

**obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

**NE  
TESEDIF E**

**52 MÊR  
HEFTEYAN**

**WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN**

**Ne tesedif e  
52 Mêr 52 Hefteyan Li Ser Tûndkariya Mêran Dinivîsin**

©Weşanên Weqfa Ragihandinê ya IPSyê

Nivîskar: **52 Mêr**  
Koordinatör-Edîtor: **Şenay Aydemir**  
Berhemên dîbarî: **Kemal Gökhan Gürses**  
Sepan û dîzayna pirtûkê: **Ali Seçkin Karayol**

Gulan 2019

**WEŞANÊN WEQFA RAGIHANDINÊ YA IPSYÊ**

Faik Paşa Yokuşu No: 37/7-8  
Kat:3 34430 Beyoğlu, İstanbul  
Tel: +90 212 2511503  
Faks: +90 212 2511609  
E-poste: bia@bianet.org  
Malper: www.bianet.org

<https://www.facebook.com/bagimsizletisimagi/>

[https://twitter.com/bianet\\_org](https://twitter.com/bianet_org)

<https://www.instagram.com/bianetorg/>

Ev pirtûk bi piştgiriya maddî ya Ajansa Navneteweyî ya Hevkarîya Ji Bo Pêşketinê ya Swêdê (SIDA), Bernameya Sivil Düşün (Sivilane bifikire) ya Neteweyên Yekbûyî û Zanîngeha Metropolîtan ya Osloyê (Oslo Met) – Navenda Rojnamegerî û Medyayê (JMIC) hatiye amadekirin.

Berpirsa nêrînê di vê pirtûkê de Weqfa Ragihandinê ya IPSyê ye. Ji ber vê yekê bi ti awayî çênabe ku wek nêrînê SIDA, Sivil Düşün an jî OsloMetê bêne dîtin.



**IPS İLETİŞİM VAKFI**



**İsveç  
Sverige**

**OSLOMET**





# Naverok

<b>Şenay Aydemir</b> Kêşeyên ‘Mêrbûnê’!	7
<b>01 Murat Çelikkan</b> Dibe ku ez dîn bûbim	10
<b>02 Mehmet Eroğlu</b> Jin	16
<b>03 Tuğrul Eryılmaz</b> Sûr-Karşıyaka-Cebecî-Babialî	20
<b>04 Ümit Ünal</b> Rojhilata Navîn	24
<b>05 Hakan Bıçakçı</b> Diêşe Rocky	28
<b>06 Yekta Kopan</b> Ez ditirsim ku bi xwe re rû-bi-rû bimînim	32
<b>07 Tayfun Pirselimoğlu</b> Şeveka li çolê	36
<b>08 Murat Yetkin</b> 3 rewşên tundkariya mîran	40
<b>09 Atilla Taş</b> Em mîr ji bo jinan gelek nesemîmî ne	44
<b>10 Şener Özmen</b> Mêrbûna muhteşem	48
<b>11 Korkut Akın</b> Divê kurê min bavê xwe nas bike	54
<b>12 Gökhan Durmuş</b> Rewşa nûçegîhanên jin ji rewşa jinên din ne cudatir e	58
<b>13 Ahmet Ümit</b> Navê min Hatun e	62
<b>14 Volkan Ağır</b> ‘Em’ ne li wir bûn, lê hejmara ‘me’ zêdetir bû	66
<b>15 Alper Hasanoğlu</b> Ne’ileta mîrbûnê	70
<b>16 Pakrat Estukyan</b> Hişmendiya dewletê li dijî jinan e	76
<b>17 Sami Evren</b> Bi rastî jî ne tesedif e ku mîr jinan dikujin	80
<b>18 Ali Kemal Çınar</b> Mîr, mîna û her wekî din in	86
<b>19 İrfan Değirmenci</b> Parastina min li pêvekê ye!	90
<b>20 Mehmet Açıar</b> Rapêça Tundkariyê	94
<b>21 Menderes Samancılar</b> Biheşta derewîn	98
<b>22 Barış Ünlü</b> Cîhana hizirkirinê û mîrbûn	102
<b>23 Bağış Erten</b> Mezinbûna li warê xwendekaran	110
<b>24 Turgut Yüksel</b> Tramvaya azweriyê	114
<b>25 Fırat Yücel</b> Çêdibe ku îtirafkirin û li-xwe-mikur-hatin jî pesindaneka nîrane be	118
<b>26 Fatih Polat</b> Rewşa mîrbûnê: Rihetiyeke wiha ye ku dema tu dev ji xwe berdî rûbirûbûyînê tune dike	122

<b>27</b>	<b>Tanıl Bora</b>	Mêr û mêt	<b>128</b>
<b>28</b>	<b>Tan Morgül</b>	Tu li çi dinêrî wilan!	<b>132</b>
<b>29</b>	<b>Haşmet Topaloğlu</b>	Li hewa re ye	<b>136</b>
<b>30</b>	<b>Rauf Kösemen</b>	Înkarkirin nexweşiya hafizeya mêtan e	<b>140</b>
<b>31</b>	<b>Süreyya Evren</b>	Ji bo dema pêş 7/52	<b>144</b>
<b>32</b>	<b>Olkan Özyurt</b>	Bavîtî: Di gotinê de wek agirî ye, di kiriyarê de dike bikeve	<b>148</b>
<b>33</b>	<b>Tunca Öğreten</b>	Bê-rû(barî)bûn!	<b>152</b>
<b>34</b>	<b>Zafer Yılmaz</b>	Ez nerazî me!	<b>156</b>
<b>35</b>	<b>Cem Erciyes</b>	Kî bi kê bikaribe	<b>160</b>
<b>36</b>	<b>Özcan Sapan</b>	Li eyneyê binêre!	<b>164</b>
<b>37</b>	<b>Mahir Ünsal Eriş</b>	Dayê dayê, dayka min, dayka min a mêt!	<b>170</b>
<b>38</b>	<b>Ulaş Bayraktar</b>	"Jin jin e, miraza min ew e ku nebe weke mêtan"	<b>174</b>
<b>39</b>	<b>Veysi Altay</b>	Mêt û mêtînger	<b>178</b>
<b>40</b>	<b>Murat Utku</b>	Salên dibistana deryayıyan, jiyan medenî û rewşêñ mêtâbûnê	<b>182</b>
<b>41</b>	<b>Burak Kuru</b>	Yên ji xwe re diaxivin: Tirkîye ji vî dengî hez dike	<b>186</b>
<b>42</b>	<b>Burak Göral</b>	Di serî de jin û zarokan rizgar bikin!	<b>190</b>
<b>43</b>	<b>Mehmet Bozok</b>	Xebatêñ li ser mêtâniyê yên bi nêrîna rexneya li mêtâniyê (ne gelo) û mêt?	<b>196</b>
<b>44</b>	<b>Yenal Bilgici</b>	Bila mêt ji kerema xwe re hiş bin	<b>200</b>
<b>45</b>	<b>Kıvanç Sezer</b>	Tiraliya mêtan	<b>204</b>
<b>46</b>	<b>Ömer Madra</b>	Guherîna îklîmê -tûndkariya mêtan- ne tesedif e	<b>208</b>
<b>47</b>	<b>Müfit Can Saçıntı</b>	Ehmeqîya çêkirî	<b>214</b>
<b>48</b>	<b>Can Tonbil</b>	Bi destûra we...	<b>218</b>
<b>49</b>	<b>Derya Bengi</b>	Tep û rep!	<b>226</b>
<b>50</b>	<b>Ramin Matin</b>	'İstiqrar'	<b>230</b>
<b>51</b>	<b>Emre Senan</b>	"Yê mêt be" dikare dest jê berde	<b>234</b>
<b>52</b>	<b>Yıldırım Türker</b>	Hêsîriya di destê erkê de	<b>238</b>



# KÊŞEYÊN ‘MÊRBÛNÊ’!

**ŞENAY AYDEMİR**

Murat Çelikkan, Mehmet Eroğlu, Tuğrul Eryılmaz, Ümit Ünal, Hakan Bıçakçı, Yekta Kopan, Tayfun Pirselimoğlu, Murat Yetkin, Atilla Taş, Şener Özmen, Korkut Akın, Gökhan Durmuş, Ahmet Ümit, Volkan Ağır, Alper Hasanoğlu, Pakrat Estukyan, Sami Evren, Ali Kemal, İrfan Değirmenci, Mehmet Açıar, Menderes Samancılar, Barış Ünlü, Bağış Erten, Turgut Yüksel, Fırat Yücel, Fatih Polat, Tanıl Bora, Tan Morgül, Haşmet Topaloğlu, Rauf Kösemen, Süreyya Evren, Olkan Özyurt, Tunca Öğreten, Zafer Yılmaz, Cem Erciyes, Özcan Sapan, Mahir Ünsal, Ulaş Bayraktar, Veysi Altay, Murat Utku, Burak Kuru, Burak Göral, Mehmet Bozok, Yenal Bilgici, Kıvanç Sezer, Ömer Madra, Müfit Can, Can Tonbil, Derya Bengi, Ramin Matin, Emre Senan û Yıldırım Türker.

Me 10ê Kanûna Paşiyê ya 2018ê dest bi weşandina nivîsên “Ne Tesedif e/ 52 Mêr 52 Hefteyan Li Ser Tûndkarîya Mêran Dinivîsin” kir û heta 2yê Kanûna Paşiyê ya 2019ê dewam kir. Gotinêne “ne tesedif e” bi kurtasî mexseda me dîyar dike. Ev 52 navêne min li pey hev rêz kirîn, ew kes in ku cara yekem li ser vê mijarê nivîsîne. Em spasdar in.

Em vejerin destpêkê. Di Kanûna Pêşiyê ya 2017ê de ji min re hat pêşniyarkirin ku koordinatoriya rêzenivîseka bianetê bikim, rêzenivîs ji “nivîsên mîran ên li ser tûndkarîya mîran” pêk dihatin. Ez di heman demê de kelecanî bûm û ketim di fikarê de. Ez gelek kelecanî bûm ji ber ku ji bilî karên akademîk li ser vê mijarê gelek xebat nehatibûn kirin. Ez di fikarê de bûm ji ber ku ji bilî tûndkarîya mîran a hestebarî/fizîkî yên berbiçav piranîya mîran “nîşandana mîrbûnê” weke kêşeyekê nabînin.

Lê “mêrbûn” di rewşên “tûndkarî” de berçav e. Dê balkêş bibûya ku ji devê mîran hîn bibim ka di jîyana rojane de mêrbûn çawa ji nû ve tê çêkirin. Ji ber vê yekê me ji mîrêni ji derdorêni cida û ji xusûsiyetêni cida nivîs xwestin. Me ji wan xwest heke mûmkin be, bila ew li jîyana xwe binêrin û behsa pêvajoyêni ji-nû-ve-avakirina mêrbûna xwe bikin. Mesela nivîskarekê li ser fûtbolê dinivîse dê behsa zimanê xwe yê rojane, yê dema li meydana fûtbolê û di nav temâşevanêni lîstika fûtbolê de bikiriya. An jî derfetek dê çêbibûya ku em bibînin ka li kolejeka “qedîm û xwedîya kevneşopîyeka bihêz” kesekê li warê xwendekaran mayî li çînêni ji hev cida yêni sosyo-ekonomîk mêrbûna xwe çawa ji-nû-ve çêkiriye.

Xebatkarêni bianetê jî tê de bi jimareka zêde nav hatin nivîsin, ji wan 52 kesan qebûl kir ku binivîse. Heta ji me hat me xwest em ji alîyê çandî û civakî ve berê xwe fireh bikin. Hin şîroveyêni erêni jî hatin kirin. Hin şîroveyêni nemaze xwendevanêni jîn neyînî jî bûn. Tiştê herî girîng ew bû ku dihat gotin mîr xwe ji mijarê dûr dikan û behsa mîrbûneka ji xwe dûr dikan. Ew rexneyeka di cih de bû.

Ji bilî ku nivîsan ji-nû-ve avakirina mîrbûnen ya sîyasî, çandî û civakî û bikarhînana wê ya di zimanê rojane de, nivîsan tişteka girîng a li ser me mîran jî nîşan da. Li malbat, dibistan, leşkerî, komîn mîran seyirgeha fûtbolê meyla piraniya me ji bo ji-nû-ve avakirina mîrbûnen heye.

Meyla me li ser wî tiştî heye ku em zimanê malbatê yê me di pişpişîne, têkiliya çîna jîr û jor a li dibistana şevîn, çînperestiya li leşkeriyê, sloganêni zayendperest ên li

trîbunan jî asayî bikin. Lewre, ‘asayîbûna’ van qadan, hêzeka wisa dide me ku bêyî em di nava têkiliyan civakî, çandî û aborî de kedekê bidin dikarin bibin xwediyê wê. Ji lewre pirsên derbarê mîrbûnen û mîrbûna me de herî zêde di nava wan rewşen zayendî, laşî û hestiyarî de derdi Kevin holê ku vê rewşa asayî jî ji nav dibe.

Ji ber vê ye ku fikra min a derbarê 52 nivîsan de ev e; di van nivîsan de tenêne zanyariyêni ku em mîr têdigihêni û tînin ziman hene, ew zanyarî hene ku di heman demê de em dîkin nakin fam nakin. Ev nivîs ji hêla wan kesan ve hatine nivîsandin ku di warêni xwe de pispor in û zanebûnekê wan heye û ez ji nêz ve karêni wan dişopînim. Li gorî fikra min, nivîsên ku van kesan nivîsandine him ji hêla tiştêni tê de hatine nivîsandin, him jî tê de nehatine nivîsandin çavkaniyeke girîng e.

Di navbera 22 û 26ê Kanûna Paşiyê ya 2019ê de Nurseli Yeşim Sunbuloglu (Hewcedariya fikra li ser mîrbûyîna wekhev), Maral Erol (Vegera li xwe veguhestina mîrbûnen), Selin Akyuz (Nêzîkatiya ji siyasetê wêdetir), Cenk Ozbay (Dema mîrbûyîn dibe benîştê devan), Sevilay Çelenk (Gelo tu dikarî çirokeke rastîn ji min re vebêje) û Nebahat Akkoçê (Hayjêbûna ku hêzê dide polîtîkaya feminîstan) derbarê nivîsên Li ser 52 Mîran de nivîsandin. Ez van nivîsan di vê çarçoveyê de gelekî girîng dibînim. Spas dikim.

Çend sal berê hevaleke min ‘mîrbûn’ şibandibû alkolvexwariyê. Behsa civînêni ‘alkolîkên bênav’ ên di filmêni Hollywoodê de em gelek caran dibînin, kiribû. Di van civînan de hemû kes bi dor diaxivin û

dibêjin, "navê min... ez alkolîk im û ev pirsgirêkek e...". Hevala min jî bi henekî gotibû, "Divê hûn jî her sibê bi gotina ez mîr im û ev pirsgirêkek e hişyar bibin". Paşê jî wiha gotibû, "Di encamê de dema dest ji alkolê hat berdan, hemû têkoşîn heta vexwarina gulpa pêşiyê ye. Piştî vexwarina wê gulpa pêşiyê, her tişt dizîvire serî. Ger ku hûn dest ji rolên mîrbûnê yên civakî berdin jî her tiştê ku hûnê bikin wê bi libatekê vegere serî." Em dikarin vê li ser zêde bikin, gelek alkolîk wisa difikirin ku pirsgirêka wan a alkolî nîne. Weke em, mî difikirin ku di rolên mîraniyê yên me de pirsgirêk nîne.

Ne her serê sibehê lê gelek caran em li ser meseleya asayîbûna mîrbûnê bifikirin dibe ku ev bibe destpêkek. Weke vê rîzenivîsa ku wê niha bibe pirtûk. Baş xirab, kêm şaş, di hemû gotarêni di vê rîzenivîsê de delînê derbarê têgihiştina mîran a li ser mîrbûnê de hene. Ez hîvî dikim ku di encama şopandina van delîlan de di demên pêş de wê karên wisa derkevin holê ku wê karibin çavkaniyê pirsgirêkan derxin holê.

# NE TESEDIF E

52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN

#01 MURAT  
ÇELİKKAN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## DİBE KU EZ DÎN BÛBIM

Gelek dem lazim bû ji bo ku ez xwe kontrol bikim.

Gelek dem lazim bû ji bo ez wî tiştî fam bikim  
û ji xwe bipirsim ku tiştên ez weke maf dibînim  
ji perwerdeya zayendî ya civakî têñ.

Ez nikarim bibêjîm ku min ji hev derxistine.

Ne laşî be jî min demana tundkariyê teqez bi kar anîye.

Mijar bi xwe ne bes e ji ber ku min qebûl kiriye weke mîr, di mijareke wiha de nivîsa destpêkê binivîsim divê ez dîn bûbim, lê na ez dîn nebûme. Sedema ku min ev tişt daye ber çavê xwe ev e; li qada civakî di mijara mîrbûnê û tundkariya mîran de wextê axavtina mîran hatiye û mîr ji bo axavtinê gelekî dereng jî mane. Helbet min nekarîbû Nadîreyê û bianetê red bikira.

Axir ji bêwatetiya gotina “ez li hemberî hemû tundkariyê me”, ji nimayışa mîrbûnê ya li hemberî wateya “tundkariya mîran”, em îro hatine rewşeke wiha ku mîr tundkariya mîran nîqaş dîkin û li ser wê dinivîsin. Ne ji zû de ye, 9-10 salên ku vê pêvajoyê destpêkiriye. Li gori çeteleyên tundkariya mîran ên bianetê ji sala 2010ê û vir ve li Tirkiyeyê mîran li derdora 2000 jin kuştine. Dema ji vir li meseleyê binêrin û bifikirin hûnê fam bikin ku berdêla vê çiqas bi giranî hatiye dayin. Tirsa ji jinan û dijminahiya jinan bûye sedema wî tiştî ku him yek bi yek mîr him jî sazî li hemberî jinan kiryarêñ dijmirovahiyê pêk bînin. Her ev bûye, hîna jî dibe.

Helbet ez wî tiştî naparêzim ku dema mîr jî besdarî nîqaş û doktrîna zayendî ya civakî bibin wê çareseriyeke misoger ji pirsgirêkê re bîne. Lê bi vê munasebetê ez ê hewl bidim ku tevkariya xwe ya mutewazî bikim û li xwe mikur bêm.

Çawa ku berpirsiyariya kemasiyêñ min ên ku min weke demana mîrbûnê bidest xistine, di stuyê mîrbûnêñ ku hatine fêrkirin û testosteronê de be, di vê mijarê de ez deyndarê wan jina me ku hema hema bi giştî wan hiştiye li ser xwe

biponijim û li xwe vejerim. Ez deyndarê wan jinêñ zewac û evîndariya bi min re dane ber çavê xwe, yêñ dostaniya min kirine û yêñ ku weke hevkar bi min re gelek dem borandine me ku bi bêhnfirehê min perwerde kirine, tehemula mîrbûna min kirine û helbet têkoşîna nasnameyê li hemberî mîrekî kirine. Divê di mijara lêpirsîna mîrbûnê de, di fêmkirina wî tiştî de ku mîrbûn ji tercîha zayendî û heteroseksîzmê wêdetir e û di mijara pêkarîbûna mîrbûnê de ez tevkariya LGBTI+ piştguh nekim.

Gelo em weke mîrên mixalif ev tişt naleta me ye ku desthilatdariya em li hemberî wê derdikevin weke mîraniya hegemonîk dîsa dîsa çêdikin. Mixalifiya me gelek caran lêpirsîna serdestiya patriyarkayê û heteroseksîmê ji bîr dike. Lê ji ber em mixalîfin, em wisa difikirin ku ji xwe lêpirsîna xwe dîkin.

Ji temenê xwe yê gelekî ciwan de ez di nava derdoreke polîtîk de bûm. Ji 17 saliya xwe û pê de jî di nava têkoşîna sosyalîst de me. ne desthilatdariya civakî û sazûmanî ya di mijara meseleya jinan de ne ya mirov wê bibin evîndarê kê û bi kê re şâ bibin û ne jî hevaltiya wan zêde di rojeva min de bû. Ji bilî çend jinêñ bi rengekî cidî li ser vê meseleyê disekinîñ ku wan jî tenê bi armanca “bila ev jî hebe” komeleyêñ jinan vekiribûn û ev komele di bin serdestiya îdeolojîk û rêexistinî de bûn. Wê gavê jî ew jin bêhtir hêja bûn ku di hin meşan de li paş pankarta rêexistinêñ jinan na lê bi me re yanî bi mîran re dimeşyan.

Piştî derbeya leşkerî ya sala 1980yî bi saya tevgera jinan, a lezbiyen û geyan ku her diçû berbiçavtir dibû, li Komeleya Mafêñ Mirovan min her dû jî di rastiyê de nas

kirin. Li wir bi xwe jî min kêmek bi xemgînî li wî tiştî temâşe kiribû ku sala 1990î dema ji bo grevê birçibûnê yên li girtîgehan çalakiyên protestoyî dihatin çekirin jin çûbûn çalakiya cuda (protestoya bi cil û bergên reş). Xuya ye ku yek ji şîroveyên herî Ortodoks ên navendparêziya demokratîk a li Tirkîyeyê bandoreke mezin li ser min kiriye.

Digel ku ez bi meseleya desthilatdariyê re ewqas mijûl dibim min patriyarka paşguh kiriye. Dibe ku çavkaniya xwe ji mîrbûna min distîne ev tişt. Helbet ez li vir di vê mijarê de ji kîsî xwe hukmê nadim. Jinêk ku gelekî gelekî ji min baştir dikarin vî tiştî bikin hene. Lê ez deyndarê jina me ku di vê mijarê de meseleya jinê dîsa wan kurtir bi min dane famkirin.

Lê divê tundkariya mîran ne tenê meseleya jinan be. Jin weke kesên ku rastî tundkariyê têñ, dema ku têkoşîna tundkariyê bi xwe û têkoşîna kesên ku tundkariyê dîkin yanî dema têkoşîna me dîkin, divê mîr jî di heman demê de hewla têkoşîna bi mîrbûnan a bi rengê di gelek çandêñ cîhanê de hatiye ravkirin re bikin û ji xwe re wê bikin derd.

Çi mîr be çi jin be, ti zîndewer nîne ku dema nîvê şevê bi tena serê xwe li kolanê bimeşe û rastî pênc zilaman bê û netirse.

Mîr xwediyyê wê demanê ne ku dema nikaribin kontrol bikin an jî serdestiyê bikin hêrs bibin û tundkariyê bikin. Hînî wî tiştî bûne ku dema erka wan têrê neke piştgiriyê didin komeke mîrên xwedî erk û ji bo berdewamiya erka wan tundkariyê dîkin. Divê neyê jibîrkirin ku tecawiza sistematîk amûreke şer e.

Niha em hatin ser beşa zehmet... yanî meseleya lêpirsîna hindurîn.

Lewra heke di vê meseleyê de hewldana lêpirsîna hindurîn û mikurhatin çênebe wê gavê xetereya wî tiştî derdikeve holê ku mîrên xwe weke her tiştî dizanin dihesibînin dikarin qada tundkariya li ser jinan rave bikin û vebêjin. Ji ber wê jî ez wî tiştî gelekî girîng dibînim ku mîr ne li hemberî jinan bin, lê di navbera xwe de li ser merbûna xwe biaxivin û nîqaş bikin.

Qasî ku tê bîra min, min tundkariya zayendî û laşî li hevkarêñ xwe, jinêñ xwe, evîndarêñ xwe û zarokêñ xwe nekiriye. Dibêjim ku qasî tê bîramin, lewra hin tiştêñ ku ez weke mafêñ xwezayî qebûl dikim dikaribûn bihiştana taktîkêñ tundkariyê yên psîkolojîk bi hêsanî veguhezin tundkariya laşî.

Ez hêvî dikim ku ez ne şaş bim û encameke wiha derneketibe holê. Lewra mîr vê tundkariyê jî herî zêde dikarin li ser kesên nêzîkî xwe tetbîq bikin. Bi taybetî jî ev nêzîkayî di nava malê de hatibe sazkirin ku mîr desthiladrariya xwe bi hemû awayêñ sazûmanî û civakî li vir diparêzin.

Min hewl da ku di têkiliyê xwe de, li ciyêñ ku min lê kar kirine cidakariyê nekim, serdestiyê ava nekim û hay ji mafêñ xebatkaran hebim. Lê di bingeha demanê mîran de desthilatdarî û kontrolkirin heye ku em weke mafêñ xwezayî qebûl dîkin.

Gelek dem lazim bû ji bo ku ez xwe kontrol bikim. Gelek dem lazim bû ji bo ez wî tiştî fam bikim û ji xwe bipirsim ku tiştêñ ez weke maf dibînim ji perwerdeya zayendî ya civakî têñ. Ez nikarim bibêjim ku min ji

hev derxistine. Ne laşî be jî min demana tundkariyê teqez bi kar anije.

Ez dixwazim behsa wan deman û xûyan bikim ku hîna hewl didim çareser bikim û wan weke mafekî xwezayî dibînim.

Em ji ya herî nerm, ji “mafê qutkirina gotinê” dest pê bikim...

**Mafê qutkirina gotinê ya mîran:** Her çiqas ku ez zû bi zû paş de gavê diavêjim jî her gav ez bûme gengeşikerekî germ. Di germbûna nîqaşê de bêyî ku hay jê çêbibim bê kesên din diaxivin an na ez tiştên ku tên hişê min, tiştên ku rast dibînim û baweriya min bi rastiya wan tê tînim ziman. Ev jî pêwîstiyeke “li ser navê hêza rastiyê mîrbûnê” bû.

**Çareserî:** Heke ku tehemula te tune be beşdarî nîqaşan nebe, gotina jinan qut neke, qut neke.

**Mafê ez dizanim ê mîran:** Bi dirêjbûna temen re tecrûbe û zanyarî jî bi rengekî ïzafî zêde dibil. Ez ji nişka ve dibînim ku di her mijarê de zanyariyê min hene. Ev zanyarî piştî demekê vediguhezin fîkî û darazên neguher. Di civîn û nîqaşan de her gav gelek fîkrê min hene ku ez bibêjim. Ez dixwazim ku van tiştan bibêjim.

Na, divê ez bibêjim, ragihînim. Ev car caran bi hevokên “rastiya vî karî ev e” derdikeye holê. Heçku her gava ez diaxivim, ji hêla teorîk ve dizanim ku jiyanâ ciwanan, jinêni bi zehmetî dikarin mafê axavtinê bi dest bixin zehmettir dikim. Her wiha ez dikarim bi qebûlkirina vî tiştî dest bi karî bikim ku ez van mijaran nizanim, dibe ku hin kesên din ji min baştir bizanibin.

**Çareserî:** Ez hewl bidim ku hin tiştên dizanim ji xwe re veşêrim û kêmtrî biaxivim, di wê dema teserufê de ji bo jin û kesên LGBTI+ bêhtir biaxivin baldartir bim.

**Mafê pevhenekkirinê yê mîran:** Min ew derdorê karî ên rehet her gav tercîh kirine ku mirov henekan bi hev dikin. Min hewl da ku ciyêz ez lê dimînim jî wiha bin. Lê ez her gav balê nadim wî tiştî ku li van derdoran hiyerarşîyeke nav lê nehatiye kirin heye û mirov xwe li van deran wekhev nabînin. Ez gelek caran ji bîr dikim wan henekan nekim ku derbarê temenê jinan, jîriyê wan û yên derbarê dîmenê wan ên ku wê bihêlin xwe xerab bihesibînin. Ev jî sazkirina wê taktîka desthilatdariyê ye ku bi sedsalan e dihêle yên li hember xwe lawaz û kêm bibîne.

**Çareserî:** Derbarê nîjadperestî û zayendperestiya rojane de bêhtir tiştan tu bixwînî û bifikirî. Tu wî sînorê di navbera pevhenekkirinê û yê sivkitayê neborînî. Bi taybetî ji jinan re tu nebêjî ku “îro tu gelekî westiyayî dixuye, çi bûye gelo tu bi şevê ranezayî, kîloyê te zêde bûne.”

**Mafê qîjînê yê mîran:** Hewldana bêdenghiştina bi qîjînê ya li ser kesên din jî taybetmendiyekê mîran e. Tiştê herî xirab ew e ku dema vî tiştî dikim ez ne di ferqa wê de me, tenê dema ku ez nîqaşê dikim vî tiştî dikim. Yanî ez dengekî gelekî çînî û meroxî bikar tînim, tam weke amûreke serdestiyê hetta weke amûreke çewisandinê.

**Çareserî:** Di navbera kesên wekhev û yên tu wan ne wekhev in, ji te kêmtrî in tu dengê xwe qet bilind neke. Di nava ti şert û mercan de...

Mafê neecibandinê û yê rexnekirinê yê mîran: Bi taybetî li malê di jiyana rojane de mîr bi hêsanî dikarin xwe bixin pozisyonâ rexnegiran. Her wiha ez jî! "Ev birinc ne weke ya ku tu her carî çê dike ye."

Çareserî: Mafê neecibandinê û mafê rexnekirina bihêsanî him ji ber ku dihêle yê li hemberî te xwe kêm bibîne tê wateya tundkariya psîkolojîk him jî ji bo dîtina çareseriyê tê wateya bi rengê çalak helwestê nestîne, kedê demkî û giyanî ya vê nede û bi vî rengî pozisyonâ xwe ya bikêr zexmkirinê. Yanî jinûve hilberîna desthilatdariya mîran.

Mafê serdestiya li ser keda nava malê: Hizra min a li ser wî tiştî ku divê karê nava malê her li ser keda jinê be. Karê min bi xwe be jî. "Zarok digirî", "gumlekê min ê lacîwer li ku ye?", "mal çima bela wela ye?".

Çareserî: Divê ez bînim bîra xwe ev hemû karênen min in û divê ze wan bikim. Heke ku xwarin ne zêde bi çêj be, heke ku zarok bigirî, heke ku pêdiviya zarokê bi lîstikê hebe, heke ku tiştên lê digerim ne li ciyên xwe bin an jî ez wan nabînim, beriya ku ez tiştekî bibêjim ez tînim bîra xwe ku ev karê min e. Tişa baş ew e ku dema ez vê ji bîr dikim li malê kesek heye, tîne bîra min.

Mafê hêrsbûnê yê mîran: Dema hin kes, tiştek min gelekî aciz dike û di vî tiştî de israr dike hêrsbûn yek ji demanê mîrbûnê ye. Kesê/a li hemberî xwe bi hêrsbûnê bimelisîne. Dijûnkirin... Ez vê jî dikim.

Çareserî: Divê ez bînim bîra xwe ku ev tişt nîşaneyeke mîrbûnê ye, dijûnkirin qasî birînkirinê zayendî ye.

Mafê xeyîdîn û cezakirinê yê mîran: Piştî mafê hêrsbûnê yan jî mafekî ku di heman demê de bi mafê hêrsbûnê re tê bikaranîn. Yek ji rîbazên herî baş ê ku cezakirinê ye, yan jî dihêle kesê li hember, xwe tenê û dilbiguman bibîne. Dema kesê li hember tiştekî bibêje sazkirina desthilatdariyê ya bêdengiyê yan jî bi xeyidandina kesê li hember wî tune bihesibîne. Gaveke li du wê jî cezakirina wî/wê û bihêle ku hay jê çêbibe. Min gelek caran ev tişt kirin. Xûyeke xirab, mîrbûneke kirêt.

Çareserî: Ti gavê li hemberî xizmîn xwe, evîndarêni xwe û hevkarêni xwe desthilatdariya bêdengiyê saz neke. Desthilatdariyeke wiha ye ku biçûk dixe, bi xeyîdandinê tune dihesibîne û bêhtir rencîde dike, mîr ji bilî xwe li hemberî herkesan gelek caran bi kar tînin.

Ez piranî bi rîveberen jin re xebitîm. Weke ku min got, ez gelek tişt ji wan fêr bûm. Gava ku tiştek nekirin jî mirêk li ruyê min girtin. Lî 6 salêni dawiyê li ciyekî wiha kar dikim ku bêhtir jin lê hene. Ez ji hemûyan lê herî zêde jî ji sê hevalen min ên jin ên rîveberiyê dikin, gelek tişt fêr dibim. Di serî de jî guhdarkirin tê. Ez fêr dibim, ew jî hîna bi min re kar dikin. Ez hîna jî dixwazim.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Yek jê damêzrînerê Navenda Heqîqet, Dad û Bîrê ye û Ji sala 2011an vir ve jî hev-dîrektorê wê ye. 25 sale rojnemeger e. Di nava van 25 salan de karên nûçegihanî, berpirsiyariya weşanê, edîtorî, û qunciknivîsî kiriye. Di nav Tevgera Mafê Mirovan a Tirkiyê de bi awayke çalak cihê xwe girtiye. Avakarê Komeleya Mafê Mirovan, Rêexistina Efûyê ya Navnetewî Şaxa Tirkiyê, Komeleya Hemwelatiyan ya Helsînkiyê û Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyê ye. Di projeyê di derbarê pirsgirêka kurd û etîka medyayê de kar kiriye. Ji bo piştgiriyê rojekê dibe Berpirsê nobedar yên weşana Ozgûr Gûndemê Ji ber vê yekê jî bi sûcê propagandaya rêexistinê 18 meh ceza lê hatiye birîn. Di 14ê Tebâxa 2017an de hatiye girtin û şandine girtîgeha Kirkclareliyê . Piştî 68 rojan, bi şertê kontrola edlî tê berdan. Heta ceza wî biqedede wê heftê 4 roj li emniyetê îmze bavêje.

# NE TESEDIF E

52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



#02 MEHMET  
EROĞLU

**obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## JIN

Divê em çi bikin?  
Ji bo çareserkirina kêşeyên jinan her çende  
gava yekem ferkirin û wan jî be,  
taliya paşiyê ev meseleya desthilatê ye.

## Anadolû!\*

Erê baş e lê em li wenatekê welê dijîn ku ji bilî navî ti tişt ne jinane ye.

Li vî welatî (belkî li gelek welatan welê ye) her tişt mérane ye. Goştê mûhafazakariyê bi sosa çiyayî û eşîretbûnê bazara wê tê kirin. Méraniyeka welê ye ku bi tenê bi gotinan e. Jin bi tenê dema zarokan çêbike û bibe dayik qedrê wê heye.

Heta ku carinan em dibihîsin ku tê gotin çekirina zarokekî/ê ne bes e divê jimara wan bê zêdekirin. Lê em dizanin ku jin heke qet zarokan çênekin jî dikarin bibin dayika her kesan.

Ya rastî ev tespît jî xelet e. Ji bo hûn ji mérên pederşah re qedrê we hebe ji bilî çekirina zarokan teştekê dî jî lazim e: Aîdîyet!

Heke jinên dayik ne dayika me bin ne biqedir in. Bila neyê fêmkirin ku ez mübalexeyê dikim. Weke min hewil da ez bi sersere di çerçeveyekê de bi cih bikim, mér dema wan gotinên xweş payebilind ji bo jinan dibêjin ew bi tenê ji bo jinên ji eşîreta xwe re dibêjin û wan jinên dî jê bêpar dikin.

Dema gotina “jin” tê gotin tiştê di serê me de tê çandin, li ber çavêن me tê danîn, hima bêje bi tenê mêtûn e: Têgeheka biefsûn heye, navê wê exlaq e, exlaqê jinan e.

Ev exlaq aliyê vijdanî yê civakê tine dike. Kêrî wê yekê tê ku hefsarekê bike serê

jinan jinan. Heke em baştır li vê yekê binêrin em ê bibînin ku nîvê vê têgehê ji qaîdeyên dînî û kevneşoriyan, nîvê dî ji qedexeyan pêk têن.

Tabii ew tiştê jê re gotina namûs tê gotin li dijî jinan e, nêrîneka durûyane ye, hewil dide jinan dane bin nîrê mérän. Ev nêrîneka mérbûn û çiyayîbûnê ye ku ji xwe ve bingehê exlaqê ye.

Ji bîr nekin kuştin kiriyaureka xerab e lê heke ji bo namûsê hatibe kirin –ne bitenê di nava civakê de di qanûnan de jî- dikare mazeret jê re bê dîtin. Ew tiştê ku jê re namûs tê gotin gelek caran pêkhateyeka qedexeyên ji bo jinan e. Welê ye ku ew tiştên ji bo jinan wek bênamûsîyê(!) têne binavkirin ji bo mérän wesfekê pesindanê ye.

Divê em vê yekê qebûl bikin, ji bo [têkoşîna li dijî] tûndkariya li jinan tê kirin, newekheviya aborî, hin tişt hene ku divê jin bikin. Erê jin şîrê xwe didin me hez ji me dikin lê dest li hişê me nadin. Şekildana mejiyê me her dem ji bo bavên me hatiye hiştin. Divê ev yek biguhere.

Ma tiştê herî dramatîk heta ku tiştê trajîkomîk ne ew ku hîmîn exlaqê wan normên wan pêr pêk tînin?

Ji dema yekyezdaniyê ve xweda û pêxember her bav in. Her çende jin bi awayekê bi hêz bi şertan ve hatine girêdan jî, divê bê guhertin.

Jin di hicreyekê de asê maye dîvarê çepê mîr in, dîwarê rastê dîn in, dîwarê paşiyê exlaq e û dîwarê pêşiyê dîwarek e ku ji hiş û bîra jinan bi xwe pêk tê.

Divê jin dest jê berdin ku bi çav û berçavikên mîran binêrin.

Jin ew kes in ku şîrî didin mîran û her mîrek jî dijminê jinan e. Min çavdêriyeka baş li vê yekê kiriye. Ev dijminatî her car nabe sebeba kuştinan an jî tûndkariyê. Ez behsa wê yekê dikim ku ji hemî aliyên civakê ve mîr bi çavê kêmdîtinê li jinan dinêrin.

Heke civakekê kêşeya azadî û wekheviya jinan mafê wê yê jiyanê çareser nekiribe em nikarin demokrasiyê jê hêvî bikin.

Li welatekî azadiya xwe-îfadekirinê nebe. Ew welat li dinyayê – ne bi serkeftinên xwe yên ji bo zanist çand û werzîşê bê nasîn- ew welat bi girtina rojnamegeran û sîyasetmedaran herî navdar be. Li wî welatî jin ne azad e û metirsiya bêñ kuştin ji bo jinan heye.

Divê em çi bikin? Ji bo çareserkirina kêşeyên jinan her çende gava yekem ferkirin û wan jî be, taliya paşiyê ev meseleya desthilatê ye.

Her kes behsa azadiyê dîkin lê gelek kêm kes wê ji ser lêvên xwe ba nadîn û dadiqurtînin. Azadî wek avê ye nayê qetandin û her roj tê qezenckirin.

Ji bo vê yekê karê jinan zehmettir e. Divê ew herweha li dijî mîran jî li ber xwe bidin. Serkeftina li du çeperan! Çi pevcûneka zor û çi pevcûneka esilzade ye.

\*Ana: *Dayik*

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Romanûs û senarîst e. Romana wî ya yekemîn ya bi navê Issızlığın Ortası (Li Navenda Tenhayiyê) di sala 1979an de Xelata Romanê ya Milliyetê wergirtiye, lê ji ber ku Darbeya 12ê Îlonê hatiye qedexekirin û di sala 1984an de jî hatiye çapkirin. Ev pirtûkên wî hatine çapkirin; Geç Kalmış Ölü (Miriyê Derengmayî), Yarım Kalan Yürüyüş (Meşa Nîvco Mayî-1984), Adını Unutan Adam (Mêrê Ku Navê Xwe Jibirkirî- 1989), Yürek Sürgünü (Mişextiyê Dil-1994), Yüz: 1981 (Rû:1981- 2000), Zamanın Manzarası (Dîmena Zemanê- 2002), Kusma Kulübü (Klûba Vereşînê- 2004), Düş Kırgınları (Xeydokêن Xewnan- 2005), Belleğin Kış Uykusu (Xewna Zivistanê ya Bîr ê- 2006), Fay Kırığı Üçlemesi Mehmet, Emine, Rojin (Sêbareya Şkeste ya Fayê Mehmed; Emîne, Rojîn- 2009, 2011, 2013), 9,75 Santimetrekare (9,75 Santimetrekare- 2014), Mermer Köşk (Koşka Mermer- 2017) û Kıyidan Uzakta (Ji Peravê Dûr-2018) ye. Pirtûka wî ya bi navê Aforîzmayên Wêjeyî (Edebî Aforîzmalar) di sala 2016an de hatiye weşandin ji nivîsên wî yên ku xwendekarêñ wî hilbijartine pêk tê. Xelatêñ Milliyet Roman, Madaralı Roman û Orhan Kemal girtiye. Senaryoyê rêzefîlmên bi navê Sızı(Jan), Issızlığın Ortası (Navenda Tenhayiyê) û Tutku (Bengînî) nivîsandiye. Senarîstê filmêñ Gava 80em û Solgun Bir Sarı Gul e. Gava 80em di sala 1996an de di Festîvala Fîlman ya Stenbolê Xelata Filma Herî baş ya Tîrkan wergirtiye. Her weha Xelata Feferasyona Rexnegirêñ Sînemayê ya Nawnetewî (FIPRESCI) wergirtiye. Gava 80em û Solgun Sarı Bir Gül (Guleke Zer a Çilmisi) di sala 1997an de xelata taybet ya jûriyê ya Altın Portakala Antalyayê û di Altın Kozaya Edeneyê de jî 3em xelata herî baş girtiye. Di sala 1948an de li Îzmîrê hatiye dine. Di sala 1971an de xwendina xwe li Zanîngeha Teknîkî ya Ortadoguyê di temam dike. Ji aliyê dadgeha derbeya 12ê Adarê, 6 sal ceza jêre tê birîn. Bi efûya giştî ya sala 1974an serbest hatiye berdan û dest bi nivîsandina romanê kiriye.

#03 TUĞRUL  
ERYILMAZ

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## SÛR-KARŞIYAKA- CEBECÎ-BABIALÎ

Min di nava van salan de tenê hejmareke gelekî hindik  
hempîşeyê xwe yên jin dîtine ku di nava mekanîzmaya  
biryardayinê de cî digirtin. Ji vê zexmtir tundkarî heye  
gelo? Ez bang li hemû mîran bikim, beşdarî  
vê kampanyeya “lêpirsînê” bibin.

xwe jê rizgar kiriye.

Destpêka salên 1950yî...

Bavê min li Amedê di Kargeha Şerabê de pisporê alkolê bû. Ez li Sûrê diçûm Dibistana Seretayî ya Suleyman Nazîfî. Qasî ku tê bîra min li polê, lawikekî biberçavk û du jî keçen tompiz hebûn. Ev her sê zarok ji roja pêşiyê ya dibistanê û pê de rastî tahdeyê hatin. Bêhtir jî tahdeya kurikan. Gotinên me yên herî kubar çarçav\*, çelek û şîşko petata bûn. Rondikên van her sê hevalên me hîna jî bi dilêşî têñ bîra min.

Piştî wê bi çend salan...

Bavê min vê carê li Kargeha TEKELê ya Îzmîrê ye. Ez li Karşiyakayê diçim Dibistana Seretayî ya Fevzî Paşayî. Li polê hejmara lawikên berbiçavk û keçen tompiz zêde bûye. Çawa me li li Amedê dil diêşand niha jî li Îzmîrê heman tiştan dikin an jî dîbin şahidê dilêşandinê. Li vir li gel gotina çarçavkê em weke biçûkxistinê gotina "Zekî Murenî" jî pê ve dikin. Hizra ku tundkariya mîran wiha destpêkiriye dibe gelekî bi we komîk bê. Lê bawer bikin ku wiha dest pê dike.

Paşê ez çûm Lîseya Karşiyakayê û Koleyâ Erdemê ya li Karşikayê û ev rewşa ku em dikarin weke destdirêjiyê bi nav bikin li vir jî neguherî. Erê neguherî bû lê asta wê bilind bûbû. Navêñ klîşe li wan zarakan dikirin ku di halê xwe de bûn an jî bi gogê nedilîstin dikirin: "Kız Ahmet, Kırıtk Mustafa..."

Ez tiştekî din lê zêde bikim, digel ku ti eleqeya min bi lîstina gogê re tune bû û kesekî daxwaz ji min nedikir, ji ber tirsa leqebdayînê ez bibûm kalevan û min xwe ji belaya tirsê rizgar kir an jî ji min heye ku min

Ji bo keçan rewş hinekî din xirabtir bû. Weke hemû keç amade bûn ku her tiştî bi me re bikin û bi me re werin her deverê. Ji ber ku em zarokên "mîr" en bav heta dayikan bûn.

Ez dixwazim vê bibêjim: Ez dibêjim qey ew tiştâ ku em navê tundkariya mîran lê dikin, destdirêjiya zayendî, tundkariya laşî, mobîng, navê wê çi dibe bila bibe, ji dibistana seretayî dest pê dike. Mamosteyên me hebûn ku teqez em hemû jî rastî wan hatine, digotin, "Weke keçan negirî yan jî xwe weke kurikan ne hilpekîne."

Li bajarekî weke Îzmîrê yê modern, pevçûnên herî mezin ên ku ez bûme şahidên wan, di navbera xwendekarêñ mîr ên Lîseya Havayê û Lîseya Karşiyakayê de derdiketin.

We pê derxist. Dema ku xortekî ji Lîseya Havayê, bi keçeke ji Lîseya Karşiyakayê re dihat dîtin yekser wî kurikî kotek dixwar, keç jî bi heqaretan dışandin mala wê.

Xwendekarêñ Lîseya Havayê hema hema her hefte, bi gotina "We li hevalê me daye" Karşikaya tevlihev dikirin. Qiyamet radibû. Helbet mezinan yekser şîroveya rewşê kiribûn. "Ho zarokno ma keç hêjayî wî tiştî ne ku hûn ji bo wan bi hev dikevin?"

Paşê me yê ev hevok gelek caran bibihîsta; "We çi ji wî zarokî xwest, teqez keçikê rû dayê!" û gelek tiştîn weke vê...

Helbet mirov dikare van tiştan weke tevgerên dema balixtiyê ango kamiltiyê bibîne û li ser nesekine. Lê mixabin berdewam kirin.

Di nava heman salan de...

Rojekê bi tesedifî min dît bavê min şîmaqek li dêya min da, ku yek çipiska wî jî li me nedaye. Şîmaqeke gelekî sert bû û hindik mabû ku dêya min biketa. Ez 14-15 salî bûm.

Bi xemgînî tê bîra min ku digel tirsê jî ez bi ser bavê xwe de çûm. Dêya min di wî halê xwe de kete navberê û got, "Kurê min bavê we gelekî aciz e, tu derkevî" û min şandibû baxçeyî.

Helbet ev mesele li vir bi dawî nebû. Rojekê dema ku em hatin malê me dît dêya min çenteyê xwe rahiştiye û bi destê birayê me yê biçük Tanerî girtiye ji birayên min Tûrhan û Tûrgût û xwişka min Turkanê re got, "Heydê em ji malê diçin."

Min got, "Dayê em ê biçin ku", got "Em ê biçin Bûrsayê, cem xaltîka te. Careke din jî em nayêne vê malê." Dêya min me li ber deriyê postaxaneyê hişt û kete hundir. Piştî du saetan bi ruyekî spîçolkî derket ji derive.

Nayê bîra kesên ciwan lê berê mirov diçûn postaxaneyê û ji bo dora telefonê navêne xwe dinivîsandin. Heke ku şensê we hebûya di nava saetak du saetan de dora we dihat û hûn dikarîbûn biaxivin.

Carekê me nêrî, em ber bi mala xwe ya li Taxa Nergizê ya li Karşiyakayê vedigerin. Ji ber ku ez yê mezin bûm, dêya min kulê xwe bi min re par ve kirin. "Kurê min, xaltîka te û mîrê wê gotin, ji du şîmaqan tiştek dernakeve, mala xwe xirab neke, mala xwe terk neke û neyê van deran."

Ma paş stuyê xwe xura û em vegeriyan malê.

Salêن 1960î...

Dengê lingên azadiyê yên salêن 1970yî têbihîstin... Komeke jin û mîrê temenê wan di navbera 18-25an de ye, li Enqereyê li Fakulteya Zanyariyên Siyasî kom bûne. Nîvîn me li şevîman a Fakulteya Siyasalê a li Kampusa Cebeciyê dimînin.

Li şevîmanê 400 kes dimînin. 3 ji 4ê van mîr, yek ji 4ê van jî jin in (helbet li beşen cuda dimînin). Em hemû jî cara pêşiyê bi rastiya jiyanê re rû bi rû dimînin. Em hemû jî gelek bextewer in.

Niha hûn dikarin bibêjin, "Êdî rewş gelekî guherî ne wisa Tugrûl?"

Ez bi fikarim ku dîsa jî gelek tişt nehatiye guhertin. Herî pêşverûyê me jî bi çavê "tiredîn" û "sivik" li wan jinan dinêrin ku hevalên wan ên mîr hebûn û bi taybet jî xweşik bûn. Ez dixwazim behsa yekê bikim ku niha ne bi me re ye. Carmen Nûrsûnê Mulkiye qedand û li Fakulteya xwendibû û bûbû doktor. Ez silavekê lê bikim.

Keça herî xweşik a dibistanê bû. Tenê bi xortêñ bedew re diçe û tê. Helbet em wê gavê were mîr li ber çavan napeyivin lê di sohbetêñ nava xwe de, bi giştî jî di dema vexwarina votka yan jî bîrayê de, bêyî ku şerm bikin fesadiya wan dikin ku kî qîz e kî ne qîz e.

Ne tenê Nûrsû bû jîna herî xweşik, xweşikêñ din jî dibûn mijara fesadiyan: Zerrîn, Berrîn, Fatoş, Hulya, Samiye, Sema, Ferda, Semra, Ulku, Sevtap, İpek, Selma, Canset, Vekaa, Işık, Necmiye, Nîmet, Hale, Gaye, Ferhan, Sezî...

Di salêن 1968 û 1969ê de hişê me hat serê me û me dît ku di serî de Nûrsûn, ew jinêñ em behsa wan dikin qasî xweşikbûna xwe

mirovêñ herî pêbawer in. Di van salan de cara pêşiyê min muhasebeya xwe kir. Ez di wê rewşê de bûm ku min digot, "kî bi kê re derdikeve, kî ji kê hez dike ci ji te re" lê ji xwe em bûbûm 22 salî.

Û hevalekî me yê xort hebû ku niha navê wî nayê hişê min. Li kantînê rûdinişt û karê honandinê dikir ku ji me re ev tişt gelekî seyr bû. Ew helwesta pasîf-agresîv a ku me li hemberî wî kurikî nîşan dida hîna jî ji min re bûye kul û dert. Ez hêvî ji Xwedî dikim ku vê nivîsê bixwîne. Ez gelekî dixwazim ku pirsa "Çima tu jî beşdarî nava wanêñ din bû? ji min bike û ez jî xemgîniya xwe bînim ziman. Mixabin vî hevalê me jî di demeke kurt de dest ji dibistanê berda.

Çend tiştîn wiha têñ bîra min ku mîran li hemberî jinan û li hemberî mîrên ne weke xwe nîşan didan. Gelo dibe ku mirov xwe bispêre hinceta "zaroktiyê, xortaniyê...?"

Ji TRTyê bigire heta salêñ dirêj ên min li Babialiyê derbas kirin, di kar de ez bûme şahidê wî tiştî ku ev rewş neguheriye. Me ew midûrên navsere dîtin ku destdirêjî li stajyeran dikirin.

Bi dehan hempişeyêñ min çêbûn ku pozbilindî li hevkarêñ xwe yên jin dikirin. Ez ê zêde behsa van tiştan nekim lê dibe ku ew jî vê rêze nivîsê bibînin û bibêjin ku "Me ci kiriye!" û bixwazin hin tiştan bibêjin.

Ez vî tiştî jî bibêjim û êdî biqedînim: Di tevahiya jiyana rojnamegeriya min a 40 salî de tenê Nûrcan Akad tê bîra min ku di medyaya belavbûyî de bûye berpirsa weşanê ya giştî. Lî min di nava van salan de tenê hejmareke gelekî hindik hempişeyê xwe yên jin dîtine ku di nava mekanîzmaya biryardayinê de cî digirtin. Ji vê zexmtir tundkarî heye gelo?

Lêborîna xwe ji wan nûçegîhanêñ jin û ên mîr ên ciwan dixwazim ku bi zanebûn an jî bi nezanî ez li hemberî wan ketibim nava tevgera mobîngê. Ez bang li hemû mîran bikim, beşdarî vê kampanyeya "lêpirsînê" bibin. Teqez e her yek ji me li wî ciyê ku lê ye em ê bi kêrî tiştekî bêñ.

\* Çarçav: *Di Tirkî de ji bo kesêñ ku berçavkê dixin çavêñ xwe weke gotina kêmkirinê tê bikaranîn*

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger e. Avakerê Weqfa Ragihandina IPSyê û Endamê Lijneya Rêveberiya Weqfê ye. Di kovar û rojnameyêñ wekî Haftalık, Nokta, Yeni Gundem, Sokak, Milliyet Sanat û Radîkal 2de wekî berpirsê weşanê kar kiriye. Her wiha di kovara Tempo, Rojnameya Yenî Asirê û Cûmhûriyetê de xebitiye. Di Zanîngehê Ankara, Bahçeşehir, Bîlgî, Kadîr Has û Zanîngeha Aboriyê ya Îzmîrê de dersêñ Rojnamnegeriyê daye. Piştî ku lîsans û mastera xwe li Zanîngeha Enqere yê di Fakulteya Zanistêñ Siyasî de diqedine, dersêñ xwe yên pêşîn yên derbarê rojnamegeriyê de li weşan û medya ya Enqereyê daye. Demekî li Îngîltereyê maye. Li Navenda Nûçeyan ya TRTyê dest bi karê Rojnamegeriyê kiriye. Piştî demekî li Zanîngeha Enquerê di Peymangeha Medya û Weşanê de dersêñ ragihandinê daye. Piştî derbeya 12 Îlonê ji erka xwe îstîfa kir û çû Stenbolê. Di gelek kanalêñ televîzyonan de beşdarî bernameyêñ derbarê sînemayê de dibe. Di sînema û rêzefîlman de wek şêwirmend dixebite. Heyranê Rollîng Stones û Marîen Faîthfüll e. Xêlkê Îzmîrê ye.

#04 ÜMİT  
ÜNAL

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## ROJHILATA NAVÎN

Kurê jinekê wek xwe ji cîranên di pencereyên xwe de û mirovên di rûyê de dimeşin vede qêriya:  
“Dayê çima tu ho dikî?” “Kî li te dide”  
“Tu çima ho li min dikî.”

Nayloneka şewitî ye. Firax tenî bûne.

Bizmarêñ zengarî di texteyekê siftobûyî de ye. Termê kuçikekê li rexa deryayê ye, kezê girtiye. Nîvê rûyê wî bi tenê hestî û goşt in. Ji dur ve dengekê mîran tê û diayan dike.

Li ser dîwarên bêhna mîzî jê tê nivîsên eyb hene, slogan hene. Şûna destekê bixwîn heye. Li rexa rastê ya wê şûndestekê xwînî heye. Heman dest e gelo? Nepirse! Tu zarok î! Here ber sihê! Li ber tavê xwîn dê ji difina te bê. Tu zarokek î li beravan... Tu li rojhilatê Behra Spî yî. Tu li nava Rojhilatê yî. Tu li Rojhilata Navîn î.

Rojêñ Poyraz(bayêñ ji Bakurî têñ, hênikba) heyî rojêñ bêtam in. Ji ber pêlan hûn nikarin biçin di deryayê de. Derya jî ne wek her caran e. Ne şîn û zelal e. Pêl bi pêl e û zerîn bûye.

Çi işê te li ber deryayê heye, ma bavê te tu ne şandibûyî navçeyê.

Ez diçim nik quesabê li ser rîya beravê, dibêjim "min kîloyek qîme dixwest, bila bêbez be, ji kerema xwe re... Ew min jê xwestî kurê quesabî bû. Qesab bavê wî ye. Ew mirovek keyfîn e. Kurê wî dingozeyek e. Her welê dixweyî ku nû ji xewê rabûye. Destêñ wî qirêjo ne.

Min bi zehmetî gotina ji kerema xwe re li gotinêñ xwe zêde kirin. Ji ber ku ez ditirsim ew bibêje qey ez "tanju" me. ez ditirsim ji ber ku min carekê dîtibû, mîrekê pordirêj ji mînîbûsê peya bû û wek biherike dimeşıya, vî kurî û hevalêñ wî ji paş ve bakirinê "tanjuuuu" û henekêñ xwe lê kirin. Ez ji bilî ku dizanim tanjû navê mîran e,

tiştek dî nizanim, wateya wê nizanim, lê ew pê dihesim ka ci ye. Madem wê rîyê dide van kesêñ wek keftaran ku tîqetîq bikenin û henekê xwe bikin tişteka metirsîdar e.

Ji van mirovêñ bi vî awayî re bêjî "ji kerema xwe re" ji serê wan zêde ye. Min dixwest kesek welê bûma ku min bigota "du kîloyen bêbez çêke ha!" Heke min we kiribûya dibû ku bibûma yek ji wan. Lî hemî gotinêñ ji devê min derdi Kevin wek axiftinêñ lêborînê ne. Ne di destê min de ye. Ew rotroteyê heta nîvê sîngê wî vekiriye, ji kerem meremê fêm nake û goştêñ têrbez û mez diavêje mekîneya qîmeçêkirinê de.

Mû li sîngê wî nîne. Wek bûkalemûnan ber bi pêş ve derketiye. Bavê min dê xwe bi min re aciz bike. Dema wî ez ji malê rîkîrîm qewîtî kiribû û gotibû: "silavan bike û bêje ez kurê Emînê serçawîş im. Jê re bêje bavê min kîmeya bêbez dixwaze."

Xema min ev e: Ne ji ber ku ez kurê bavê xwe me, ji ber ku ez ez im, dixwazim kîloyek qîmeya bêbez bikim di kefa destê xwe de.

Min silavêñ bavê xwe lê kirin. Nizanim çîma bêyî silavêñ hinekan hûn nikarin tiştinan bikirin. Ma ne bi pereyê xwe ye? Qîme kir di pakêtekê de.

Min pere dirêjî wî kir û wek bikim pistepist got "qewet be."

Dema dimeşyan min hewil da sîngê xwe piş bikim û wek hişkemerekê bixweyîm da ji piştê ve di heqê min de nefikirin ku "tanju" me.

Êvarî mîvan dê bêñ. Bavê min dê ecîna çêbike. Bavê min ji Rûhayê ye. Li rexa Egeyê ye wî du bajariyên xwe dîtine. Gelek caran bi malbetî em diçin mîvaniya wan an jî ew dibin mîvanen me. Dema bavê min pakêta qîmeyê vekir rûyê xwe tirş kir. "Qebrax! Dîsa goştê bibez daye. Ma te negot ez kurê Emînê serçawîş im?"

"Min got..."

Ew dizane ku min negoziye.

"Bi vê ecîn çênabe."

Bavê min ji bîst saliya xwe ve li Izmîrê dijî ji ber wê devoka xwe ya berê ji bîr kiriye wek Izmîriyan diaxive. Carinan hin gotin bêyî hemdê wî bi devoka wî ya berê ji devê wî derdikevin. Li şûna bêje Çîgköfte(ecîn) dibêje "çikifte."

Aciz bû û got "lê vegeŕîne."

"Bêje keyfa bavê min ji vê re nehat. Wî got têrbez e. Bila yên bêbez bide. Em ne xazxazok in. Em pereyên xwe didinê."

Nizamin min çawa lê nêrî wî ji min fêm kir ez ê wê xizmetê pêk neînim. Li dayika min nêrî. Wê têra artêşekê pîvaz ji zêdeyan cida dikirin û paqij dikirin.

Yek ji rastiyên herî zehmet ên dinyayê ew e ku zarokên me dê ti caran nebin ew kes ku em tam wê dixwazin.

Li rojhilata navîn heqîqet ne tişteka

jêhezkirinê ye. Li nava rojhilatê rastî nayê gotin. Bi xwîn, tirs, herî û fehmê tê vesartin. Ji destpêka dinyayê ve ev yek holê ye.

Bavê min dibêje were. Li pêşıya min dimeşe. Dêya min ji piştê ve bang kir û got:

"Serîyek marûl jî bînin."

Em ber bi bajarê ve meşîyan. Bavê min li pêşıya min dimeşîya û bi min re diaxivî. Ew ê nîşanî min bike ka çawa mirov nahêle hîle li mirovî bê kirin, xeletiyek çawa tê rastkirin, mirov çawa nayê perçiqandin û mîranî çawa ye.

Min bi tenê dixwest em piştînîvroya berebat yekcar ji bîra min biçe, erd biqelişê û bikevimê. Hêj min bûyerên di wê piştînîvroyê de bûyîn ji bîr nekirîn tiştekê welê çêbû ku bi salan e ji bîr nakim. Pêşiyê me qêrîna jinekê bihîst. Dema em gihan serê kolanê me dît ku mîrek li pîrejinekê dide. Li nava kolanê. Jina ku bi zehmetî xwe gihadibû derive dikir hewar û digot "Ez li ber bextê we me min xelas bikin dê min bikuje." Dikir qêrîn û digot: "nedane kurê min."

Dev û lîvîn wê tejî xwîn bûbû.

Kurê jinê wek xwe ji cîranê di pencereyên xwe de û mirovên di rêyê de dimeşin vede qêriya: "Dayê çîma tu ho dikî?" Kî li te dide" "Tu çîma ho li min dikî." Pşê kulmekê didaneyê. Pîrejin li erdê ket û tilolo bû. Bavê min ê ku heta hingê mat mabû, ber bi wê derê ve beziya. Du sê cîran jî bi zopêñ di destê xwe de ber bi wî sengeleyî ve meşîyan. Wî mîrî dijûn kirin û dûr ket. Kefiya jinê ya spî ji ser pora wê ya sor rabûbû, rûyê wê toz girtibû. Bi dengekê

zirav yê wek zarokan li erdê dinalî.

Bavê min alîkariya jinê kir ku biçe di malê de. Haya nexweşxaneyê ji bûyerê çêkir. Ji wê pê ve êmanetî cîranan bû. Di wê demê de qîme li erdê ketibû. Di nav tozê re gevîzî bû. Hin pisîkên li derdorê dê bi çavêن matmayî xwe biavêtiyan qîmeya xav û bavê min ê dijûn bikiriyan û ew daniyan rexê... Zîyafeteka biha bû, ji bo pisîk û kûçikên kolanan. dema qîmekirînê mijara sereke dê ew be ku mîrekî li dêya xwe da. Qesabê zirzopepe dê bêje "kurê wê nankor e." Kurê wî hingê ji wê derê çûbû. Bi tenê yê bav li dikanê bû. "Vedixwe, pereyêن dayika xwe ya reben dixwe û ketiye işê

xumar mimarê jî...Xwedê islih bike."

Bavêmin di nava axiftinê e got: "Ev jî kurê min e, dema careka dî bibêje qîmeya bêbez bide, qîmeya bêbez bidê."

"Ez ne li dikanê bûm serçawîşê min. Kurê min qîme çêkiriye. Ew nizane... Bi xwdê ez biçim ev dikan bê bêxweyî bibe. Lêdan û gotin ti lê nake. Me nekarî em wî bikin zelam. Nizanim daye kê..."

*Min her wek biyanîyekê wek ne li wê derê bim guhdarî dikir. Ez ê ti caran hîn nebim wek wan biaxivim. Ez zarokek bûm. Li rojhilatê Behra Spî bûm. Li nava Rojhilatê. Li Rojhilata Navîn.*

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhêner, Senarîst û Nivîskar e. Senarîstê fîlmên wekî Teyzem (Xalтиya Min-1986), Hayallerim, Aşkım ve Sen (Xeyalên Min, Eşq û Tu) û yê 8 fîlmên dine. Fîlma wî ya yekem ya metrajdirêj ya bi navê "9" di sala 2002an de gelek xelatan werdigre. Di sala 2003an de jî li ser navê Tirkîyê bû berendamê xelata Oscarê ya Fîlma Herî Baş a Bi Zimanê Biyanî. Hem Senarîst hem jî derhênerê Anlat Îstanbul (Vebêje Stenbol-2004) Ara(NAVBER2007), Gölgesizler (En Bê Sî-2008), Ses(Deng-2010), Nar(Henar-2011) û Sofra Sîrları(Razîn Sifreyê-2018) yê ye. Çar pirtükên wî yê ku hatine çap kirin hene: Amerikan Güzeli (Xweşika Emrîkî-Çîrok, 1993, Weşanxaneya Oglakê), Aşkın Alfabesi (Elîfbaya Eşqê-Roman, 1996, Weşanxaneya İyi Şeyler), Kuyruk (Dûv-Roman, 2001, Weşanxaneya Oglakê), Işık Gölge Oyunları (Lîstikên Sî û Roniyê-Otobiyografî, Weşanxaneya Yapı-Krediyê). Di sala 1965an de hatiye dinê.

#05 HAKAN  
BİÇAKÇI

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## DIÊŞE ROCKY

Rocky rikberê xwe li erdê pan dike û di axavtina xwe ya şampiyoniyê de dibêje, "Helwesta we ya li hemberî min guherî. Ihtimala guhertinê ji bo me hemûyan heye. Ihtimal heye ku hûn jî biguherin."

Yek ji şêweyên sergirtî yan jî nixumandî yên tundkariya mîran e piştevanî ango alîgiriya hêzê. Ev e ku mirovan di bin navê "serketî" û "binketî" de dike du bes û hewl dide ku besdarî beşa serketiyan bibe. Dîsa ev e ku bi bêhişî xwe dixe şûna beşa serketî û úcdanê xwe winda dike ku di encamê de kor dibe. Piştî hêz zêde dibe famkirina ji halê yekî kêm dibe. Rewşenî istisna ne tê de ev e helwesta mîran a karakterîstîk.

Di fînala Rocky IVê de (1985, Sylvester Stallone) digel ku ez zarok bûm û digel ku min sedema wê bi awayekî baş fam nekeribe jî, beşek ku bi zelalî tê hişê min û bi min xweş nehat hebû.

Rocky diçe Moskowayê û derdikeve pêşberî Ivan Drago boksorê Rûsî. Rocky li deplasmanê ye. Hemû temâsevan piştgiriya boskorê Rûs dikan. Ivan Drago serkeftî dest bi maçê dike. Rocky di bin sloganên bicoş ên gelê Rûs de kulman li ser kulman ji Ivan Dragoyî dixwe ku weke cinawerekî bêhest te dîtin.

Hindik maye ku têk biçe. Lê piştî ku gelek kulman dixwe, bileyz tê ser hişê xwe û di pêşbirkê de dikeve pêş. Ji nişkê ve rewş diguhere.

Piştî ku Rocky kulman dadiweşîne li ser laşê Dragoyî, alîgirên coşdar ên boksorê Rûsî hêdî hêdî xwe ji pişta wî vedikişînin û li şûna slogana "Drago, Drago, Drago", bi slogana "Rocky, Rocky, Rocky" salonê dihejînin.

Rocky rikberê xwe li erdê pan dike û di

axavtina xwe ya şampiyoniyê de dibêje, "Helwesta we ya li hemberî min guherî. Ihtimala guhertinê ji bo me hemûyan heye. Ihtimal heye ku hûn jî biguherin."

Rocky li wê salona ku li dîwarên wê posterên Marx, Engels û Lenînî hatiye daliqandin û li jora wê stêrkeke sor a gewre heye diaxive. Bêgûman ev axavtin propagandayeke şerê sar a ku herî ji rêzê ye.

Lê li vir mijareke din a tarî heye ku ew jî daxwaza piştevanî ango alîgiriya kesê bi hêz e. Ev dîmena kevn a ku di zaroktiya min de bi min nexweş hatibû iro min geleki aciztir dike.

Çîroka narîn a filmê Sivasê (Kaan Mujdecî, 2014) ku min salên borî lê temâşe kiribû jî ev rastiya civakê ya balkêş bi rengekî xemgîn anîbû bîra min.

Di destpêka filmî de kurikê bi navê Aslan, xwedîtiyê li kuçikê ku cisnê wî kangal e dike. Aslan ew kûçike ku piştî şerê kûçikan weke berate avêtine. Wî xwedî dike û wî ji mirinê vedigerîne.

Aslan û kûçik dibin heval û paşê navê wî dike Sîvasî. Lê çîroka me ne weke çîroka Dost Lassieyê ye. Sîvas yek ji wan kûçikan e ku ji bo şerê kûçikan hatiye xwedî kirin. Li şûna ku li bexçe bimelise, divê şerê kûçikan bike. Şîretênu ku mîrên derdorê bi yek dengî li Aslanî dikan, vediguhezin fişara derdorê ya li ser wî.

Aslan ditirse tiştek bi serê kûçikê wî were ku nû bi ser hişê xwe ve hatiye û qebûl nake. Dibêje ku “Ez kûçikê xwe naxim nava şer”. Lê ew mêtren ku li derdora wî ne piştî demekê vî tiştî bi wî didin qebûlkirin.

Aslan bêyî xwesteka xwe Sîvasî dixe nava şerê kûçikan. Û piştî ku dibîne kûçik bi ser dikeve kêfa wî jî ji vê rewşê re tê. Aslan ku pêşiyê alîgiriya yê binketî dike, bi zêdebûna temenê xwe re nêzîkî wê cîhana mêtan dibe ku dixwazin alîgirê serketiyan bin.

Li hêlekê dilê wî bi Sîvasî tê, lê li hêla din jî dixwaze wî weke nîşaneyî mêtanîya xwe li gel xwe bigerîne û di nava vê dudiliyê de dimîne. Li hêlekê ihtimala zerardîtina kûçikê wî weke sawekê di laşê wî yê biçük de ye û dîsa di heman laşî de ew xwesteka serwextiyê ya di rêya mêtîtiyê de cî digire. Ev her du hest di vî laşî de bilind dîbin.

Çawa ku meyla alîgiriya hêzê yek ji tundkariya mêtan a sergirtî ango nixumandî ye, helbet hin têgehêن qalipgirtî hene ku tundkariya mêtan dinixumîne, wê rewa dike heta wê şîrin dike.

Ev ew cûre gotinin ku bi vebêjên serdest, bi mînakên çanda populer û derbirînên gel ve her gav lê tê sorkirin. Ez ê hewl bidim ku yên yekser têbîra min binivîsim:

- Mêt weke zarokan in. Mirov nizane wê kengî û li ku ci bikin.
- Helbet sînorek ji sebra mêtê xwînger re heye.
- Car caran “ji bo exlawekî hê bilindtir” divê mirov serî le tundiyyê bide.

- Dabînkirina edaletê cî tê dikeve ser milê mêtan. Parastina sîstemê ya dijqanûnî divê têkeve dewreyê, di van rewşan de divê mirov xwedî li hiqûqa xwe derkeve.

- Heke ku mêtan bi awayekî li hev kiribin, wan hevalbendî di navbera xwe de saz kiribin, wê gavê ti pirsgirêk nîne. Heke na pirsgirêk hene.

- Heta ku tu tolê ranekî, tu nikarî di nava aramîyê de bijî. - Di hin rewşan de divê tu guh nedî hişê xwe, lê bi hestêxwe bawer bibî.

- Kesê ku hez dike dikare her tiştî bike!



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Nivîskar e. Romana wî ya pêşîn ya bi navê Romantîk Korkû (Tirsa Romantîk) di sala 2002an de ji hêla Weşanxaneya Oglakê ve hatiye çapkîrin. Di kovar û rojnameyên cuda de di derbarê sînema, wêje û çanda popular de nivîsên wî û çîrokên wî hatiye weşandin. Pirtûkên wî yên Biniya Valahiya Apartmanê(Apartman Boşluğu Altı) Odeya Tarî(Karanlık Oda) Zemanê Vala(Boş Zaman) li zimanê biyanî hatine wergerandin. Pirtûkên wî yên ku ji Weşanxaneya Îletîşîmê derketine ev in: Rüya Günlüğü(Rojnivîska Xewnan), Boş Zaman (Zemanê Vala), Apartman Boşluğu(Valahiya Apartmanê), Karanlık Oda(Odeya Tarî), Ben Tek Siz Hepiniz(Ez Tenê Hun Hemû), Doğa Tarihi(Dîroka Xwezayê), Hikâyede Büyük Boşluklar Var (Di Çîrokê de Valahiyê Mezin Hene) , Otel Paranoya(Otela Paranoyayê) û Uyku Sersemi(Sergêjê Xewê)ye. Li Stenbolê dijî. Di sala 1978an de li Stenbolê ji dayik bûye. Di sala 1996an de ji bo Zanîngehê dice Enqere yê. Di sala 2001an de Li Zanîngeha Bîlkentê Beşa Aboriyê diqedîne.

#06 YEKTA  
KOPAN

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVÎSIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## EZ DITIRSIM KU BI XWE RE RÛ-BI-RÛ BIMÎNIM

Ji bo jinûveçêkirina zimanê “mêraniya hegemonîk” divê em çîrokên xwe bibêjin û rûbirû bimînin. Niho ka em deftera xwe ya dema xwendina seretayî derbêxin û lê binivîsin, “ez ditirsim ku bi xwe re rû-bi-rû bimînim.”

Dema ku min qebûl kir ez ê vê nivîsê binivîsim, min tiştekê giring hesab nekiribû. Nivîsîna li ser “tûndkariya mîran” tê wê wateyê ku ez ê li ser serboriyên xwe yên li quncen tarî mayîn, ecêb in û veşartî ne binivîsim. Dikarî bibêjî “ez ê bi awayekê hêsanî binivîsim, li ser sermeziniya mîran binivîsim û xwe jê xelas bikim” lê ne welê ye.

Min demekê fikirî ez nivîsê li zarokekê bar bikim ku cezayê wî ew e ku dê li ser deftera xwe sed caran binivîse “Ez ditirsim ku bi xwe re rû-bi-rû bimînim.” Ez ditirsim ku bi xwe re rû-bi-rû bimînim û bi tirsê wê vedîşerim. Ez ji jinan ditirsim, hingî ditirsim hêrs dibim. Ez ji mîrbûnê ditirsim, hingî ditirsim dest bi tûndkariyê dikim.

Min xwest li ser gelek rûperan binivîsim “ez ditirsim ku bi xwe re rû-bi-rû bimînim” lê min nekarî. Ez dibêjim qey ea ji wê jî tîrsiyam.

Paşiyê re min “dema teslîmkirinê” bi paş de da û min xwe berda kûrahîyên rûbirûmanê.

Sala 1975 bû.

Ez hingê 7 salî me.

Rojeka Yekşemê bavê min biryar da min bibe cihê lîstina fûtbolê. Fanîleyê binî, fanîleyê pembû, qazaxê stûr... Min xwe welê amade kir ku bikarim li hemberê zivistana Enqereyê xwe rabigirim.

Qelebalixiya li derve ez kelecani kırim. Em bi du wesayitan çûn Yarîgeha 19ê Gulanê.

Digel ku zikê min ji zêdeyî ve hatibû tejîkirin jî dema min kiftefiros dîtin gilîza min rijiya. Dema em çûn yarîgehê wek min tiştekê efsûnî dît. Welê mezin bû ku... Hêvîyek di dilê min de hebû ku ez ê Fenerbahçeyê bibînim. Bavê min got ez lîstika “Karemaniya Duyem” e. Hinekê qehîrim lê dîsa jî keyfîn bûm, min tiştinbi bavê xwe re bdikir...

Em li seyirgehê li ciheekî rûniştin. Min dixwest fêm bikim ka ez ê li kû binêrim û divê çi demê kelecanî bibim. Komeka alayê wan heyîn 10 rêzan li pişt me bûn. Bavê min ê ku bi aramî li lîstikê temaşe dikir, demekê got “Here loo! Çawa ji destê xwe berda!!” Hima pey wî ez rabûm ser xwe. Min jî kir ax û wax. Qey dema mirov li lîstikê temaşe bike divê welê bike.

Dema em ji bo neavêtina golê aciz bûn koma qelebalix dikir aciz bû. Dibe ku wan piştevaniya tîma dî dikir. Kesek ji koma wan tiştek ji bavê min re got lê bavê min lê venegeriya. Lê min fêm kir tiştin ne rast in, bêhizûriyek heye. Piştî pênc deqîqeyan bi avêtina golekê em şa bûn hingê qîyamet rabû. Du kes ber bi me ve meşîyan, yekî got “dia bike zarok li nik te ye.” Bavê min sor bû. Ji aliyekê ve ez girtim ji aliyekê ve gotinên wek “camêrno eyb e” dibêje. Nayê bîra min ka ew li hev ketin an no. Lê tê bîra min ji beriya ku lîstik xelas bibe em ji yarîgehê/lîstikgehê derketin.

Roja min a ku min “bi bavê xwe re tiştnin kir” di nav tifa mirovên bihêrs de ma. Piştî gelek salan min xwest ez bi bavê xwe re li ser wê rojê bipeyivim û hestên wî bizanim. Lê nehat bîra wî. Hat bîrê ku em çûbûn seyra lîstikê lê nehat bîrê ka çawa û çima em zû ji yarîgehê derketin. Qey dema mîrek li hemberê mîrekê dî têk diçe hişê wî wê bûyerê paqij dike.

Dema min xwest ez û bavê xwe bi tiştên di hişê me de rûbirû bibin, “nîşandana hêzê ya komeka mîran” ji me re bûbû dersek.

Di heman salan de bûyereka dî jî pêk hat.

Me li kolanê lîstika veşartokî dilehîst. Kesekê ji min 4-5 salan mezintir yê dibêjim qey navê wî Abidîn bû got ka em lîstika Dixtorê Kimble bileyîzin. Ew lehengekê rêzefilmeka hingê bû. Dixtorrê Kimble direviya û Komîserê Gerard jî sond dixwar ku dê wî bigire.

Min bi serbilindiyê rola Dixtorê Kimble stand. Min hinekê karî ez birevim. Paşê hatim qepeçekirin û girtin. Abidinê ku rola Komîserê Gerard standibû diyar kir girtin ne bes e divê ew cezayekê jî bide min.

Nizanim wan ji kû dît lê wan tayek dîtibû, tayênu ku cilik l-i ser têne ziwakirin. Destê min girêdan. Paşê ez bi boriya ava pîs ya xaniyekê ve girê dam. Wan ez pê ve girêdam û çûn. Dema wan ez pê ve girêdayîm ci qasê keyfxweş dibûn. Ax bîr ci qasê dijwar in.

Paşê nayê bîra min ji min re hat gotin ku xuşka min a 7 salan ji min mezintir e dema ji dibistanê vege riwayî ez dîtime. Li serê boriyekê ve hatibûm girêdan, xwîn li destê min kom bûbû, min hinekê rîtitû

xwe ve. Giriwayî bûm. Hinekî ji ser hişê xwe çûbûm.

Xuşka min ez ji boriyê vekirime. Çûye cilikên xwe yên dibistanê ji ber xwe kiriye. Pantorê xwe wergirtiye. Paşê li kolanê têr li Abidînî daye.

Da min ji zilma mîran biparêze wek mîrekê ketibû di nava mijarê. Pantor wergirtiye, dijûn kiriye û kulm danîne, bersiva tûndkariyê bi tûndkariyê daye.

Ev çîroka xuşka min ku bi serê xwe wek artêşekê bû li sohbetên navmalî gelek caran bi serbilindî dihat gotin. Bi salan ez bi wê hêza li pişt xwe jiyam. Çawa be Abidîn bêñ pêşıya min xuşkeka min heyâ li wan bide.

Bavê min bi bîra me ya li Yarîgeha 19ê Gulânê rû-bi-rû nema û koça dawî kir.

Di van rojan de ku min difikirî vê nivîsê binivîsim ez li ser du çîrokan difikirîm.

Li aliyeke çîrokeka leheng hewil dide biaxive li aliye dî çîroka “bi tûndkariyê bersivdana tûndkariyê.”

Erê ez îro çîrokbêjê kîjan çîrokê me?

Ji bo jinûveçêkirina zimanê “mêraniya hegemonîk” divê em çîrokê xwe bibêjin û rûbirû bimînin.

Niho ka em deftera xwe ya dema xwendina seretayî derbêxin û lê binivîsin, “ez ditirsim ku bi xwe re rû-bi-rû bimînim.”

Bi tenê hingê em ê dest pê bikin ku biaxivin, rû-bi-rû bimînin û bi sere bigihin. Demildest. Niho.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE


Nivîskar, Pêşkêşvan, produktor e. Li ser platforma Youtûbê bernameyekî çand û hunerê ya bi navê Noktalı Virgül amade dike û di heman demê de pêşkêş jî dike. Pirtûka wî ya bi navê Aşk Mutfağından Yalnızlık Tarifleri (Ji Pêjgeha Eşqê Terîfên Tenêtiyê) di sala 2002an de Xelata Saît Faîk ya çîrokê, pirtûka Karbon Kopya di sala 2007an de Xelata Pirtûka Salê ya Telîfê ya Dunya Kîtabê, Pirtûka Bir de Baktım Yalnızım (Min Nişkava De Dît Ku Ez Tenê Me) di sala 2010an de Xelata Yûnûs Nadî û Xelata Haldûn Taner wergirkiye. Pirtûka wî ya zarakan ya bi navê Bûrûn di sala 2009an de hatiye çapkiran. Pirtûkên wî li gelek zimana hatine wergerandin. Hin pirtûkên wî yên ku hatine wergerandin ev in: İçimde Kim Var (Di Hundirê Min De Kî He Ye), Kediler Güzel Uyanır (Pisîk Xweşik Ji Xew Şiyar Dibin), Aile Çay Bahçesi (Baxçeya Malbatî ya Çay) û İki Şiirin Arasında(Di Navbera du Helbestan de). Editoriya Îpeklî Mendîla ku li ser Çîroka Tirkan bi şêwazê ferhengî hatiye amadekirin, kiriye. Di destpêka salên 2000î de Di kanala NTVyê de pêşkêşvanê bernameyekî çandî û hûnerî bû.. Di heman demê de di Rojnameya Radîkalê de nivîsandiye. Di sala 2015an de yekem berga Ajandaya çand û hunerê ya Can Almanakê hatiye çapkiran û wî ev ajanda wekî proje amade kiriye. hê jî di lijneya nivîsê ya vê projeyê de kar dike. Di sala 2016an de pirtûka wî ya dawîn ya bi navê Sakin Oraya Gitme hatiye çapkiran. Di sala 1968an de hatiye dinê. Li Zanîngeha Hacettepeyê Beşa Kargêriyê qedandiye.

#07 TAYFUN  
PİRSELİMOĞLU

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## ŞEVEKA LI ÇOLÊ

Dema min bi mereqdariyê li wî kesê li erdê dinêrî hinekan hewil da wî ji erdê rake. Dema wê komê ez bi paş de avêtim ciwanê serê wî şikestî ji ber çavê min çû, ez reviyam û dûr ketim.

Dibêjim qey min di sefa yekem a xwendina navê de dixwend. Tê bîra min çenteyekê min ê reş di destê min de bû. Zivistan bû. Dinê dikir tarî bibe. Kolan bi zarokên ji dibistanan derketîn û karmendêni ji kargehan derketîn tejî bûbû. Baran dibariya, wexma ti caran terka bajrî nedikir, zêde û tîr dibû.

Li caddeya herî qerebalixa Trabzonê, li caddeya Uzunê – li cihekê ku di navbera dikana kitêbfiroşiyê ya kekê Mehmet û sînemaya Sarayê bû- mîrekê li pêşıya min dest bi liv û tevgerê kir. Zopek an borîyeka hêsinî ji bin qapûtê xwe derêxist, wî pêşıyê ew li pişta ciwanekê li rexa parqê sekinî da paşê li serê wî da.

Dema ew reben di nava xwînê de li erdê digevizî mîrikê dî reviya. Goleka xwînê li rexa serê wî çêbûbû, komeka mirovan bi dengê bimebimê li dora wî ciwanî kom bûbû. Ez ji ber ku ji nêzîk ve bûbûm vê bûyera diltezin tirsiyam û ketim kelecanê.

Dema min bi mereqdariyê li wî kesê li erdê dinêrî hinekan hewil da wî ji erdê rake. Dema wê komê ez bi paş de avêtim ciwanê serê wî şikestî ji ber çavê min çû, ez reviyam û dûr ketim.

Ya rastî dema li xwe mikûr bêm dikarim bibêjim ku ew kelecana min ji ber wê yekê bû ku ji nişkê ve çîrokeka min çêbû ku xwîn tê de bû. Ez bûbûm şahidê kuştineka müazam. (Dibe ku nemirîbe lê hingê ne ew çend giring bû.)

Li caddeya Uzunê li rêya mayî bi lez çûm

û giham dikaneka bi dûmana cixareyê bêhin ketiyê. Heft heşt kesên li dikanê pêsiyê berê xwe da min û paşê sohbata xwe dom kir.

Ya rastî ez keyfxweş bûm ku wan bala xwe neda min, min nedixwest ew bala xwe bide min û bibînin ku ez ditirsimkovikên min direcifîn- lê ti tiştan nedikarîn bibin asteng ku meseleya şikênatina serîyî bibêjim.

Wê komê belkî cara sedê bû ku heman tişt dubare dikirin û welê nedixweyan ku dê guhdariya min bikin. Wan li ser kuştina hirçekê diaxivîn, ji beriya çend mehekê bavê min li bajarê Wanê kuştibû. Wî demekê dirêj hirç teqîb kiriye, dema pey hirçê çûye li teht û nizaran asê maye, paşê kuştîye û kevilandiye, paşê ji bo derman e bezê hirçê ji kelaşê wê kiriye. Wî karî ew qasê mextê wî biriye ku dema karê xwe qedandiye dinê tarî bûye.

Di wê tariyê de wî kevilê hirçê daniye ser milê xwe, tifenga wî di destê wî de mecbûr bûye bi wan tehtan de bê xwarê. Ew du daran ketiye, destê wî xelaye û paşiyê kariye bigihe tirimbêla xwe.

Wan serhatiyê xwe yên ji bo nêçîrê bi  
vî awayî digotin û pey hev rêz dikirin.  
Paşê qêrûvêra wan hat, îştaha min a ji bo  
gotina serhatiya şikênandina serî çû. Min  
guhdariya sohbetê kir.

Jineka piyangofiroş hat dikanê. Ti kesan  
bala xwe nedayê. Min ji xwe şerm kir.

Paşê civat bi ken belav bû. Di rê de  
min serhatiya xwe ji bavê xwe re got.  
Bertekên wî ne wek min texmîn dikir bû.  
Me ji firina Rûştîyî nan kirî. Dema em  
çûyîn malê baran bariya.

 DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhênerê Sînemayê, nivîskar û wênesaz e. Di sala 2002an de yekemîn fîlma metrajdirêj ya bi navê Hiçbir Yerdeyê (Li Tu Cih ï) kişandiye. Piştî fîlmên bi navê Riza (2007), Pûs (Mij, 2009), Saç(Por-2010) di sala 2013an de derhêneriya fîlma Ben O Değilim (Ez Ne Ew im) kiriye. Filma wî yê dawîn Yol Kenarı (Qeraxa Rê) ye. 6 romanên wî yên bi navê Xebroşkêن Çolê (Çöl Masalları), Albûma Kesên Wenda (Kayıp Şâhıslar), Malîhulya û Quleyêñ Bajêr (Şehrin Kuleleri), Kerr hene. Herweha du pirtûkên wî yên çîrokan jî hene, bi nave Otel Odaları û Harry Limein En Yeni Hayatları ya da Üçüncü Adama Övgü ye. Li Trabzonê hatiye dinê. Li Zanîngeha Teknîki ya Ortadoguyê xwendîye. Li bajarê Wiyanayê di Akademiya Hunerên Sepandî (Hochschule für Angewandte Kunst) de di warê wêneyê de perwerde dîtiye. Li Tirkîye yê û li derveyê Tirkîye pêşangeyên wêneyan lidarxistiye.

#08 MURAT  
YETKİN

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TUNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## 3 REWŞÊN TUNDKARIYA MÊRAN

Li vir berpirsiyarî bêhtir dikeve ser milê wan mêtê  
xwedîwicdan, azadîxwaz û wekhevparêz. Divê  
mêtê xwedîwicdan, azadîxwaz û wekhevparêz ji bo  
wekheviya zayendî ya civakî li gel jinan bisekinin.

Ji xwe hûn rewşa yekem a tundkariya mîran dizanin. Ji xwe nivîskarêن din di rîzenivîsa “52 Hefte, 52 Mîran” de behs dikin. Lê heke hûn kesekî wisa bin ku vê nivîsê dixwînin wê gavê tê wateya ku hûn jî nas dikin.

Ew rewş ne tenê tundkariya zayendî ye, lê herî zêde ew e. Demekê dadwerekî teqawidbûyî behsa wan dosyayan kiribû ku di dema wezîfedar bû hatibûn ber wî. Gotibû, min tenê ew dosya nedîtiye ku derbarê tecawiza kur a li bav de ye. Ji bilî wê “çî tiştên ku werin hişê we yan jî neyên hişê we” hatibûn ser maseya wî. (Lê ji tunebûna wê dosyayê jî baş ne ewle bû. Li gorî texmînên wî dibe ku kesê rastî wî tiştî hatibe ji ber fediyê nexwestiye yan jî tirsiya ye li qereqolê, li daghehê behsa wî tiştî bike.)

Ez naxwazim bi mînakan dilê we bixelînim. Gotina “Hêz maf e” ya Otto von Bismarckê ku yekîtiya Almanan bi kulma xwe ya hesinî ava kiriye rewşa çavşorê ku bi bi gotina “ez tehrîk bûm” di mînibusê de êrîşî keça bi şalê kurt kiriye, ya kesê li taxê bi îşkenceyê çêçika pisîkê kuştiye, ya wî zordesîbicûk ê ku li wênegehê li zarokên bi berçavk ê bejin kurt dide û ya qatilê ku jina xwe ya dest ji hev berdane li stargehê dibîne û dikuje nîşan dide.

Li gorî “çeteleya tundkariya mîran” a bianetê di sala 2017yêde herî kêm 290 jin ji hêla hevjîn an jî mîrên kevin, bavêwan, birayêwan, xizmîn mîr an jî mîrekî nas ve hatiye kuştin. Bi heman awayî 22 zarok u 34 mîrên ku li cem jinan an jî xwestina kuştina jinan astegn bikin hatine kuştin.

Tecawiz li 101 jinan hatiye kirin. Destdirêjî li 247 jinan hatiye kirin. 376 zarokên keç rastî istîsmara zayendî hatine, 417 keç birîndar bûne. Mixabin hejmar her sala ku derbas dibe zêde dibil û ev hejmar ên ku derbarê wan de doz hatine vekirin; bi vî awayî haya me jê çêdibe, an na weke gotina dadwerê tewaqidbûyî, yên ku em nabihîzin jî hene.

Em werin ser daghehan. Dozek hebû ku min bi taybetî dişopand: Sala 2011yê keçeke zarok a 13 salî li Mîrdînê, hin karmendên dewletê û esnaf jî di nava wan de rastî tecawiza 26 kesan hatibû. Ji ber ku Serdozgerê Komarî îtiraz li biryare nekiribû, her yekî ji wan 5 sal ceza wergirtibûn.

Niha ji bo wan kesênu ku dibêjin “li wan deran ji xwe rewş her wisa ye ez dixwazim mînakekê jî ji Ispartayê bidim. Sala 2016yê, Nevîn Yildırıma 26 salî, Nûrettîn Gulerê ku bi zora çekê tecawiz lê kiriye û ew ducanî kiriye û bi gefa ku wê fotografên wê belav bike di tecawizkirinê de berdewam kiriye bi tivinga nêçîrê kuştiye û serê wê jê kiriye û serî diavêje ber qehwexaneya gund.

Ne ji bo erêkirina wî tiştî lê ew mafênu ku dagheh ji bo tecawizkar û dizênu kirawatê dixwin stûyê xwe û ruyê xwe kur dikan û bi vî awayî derdi Kevin daghehê cezayênu wan kêm dike lê ev mafê ku jê re mafê sekna erêni tê gotin ji bo Yildırıma cezayê heta hetayê standiye pêk naynin.

Ayşe Armanê navekî baş li vê rewşê kir û got; “Edaleta bisimbêl”. Niha dor tê ser rewşa duyem a tundkariyê, yanî newekheviya zayendî ya civakî. Rewşa saziyên dewletê mînaka herî baş e ji bo vê rewşê.

Me behsa dodgehan kir ya, ez ji jor de dest pê bikim. Li Tirkiyeyê jin nêvî ji civakê ne. Niha 17 endamên Dadgeha Destûrî jî mîr in ku salên borî endamên wê yên jin çêbûne û hetta jinek bûye seroka wê. Ji bilî serok û alîkarêن Dadgeha Bilind, 18 ji 20 serokên daîreyên cezayan, 19 ji 19 serokên daîreyên hiqûqê mîr in.

Jinek li ser Şûraya Dewletê ye lê di astêن xwarê yên rîveberiyê de jinek jî kar nake. Nêzîkî 16 hezar dadwer û dozger hene. Ji sedî 66ê dadweran, ji sedî 91ê dozgeran mîr in. Lijneya Hilbijartinê ya Bilind (YSK) pira di navbera dadweriyê û qanûnçêkirinê de ye. 11 endamên wê hene ku yek jê jî ne jin e û hemû jî ji dadwerên payebilind pêk tê. Di nava nûnerên li YSKyê yên çar partiyêن Parlamentoyê de jî jin nîne.

Di encama hilbijartina 1ê Çiriya Paşiyê ya 2015yê de 550 parlamenteer ji bo Meclîsa Netewî ya Mezin a Tirkiyeyê (TBMM) hatin hilbijartin, tenê 82 ji wan jin bûn. Ev jî ew mînake ku heta niha hejmara herî zêde ye. Ji 81 bajaran li 43yan parlamenteerên jin nîne. Rêjeya nûnertiyê ji sedî 15 ye û bi vê rîjeyê di nava parlamentoyên cîhanê de em di rîza 91em de ne.

Ji 18 komisyonan komisyonek tenê seroka wê jin e, ew jî weke ku ji rewşê re hatibe hilbijartin Komisyona Wekheviya Fersendê ya Jin û Mêran e.

Ji 25 wezîran 2 wezîr jin in. Di nava alîkarêن wezîran de jin nîne. 3 jin hene di nava 81 waliyan de û ev hejmara herî zêde ye ya heta niha. Ji 973 qaymeqaman tenê 16 jê jin in.

Wezareta Karêن Derve ye minaka herî baş ya ku di nava saziyên dewletê de

jin li cihê biryarstandinê kar dikin. ji 239 serkonsolosan 43 jê jin in, ji 20 midûrên giştî 4 jê jin in û li gorî vê rewşê rîjeya jinêن ku rîveber in ji sedî 18 ye. Di salên borî de jî di nava alîkarêن şêwirmendan de jî jin hebûn lê niha nîne.

Me got ya perwerde pêwîst e...Li Wezareta Perwerdeyê ya Netewî de rewşeke balkêstir heye. Li dibistana seretayî hejmara mamosteyêن jin (nêzîkî 151 hezar), hejmara mîran (115 hezar) derbas dike. Lê wezîr, şêwirmend û 7 alîkarêن şêwirmendan mîr in, tenê midûreke giştî û ji 81 midûrên perwerdeyê yên bajaran du jê jin in.

Di mekanîzmaya biryardayinê ya dewletê de ji sedî 89ê rîveberan mîr in, ji sedî 11 jî jin in. Li sektora taybet rewş hinekî bastir e: Di nava 43 endamên Rêexistina Aboriyê Geşepêdanê û Hevkariyê (OECD) de em qada rîveberiya jinan de di rîza 41ê de ne ku rîjeya wê ji sedî 13 ye. Piştî Tirkiyeyê Japonya û Koreya Başûr heye.

Pirsgirêk ne tenê di wekheviya fersendê de ye. Jina ku hatiye çewisandin û ji perwerdeyê mehrûm hatiye hiştin, ji bo ku keça wê jî şopa wê bajo, car caran ji kesê ku vî tiştî lê disepîne bêhtir dibe parazvanê coşdar ê pergala ku lê tê sepandin. Demeke berê li ser medyaya civakî mînakek hebû. Dayikê ka kurê wê yê ji bo xwişka xwe diçû avê ji metbexê bîne disekeinand û jê re digot, "Sibê wê xizmeta bükê jî bike" û li ser vê keça wê çübû ji xwe re av anîbû. Ev mînaka herî sivik rê li ber çavgirtin û erêkirina tecawizê, îşkencekirina bav li keç û kurê xwe jî vedike.

Hevalekî min ê kar behs kiribû. Li

Stenbolê, li Yeşilkoyê dema dikeve nava mala xwe çavê wî li keç û xortekî dikeve ku li peravên deryayê rûniştîne. Xort dengê xwe li ser keçê bilind dike û wê dihincirîne. Weke jinekê kêfa wê ji vê rewşê re nayê. Ji dûr de mudaxele dike û dibêje ku "Tu çi diki?". Erê we rast pê derxist, keçik li hemberî hevala me derdikeve û dibêje ku "Çi ji te re, tu li karê xwe binêrî". Keç û xorßen ku hînî helwesta xirab a ku dayik, xaltîk, xwişk û birayêن wan rastî wan têن dabin ev dibe "asayî" û ew jî vê helwestê dipejirîne û berdewam dike.

Newekheviya zayendî ya civakî mijareke ku hatiye gewirandin, pirsgirêka civakî ya herî giran e û pêkarîbûn ne hêsan e.

Hin hêlên wê yên din jî hene.

Jin bêhtir diweste, jina ku dixebite bêhtir diweste, jina ku zewicî ye û dayike herî zêde diweste. Mêr, mîrên ku xwe bajarî, perwerdekirî, wekhev dibînin jî ew barê li ser milê jinan qasî ku hewce dike hilnagirin. Lê çavdêriyeke giştî ya wisa heye ku zarokên xort ên ku dayikên wan kar dikan di nava malê û di karêن zarakan

de tiştan bêhtir par ve dikan, zarokên keç jî bêhtir bixwebawer in û nahêlin bêñ cewisandin.

Ne tenê liv û tevgera xwe divê em zimanê xwe jî rast bikin. Heta niha her "karmendê mîr" dihat gotin, dema mijar bû jin gotina "mirovêن karî" hat bikaranîn? Çima gotina "Karmenda jin" ewqas zehmet e. Çima gotina "zanyarêن mîr" hêsan e lê gotina "zanyarêن jin" zehmet e?

Em niha hatin ser rewşa sêyê ya tundkariya mîran: rewşa ku dengê xwe dernaxe.

*Li vir berpirsiyarî bêhtir dikeve ser milê wan mîrên xwedîwicdan, azadîxwaz û wekhevparêz.*

*Divê mîrên xwedîwicdan, azadîxwaz û wekhevparêz ji bo wekheviya zayendî ya civakî li gel jinan bisekinin.*

*Weke ew rêzikên Nazim Hîkmetî yên ku digot "Ji lorikên dayikan, heta nûçeya ku pêşkêşvan dixwîne"...Divê li her qada jiyanê...*

## DERBARÊ NIVISKARÎ DE

Berpirsê Giştî yê Weşan a Rojnameya Hürriyet Daily Newsê ye. Ji sala 1981an vir ve rojnameger e. Di BBC World Service, Deutsche Welle û AFPyê de xebitiye. Pişti vana di Turkish Daily de xebitiye. Yêk jê avakerê qenala yekemîn a nûçeyan ya bi navê NT Vyê ye. Buroya Enqereyê ya vê qenalê ava kir. Nûnertiya rojnameya Sabah û Radîkalê li Enqereyê kiriye. Di sala 2011an de bûye berpirsê giştî yê weşana Hurriyet Daily Newsê. Li Zanîngeha Teknîki ya Ortadoguyê de Beşa Endezyariya Makîneyê qedandiye. Di sala 1959an de hatiye dinê. Zewicandî û xwedî zarokeke keçîn e. Di derbarê siyaset û têkiliyên navnetewî de pênc pirtûk nivîsandiye. Navêن pîrtûkên wî ev in: Di Xeta Şer de Polîtîkaya Aktîf, Di Sêgoşeya Rojhilata Navîn, Balkanan û Kafkasan de Tirkîye(1992), Di Odeya Bendewariyê ya Ewropayê de Tirkîye(2002), Tezkere-Çiroka Rastîn ya Aloziya Iraqê(2004), Dafika Kurd-Ji Şamê Heta Îmraliyê Ocalan(2004), Ji bo Meraqdaran Pirtûka Entrîkayan(2017).

# NE TESEDIF E

52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN

#09 ATILLA  
TAŞ



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## EM MÊR JI BO JINAN GELEK NESEMÎMÎ NE

Hêsanî ye ku mirov hemîya sûcî bike stoyê malbat û derdorê. Min tiştên wek dar û keviran yên di hişê xwe de nerm kirin û kirin di şeklekê de lê hê jî hin hişk û reqî di kûraya hişê min de mane

Ez li cihekê welê mezin bûm ku tûndkariya li jinan tê kirin hatiye qebûlkirin, bûye ji rêzê û normal e. Pîrika min a ku ez li ber destê wê mezin bûm jî li cihekê welê mezin bûbû. Mesela di zarokatiya xwe de dema em digiriyan ji me re digot: "Wek jinan negirîn." Ji bo wî cihî giriyan wek qelsiya jinan dihat dîtin.

Rast û diristiya her tiştan mêt dizanin. Ew gotinênu ku me gelek caran dibihîstin ew gotin bûn ku qedrê jinan sivik dikirin. "Aqilê jinan di tîka wan de ye, dema radibin dikeve." "An tê ya min bî, an tine bî." "Bavêje ceyndika min ez ê te bikujim."

Heke em nimûneyeka ji van demên paşiyê bidin jî: Di stranekê de, gotin zayendperest yên "heke tu nebî ya/yê min ez ê taciz bikim" tênu gotin.

Welê tê dîtin ku jin sih û dûvikên me ne. Di malbata min de jî ez bûm şahidên bûyerên bi wî rengî. Ji rêzê bû ku kesek li keç, jin an jî xuşka xwe bide. Ji rêzê bû gotinênu "namûs û hey namûs" bênu gotin.

Min ev gotin jî gelek caran bihîstine "keçek bi saxî diçe mala mêt xwe lê bi tenê mirîyê wê dikare ji wê derê derbikeve.

Wê rewşê tesîra xweb li jiyana min jî kiriye. Di zewaca xwe ya pêşiyê de û di têkiliyên xwe de min gelek xeletî kirin.

Hêsanî ye ku mirov hemîya sûcî bike stoyê malbat û derdorê. Min tiştên wek dar û keviran yên di hişê xwe de nerm kirin û kirin di şeklekê de lê hê jî hin hişk û reqî di kûraya hişê min de mane.

Ji ber çi min bi wî rengî dest pê kir, ji ber ku heke em ji bo wî mijarê ne semîmî bin welê dixweyî dê hel nebe! Gelek kêm demên me çêbûne ku di civatê de durûtî di asta herî bilind de ye. Ji aliyekê ve di medyaya civakî de li dijî wî yekê nerazîbûn tê nîşandan ji aliye dî ve mirov bivê-nevê ji xwe dipirse "erê civak ev qasê nerazî be çîma jimara bûyerên bi wî rengî zêde dibe."

Ez behsa civakekê dikim ku jinan wek siha mêtan wek alîkara wan dibîne û gelek nesemîmî ye.

Xwedêyo! Ci qasê xelk ji bo tûndkariya jinan û îstismarkirina zarokan hesas in! Erê ew kesenî îstismarê dîkin kî ne? Ma ew kes ji civat û gerdûneka dî hatine? Na ew kesenî hesas bi xwe ne ku wê yekê dîkin. Hima bêje kesek me bibîne dê bibêjin qey em ne di civakekê de ne ku mêt baladest in.

Erê tiştê em hewce ne perwerde ye. Bawer bikin ti têkiliya wî yekê bi perwerde û cînên civakê ve nîne. Tûndkarî ew qasê berbelav e ku ti ferq nake li hemî cînên civakê ye. Rayên wî kêşeyê kûr cûne ti ci bibêjinê bêjinê.. bêjin edet, çand, dîn, şertên sosyoekonomîk her ci be gelek kûr e. Heke em zanistî biaxivin di genan de ye.

Van rojan hevalekî min behsa meseleyekê kir, bi wî meseleyê hûn ê fêm bikin ku ev kêşe ne bi tenê ji genêne mêtan de ye di genêne jinan de jî heye. Di xwaringehekê de mêt û jinek dema li hev ketine, mêtî li jinê daye. Wan kesn li derdorê navbeynkarî kirine.

Jina lêdan xwerî dijûnên lewitî li wan kesên navbeynkarî kirîn kiriye û gotiye "ma we çi jê, mérê min e dê li min jî bide û ji min hez jî bike" her kes di cihê xwe de dicemidin.

Polîsekê hevalê min behsê dikir "mér li jinan didin, bi giliya cîranan em wan dibin qereqolê paşê ji sedî 90ê wan dibêjin giliya wan ji mérê wan nîne. Em nikarin ti bikin." Ji ber ku jinan cihek nîne ku xwe lê bisitirîne, şertên ekonomîk rê nade an jî heke zarok hebin ji bo wan tehemmilê dîkin.

Ji destpêkê ve azadiya jinan ji wan hatiye standin. Bi gotinên "aqilsivik" qedrê jinan hatiye sivikkirin. Tiştê îronîk jî ew e ku jin wan mîran mezin dîkin.

Baladestiya mîran ya bi hezaran salan di cih de naguhere. Em mér ji bo jinan gelek nesemîmî ne. Jin ji bo me tiştek e ku em xwe wek xwediyyê wê dibînin, metayek e.

Li hemî derên dinyayê bi vî awayî ye. Li reklaman, rêzefîlman û şirketên mezin ên dixwazin tiştên xwe bifiroşin bedena jinan wek metayekê tê bikarhînan. Em ji kû dest bi guherînê bikin. Li gor min ji destpêkê tiştê herî giring helkirina kêşeya semîmînebûnê ye.

Dema ku ez vê nivîsê dinivîsim, nizanim ka çend jin têne kuştin û tûndkarî li çendant dibe, em ê twitekê bi hemî hal û balê xwe yê şirîn binivîsîn û bi vê yekê erkê xwe pêk bînin ma ne?

Ez niho twitekê binivîsim û bibêjim "hevalno ji bo şermezarkirina tundkariya li jinan em sibeyê bimeşin" çend kes dê bêن?

Ceribandina wê bellaşî ye!

Heke deh kes bê gelek baş e. Heke em cihekê jin bikarin bi azadane xwe îfade bikin, şıyanêن xwe der bikin, rêz û hirmet ji wan re hebe çênekin em ê bêjin û em ê li ber govendê girê bidin.

Li meclîsê binêrin, li dîwana wezîran, şirketan, fabrîqeyan, li wan cihan binêrin ku jin dikarin li wan deran kar bikin û entegre bibin binêrin hingê hûn ê fêm bikin ka ez dixwazim çi bibêjim.

Fîkrêن li mejiyê me belav bûyî û bûyîn tabû ew e!

Heke em ji xwe dest bi guhertinê nekin, bi tedbîrên nesemîmî û spesîfîk, tiştek dê neguhere, ho hatiye dê ho here!



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Stranbêj û Qunciknivîs e. Di sala 1998an de albûma wî ya yekemîn bi navê Kîrmîzîlîm der ketiye. Bi strana xwe ya bi navê "Ham Çökelek" xwe daye nas kirin. Di sala 2000an de li Akademiya Filmê New Yorkê perwerdeya Sînema û televîzyonê girtiye. Di Nîsana 2015an de li Rojnameya Meydanê dest bi qunciknivîsiyê kiriye. 31ê Tebâxa 2016an de bi idîaya ku her çiqas ne endamê wê be jî bi zanebûn alîkariya Rêxistina Fetoyê kiriye, li Stenbolê hatiye destgîrkirin. Di 25ê Mijdara 2017an de hatiye tehliye kirin. Di 4ê Sibata 1975an li navçeya Ceyhana Edeneyê hatiye dine. Dibistana Seretayî û navîn li Ceyhanê û Lîseyê jî li Davûtpaşa ya Stenbolê diqedine.

#10. ŞENER  
ÖZMEN

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## MÊRBÛNA MUHTEŞEM

Di gel vê car caran roman, car caran helbest, car caran karên hunerê yên serbiwe heta dezgeh ji van gotinan derdiketin. Em ji bo Daisyyî vexwin... Ji ber ku mîrbûna muhteşem xistiye bin lingên xwe...

Di dawiya vê nivîsê de wê lixwemikurhatinek tune be, ji xwe bila nebe! Ez dibêjim piştî ku demeke dirêj li ser kirinê û vekişina qadeke goya biewle derbas bûbe, lixwemikurhatin li hisê entuelekteliyê nayê.

Ne di asta hesûdiyê de be jî, bêyî ez jiyanê li hezkiriyên xwe û li kesên ku ji min hatibû xwestin ez nefretê ji wan bikim biherimînim, min hewl da ez hêlên baş ên jiyanê bijîm. Min destdirêjî nekirin. Min ew hevokên ku bi dil an jî ne bi dil tê de bi kar neanî.

Jinênu ku divê ez lêborinê ji wan bixwazim hene, di serî de ji Zelalê, jina ku ez bûm evîndarê wê, jina ku ez bi Kurdiya bichelbest û biafsûn ketime nav jiyanâ wê.

Ew dengbilindkirinên ku bi genêna bavê min coş dibûn...

Nepixînin mîna mîrêkî ji Rojhilata Navîn ê karakterîstîk....

Di salêna destpêkê yên hevaltiya me de, tu dibêjî qey ne ew bû ku divê deh saetan ji min zêdetir kar bike, gotinêna "Kanî xwarin!"...

Înyad, desthilatî, rol û qelsiyêna din...

Erê qelsî, lewra tenê kîmasiyek, netemambûnek, birîneke ku li derekê bi cî nebûye dikare van tiştan bide gotin. Ji devê Ursulaya ku çavdêriyê li hemû xwînerên min ên jin ên Kurdan dike û hevaltiyê bi karakterê min ê 'mîr' ê serdest re dike ku di pirtûka min a bi navê Xeybê

ya hîna ji bo Tirkî nehatiye wergerandin de li daristaneke baranê rîya xwe winda kiriye; Ursula ji Kendalê Diyarbekirî re dibêje ku ew ê bi mercekê ji ciyê çok daye erdê rabe, rewş çiqas xirab be jî, divê tonâ dengê xwe eyar bike, divê qet lê hêrs nebe, di gel vî qasî Ursula ne guleke, ne pinpinîkeke, ne ya wî ne jî ya hin kesên din e.

Zehmet bû destpêka ciwaniyê Bi taybetî dema ku di navbera cîhana romanê û rastiya bixof a li ber deriyê malê de dipelcipîn.

Di vê rîwîtiya zehmet de dostêna min ne dêya min, ne bavê min, ne kesên din ji malbetê ne jî mamosneyen min bûn, ez tohmetê li wan nakim.

Min bi qasî dinyayê ji birayê xwe yê mezin hez dikir ku hewl dabû çêlika pisîkê ji nava hesinêna avahiyê rizgar bike, ez ji siya dêya xwe ditirsam, min bêriya bêhna xweydan û ruyê bavê xwe dikir ku dirbê wê dişibiya yê Paul Newman û Steve McQueenî, piştî ku ji Basibrînê vedigeriya Hezexêez dibûm şahidê pevçûnen dijwar ên di navbera wî û dêya xwe de, min birayê û xwişka xwe re li rewşa heyî temaşe dikir, ji bo ku bavê min li dêya min nexe em bi hev re digiriyen û paşê bi çavêna xwe yên werimî, di bin ronahiya lempeya gazê li kêlekekê di xew de diçûn.

Paşê ew jî dihate tefandin, ma tarî jî tiştek e, weke ku em di nava şilehiyeke şevereşê de bûn, weke ku nav û dilê me bi vê şilehiyê tijî diibû, gulpîna dilê me bi xwe jî disezinî, ji bo ku em ji ber tirsê dîn nebin, me piştgiriya hev dikir. Dayik digirî, dayik gazindan dike, dayik kutanê dixwe, dayik digirî, dayik gazindan dike, bav kutanê dike...

Dema ku 12yê Îlonê hat, ‘Hikûmet’ yek ji wan peyvan bû ku li Hezexê herî zêde min dibihîst; “Hikûmetê girtiye, hikûmetê Kuştiye, hikûmetê avêtiye, hikûmetê ...”. Min nedizanî ku hikûmet çiye, bi taybetî jî kîye, lê li gorî tiştên ku min serobero dibihîstin (jin bêhtir diaxivîn) dibe ku ew jinek be.

Demek dirêj derbas nebû ku ez fam bikim, hin tişt ne li gorî adetê çêdibin, li nava cîrana, li qehwexaneyê, li mizgeftê heta dibistanê li derdora min hin jirêderketin hene. Men ew dem borandin ku zarokên Kurdên misilman di dema belavbûna dibistanê de şîr ji pozê dayikên zarokên Suryaniyan dianîn, min gelek tişt ji bîr kirin lê min ev çerxa tundkariyê ji bîr nekir. Ez ji ber vê sedemê ji bo bindestan hêrs dibim.

Bêyî ez zimanê helbesta bi Tirkî ya ku demeke dirêj min pê dinivîsand û bi pirtûka xwe ya dawî ya bi navê Gotina min ji derveyî Nexşeyê ye min bi derbekê nivîsandina bi vî zimanî qut kir û ne jî zimanê çîrok û romanên ku min bi Kurdi dest bi nivîsandina wan kiriye ji xwe re bikim star, ji ber ku ez li vê hêla tundkariyê – le min dixwest ez li vê hêla avê bimînim-mabûm, ez bi êşa wî tiştî derketim heta vê qonaxê ku min nekarî ji wan keç û xorôtê wê neteweya ku her cure tundkarî –ji ber ku di tonênavberê de şermek dihewand

min ji gotinê û nivîsandinê xwe diparast- li wan rewa tê dîtin re bibêjim bê ka tiştê ku diviya ez pê re rûbirû bimama ‘mîrbûn’ bû yan ‘nêrîna mîr a li jinê’ bû.

Di kataloga pêşangeha min a bi navê Filtresiz de ku kuratorê wê Sureyya Evren bû û li Arterê hatibû vekirin, nivîskar û edîtor H. G. Mastersî li ser berhema min a bi navê Nameyê de (Mektup) wiha gotibû; “Nameya ku bi saya jestekê tiştê ku otobiyografîk e derdixe qonaxa mînakeke xwedî hêza ku dikaribe nûnertiyyê bike û weke ronahiyê li dîwarê galeriyê hatiye nîşandan, dişibiya tableteke antîk ya ku peyameke edebî tê de hebû”. Min di dawiya vê Nameyê de behsa neçariya dîtina ‘cenazeyê cudaxwazekî’ kiribû ku di salêl lîseyê de mamosteyekî me pêşkêşî lê kiribû.

Tiştê min dîtibû ne dişibiya wan çîrokan ku derbarê cendekê dapîra min a mirîbu, li erdê bûn, cil û bergên ku li xwe kiribûn bi awayekî din bûn, bi rengê hatî şewitandin, perçiqandin, jêkirin, şikenandin...

Min dikarîbû fam bikira, lê ez ji cendekê mirî yê jinekê re ne amade bûm, na! Ez bê sedem li hemberî Yeseninî bihêrs dibûm, bi heman awayî li ser Mayakovskyyî jî ku serê xwe li peyareyên Nevskiyê dida. Hişê min vî tiştî qebûl nake, wê neke, weke mîr sedema şevişîna min ev e...

Çiqas balkêş e ne wisa? Piştî demekê, li hemberî hîzrên xwişka min ên ku me gelekî ‘dijwar’ didîtin (hema hema) hemû malbat bû yekdeng, weke ku ew berpirsiyara hemû tiştên bûyî ye, weke ku wê ew nalet anije Hezexê û min paşê, gelekî paşê ferq kir ew daxwaza me ya ku dem berî demê wê weke cendeke

parçebûyî li bin kameriyeya şaredariyê bibînin, di dilê dêya me de dihat xwedîkirin.

Dêya min, qet lê qet ji xwişka min hez nedikir Baş e min û birayê min? Ya rastî ez ji vê gotina ağabey jî qet hez nakim! Çawa dibe ku em ên Hugo von Hofmannsthalî dixwînin, ji ber ku oje li neynûkê xwe dikir me dixwes wê ceza bikin? Ax dayê, li şûna ku tu me biparezî, xwezî te hinekî hez ji me kiriba!

Divê me gelekî, gelekî, gelekî, gelekî hez bikira...

Mixabin ez ê nikaribim bibêjim ku guherîn-veguherîn bi xwendinên polîtîk ên dema zû re dest pê kiriye, pirtûkên ku rihê mirov jê diçe, mijarên bêhnçikiyayî bûn. Herçiqas ku Çepê hiştibe hişmendiyek bi min re çêbibe jî, paşê ji bo ku wê tune bike hewl dabû û bi vî halî, tirsnak xuya dikir. Bavêن Maoîst ên ku min ew nas dikirin, zilamên gêjik bûn ku tundkarî li hevjîn û keçen xwe dikirin, pirtûka bi navê Zinarêن Sorikî weke çek bi kar dianîn. Mîrbûna muhteşem, aşkere yan jî nixumandî, çavkaniya xwe ji faşîzmê digirt û faşîzm ji bo ku jiyanê tune bike hatîbû programkirin.  
Ji bo tunekirinê...

Herçiqas ku beriya niha bi demeke dirêj min xwendibe jî û herçiqas demeke dirêj li ser wan deman derbas bûbe ku min di nav re peyv an jî hevokeke bibandor ên pirtûkê –di demên ku bin bi şûn da ba wê kiriye kêm caran li erdê hiştîye-bêyî ez cangiraniyê bikim li ser defteran dinivîsand derbas bûbe jî, ji bo aqûbeta nivîsê li vê xaçerêyê ez ê yekê ji wan bi deyn bistînim.

Foucault di pirtûka xwe ya bi navê Fonksiyona Siyasî ya Entuelektelî de wiha dibêje; Em çawa dikarin gotinêن xwe û kiryarêن xwe, dil û zewqêن xwe ji faşîzmê rizgar bikin? Faşîzm çawa dikare ji nava tevgerêن me bê qewitandin ku di tevgerêن me de bi cî bûye? Tişte ez behsa wê dikim ew rewş e ku di hin deman de haya te ji hin gotinan çêdibe, herçiqas ku peyv bi peyv neyê bîra we jî, rewşa pelandina we ya ji hin deran e.

Tekez hin jêgirtinêن we jî yên bi vî awayî hene!

Ha ev jî gotineke wiha ye; lê hêleke şamiltir ê vê jêgirtina Foucaultyi ji vê gotina xweşik a destpêkê ya kitêboka bi navê Derbarê Huner û Wêjeyê ya Marx û Engelsî heye ku ji dema lîseyê û heta niha (Min lîse li Hezexê xwend ku wê gavê navçeya Mêrdînê bû) qet min ji bîr nekiriye: “Şêweyê hilberîna jiyana madî, pêvajoya polîtîk, çandî û entelektuelî ya jîyanê jî diyar dike”.

Pirtûkeke din jî, ya Louis Althusserî ye ku min bi axîn û nalîn xwend û bi hîzrêن min ên ji xwe derbarê dahatûyê de ne zêde geş bûn girt û virvirandin. Navê pirtûkê; Dahatû Wê Dirêj Bidome ye; min wisâ hest dikir ku ez Althusserê strukturalîst baş fêm nakim, gelo bi rastî jî hevjîna xwe Héléne kuştîye? Helbet bandora wê di demeke kurt de derbas nebû – Ciye seknê qet nizanin! Xaleke krîtîk bû, min weke xwendeyekî ciwan ê strukturalîst dizanîbû ku ez nikarim fikra xwe li ser Althusserî bibêjim û ev ramana şileyî, bi awayekî balkêş qadeke tirsnak a entuelektelî ya bi nîrînêن cidî dagirtî, li pêşıya min vekir ku wî li hemberî kesê/a kuştî diparêze. Di dilê min de qasî misqalê zerre faşîzm

tune bû lê vê sê rojên dinyayê misogeriya wî tiştî tune ye ku faşîzm wê nekeve wir. Ji wê roja ku bi zimanê nêrza yê ku gelek caran gotina jin, gelek caran gotina evîn, gelek caran gotina azadiyê tê de derbas dibe me dest bi kuştina jin û azadiyê kir, min fam kir ku li cografya min a erda wê ne rast helbest nayê nivîsandin –ya ku bê nivîsandin jî ne helbest e- û dawî li helbestê hat!

Piştî qîrîna sipî ya jinên Êzidî, dawî li helbestê hat, lewra êdî jin nîne!

Me hemû jin kuştin, destên me kesk e.

Em li bendê ne Xwedê wan bi rengekî ku bêhtir guhê xwe bidin gotinan bi şûn de bide me. Ew faşîzma ku di nava tevgerên me de bi cî bûye.

Ev gotin diçin û têñ li min didin...

Ne ku kiryarêñ me yên di nava malê de zaroktiyê weke çavkaniya hemû tirsan nîşan dide, ne jî ez di wî emrî de me ku faşîzma di nava mamosteyêñ min ên Rojavayî de bi cî bûye (êdî gelek ji wan najîn) biqewitînim. Çima li me didan? Hin rêyêñ din tune bûn ku bihêlin em bibin mirovêñ baştir (!)? Çewisîna li hemberî fişarê gelo genetîk e, ev kurm ji dê û bav derbas dibû?

Rojek tê tu ji bîr dikî van tiştan an jî tu dibejî dibe min jî bîr kiribe, rojekê tu dibî şahidê wî tiştî ku faşîzma di dilê de de bi rengekî ku tû pê şâşwaz bibî dirije derve. Piştî ku temâşekirina tundkariya bikef a li hemberî Daisy Domergueyî yê qaçax û dînikî di filmê The Hateful Eight (2015) ê Tarantinoyî de, di dawiya filmî de gotina "filmekî gelekî baş bû!" gelo ew tiştên ku

em ê erêni bikin nîşan nedida?

Di rastiyê de ez li pey şopa ên di gotinan, ên di dîmenan de bi cî bûne digerim. Di gel vê car caran roman, car caran helbest, car caran karêñ hunerê yên serbiwe heta dezgeh ji van gotinan derdiketin.

Em ji bo Daisyyî vexwin... Ji ber ku mîrbûna muhteşem xistiye bin lingên xwe...

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Helbestvan, çîroknivîs, wergêr û hunermendê aktûel e. Demeke li bajarê New Jerseyê (DYA) dijî, Herçiqas helbest û karîkatur zû nas kiribe jî ji bo hunera aktuel û wêjeya kurdî dest ji herduyan jî ber daye. Di kovar û rojnameyên wê demê de çîrok û helbestên wî hatine weşandin. Yekemîn çîroka wî ya ceribandinê ya bi navê Mirin û Dîyalektîk di Kovara Warê de, li jêr navê Sîyabend Z.de hatiye belavkirin (1999). Pirtûka Arjen Arî ya bi navê Destana Kawa û Azhî Dehaq (2011) û pirtûka Berken Bereh ya bi navê Dilê Min Balgîf e Ji Eşqê Re (2012) wergerand û di Weşanxaneya Evrenselê de hatiye çapkiran. Nivîsên wî bi serenava "Uykusu Bölünenler" di kovara "Sîcak Nal"ê ya ku Sureyya Evren editoriya wê dikir, hatine weşandin. Weşanxaneya Lîsêjî ev nivîs û wergerana di sala 2013an de wekî pirtûk çapkiriye. Di Kovara Art-Îstê ya ku yekemîn kovara hunera aktuel ya ku Halîl Altındere editoriya wê dikir, dest bi nivîsên hunerî kiriye. Di kovar û rojnameyên wekî Sanat Dünyamız, Sîcak Nal, Bîrgün û Radîkal Kîtap de nivîsên hunerî û wêjeyî, nivîsên derbarê pêşangehan û hunermendant de nivîsiye. Di sala 2005an de Xelata Kunstmuseum Thun (Swîsre) ya Prix Meuly wergirtiye. Tevlî Bernameya bi navê TRANSFER 07 Pevguherîna Hunermendant ya ku Sekreteriya Çandî ya Ren Westfalyaya Bakûr bûye (Munster, Almanya). Her wiha tevlî bernameya bi navê Nivîskarê Bajêr ên Turkiye-Almanyayê ya ku Enstituya Goethe pêk aniye, bûye(Munîh). Di sala 1971an de li Şîrnexê hatiye dinê. Li Zanîngeha Çukurovayê di Fakulteya Perwerdehiyê de beşa Perwerdeya Wêneyê(Resim-Îş) qedand. Bi Zelal re zewicî ye û lawekî wî yê dehsalî bi navê Robîn he ye.

#11 KORKUT  
AKIN

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# DIVÊ KURÊ MIN BAVÊ XWE NAS BIKE

Destsgirtiya min wêneyê destgirtiya min a berê  
qetandibû, min gelek lê dabû. Bêguman eyb e.  
Piştî salan ez lêborîna xwe dixwazim.

Dema ez xwendekar bûm yek ji danasîna herî zêde min jê hez dikir ev bû: "Ji ber ku li ser nasnameya min 'mêr' nivîsiye ez mîr im."

Ez jê aciz nedibûm ku vê li nava civatê bibêjim, li wan kesên li dora min jî ecêb nedihat. Gelek sal borîn, 12ê Îlonê hat û çû, gelek dem borî, êdî dema ev gotin dihatin gotin kesên derdorê bi nêrînê ecêb dinêrîn û kêm didîtin.

Piştî hingê, min em nasîn ji bî r nekir lê min pênaseyeka dî ji xwe re dît.

Dema jiyan bi vî awayî diguhere cih ji tûndkariyê re namîne ma ne...na, bêguman na...

## Cihê tûndkariyê nîne

Min bi kîdariyê li ti kesan nerîye. Heta ku me kesekê faşîst girt wî bi çekan em ji xwe re kiribû armanc jî, hevalên min ên hemsiyaset lê dan lê min nekarî ez destê xwe jî rakim.

Carekê jî me êrîş kir, tê bîra min min pê xwe rakir min nekarî ez pehînekê li faşîstê me girtî bidim, yê faşîst reviya. Ya rastî tûndkarî ne bi tenê lêdan e, dema mirov mirûçê xwe dike û qêrdan jî tûndkarî ye- ku e gelek caran dikim.

Min dît ji ber çi ye: "Mirovên bêçare dijûnan didin" ez we dibêjim ma çi bibêjim. Paşê xemgîn dibim. Dema min dinivîsi hat bîra min... Destsgirtiya min wêneyê destgirtiya min a berê qetandibû, min

gelek lê dabû. Bêguman eyb e. Piştî salan ez lêborîna xwe dixwazim.

Gelo tê bîra wê? Gelo mirov dikare ji bîr bike, ji bîr nekiriye lê wek ji bîr kiribe tevgeriyaye. Belkî – welê dixwazim- xwe ji xwe jî aciz bike ku wê hesûdî kiribû...

Paşê me hevaliya xwe domand, wê mijarê em ji hev dûr nekîrin, em ji hev neçûn paş... Dîyar e em herdu jî ji ber bûyerê xemgîn in.

Ji bili kîrnehatinê ne tiştekê dî ye...

Dema hûn nekarin derdê xwe ji ya/yê li hemberî xwe re bibêjin, di hişê wê/wî de jî tiştekê dî hebe, sed deq û dolab bizivirin, dengê we bilind dibe, mirûçê we dike û gotin reng diguherin.

Heke piçekî biçûk be, heke nemaze jin be û hûn bikarinê hûn dikarin şimaq an kulma xwe li ber wan bilind bikin. Heke hûn nedanîn tê wê wateyê ku we tûndkarî nekiriye.

## Şer jî tûndkarî ye

Ece Ayhan bi awayekê şairane dibêje "di dersa dewletê de zarok hatin kuştin." Ma ev jî ne tûndkarî ye? Li nava Enqereyê dorpeçkirina peykerê mafêن mirovan jî tûndkarî ye.

Tiştê herî xerab jî ci ye hûn dizanin... Gotinên wî mîrikî ye ku pêşkêşkarê televizyonekî ye, dem dersdêreka jin di bernameyê de jê re got "bila zarok nemirin wî piştgiriya gotinên wê kir" paşê bi zordariya dewletê, wî xwe parast û hin gotinên welê gotin ku li ber çavêن min reş bû.

Tûndkariyek heye, dersdêrek nerazîbûna  
xwe diyar dike, dewlet cezayî dide  
dersdêrê, pêşkêşkarê bernameya zindî jî  
tûndkariyê zêde dike.

Di sed salên paşiyê de bi tenê 11 salên  
aştiyê çêbûne. Bi salan dewletan(qasî  
hêza xwe) mafê xwe dîtine axa kesên dî  
dagir bikin û mirovan bikujin.

Em li bendê bûn ku ti kêşeyên dewleta  
me bi cîranan re nebe lê ji aliyekê ve  
serê leşkerên me kirin di kîsikan de,  
diplomatên me hatin revandin û bûn rehîn.  
Ma tûndkariya birêvebir ên dewletê jî ne  
tûndkariya mîr(an) e?

Ya rastî ka ez ci bikim? Ez vê nivîsê  
biqetînim û nivîseka helbestîtir binivîsim?  
Gelo ez nivîseka çîrokî binivîsim?

Ka bisekinin ez ê xwe spêrim bêçaretiyê û  
têr dijûnan bikim. Em bi hev re biqêrin, bila  
şer nebe bila aşî demildest niho hebe.

Ez nizanim tesadif e, lîstikeka jiyanê ye ci  
ye. Dema min nivîs temam kirî destgirtiya  
min a yekem telefonî min kir. Em gelek hev  
nebînin jî hê keyfa me ji hev re tê, em bi  
telefonê badikin hevdu, pirsa hev dîkin:

“Ez ê pirsekê bikim tu misaîd î?

Belê, ji bo te her dem...

“Dema em bi hev re bûn, prezervatîf  
hebû?”

...hima sekinîm. Mat mam... Ev ji kû  
derket? Belê hebû, belkî kêm dihat  
peydakirin, belkî biha bû lê hebû.

“Çima me bi kar neîna, ez ew qas caran

kûrtaj bûm?”

...bi tenê bersiveka min hebû. Nezanî,  
cahilî. Me zanîngeh xwendibû, em xwende  
bûn(cîrokên wê yên xelat standîn hebûn,  
fîlmên min...) me guherînên jiyanê teqîb  
dikirin lê dîsa nezanî...(Ez dizanim dema  
ez behsa 33 sal berê jî dikim divê şerm  
bikim. Min cara pêşiyê jineka rût û tazî  
dîtibû, nezanî bû.

“Te qet bi kar îna?”

Belê, paşê min bi kar îna.

Giriya. Bi wê xema ku wê nedikarî serê  
xwe bispêre milên min, min nezanî ci  
bikim, dest û tiliyên min li hev geriyan. Min  
xwest bibêjim “negirî” gotin li gewriya min  
asê bû.

Ev jî tûndkariyeka dî ye. Ew şoka ew ketiyê  
û ew rewşa ku piştî salan ez rastî nezanî û  
cahiliya xwe hatîm ma ne tûndkarî ye?

...hima bêje her roj destgirtî, lêzim an jî  
mîrê jinekê wê dikuje.

...qatilekê tecawiz li zarokeka sê salî kirîye,  
di girtîgehê de mehkûmên dî ew kuştiye.

...dewlet her kesên dibin mûxalifê wê  
desteser dike û digire.

...dewletçavêx li wê yekê digire ku li  
–piraniya cihêne neqanûnî- tecawiz, taciz li  
zarokan tê kirin.

Gotina paşiyê...

Min nivîs li jîna xwe da xwendin(da  
xeletiyê min bibîne, ji bo rewşen negotinê  
an jî derveyî mexseda min bibîne.)

Wê got:

"Min ji te re gotibû nameyan bivêje lê te neavêt. Ev jî tûndkariya mîran bû, tûndkariyeka eskere..." Da wê name biqetanda û biavêta ez bibêjim "bila destê min bişkesta, ez poşman im" hê jî ne bes e.

Ji ber emrê wî hê dem maye ku kurê min vê nivîsê bixwîne... Bila ew jî bixwîne. Bavê xwe nas bike... Ew ê pê re civakê jî nas bike.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhênerê kurtefîlman û televîzyonvan e. Ji sala 1983an vir ve kartpostalên ku dest bi dest têñ belavkirin çê dike. Li Zanîngeha Anadoluya Eskîsehîrê di Fakulteya Zanistêñ Ragihandinê de beşa Sînema û TVyê xwendîye. Li Zanîngeha Stenbolê jî mastera xwe li ser Rojnamegeriyê kiriye. Di Enstîtuya Aboriya Kargêriyê de perwerdehiya pisporiyê girtiye. Li Yeşîlçamê, wekî alîkarê derhêner û senaryonûs dest bi kar kiriye. Di televîzyonan de bernameyan çand û hunerî çê kiriye. Li Navenda Hunerê ya Mujdat Gezen û li Zanîngeha Aydinê ya Stenbolê di derbarê sînemayê de, ders daye. Bi fîlma xwe ya bi navê "Volî" di 5em Pêşbirka Kurtefîlmên Netewî ya ÎFSAKê de xelatekê mezin wergirtiye. Bi fîlma "Gelîncîk" xelata Kurtefîlmên 10em sala çalekiyêñ REPAŞê (1986), bi fîlma "Hişt Hişt" xelata Mansiyona Pêşbirka Kurtefîlman ya Mafêñ Mirovana Şaredariya Karşıyakayê (1990), bi fîlma "Hayat Ne Tatlı" Xelata Yekemînî ya Pêşbirka M. Arıburnu (1991) û Bi fîlma "İstanbûl Sayfaları" xelata bernameya TVyê ya salê ya Komeleya Rojnamegerên Hemdem wergirtiye (1993).

#12 GÖKHAN  
DURMUŞ

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TUNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# REWŞA NÛÇEGİHANÊN JIN JI REWŞA JINÊN DIN NE CUDATIR E

Li gorî anketa TGSyê çekiriye, ji sedî 60 ji rojnamegerên jin dibêjin ku rastî tundkariya psîkolojîk û mobbingê hatine. Rêveber di lîsteya kesên ku tundkariyê dikan di rêza yekê de ne. Di rêza duyem de hevalên wan ên karî tê.

Em her roj di televizyonan de, rojnameyan de, di gelek dezgehêن medyayê de nûçeyên tundkarî, mirin, tecawiz, destdirêjî û yên istîsmarê yên li ser jinan dixwînin, temaşe dikan. Gelo dema di xwendina van nûçeyan de qet hizra we çêbûye ku kî van nûçeyan çêdikin? Gelo rewşa kesên ku van nûçeyan amada dikan çawa ye, gelo rojnamegerên jin bi van rewşan re rû bi rû dimînin, dema ku van nûçeyan amade dikan ci hest bi wan re çêdibin?

Dema ku min ev nivîs amade dikan, min nûçeyek xwend ku li Bûrsayê rojnamegerek jin a li radyoyeke herêmî kar dikan rastî tecawizê hatiye û paşê doz vekiriye. Dadgeha îstinafê 23 sal cezayê girtîgehê dabû her yer ji bersûcan ku dadgeha herêmî ew serbest berdabûn. Niha dosya li Dadgeha Bilind li bendêye ku biryarê derbarê wê bide.

Ji sedî 38.6ên rojnamegerên ku kar dikan jin in. Nêzîkî ji 3yê yekê endamên Sendîkaya Rojnamegerên Tirkiyeyê jin in. Rêjeya rojnamegerên jin di sektorê de, rêjeya birêxistinbûna wan jî ne gelekî bilind e. Ev rêje di her yek dezgehêن medyayê de jî zêde naguhere. Li Tirkiyeyê di dezgehêن medyayê yên netewî de di nava berpirsên weşanê de jin nînin. Di mekanîzmayên biryarê de hejmara wan gelekî kêm e.

Sendîkaya Rojnamegerên Tirkiyeyê, di nava sendîkayên Tirkiyeyê de kêm be jî gavên erênî avêtiye. Di Civata Giştî ya 2013yê de di rêziknameya xwe de guhertin çêkir û ew xal lê zêdekîrin ku dibêje; "TGS di hemû xebatêن xwe yên sendikayî de weke prensîbêن bingehîn qebûl dike

ku alîgirêن sendîkayê xwediyê gotin û biryaran bin, wekheviya jin û mîran di serî de her cure wekheviyê, demokrasiyê û pergala demokratîk a hiqûqî li her qadê dabîn bike û biparêze. Li hemberî her cure tundkariya li ser jinê (destdirêjî, tecawiz, lêdan, mobbing û hwd) û li hemberî cidaxwaziyê têdikoşe û polîtîkayan di vê mijarê de li pêş dixe. Di dema pêkanîna van polîtîkayan de heke nelihevkirinek çêbibe dengê jinan encamê diyar dike. Hewl dide ku di hemû qadên sendîkayê de, di hemû mekanîzmayên biryardayinê de, di civata giştî, komxebat û komisyonan de û di hilbijartina delegeyan de jin di asta herî bilind de xwedî nûner bin. (...) Ji bo çareseriya pirsgirêkên karkerên LGBTIyan hewl dide, ji bo çareseriya pirsgirêkên van karkeran di çarçoveya îmtiyaza pozitîf de tedbîran bistîne û ji bo wê komisyonan ava bike."

Dema ev xal dihatin nîqaşkirin digel liberxwedana hin rêveberên me yên jin û mîr me bi piranî ev xal ci bi cî kirin. Gotinêن "Em çîma cidakariyê dikan? Heke ku jin nexwazin bibin rêveber wê ev kota ji me re bibin asteng. Di demeke wisa de ku pirsgirêkên lezgîntir ên rojnamegeran heye em ê bi van re mijûl bibin?" ên sereke bûn ku kesên li hemberî van biryaran derdiketin. Ji ber ku me bi paş de gav neavêt, ev guhertin di rêziknameyê de çêbûn.

Nîvê rêveberên Navenda Giştî, yên şaxê Îzmîr û Enqereyê rojnamegerên jin in, ji sedî 40ê rêveberên şaxê Stenbolê jî dîsa rojnamegerên jin in. Nûnerên sendîkayê yên li kargehan di çarçoveya kotaya ji sedî 50 jin in. Komisyonâ Jinan û LGBTIyan a TGSyê hat avakirin. Her çiqas ku ne di asta tê xwestin de be jî, bi rêya vê komisyonê

hewl didin ku pirsgirêkên rojnamegerên jin yek bi yek bêñ çareserkirin. Ev bi xwe jî ji bo TGSyê gaveke gelekî mezin e.

Di nava sendîkayênu ku bi Konfederasyona Turk-Îşê ve girêdayî de ne jî TGS tekane sendîkaye ku jinek bûye serokê wê yê giştî. Helbet ev ne bes e. TGS di salêñ dawiyê de ji bo rojnamegerên jin di rêveberiyê de bêhtir cî bigirin hewl dide, divê di di mijara serokatiya giştî de jî hewla xwe berdewam bike.

Dîsa weke serokê giştî ez bi awayekî aşkere bibêjim ku ji bo di civata giştî de jinek bibe seroka TGSyê min hewleke gelekî mezin da. Ez wê gavê têgihiştîm ku heta pirsgirêkên rojnamegerên jin ên di jiyana wan a kar û taybet de neyên çareserkirin ev tişt ne mimkun e. Astengiya herî mezin li pêşıya hevala ku me erka serokatiya giştî pêşniyarî wê kir, hebûna zarokênu wê û tempoya zêde a karî bû. Min weke bavê keçeye 15 mehî bi xwe tecbure kir ku heta dewleta ku zarakan napêrêze hebe, ji bo hemû dayik û bavikan, bi taybetî jî ji bo dayikan di jiyanê avêtina gavênu mezin zehmet e.

Di dema karêñ birêxistinkirinê de jî me gelek caran hevokêñ “Li malê zarok li bendeyî min in, divê ez herim zaroka xwe bînim” bêhtir ji jinan dibihîstin. Di van 5 salêñ ku ez xwedî erk im de min nedîtiye ku rojnamegerekî mîr gotiye, “divê ez li malê li zarokî/ê binêrim”. Rewşa min jî ji ya wan ne zêde cida ye. Tenê şemî û yeksemê berpirsiyariya min a xwedîkirina wan heye. Ev hin gavênu ku TGSyê avêtine û divê biavêtiya.

Dema em bala xwe didin sektorê, dawiya cidakariyê nîne ku rojnamegerên jin di

aliyê pîşeyî de tenê ji ber ‘jin’ in rastî wê têñ. Herî zêde jî rastî tundkarî û cidakariya hevalênu xwe yên kar û raserên xwe têñ. Wisa ne fikirin ku di jiyana mirovêñ xwenda de, yên perwerdekirî de tiştêñ wisa çenabe.

Pirsgirêka herî mezin a rojnamegerên jin ew e ku sektor her diçe bêhtir rengê mîran distîne. Gelo we qet kameramanekî jin dîtiye, yan jî çend caran hûn rastî kameramanekî jin hatine? Gelo hûn wisa difikirin ku nûçegîhan û pêşkêşvana her roj derdikeve pêşberî kamerayê bi wî tiştî kêfxweş e ku her roj makyajê bike û bihêle temashevan li ekrana televizyonê binêrin? Erê û tirsa wan heye ku ji kar bêñ avêtin. Di meaş de di navbera rojnamegerên jin û mîr de her çiqas ferqeke mezin tune be jî rojnamegerên jin hêsanter ji çav têñ derxistin. Gelo ji ber ci ye?

**1 – Zewac:** Rêveber bi heman çavî li zewaca jinekê yan jî zewaca mîrekî nanêrin. Mijara anîna zarokan weke mercek derdikeve pêşberî jinan. Rêveber wisa difikirin ku wê jin di sektorê de kar nekin. Lî gelo ji bo mîran wisa ye? Ci wextî be mîr dikarin biçin nûçeyê, lî jin nikarin biçin. Dikarin biçin ji derveyî bajêr lî jin nikarin. Rojnamegerên jin gelek caran ji bo ku dest ji karêñ xwe bernedin, nazewicin.

**2 – Zarok:** Mijareke din a girêng, zarok in. Ji ber destûra zayînê, rewşa nexweşiyê, destûra şîrdayinê, rêveber di serê lîsteya kesêñ ku ji kar bêñ derxistin de rojnamegerên jin dînivîsine. Em wisa bifikirin ku rojnamegerên jin ji destûra zayînê vege riya, gelo wê karibe li gorî saetên zêde kar bike? Bersiv, na ye. Rojnamegerên jin avêtin ji derveyî sektora

rojnamegeriyê. Zarok bi hef belayan mezin kir, dema krêşê hat. Meaşên ku têñ dayin diyar in. Jin wisa difikirin ku li şûna ez vî pareyî bidim krêş an jî kesekê ji bo nêrîna zarokê, ez ê bi xwe lê binêrim. Ji xwe di sektora taybet de kêşeya krêşan heye, ji bo rojnamegerên jin ev di asteke gelekî girîngtir de ye. Zayîna rojnamegerên jin, tê wateya avêtina ji kar an jî windakirina karî.

Di dawiyê de ez dixwazim behsa rewşa stajyerên jin bikim. Li her sektorê kedxwarî heye, bi awayekî keda herkesî tê xwarin lê li sektora medyayê rewşa stajyeran cudatir e. Ji xwe dema fakulteyên ragihandinê diqedînin ji wan re tê gotin ku "Li sektorê birina çay û qehweyê ji xwe ne hêjayî gotinê ye, tê bibe koleyê edîtorê/a xwe".

Stajyerê/a ku vê gotinê esas digire, çi jê re tê gotin bi cî tîne, neçar e ku bi cî bîne. Ji xwe rêjeya bêkariyê li medyayê gelekî zêde ye. Ma bila beriya ku têkeve karî, jiyana wî/ê ya kar biqede? Bila neqede lê dema vî tiştî çiqas e ne diyar e. Rojnamegerên jin herî zêde di dema stajyeriyê de rastî destdirêjiyê têñ. Ji nûçegîhan bigirin, heta şef, heta rêveber hemû mîr destdirêjiyê li wan dikin.

Komisyona Jin û LGBTIyan a TGSyê hefteyên borî ankêtek çêkir ku rojnamegerên jin ên li Tirkiyeyê besdar bûbûn. Li gorî vê:

\* Li Tirkiyeyê ji 10an 6 rojnamegerên jin dibêjin ku "di jiyana xwe ya karî de ji ber zayendiya xwe ez rastî cidakariyê hatime/têm".

\* Ji sedî 55 ji rojnamegerên jin dibêjin ku ew jî qasî mîran kar dikin lê qasî wan meaş nastînin.

\* Ji sedî 87 ji rojnamegerên jin wisa difikirin ku bandoreke neyêni ya dayikbûnê li ser karê wan heye yan jî wê hebe.

\* Ji sedî 60 ji rojnamegerên jin dibêjin ku rastî tundkariya psîkolojîk û mobbîngê hatine. Rêveber di lîsteya kesên ku tundkariyê dikin di rêza yekê de ne. Di rêza duyem de hevalên wan ên karî têñ.

Tiştên ku rojnamegerên jin ên besdarî vê anketê bûne û parvekirinê wan wê careke din bibe sedema wî tiştî ku hemû xwendekar muhasebeya xwe ya bikin....

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Ji sala 2016an vir ve Serokê Giştî yê Sendîqaya Rojnamegerên Turkiyeyê ye. Di sala 2013an de bû Serokê Şaxa Stenbolê ya Sendîqaya Rojnamegerên Turkiyeyê. Di sala 2002an de di Rojnameya Evrenselê de wekî nûçegihan dest bi rojnamegeriyê kiriye. 11 sal nûçegihanî û du sal jî edîtorî kiriye. Di sala 1983an de li Tokatê hatiye dine. Dibistana seretayî û navîn li Tokatê û lîseyê jî li Stenbolê dixwine. Zewicandî ye û keçekê wî heye.

#13 AHMET  
ÜMIT

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# NAVÊ MIN HATUN E

Bayeka li derive bangî wê dike, wek destekê birehm.

Hatun ber bi wê bayê ve diçe ku bangî wê dikir.

Di deriyê malê de dêya wê tê pêşîya wê.

Jina reben qêrekê dide û ji ser hişê xwe diçe.

Bi qêra dêya wê gundî li wê kom dibin.

Nizanim ji kengê ve ye ku li vê derê ye. Wext ji hişê min çûye. Ji berêvareka bi rengê hingivî ber bi tarîtiyeka bêdawî... Qêrevêrek di serê min de ye, laş ji hal ketiye lê ew girêka veşartî li gewriyê çênebûye. Valahiyek, bi tenê valahiyeka mezin di rihê min de mezin dibe.

Dengê vekirina kilîlê tê, du dengên pey hey, wek du gotinên bi şerm û tirsê hatîn gotin... Çavê wê hêdîka vedibe. Bi vekirina derîyê stevlê ronahiyek ber bi pêyê wî ve wek destê gihadina hewarê dirêj bû. Ew wext gelekê dom nake. Du sihêneş ronahiyê digirin. Ew dizane ku ew bavê wî û birayê wê yê 15 salî ne. Li wî cihê xwe yê xwe kiribû qijûjû xwe qeliqand. Dema xwe diqeliqîne laşê wê diêşe. Hemî goşt, hestî û kirkirikên di laşê wê de diare. Ew cih diêşin ku roja borî bav û birayê wê lê dabûn. Tiştek li ser lêva wê ya jor heye. Tişteka hiskbûyî ye. Wek qalikekê ye. Destê xwe dideyê xwîna wê bi xwe ye...

Dengê birayê wê ket di nav bêdengiya stevlê de “binêre, binêre, Hatun Şiyar bûye.”

Bavê wî jê re dibêje “ji wê re nebêje Hatun. Hatun navê pîrika te bû lê ev nebû layiqê wî navê pîroz.”

Birayê wê got “nebû” paşê li gotinên xwe zêde kir û got “diyar bû ku ev yeka xerab e.”

Kurik hewil dide wek bavê xwe zirzopane biaxive lê ci bike nikare ew qasê nefretê li gotinên xwe kom bike. Belkî bavê wî jî lê hesiya û got dibe ev kurê eware bê rehmê. Bi kîndariyê dibêje “ev xerab e” û dibêje “ka em karê xwe temam bikin.”

Ev gotin keçê qet natırsîne. Qet ji cihê xwe

nalive, hima welê disekine. Dibihîse ku pêyên birayê wê wek bêbiryaran li ser axa erdê diçe û tê. Qet bala xwe nadeyê. Serhatiyek tê bîrê. Zarokekê hê sê mehî, li mehdikeka xemilandî ye. Pora wî zer e. Kurikekê zeîf, her nexweş û têr-girî ye. Ew bi xwe pênc salî ye. Da kurik binive mehdikê dihêjîne. Dêya wî tê odayê. Qêran dide û dibêje.

“Te ci ji kurikî kir? Çima digirî? Çima te hisyar kir?”

“Min tiştek nekir dayê, hima bi xwe hisyar bû. Paşê giriya.”

Dayika wê jê bawer nake, qurîncekekê lê dike. Birayê wê got “Ka kêrê bide min em vî karî temam bikin” van gotinan keç ji bîran derêexist. Kêr li cihê tarî ye lê ew wê kêrê dinase. Dizane kîjan kêr e ku dê gaveka dî rihê wê bistîne. Wan ew kêr di cejna qurbanê de bi kar tanî. Birek û mezin bû. Di cejnan de ho baş dihat tîjkirin. Divîya tîj û birek bûya da zû rihê qurbanan bistîne ji ber ku guneh e. Gelo şeva dî dîsa wan kêr tîj kiriye? Dema wan tîj kirî dayika wê ci gotiye? Ji berya cejnê dayika wê diket di telaşekê de gelo niho jî tê de ye?

Bavê wê ji birayê wê re dibêje “destikê wê baş bigire an tê xwe birî.”

Wek berxikeka biçük tê ber çavên wî. Wek giloleka hiriyê ye, wek spîtiya berfê ye. Bi tenê li eniya wê û çacıkêن wê yên paşiyê rengê reş heye. Navê berxikê Muslu ye. Êdî birayê Hatunê yê porzer mezin bûye ew Musluyê mezin dike. Wek pêlistoka wê ya bebik be, wek zaroka wê be mezin dike. Heta rojeka qurbanê bê û bav û birayê wê bênen berxikê serjê bikin. Tê bîra wê dema Muslu hatî serjêkirin ew çûbû odayê. Bavê wê ji birayê wê re gotibû: “Serê Musluyê baş

bigire an tê xwe bibirî.”

Dema Muslu hat bîra wê ji kaniya çavên wê dilopek herikî. Çavên Musluyê hatin ber çavên wê, wek Musluyê digot çîma we ez kuştım.

Şûndestên bi xwîna sor yên li ser kevilê wê yê ji keviya berfê hat bîra wê. Hêsrên çavan bi hemdê xwe û bêyî deng û pêjnî diherike.

Bavî pirsî: “Çîma sekînî! Ma tu tîrsayî len!”

Li gewdeyê zeîf ê xuşka xwe dinêre. Kêra di destên kurikî de wek organekêbû ku ne yê wî bû. Bavê wî li pişt wî, gavekê ji wî dûr bû.

Jê re got: “Tê namûsa malbata me xelas bikî.”

Bira dibêje: “Ez ê xelas bikim.”

Bira nêzîkî xuşkê dibe. Kêrê radike. Çavê wan rasta hev tê. Dema rûyê werimî yê xuşka xwe û çavên wê yên bitirs dibîne ji bîryarê sist dibe. Kêra ku wî rakir nikare dane. Hima welê li hewayê dimîne.

Ji ber ku dê kêrê bîne xwarê zêdetir aciz dibe. Pehînekê li xuşka xwe dide. Jê re dibêje: “Bizivire keçê... Bizivire, pişta xwe bide min.”

Keç difikire karê birayê xwe hêsanîtir bike. Ji xwe her ne ji bo xizmeta wî hebû? Ji xwe sebeba heyina wê ne ew bû ku xizmetê ji kurê paşê li malbatê zêdebûyî bû? Keç difikire dê bi vî awayî ji wê îşkencê xelas bibe. Nêrînêñ kîndarane yên bavê wî, wî disekinîne.

“Ji wê re nebêje keçê, navê wê qehbe ye.”  
Ev gotin keçê gelek diêşîne. Ji pehîna birayî

zêdetir, ji kulm û pehînêji şevê ve xwarî zêdetir...

Bira vê carê dibêje “qehbê! Keçê, qehbê bizivire.”

Keç dizivire û bi hemî hêza xwe radibe. Ti kes ne li bendê bûn ku ew rabe. Li rasta wan disechine. Nediêşîya ne jî ditirsiya.

“Bi wêrekî dibêje: Navê min Hatun e! Ez ne qehbe me!”

Du mîr bi halê matmayî bi paş de diçin.  
Kurik di minmine.

“Tu qehbe yî, erê qehbeyî wîî!”

Bi ser birayê xwe de diçe.

“Navê min Hatun e, ez ne qehbe me.”

Bira li hemberî heybeta wê dihele. Bav hewil dide wî vegeŕîne ser halê berê.

“Wê kêrê lê bide, lê bide, wê qehbeyê nede axiftin.”

Hatun qêran dide.

“Ez ji we re dibêje ji min re nebêjin qehbe.”  
dest diavêje kêrê û ji destê birayê xwe de derdiêxe.

Birayê wê dike bêje qehbe “Qeh..”

Hatun dike kêrê li wî bide. Çavê wê tê rasta çavê birayî. Ew kurê porzer tê bîra wê. Ew kurê her nexweş, her girîker û her zeîf.” Dilê wê nerm dibe. Nikare kêrê li wî bide. Birayê wê liber wê direcife.

Bavê wê dike ji hêrsê biteqe. Ji kurî re dibêje

"min digot qey tu mîr î!"  
Ew bi xwe bi ser keçê de diçe.

"Wê kîrê bide min, bide min qehbeya pîs."

Keçê li bavê xwe nêrî, nayê bîra wê kengê  
wî gotineka xweş jê re gotibû, kengê bi  
hezkirinê destê xwe dabû wê.

Mêrik jê re dibêje: "Wê kîrê bide min, zû  
bide."

Keç dibêje "ha ji te re, ha ji te re!"

Bi hemî hêza xwe kîrê li koda sîngê bavê  
xwe diçikilîne. Devê mîrî beş dibe. Ji êşê  
zêdetir matmayî dibe ku keça wî karî wê  
yekê li wî bike. Hêrsa keçê kêm nabe, heta  
mîr li erdê tilolo dibe, kîrê lê dide û lê dide.  
Heta nefreta di çavê wî de ditemire.

"Ha ji te re, Ha ji te re!"

Dema ji ser kelaşê bavê xwe radibe rihet  
dibe, kîrê diavêje rexekê. Bayeka li derve  
bangî wê dike, wek destekê birehm. Hatun  
ber bi wê bayê ve diçe ku bangî wê dikir. Di

deriyê malê de dêya wê tê pêşîya wê. Jina  
reben qêrekê dide û ji ser hişê xwe diçe. Bi  
qêra dêya wê gundî li wê kom dibin. Ji derî  
û pencereyan mirov bi mereqdariyê dinêrin.  
Dema Hatun diçe meydana gundî li ber  
mizyeftê disechine.

Diqêre û dibêje "navê min ne qehbe ye, ez  
hatun im!"

Dengên pistepistê vediguhere dengên bilind.  
Dengên bilind dibin qêrîn. Îdî ji Hatunê re ne  
xem bû. Dimeşe, ber bi bayê ve dimeşe. Ber  
bi dawiya qundî, ber bi kendalê ve dimeşe.

Li serê kendalê ba zêdetir dibe. Bêhna  
giyayêñ hişkbûyî û kulîkêñ çolê bi xwe  
re tîne. Demek tê ku Hatun dixwaze bibe  
bayek. Dixwaze bibe beşeka kulîkêñ  
bêhna wan dihat wê, beşek ji kêzik, giyayêñ  
hişkbûyî û çiyayan. Ne dixwest bibe beşek  
ji mirovan lê dixwest bibe beşek ji wê  
xwezayê. Destêñ xwe ber bi herdu aliyan ve  
vedike û xwe bi valahiyê de diberde. Nayê  
bîra wê ku li erda hişk ketiye. Ji ber ku ew  
dibêje qey dema ew diket baya birehm dê  
wê bibe dinyayeka dî, cihekê hizûr lê heyî.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Nivîskar e. helbest, çîrok, roman û xêze romanê wî he ne. Pirtûka wî ya dawîn "Kırlangıç Sokağı" (Kolana Hechecokê) di nav vê mehê de û Pirtûka wî ya yekemîn ya bi navê Sokagın Zûlasi (Helbest), di sala 1989an de hatiye çapkîrin. Romana yekemîn ya bi navê Sîs ve Gece (Mij û Şev) ya ku di sala 1996an de hatiye weşandin û di edebiyata polîsiye de wekî Şâheserekî hatiye pejirandin. Pirtûkêñ wî yên din jî ev in: Kar Kokusu (Bêhna Berfê), Patasana, Kükla, Nînattanın Bileziği (Bazina Nînattayê), İnsan Ruhunun Haritası (Nexşeya Rihê Mirovan), Aşk Köpekliktit (Eşq Küçiktî ye), Beyoğlu Rapsodisi (Rapsodiya Beyoglûyê), Kavim Bab-ı Esrar ve İstanbul Hatırası (Qewm Babê Esrar û Bîreweriya Stenbolê), Başkomser Nevzat (Newzadê Serkomîser), Çiçekçinin Ölümü (Mirina Gulfiroşekî), Tapınak Fahîseleri (Fehîşeyen Perestgehê), Sultanı Öldürmek, Beyoğlunun En Güzel Abisi û Elveda Güzel Vatanım. Di sala 1960an de li Dîlokê ji dayik bûye. Ji ber zext û pêkutîyan sirgunî Erganiya Amedê dibin û li wir perwerdeya xwe ya seretayı û navîn di qedine. Li Zanîngeha Marmarayê Beşa Rêveberiya Giştî dixwîne. Di salen 1985-1986an de li Moskovayê di Akademiya Zanistêñ Civakî de li ser siyasetê perwerdeyê dibîne.

#14 VOLKAN  
AĞIR

NE  
TESEDIF E

52

MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

‘EM’ NE LI WIR BÛN,  
LÊ HEJMARA ‘ME’ ZÊDETIR BÛ

Ji ber wê em hemû bi heman awayî difikirin ku dema golek tê avêtin, gotina herî xweş a bextewariyê tîne zeman a Socrates e: “Na na! Ev ne goleke ji rêzê bû.

Orgazmeke wisa ye ku naqede. Nayê jibîrkirin.”

Hîna Alî Samî Yen nehatibû rûxandin. Ez li trîbuna vekirî ya nû bibûm yekî ji malê. Di maçên Lîga Şampiyonan de ji ber buhayê bilêtan min hêla jêr, di maçên lîgê de jî bi heman hincetê hêla jor tercîh dikir.

Ez û hevalê xwe ê ku gelek caran bi hev  
re dicûn maçan, em li ciyê xwe rûniştin.  
Berê me stûmalên xwe li ba da, paşê me  
slogana “Mîrê civatê tê” avêt, Sirûda Netewî  
xwend û sêbare\*...

Maçê bi rikeberiyeke dijwar dest pê kir.  
Maçeke coşdar e. Em li stada tîma hember  
bûn. Tîma li hember Fenerbahçe bû. Piştî  
demeke diyar me bi hev re dijûn ji tîma  
Fenerbahçeyê re da. Dest li ser milan,  
xencereya me li sînor, qirik li ber qetandinê,  
min his kir ku li trîbunê erd diheje.

Li trîbunê me hemûyan sloganên bi dijûn  
rêz dîkin. Pêşiyê “Ez zarokê Cîmbombomê  
me, çi ji Kanaryayê bikim! N.K.F.V.A.S.\*”  
paşê jî “Nînînînînî Fenerbahçe....  
Nînînînînî Fenerbahçe....”

Di wê demê de bû ku min ji xwe dipirsî, di dema temaşekirina fitbolê de çîma em ji dêya alîgirên tîma hember dîkin. Ew sloganên ku min li jorê behsa wan kir, min hemû jî bi coşeke mezin digotin. Bi wê kîfxwesi û hezkirina mezin a ku di heman demê de, gotina tiştekî bi hev re.

Beşa pêşiyê ya sloganê di rastiyê de  
baş bû: "Ez zarokê Cîmbomê me, çi ji  
Kanaryayê bikim..." Piştî demekê, gava ku  
min beşa din digot, dengê min di qirika min  
de dima. Dema ku li malê min û diya xwe li  
maçan temaşe dikir û min ev tişt dibihîstin,

dengên ku li salonê belav dibûn ji min re  
xerîb dihatin. Li maçê jî êdî zimanê min  
nedigeriya.

Him min nedixwest ez bibim beşek ji wê koma ku rexneyan li wan dikim him jî min di dilê xwe de digot ku “mimkun e sloganêke din bê avêtin!”.

Di lehzeyekê de min xwest ku ji wê sloganaxirab dûr bikevim û weke teqlîda wan dikim min kire pistepist û li maçê temaşe bikim. Ez bi lêdana li milê xwe hatim ser hişê xwe ku amîgoyê li ber caxê li pêşîya me sekinî bû û pişta wî li qada maçê û ji bo avêtina sloganan hatibû erkdar kirin li min dabû: "Weke mîran biqîre kurê min! Ev çi alîgiriye!"

Min bi gotina “CÎMBOMBOMÊ” ew tişt bihurand. Min nedixwest bibêjim û di ser de jî ez bi wî tiştî dihatim tohmetkirin ku “ne mîr im”. Ji ber ku min dijûn li dêya hinekan nekiribû li trîbunê tehde li min hatibû kirin. Min wê gavê fam kir ku heke tu dijûnan nedî, nikarî li trîbunan bijî.

Di navbera maçê de ji bo wê tezahurata ku dijûnan ji dayikê re dike min gotineke cuda nivîsand û min li ser serê hevalê xwe kire minmin: "Keko niha tu jî ez jî dema em bi navê dayikên xwe, derbarê cilûbergên wan henekên bê dijûn dikin jî em hêrs dîbin. Gelo çîma em wan dayikên xwe yênu ku gelekî giringiyê didan wan, dixin nava hevok û çalakiyên gelekî girantir û yê li hemberî xwe hêrs dikin? Dema vî tiştî li min bikin, li te bikin, gelekî diyar e ku em ê hêrs bibin. Kuro mînak, ez şerm dikim sloganâ N.K.F.V.A.Syê\* bavêjim. Dêya min alîgira tîma Fenerê ye, ji ber sloganê gotin ji dêya min re têr. Çîma? Him ew ne parçeyek ji macê ne. Ma nabe ku em rasterast

tiştekî ji bo xirabiya gogvanî bibêjin?  
Mînak em bibêjin, ‘Ez ê lingê te bişkînim,  
Fenerbahçeee!...’

Bersiv gelekî zelal bû: “Tewşomewşo xeber  
nede kuro. Dêya te û pîrika te nahesibin.  
Him ew çiye yaw! Heta bibêje ez ê milê te  
gez bikim...

Ev tişt ji hêla wî hevalê min jî mantiqî  
nehatibû qebûlkirin ku me gelek caran bi  
hev re li maçan temaşe dikir û me nekarîbû  
vê nîqaşê berdewam bikim. Di rastiyê de  
me nû nû 18 saliya xwe bihurandibû û  
mejiyê me nû nû ji ÖSSyê\*\* rizgar bûbû, li  
ser van karan baş kar nedikir.

Cardin heke ku min nekarîbû ev tişt bi  
wî re nîqaş bikiriya min ê çawa karîba  
gelempériya trîbunan biguherta?

Piştî demeke dirêj, digel ku biryareke  
beredayî be jî, min got dibe bi hatina jinan  
a ji bo trîbunê ev rewş biguhere û min  
ew maç bi baldarî temaşe kiribû ku ji ber  
“cezayê trîbunê” bi hezaran jin li şûna  
mêran hatibûn temasékirina wê.

Ti guhertin çênebûbû. Bi hezaran jinan  
dîsa dijûnên zayendî kiribûn û bi yek dengî  
dest bi qîrandinê kiribûn. Encam kambax  
bû. Sûcdar ne jin bûn. Ji ber ku jinan tiştê  
mêran dikirin, dubare dikirin.

Ji ber ku çanda trîbunê ya mêran nahêle  
di wê atmosferê de rewşeke cuda derkeve  
holê û di vê atmosferê de tundiya zayendî  
di gotinan xwe de dide der, jinan jî para xwe  
ji vê standibû. “Em” ne li wir bûn, lê hejmara  
“me” di wê esnayê de zêdetir bû.  
Em ew kesên testosterone wan zêde  
ye, têkiliyeke wekhev di navbera wan  
hormonên serotoninê yên di laşî çêdibe de

datînin ku yek di dema qezenckirina lîstika  
fitbolê de derdikeve holê û ya din jî di dema  
qêrîna têkiliya zayendî de derdikeve holê.

Ji ber wê em hemû bi heman awayî difikirin  
ku dema golek tê avêtin, gotina herî xweş a  
bextewariyê tîne zeman a Socrates e: “Na  
na! Ev ne goleke ji rêzê bû. Orgazmeke wisa  
ye ku naqede. Nayê jibîrkirin.”

Socrates, gogvanê efsanewî yê Tîma Milî  
yê Brezîlyayê di pirtûka bi navê [“Doctor Socrates”](#) a Andrew Downie de bi van  
gotinan behsa çîroka van gotinan dike.  
1982yê di dema Kûpaya Cîhanê de Tîma  
Milî ya Brezîlyayê û Tîma milî ya Yekîtiya  
Komarêن Sosyalîst ên Sovyetan (YKSS) de  
Socrates golekê diavêje û pêşbir dibe yek û  
yek.

Em bi mîraniyeke tepisandî re ji dayik dibin  
û mezin dibin. Hîna jî min fam nekiriye bê  
çîma tê tepisandin, tiştê tê tepisandin çiye?  
Lê dema behsa mîraniya tepisandî tê kirin  
ne tenê behsa çand û trîbunên Tirkîyeyê  
dikin.

31ê Kanûna Pêşiyê ya 2015ê Kolnê di  
dîroka xwe de yek ji sersalêن herî tarî  
derbas kir. Li rawestgeha Trênen ya Esasî de  
li 497 jinan destdirêjiya komelgeyî hat kirin.  
Alîgirêن Hertha Berlînê jî 25ê Çiriya Pêşiyê  
ya 2017ê ji bo rikeberên xwe hêrs bikin  
ew pankart vekirin ku tê de nivîsa “Di şeva  
sersalê bi xwe de jî xwuşkêن we bi tena  
serê xwe dansê dikin” hatibû nivîsin.

Ev mîrani hovîtiyeke wiha ye ku dikare wê  
rewşa travmaya civakî ya ne tenê qasî ya  
Kolnê belê qasî ya Almanyayê mezin e jî  
bike mijara “qerfan”.

6ê Hezîranê ya 2015ê, di dema pêşbirka

Fînalâ Lîga Şampiyonan a di navbera Juventus û Barcelonayê de ez li Santiagoya Şîliyê bûm. Ez û çar hevalên xwe yên mér li heman malê diman. Li gorî saeta Şîliyê pêşbirk saet di 15.45ê de dest pê dikir.

Hekemêm pêşbirkê ji Tirkîyeyê bûn. Yê orteyê Cuneyt Çakir, alîkarên wî Bahattîn Dûran û Tarik Ongûn bû. Hekemên kêlekê Huseyîn Goçek, Bariş Şîmşek û hekemê yedek jî Mûstafa Emre Eyîsoy bû.

Beriya ku pêşbir dest pê bike hevalê min ê malê bang li min kir: "Hekem Tirk e, dema ku ez hêrs bûm, ez ê bi Tirkî dijûnan bikim. Hûn herî zêde ci dibêjin ji hekeman re?"

Em bi wî filmî mezin bûbûn û em wisa hîn bûbûn ku Şevket Altûgî ji mamosneye xwe yê Ingilîzî re digot "Hastîz Pezevenk Osman". Diviya bû ku ez heqê filmî bidayê.

Lê heke ku min hemû tiştên di hişê xwe de bigota, wê sê çar hevalên me yên keç biçûna. Min got ku "Tiştên seksîst bi min nede gotin..." lê li min guhdar nekir. Min got, "Dîsa jî tu li malê bibêjî lê nêzîkî yekî Tirk nebêje. Herê pir 'Hekemê qûnek' tê gotin..." Yek ji wan qadan bû ku min careke din tundkariya zayendî ava kiribû. Min hinekî şert kiribû û ez li ber xwe ketibûm.

Bilêvkirina heceya "qû.." ji bo kesê ji Şîliyê re zehmet bû. Xwest ku ez tiştekî din nîşanî wî bidim. Min got ku "siktir be". Hêsanî bû ji bo wî. Di dema maçê de her gava ku Cuneyt Çakirî li pîspîskê da wî ev dijûn kir û car caran jî hema wisa kir.

Yek ji wan lehzeyan bû ku di demêñ dawiyê de mi herî zêde xwe nebaş his dikir. Kêfa min ji wî tiştî re nehatibû ku min hêvî dikir ku ez wî tiştî biguherînim lê min careke din ew tişt ava dikir.

Niha, ihtimale ku ne ew lehze ne jî wê gotin wê were bîra hevalê min. Ti qiymeta vî tiştî nîne. Giraniya wî tiştî bêhtir bû ku ji ber çanda min a jêr tiştekî din nekarîbû pêşkêşî min bikira ez neçar bûm.

*Têbînî: Ez lêborînê ji hekemên qedirbilind Cuneyt Çakir, Bahattîn Dûran, Tarik Ongûn, Huseyîn Goçek, Bariş Şîmşek û Mustafa Emre Eyîsoyî dixwazim.*

\* N. K. F. V. A. S. : Ez di dêya hemû Feneriyan im.

\*\*ÖSS: Ezmûna hilbijartinê ya xwendekaran, ew ezmûn e ku ji bo xwendekar karibin biçin zanîngehê divê piştî lîseyê bikevin vê ezmûnê.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Ji sala 2006an heta niha nivîskariya blogê dike. Di sala 2008an de di Rojnameya Cûmhûriyetê de li beşa werzişê(spor) dest bi nûçegihaniyê kiriye. Ji wê rojê ve bi piranî nûçegihaniya spore dike. Wekî nûçegihaneke serbest di sala 2014an de Kûpaya Cîhanî ya Brezilyayê û di sala 2015an de jî Copa Amerîca yê ya Şîliyê şopandiye. Ji sala 2011an vir ve jî di Açık Radyoyê de her rojê duşemê bernameyekî bi navê Efektîfpas pêşkêş dike. Di GazeteDûvar de nivîsên heftane dinivîsîne. Di malpera Ozguruz de jî carinan nivîsên sporê, dinivîsîne. Carinan jî nivîsên wî yên derbarê civakî û bûyerên civakî de di medyayêñ cûrbecûr de, têñ weşandin. Ji sala 2016an vir ve li Bajarê Kolna Almanyayê dijî.

#15 ALPER  
HASANOĞLU

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## NE'ILETA MÊRBÛNÊ

Dema mirov bixwaze li ser tûndkariya hemzayendêñ xwe biaxive, gotin li gewriya mirovî asê dimînin.

Ez dixwazim ji vê tespîtê dest bi nivîsîna gotara xwe bikim. "Tûndkariya mîran a li jin, hevzayend û li mîrên ji wan zeiftir. Ne bi tenê tûnkariya wan mîrên desthilatê dixwazin e. Herweha tûndkariya civakê bi xwe ye."

mêrane yê civakê ye.

Aristoteles dibêje: "Bayên ku mirov herî zêde jê ditirsin ew ba ne ku cihêن veşartî yên mirovan tazî vedikin."

Dema ku ez bi serhatiyêن xwe û jiyana xwe li tûndkariya mîran dinêrim wek ez li ber wê bayê dimînim. Dema ku hûn li civakeka pederşah hatibin dinê û hûn bibêjin we tûndkarî li jinan, zarokan û li yên ji xwe zeiftir nekirie, we xwe nas nekiriye.

Lê ez dikarim bi dilekê rihet vê yekê bibêjim ku piştî ez hatim emrekê kamil min bi zanebûnî tûndkarî nekiriye. Heke ez li serhatiyêن xwe binêrim li ber çavêن we rayêxim û yek bi yek hilbijêrim ka dikeve di nav tevgerêن tûndkariyê de dê feydeyê nede ti kesan.

Ew serhatî ew tişt in ku dê digel min, terapîstê min û wijdana min bimîne. Ez difikirim ku tiştên dikevin ser milê min ew in ku divê ez ji ber "qibahetên berê" lêborînê bixwazim û wek profesyonelekî li ser tûndkariya mîran fîkrêن xwe bibêjim.

Li dinyayê di her 17 saniyeyan de carekê tecawiz tê kirin. Nizanim gelo pêwîst e ez tiştekê dî bibêjim.

Dema mirov bixwaze li ser tûndkariya hemzayendêن xwe biaxive, gotin li gewriya mirovî asê dimînin. Ez dixwazim ji vê tespîtê dest bi nivîsîna gotara xwe bikim. "Tûndkariya mîran a li jin, hevzayend û li mîrêن ji wan zeiftir. Ne bi tenê tûnkariya wan mîrêن desthilatê dixwazin e. Herweha tûndkariya civakê bi xwe ye."

Tûndkariya li jinan, encama zeîfiya ruhê

Herbert Marcuse tûndkariya mîran weha pênase dike; ji xwe hewceyîyêن tepeserkirî yên cinsî û hestebarî dîsa têne tepeserkirin. Lê divê em ji bîr nekin ku meydana tûndkariyê çînêن civakê yên paderşah, heteroseksîst û ototrîter çêdikin.

Yek ji mijarêن ku li ser gelek kar tê kirin jî ew e ka gelo bingeha tûndkariyê bîyolojîk e; di hormon û genetîkê de bingeha wê heye. Teoriya femînîsmê ji destpêkê ve hewil dide zayenda biyolojîk û zayenda civakî ji hev cida bike.

Avakirina zayendê bi rastî jî gelek tevlihev e. Di destpêkê de pêvajoyeka welê ye ku fêmkirina wê ne mimkin e.

Zayenda civakî Frankenstein e ku civakê çêkiriye lê zayenda biyolojîk ne welê ye lê ev jî mijara nivîseka dî ye. Ji ber wê li vê derê ez ê bi berê firek cih nedim vê îdiayê.

Min bi tenê notek nivîsî û ez ê mijarê biguherim. Têkiliya zayenda civakî û zayenda biyolojîk ji ber ku gelek tevlihev e divê li ser vê mijarê em gelek hessas bin.

Heke em mijarê ew qasê kêm bibînin ji bo çareserkirina zayenda civakî dest û pêyên me dê bêne girêdan.

Em nikarin rolên zayendî yên Stereotipik nebînin lê gelo her yek ji me ne qurbanê sîstemeka monolîtîk in.

Herweha li gor lêkolînên norobiyojîk hêj nehatiye tespîdkirin ku mela mirovan(nemaze ya mîran) li ser tûndkariyê heye lê hatiye tespîdkirin ku mela wan ji bo hevkarî û alîkariya hevdu heye. Helbet çêdibe ku bê îdiakirin ku ji ber hormonan mîr ji jinan zêdetir mîldarêن tûndkariyê ne.

Lê rastiyek heye ku em nikarin wê biguherin. Ew jî ew e ku mîr di vê civatê de bi rola mîrbûnê hatine mezinkirin. Heke ne li vê civakê bûna gelo dê wekî xwe bûna an na? Ji ber ku ji lêkolînên antropolojiyê em dizanin ku dema mîran bi nêçîr û komkirinê jiyana xwe didomand wan gelek kêm tûndkarî li jinan dikir heta ku em dikarin bibêjin wan tûndkarî li jinan nedikir.

Em mirovan jî wek cûrreyekê heywanan dibînin û li gor wê li hormon û genetîka wan dinêrin. Lê mirov di wan civakan de dijîn ku her dem diguherin û mirov bi xwe jî diguhere.

Hê jî lêkolînên Norolojiyê divê bênekirin û heta niho ew têra em mijarê eşkere bikin bi pêş neketine.

Ji bo tûndkariya mîran dema ku em dibêjin mîran çek çekirin û ew maf li xwe dîtin ku mîrên dî bikujin divê em li bîra xwe bînin ku wê civakê ji bo ew mîr welê bin çawa ew guhertine.

Di guherîna civakî ya mirovan de tûndkarî çawa ji amûreka li derveyê jiyanê ketiye jiyanê?

Mesela divê em bipirsin çîma tûndkarî beşeka perwerdeyê ye lê belê lêdana şaredarekê an jî lêdana alimekê dînî tiştekê ne di rê de ye?

Çi be bila ew be tiştê giring ew e ka civak bi tûndkariyê re têkiliyeka çawa didane. Gelo cival kîjan cûrreyê tûndkariyê tolere dike kîjan cûrreyî qebûl nake?

Hin nivîskarêن femînist (mesela Susan Brownmüller) nêrîna sosyobiyojîk qebûl dikin û diyar dikin ku mîr dema têne dinyayê tûndkarî taybetiyeka derûniya wan e.

Tûndkariya mîran ji ber çîma li piraniya civakan roleka welê heye ku berê civakê diguhere û rewşa civakê diyar dikin?

Têkiliya hemî tûndkariyê kesane bi tûndkariya civakî re heye. Nayê wê wateyê ku nimûneyê cida yên psîkopatolojîk nînin lê ev rîjeyeka gelek biçûk e.

Cûrreyê tûndkariyê yê me eleqedar dike ew cûrre ye ku divê ji ber wan ceza bê dayin lê normal têne dîtin, ew jî şer, tecawiz, birîndarkirin û tûndkariya psîkolojîk e. Ji ber ku tûndkarî ji bo gelek civak û koman wek rîjeyeka çareseriya kêşeyan tê bikarînan, mirov dikare fêm bike ka di civakê de çîma tûndkariya mîran tê qebûlkirin.

Ji aliyê dî ve dewlet jî tûndkariyê wek rîjeyeka çareseriye bi kar dihîne. Yanî rastiyek heye ku tûndkariya polîs dikin û şer li ser paşeroja me tehdîd in.

Dema dewleteka medenî, medenî dibe desthilata xwe bi şikêñandina dewletên dî pêk tîne.

Di civakêndûstrî lê bi pêş ketî de kar bi tûndkariyê têne birêvebirin. Ji ber endûstrîyê maddeyên kîmyayî û radyoaktif li hewayê belav dibe. Dikevin di nav xwarinan de û her kesên dixebeitin û yên naxebitin tesîrê jê dibînin.

Piraniya endamên civakê heta 40-50 saliyê kar dikan, dema ji kar dikevin têne teqawîtkirin. Ev yek tûndkariyek e.

Avahîyêñ bajaran ne bi tenê xweza têk bir, wê hem têkiliya mirovan a bi xwezayê re têk bir hem jî tiştêñ insanî tine kirin.

Divê em ji bîr nekin ku mirov bi kirin û nêrînê hînî tûndkariyê dîbin. Mêrek li kurê xwe dide kur li kûçikê xwe dide. Li gor lêkolînan piraniya wan kesên tûndkarî li jinan kirîn di zarokatiya xwe de rastî tûndkariyê hatine. Ne bi tenê tûndkariya bavan bi tûndkariya dêyan jî zarok guherîne.

Sîstema civakî ji bo tûndkariyê meydanekê vedike. Tûndkarî jî sazîbûna xwe ya ekonomîk û civakîbihêz dike.

Bipêşketina medeniyetê û tûndkariya mîr li jinan dikan bi hev re ne. Civaka paderşahî, desthilateka mîran çêdike ku dibe sebeb rastiya xwezayî û dîrokî têk biçe.

Simone de Beauvoir dibêje mîr di têkiliya xwe ya bi xwezayê re dudil e, ew vê dudiliya xwe li hemberî jinan jî bi kar dînin, mîr jinan wek xwezaya berdest dibînin.

Li gor Simone de Beauvoirî çawa ku xweza

her tiştan dide me lê ji nişkê ve dikare felaketekê rake, jin jî heman tiştan dikan.

“Çarinan hevpeyman in, carinan cijmin.... Jin kaosek in ku jiyan jê derdikeve. Carinan jiyan bi xwe jin û mirin e.”

Tûndkariya ji bo desthilatiyê li xwezayê tê kirin û tûndkariya li jinan tê kirin carinan hevdu temam dikan. Carinan diçin cihêñ hevdu.

Beauvoir dibêje digel ku “mîr digel ku rola duyem dide jinan, dîsa jî agresyon li ser wan e.” Di jiyanarojane de tûndkariya mîran li ser jinan e.

Ev tûndkariya mîran a li jinan, ji ber xwezaya dikare zû bişkê ya wan û hewildaneka ji bo baladestiya mîran a ku ji xwe nîne ye. Mîr welê hest dike ku ji bo ew erkêñ xwe yên polîtîk, civakî û ekonomîk bidomîne di vê di liv û tevgerê de be.

Ji ber ku neçalakbûn zeîfîyê û zeîfî jî jinan teswîr dike. Ji xwe tûndkariya li jinan jî beşek ji wê çalakbûnê ye. Herweha jin bi heyina xwe zeîfî, nazikî, bêwesfiya wan tîne bîra wan, ev cezayek e.

Tecawiz nîşandana mîraniya nazik e. Em dibînin ku mîrên tecawizkirîn di ifadeya xwe de behsa zeîfî, bêdesthilatî, û tirsa ji desthilatê dikan.

Heke jin jî nebin mîr dê xwe li hemberî kê serdest bihesibînin. Di lêkolînaka di salêñ 70yê de hatî kirin de, li ser ifadeya tecawizkaran lêkolînek hatiye kirin. Di hin ifadeyan de axiftinêñ bi vî awayî hene:

“Dema ez xwe û mîrên dî didanim ber hev

ez xwe kêmî wan dibînim. Dilê min ji min dixe. Dema min tecawiz li keseka ji xwe zeiftir kir ez ji wê hestê xelas bûm.”

Di ûfadyeka dî de.

“Ez bawer dikim ku ji daxwazên cinsî zêdetir sebeba tecawizê ew e ku tu dixwazî xwe li cihekê dî bibînî.”

Ev hêrs û tirsa mîran a ku wan bi xwe ferq nekiriye, taybetiyeka nû li çînê wan zêde dike.

Herweha li kargehan tûndkarî li mîran tê kirin û mîr wê di malbatê de telafî dike. Mîr li kargehê ew qasê bêdesthilat e ku hewil dide li malbatê, di dema xwe ya şexsî de hest bike ku ew jiyana xwe kontrol dike. Encama vê yekê tûndkariya safî ya mîran e.

Da ku mîrbûn dewam bike mîr bêrawestan hewceyî wê yekê ne ku bêne erêkirin. Ev erêkirin ya rastî dikare ji tûndkariyê gelek dûr jî be. Ji xwe mîla piraniya mîran ji bo tecawiz, taciz û tûndkariyê nîne.

Di ciwanî an kamilbûna xwe de piraniya me ya kêm carekê ji bo desthilata fîzîkî cûrreyekê tûndkariyê bikarînaye.

Lê belê tûndkarî ji bilî ku kêrî wê yekê tê hesta bêdesthilatiyê zêde dike û îmaja xwe-bûnê xera dike kêrî tiştekê dî nayê.

Di romana Gabriel Garcia Marquezî ya bi navê “Payîza Bavê me yê Serok” de împaratorê ku pîr nabe dema li korîdora dirêj a qerrê dimeşe, pêyên xwe yê werimî bi erdê ve tîne û bêhna siftê belav dibe.

Ew li dinyaya wî teror, qehir û tinebûn lê zêdekirî êdî nikare ti bike. Ew mehkûmê trajedîyekê bûye. Ew mecbûr dimîne ji zindîbûnê dûr, wê bêhnê heta hetayê bikêše.

Ma le’ineteka welê ji bo me mîran jî nîne.

Gelo rîyek nîne ku em ji vê dojeha tûndkariya mîran a me bi xwe çêkirî û hemî sextekariyê bi mîrbûnê ve têkildar xelas bibin ku ew zerereka mezin dide hevzayandan, jinan, zarokan û me bi xwe.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Bijîsk, terapîst û nivîskar e. Xebatêñ xwe yên klînîkê bi ekîba xwe re di navenda ku di sala 2010an de ava kiriyede berdewam dike. Li Zanîngeha Baselê di beşa Psîkiyatriyê de wek dersdêr û li Nexweşaxaneya Dewletê ya Çorlûyê wek bijîskê pratîsyen du sal kar kiriye. Di Fakulteya Tibê ya Cerrahpaşayê de perwerdeya fîzyolojiyê û li Swîsreyê jî li ser Psîkiyatriyê perwerde dîtiye. Di dema ku perwerdeya fîzyolojiyê didît, li ser fîzyolojiya stresê û li ser epîlepsiyê(sara) xebitiye. Weşanxaneya remziyê pirtûkên wî yên bi navê Bir Terapistin Arka Bahçesi (Baxçeyê Paşîn yê Terapîstekî) (2009), Aşkin Hallerî (Rewşêñ Evînê) (2010) û İlişkilerin Günlük Hayatı (Jiyana Rojane ya Têkiliyan) (2013) weşandiye. Di sala 1967an de li Stenbolê ji dayik bûye. Lîseya Meran a Stenbolê qedandiye û ji Zanîngeha Tibê ya Cerrahpaşayê mezûn bûye.

#16 PAKRAT  
ESTUKYAN

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## HIŞMENDİYA DEWLETÊ LI DIJÎ JINAN E

Li gorî çîrokên her sê pirtûkên pîroz, ‘jina ku meyla wê li ser gunehan heye berpirsiyara sereke ya derd û kulên me ye’. Ev tenê jî dikare di tundkariya li ser jinan de derbarê rola olan de nêrînê diyar bike.

Reklama danasînê ya ku Wezarita Malbatê û ya Polîtîkayên Civakî bi van gotinan bi dawî dibe: "Di çanda me de cî ji tundkariya li ser jinê re nîne". Di destpêka reklamê de jî em dibînin ku ji herêmên cuda cuda yên welêt, hevjînên navsere bi halên xwe yên herî yaranî derketine pêşberî kameraye.

Mirovên ji herêmên Behra Reş, Ege, Rojhilatê Anadolûyê, bi cil û bergên xwe yên herêmî û bi devokên xwe weke panaromayeke welêt in. Li ser zimanê mîran hevokên ku pesnên jinan dikin.

Bi kurtasî reklama ku wezaretê amade kiriye, gotinên ku rastiyê berovacî dikin weke rastiyê nîşan dide. Ne tiştê ku dibe, lê tiştê ku divê bibe weke bûye nîşan dide.

Heke ku me qasî misqalê zerre niyetek baş di nava vî karî de dîtiba, dibe ku me dereweke wiha biçük qebûl bikira. Lê ev ji derewa biçük wêdetir gotineke înkarkirinê ye.

Wezareta Malbatê yeka nû li gotinên xwe yên înkarkirinê yên bi rengekî sîstemâtîk zêde dike ku me gelek mînakên bêbingeh û bêbinî yên weke "Misilman qirkirinê nakin" an jî "Leşkerên Tirkan tecawizê nakin"bihîstiye.

Tundkariya li ser jinê rastiyeyeke wiha ye ku li erdnîgariya me, car caran bi destê jinê û bi feraseta jinê tê qebûlkirin, li nava çanda me tê nexşkirin û bi referansên olî re tê zeximkirin.

Ji xwe divê bi giştî ji wê nêrînê neyê cudakirin ku tundkariyê weke tiştekî pîrok dibîne.

Qîmetdana mîraniyê destpêka wê feraseta çewt e ku rê li ber tundkariya jinan vedike. Car caran jî em dibînin ku di encama hiyerarşıya nirxan a ku dayik di nava malbatê de şekl û şemala wê didê de mîr dibin xwedî statûya pêşek.

Zarokên keç di encama terbiyeya malbatê de statuya xwe ya di rêza duyem a di nava civakê de qebûl dikin, ji bo qebûlkirina vê fişar li ser wan tê kirin û di dawiya dawî de bi vî tiştî qayîl dibin û bi vê jî gava pêşiyê ji bo çanda tundkariya jinan diavêjin.

## Rola olan a di tundkariya li ser jinan de

Tiştê gelekî balê dikişîne ew e ku afirêneriya him fizîkî him jî hişmendî ya mîrîn di nava van şert û mercan de têxweyîkirin, li gorî ya jinan kêmtir e.

Li gorî jinan afirêneriya mîran kêmtir e û qadêñ ku karibin xwe ïfade bikin jî hindiktir in. Weke mînak, di jiyana rojane de di nava jiyânê de mîr li dû jinan têñ, lê li qada leşkeriyê ya ku hêza milan berbiçavtir e, derfetê avakirina cîhaneke bêjinan bi destxistin.

Weke wê, di dema ku ji baweriya yezdan û xwedawendê ya di mîtolojiyê de, guhertin ber bi nêrîna xwedayekî razber de çêbû û olêñ semawî ango asîmanî derketin holê jî jinan gelek desketiyêñ xwe winda kirin. Li gel Mûsa, Îsa û Muhammed nebûna figûreke peyxamber a femînen yeksek tê dîtin.

Herweha em di nava şirîkên weke Solomon, Abraham, Pavlûs, Petrus,

Yohanna, Omer, Elî, Ebûbekir, Hesen, Husêن û yên weke wan de jî navê jinan nabînin.

Fîgura Dayika Meryemê jî di rastiyê de ne weke jinan e, lewre weke tê zanîn xwedî afirêneriyekê surrealîst e ku bi bêhnkirina çîçekê ducanî bûye.

Îro jina ku nikare li dêrê derkeve mîhrabê li mizgeftê jî nikare têkeve nava refê nimêjê.

Dîsa, li gorî çîroka afirandinê ya ku di Tewratê de behsa wê kiriye û paşê jî ji hêla Xiristianî û İslamiyetê ve hatiye qebûlkirin, Dêya me Hawwa, ji parsûyê Hezretî Ademî ve hatiye afirandin. Bi ya Şeytanî kiriye û ji rê derketiye û bûye sedem ku binyata mirovan ji bihuştê bê qewirandin.

Bi kurtasî li gorî çîrokên her sê pirtûkên pîroz, 'jina ku meyla wê li ser gunehan heye berpirsiyara sereke ya derd û kulên me ye'. Ev tenê jî dikare di tundkariya li ser jinan de derbarê rola olan de nêrînê diyar bike.

Jin bûn ên ku di nava şert û mercên tarîtiyê yên serdema navîn de bi tohmeta cazûtiyê û sêhrbaziyê dihatin şewitandin. İslamiyet jî bi cezayê recimkirinê jinan dike hedef. Li gorî hiqûqa şerîtetê di çarçoveya nêrîna kisasê de divê destê diz û serê kujer bê jêkirin, kuştina bi îşkenceyê û bi besdariya civakê ji bo jinan qebûl kiriye.

Dema ku Misilman diçin hecê, keviran diavêjin şeytên, di jiyana medenî de jî diavêjin jinan.

Bi giştî, di kiryarêñ ku bi referansên olî hatine avakirin û yên bi "tore"yê jiyana civakî ya mirovan saz dikin de jin biçûk tê

dîtin û mîrbûn tê bilindkirin.

Ev rewşa mîran bilind dike, bi xwe re xwebaweriyekekê ava dike ku ev xwebawerî weke nexweşiyê ye. E rewş jî bi xwe re dijminahiya li hemberî jinan û bi vê ve girêdayî tundkariya jinan ava dike. Ev şêwe tundkarî ji perwerdeya nava malê tê û nikare bi perwerdeya akademîk derbas bibe.

## Derman ji bo me hemûyan Feminîzm e

Heke sîstema ku nirxên tundkariyê ya li hemberî jinan ava dike, ji hêla civakê ve bêyî ku zêde li ser bifikire û qebûl dike, wê gavê nirxên hember jî divê li gorî wî tiştî be ku bêyî zêde li ser bifikire bê çêkirin. Ji bo vê jî divê destpêkê têkoşîn li hemberî înkarkirinê, derewan û xapandinê bê dayin.

Di vê meseleyê de, jinêñ feminîst ji bo alêñ xwe yên mor ên di destêñ wan de bilindtir bikin têkoşîneke bênavber didin.

Qasî tê dîtin, armanca vê têkoşînê ew e ku li hemberî feraseta olî ya hişk, ne ku xweda û xwedawendêñ baweriyan, Hera'yî, Afrodîtê û Anahîdê ji nû ve bike pût, lê bi azadiya jinan re nirxê mirovahiyê bilindtir bike.

Ji ber wê jî tevgera feminîst ne tenê weke tevgereke jinan, lê bi gelempêrî weke tevgereke mirovahiyê were dîtin.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger, Radyovan, Nivîskar û Teknîsyenê Biyokîmyayê ye. Qunciknîvîsê Rojnameya Agosê û Edîtorê malperên Ermenkî ye. Li Parîsê di Radyoya Ayp FMê û li Stenbolê di Radyo Açıkê de bernameyan amade dike. Di heman demê de di rojnameya Ozgurlukçu Demokrasî (Demokrasiya Azadîxwaz) de dinivîsîne. Bi Mîhaîl Vasîlyadîs re, li Artı Tvyê bernameya heftane ya bi navê "Haftanın Hayı Huyu" amade dike. Di pirtûka xwe ya bi navê Hay Hikayeler de, qala jiyana mirovên ji rêzê dike û ev pirtûk di sala 2011an de li weşanxaneya everestê hatiye çapkîrin. Pirtûka wî ya bi navê "Bantukht Yerker" (Stranên Xeribiyê) a ku bi Ermenîkî hatiye nivîsandin di sala 2012an de, li weşanxaneya arasê hatiye weşandin. Di sala 1953an de li Rûmelîhîsarê hatiye dinê. Malbata wî ji komkujiya 1915an xelas bûye û koçberî Stenbolê bûne. nivîskar ji nifşê duwem ya vê malbatê ye. Piştî perwerdeya xwe di dibistanê Ermeniyan de di qedîne, demeke dirêj wek teknîsyenê biyokîmyayê kar kiriye.

#17 SAMİ  
EVREN

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSIN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## BI RASTÎ JÎ NE TESEDIF E KU MÊR JINAN DIKUJIN

Li cihêن şexsî û cihêن civakî li her deran bi awayekê sistematiك tûnkarî li jinan tê kirin û ew têne tacizkirin. Her awayê tûndkariya li wan tê kirin wek tiştekê ji rêzê be tê dîtin. Gelo berpirsiyarîya min a ji bo vê yekê ci ye?

Gelo ci wateya wê heye ku ez jî yek ji wan  
kesan im ku gunehkarên vê mijarê ne?

Me hemiya pistoya spî, cilikên dibistanê yê reş, goreyên rîs û pêlava plastîk hebû.

Dixwazim binê gotinê xwe dax bidim ku gelek giring e mîr pirsa "mîrbûn û tûndkariya mîrbûnê çêkirî" bikin û ez ji vê yekê ditirsim.

Belê ji ber ku ez mîrek im û ditirsim li ser vê mijarê bifikirim, ev rîzenivîs gelek giring e.

Ji ber ku dema ez li ser vê mijarê binivîsim jî divê ji şermezarkirina kuştina jinan cidatir tiştinan bibêjim, tiştinan bikim. Ya rastî divê wan tiştan bikim ku ez xwe ji wan vedîşêrim.

Dibêjim qey ez hewil bidim behsa her tiştan bikim dişibe wê yekê ku xwe li hemberê tazîbûnê biparêzim. Ez dizanim gelek caran dê ev hevok bêne gotin "taliya paşiyê ez jî mîrekê di vê civakê de me" lê ev jî destpêkek e.

Li cihêن şexsî û cihêن civakî li her deran bi awayekê sîstemâtîk tûnkârî li jinan tê kirin û ew têne tacizkirin. Her awayê tûndkariya li wan tê kirin wek tiştekê ji rêzê be tê dîtin. Gelo berpirsiyariya min a ji bo vê yekê ci ye? Gelo ci wateya wê heye ku ez jî yek ji wan kesan im ku gunehkarên vê mijarê ne?

## Nêrînêن kîndarane yên melayî

Min di sala 1965ê de li gundê Sinci yê Karamanê dest bi çûna mektebê kir. Li wê derê bi tenê sefek û dersdarek hebû, rîza pêşiyê sefa yekem, rêzên dî sefêن navê û rîza paşiyê sefa pêncem bûn. Hingê ez heft salî bûm.

Rojên şemiya ji bo bêhnvekirina du rojên dibistan neyî em diçûn stevla Sarilarin Halîlî. Li wê derê pêlîstokên me hebûn ku me pê dilîst.

Ji xwe di rojên Yekşeman de em diçûn nik melayî. Li gundi dema zarokekê/ xitmek[Quran] bixwenda bi pesindarî behsa wî dihat kirin.

Rojekî melayê gundi hat pişt wê stevla ku me lê dilîst. Rasterast bi ser Asyayê de hat, çengê wê girt, ber bi xwe ve kêşa, bi awirêñ tûj lê nêrî û qêri:

"Tê careka dî bi kurikan re nelîzî, tê ji malê dernekevi."

Asya çû. Serê gulberojikan yê wê hewil dida bike teker li wê erdê ma.

## Keç û kur

Asya ti caran besdarî lîstikên me nebû. Ez gelek tisiyabûm û min xwe wek sûcdaran didît. Ahmet welê dixweya ku kêfxweş bû ku bavê wî li hemberî xuşka wî bi wî awayî tevgeriya.

Got: "Min jê re gotibû."

Bi xêra melayê gundi yê ku herî zêde gotina wî qedir e, ez hîn bûm ku keç nikarin bi kuran re bilîzin. Nêrînêن melayî dê ti caran ji ber çavêñ min neçe.

Sal borîn em hatin bajarî êdî ez xwendekarê Dibistana Seretayî ya Gazî Mustafa Kemalî bû. Yek sef û yek dersdarê wê hebû.

Ez bêriya wan dikim: Herî zêde jî bêriya Eyşegulê dikim, peywendiya me bi tenê li ser wê yekê bû ku min lê dida û direvîm.

Piştî salan min bihîst ku Zuleyha û Huseyîn zewicî ne. Huseyîn zarokekî zeîf û hûrik bû. Welê bû tu nanê wî ji destan birevînî dê dengê xwe nekira. Zakatiya Zelîhayê nayê bîra min.

## Manşet; Kuştina ji bo namûsê

Nûçeya diltezin zû belav bû; li gundê me mîrekî jina xwe kuştibû. Huseyînî jina xwe kuştibû. Bavê min di roja duyem de hemî rojnameyên ew nûçe nivîsin anibûn malê. Manşet ev bû: "Kuştina ji bo namûsê."

Ev bûyera ku mirov jê mat dimîne, bi rojan bû mijara axiftinê. Ji min re hat gotin ku malbata Zelîhayê xweyîtiya xwe li termê keça xwe kiriye. Ji bo yekem civîna dadgehê xelk li ber deriyê dadgehê kom bûbûn ez jî li wê derê bûm.

Du Cendirmeyan destê Huseyînî kelepçe kiribû û di navbera xwe de dibirin.

Huseyinê hûrik û zeîf hatibû ser hemdê xwe, hecko ne wî jinak kuştibû. Hecko piştî sinetê ji nû ve "bûbû mîr."

Gelê me gelek hêşedar e. Li dora dadgehê kom bûbû, çepik ji bo Huseynî lê dida.

Qehremanê namûsa xwe xelas kirî paşê "ji ber tehrîkkariya zêde" kêm ceza stand paşê serbest bû. Dema hevala min a zarokatiyê hat kuştin ez zêdetir lê hesiyam ku dîwarên namûsê yê reng—gewr çi ye.

Encam çi ye; Huseyin "qurbanê qederê"

Zelîha "orispi" û bi hezaran Huseyîn jî "bekçîyên namûsê" ne.

## Min bawer dikir ku em dikarin bi sosyalîzmê çareser bikin

Di wan salênu me lîse dixwend de, ji ber rewşa siyasî û civakî min wek mîrekê çepgir hewil dida xwe îspat bikim. Ez tam ketibûm nav mijaran civaka komûnal, civaka paşketî, kapîtalîzm û feodalîzm...

Êdî min fikra Marksîstan nas kiribû û ber bi şoreşgerî û sosyalîzmê ve diçûm.

Dema berxwedana li dijî faşîstan dest pê kir qet min xwe jê veneda ku bibim yê pêşeng. Ji ber ku dirûşma "şehîdên şoreşgeriyê nemir in" di guhê me de olan dida.

## 8ê Adarê

Me ew qasê ji şoreşê bawer dikir ku... Me dîroka 8ê Adarê Roja Jinê Kedkar bi "xuşkên xwe" re dixwend. Her çende xuşka min Sema û dêya min li malê ji bo birayê min û bavê min û min xizmet dikirin jî gihabûm wê qinaetê ku jin û mîr wekhev in.

Her çende min nedidît ka mîr û birayên keçan çi ji wan dike, min dîtibû ka serkarên mîn çi neheqîyan li karmendêñ jin dîkin.

Min digot em ê van hemî tiştan piştî şoreşê çareser bikin. Paşê derbeya 12ê Îlonê pêk hat. Paşê Hevgiriya Sovyetan têk çû.

## Hîn bûm ku nebêjim “wek mîran...”

Di sala 1984ê de piştî ez ji girtîgehê derketim. Min dîsa dest bi karê xwe yê dersdariyê kir. Çêdibe ku ji ber çalakiyên bihara 1989ê be min hin dît ku di têkoşînê de me. Ez pêşiyê di Egit-Derê(Komeleya Perwerdekaran) paşê di Egit-Senê(Sendîkaya Perwerdekaran) de bûm xwediyê roleka sereke. Bi xêra femînistên di sendîkayê de hîn bûm ku dibê [bi zimanê Tirkî] ji jinan re nebêjim “bayan” divê bêjim “kadın.”

Niho jî çarinan bêyî hemdê xwe dibêjim lê hewil didim nebêjim “wek mîran.”

Herçende min hewil da bi vî awayî bi kurdtasî bibêjim jî rastî tam ne ev e.

Di sohbetên bi mîran re ez dijûnên bi hemî rengan didim, sohbetên li ser seksê dikim. Bi tenê di civatêjin tê de hayîn min hay ji xwe heye.

## Kevneperestî

Hewildanek heye ku li rêxistinê civakî yên demokratîk û rêxistinê sivîl rê bide jinan da zêdetir bibin xwediyê postêن birêvebiriyê, cidaxwaziya pozitîf û daxwaza kotatê... ev hemî encama berxwedana jinan e.

Ez dibînim ku ji aliyekê ve jî be hewildanêji bo wekhevbûna jin û mîran heye. Erê ev tişteka erêni ye lê ne ev qasê hêsanî ye.

Kevneperestî ne bi tenê ji bo civaka kevneperest e, ji bo wan kesêñ xwe wek

wekhevîxwaz, azadîxwaz, mafxawazêñ mafêñ mirovan jî heman tişt heye.

Ez bi xwe welê difikirim ku dema zayenda civakî, hişyarîya li ser zayendê, tûndkarî, binpêkirin

Patriyarka û kapîtalîzm li derveyî siyasetê tê hiştin an kêm tê dîtin, we dike ku sîstem xwe dîsa û dîsa nû bike.

## Patriyarka û kapîtalîzm

Ji ber wê yekê kapîtalîzm û çanda wê çêkirî, li gor qinaeta min kêşeya wan mîran e ku di têkoşîna li dijî faşîzmê de xwe tevlî wan bûyerên kesane dixweyîn nakin.

Heke newekheviya zayendî bi tenê li ser têkiliyêñ kesane yên mirovan bihatîya dîtin, karê me mîran dê hêsanîtir biba.

Lê belê tiştên ku dîbin tesîrê li hemîya civatê dikin. Mirov nikare di asta têkiliya di navbera du kesan de bibîne. Heke min bizaniya ferqa di navbera Patriyarka û kapîtalîzmê de ci ye, min ê bikariya di vê kaosê de hişê xwe yê mîrane paqij bikim.

Ez difikirim ku têkoşîna jinan di nav kedkarêñ civatê de têkoşîna herî kêrhatî ye.

## Taciz, mobîng

Ew rêxistinê ku ji bo kedê, xwezayê, mirovan, LGBTIyan diebitin û li dijî mîlîtarîzmê ne, ji bo sendîka û demokrasîyê kar dikin li dijî wan tiştên sîstemê çêkirîn tevdigerin.

Gelek karê mobîngê di nava wan de tê kirin, hewildaneka ji bo veşartina tacizê heye, bi xema ku rêxistin dê teşhîr bibe hewil dide her tiştî di nava rêxistinê de hel bike.

## Hiqûqa di nava rêxistinan de

Halbûkî gelek hêsanî ye. Heke jinek îdia bike ku ew tê tacizkirin divê bi beyana wê bi hiqûqa di nava rêxistinê de kar bê kirin. Divê li kargehê hin tedbîrên welê ji bo jinan bêne standin ku jin zererê ji pêvajoyê nebîne. Di destpêkê de li rêxistineka demokratîk ev têne kirin.

Lê bi vî awayî nabe. Desthilata di nava rêxistinan de dikeve dewrê. Rûyê mîran xwe di ji nûve dîzaynkirina sîyaseta navxweyî de der dike.

Dema em dibînin rêxistineka bi vî rengî di bûyereka taciz/mobîngê de çawa wek dewleteka biçûk tevdigere tirs mirovî digire.

Ji ber serhatiyeka bi vî rengê min li gor hinan bi biryareka “birûmet” li gor hinekan jî “ji bo keç-meçan” min dest ji rêxistina xwe berda.

## Encam

Diana Scully lêkolînek li ser tecawizkarên di girtîgehan de kiriye. Wê îspad kiriye ku kêşe di çanda desthilatxwez ya mîran de ye.

Kurtasî ji bo tûndkariya zayendî nebe divê em xwe biguherin. Belê bi rastî jî ne “tesedif” e ku jin mîran nakujin mîr jinan dikujin.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Dersdêr û Sendîqavan e. Di malpera nûçeyan a Ozgurlukçu Sol (Çepa Azadîxwaz) û malpera BİANETê de, gotaran dinivîse. Di qonaxa 2. û 4em de Seroktiya Giştî ya Konfederasyona Sendîqeyên Kedkaran (KESK) kiriye. Di sala 2010an de hatiye îdîa kirin ku li xebatkareke jin destdirêjî hatiye kirin. Ji ber ku li hemberê vê bûyerê pêvajoya hiqûqî ya saziyê nehatiye destpê kirin, dest ji Seroktiya KESKê ber daye. Di nav avakarên Komeleya Perwerdekaran (Eğit-Der) û Sendîqaya Kedkarên Perwerdehiyê (EĞİT-SEN) de cih girtiye. Wek rêveberê Koma Mamosteyên Şoreşger tevlî xebatê Sendîkayê bûye. Ji bo qedexeya ku li ser Qada Taksîmê ya ji bo pîrozkirina 1ê Gulânê rabe, di nav têkoşîna li dijî qedexeyê de cih girtiye. Pirtûka wî ya bi navê Dîroka Kedkarên Perwerdehiyê (Eğitim Emekçileri Tarihi (Encümen-i Mualliminden Eğitim-Sene), di sala 1995an de hatiye çapkirin.

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN

#18 ALİ KEMAL  
ÇINAR



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## MÊR, MÎNA Û HER WEKİ DIN IN

Bê ji ber çi be lê ya ku tê arzûkirin her jin e. Paşê dîsa li ber dibistanan mêt bi komî li hev didan. Ji ber ku wî li “dawe”ya wî nêriye, wî jî bi “dawe”ya wî re axiviye hwî.

pozê xwe yê di nava xwînê de paqij kiribû.

Mêr bi hev re digerian.

Mêrê ku porê xwe şeh dikir û bêhn bi xwe wer dikirin, mêtren komîk bûn. Lewre xeml karê jinan bû. Bi mêtren ku weke jinan bû, dikenîyan. Divê mêt weke 'mêran' bûna. Divê meran her gavê xwe bidana ispatkirin. Divê mêtaniya xwe nûbikirana. Hin kes hebûn ku yek du hefteyan bêyî mêtâbûna xwe ispat bikin digerian.

Digel ku şemî roja fermî ya serşuştinê bû jî Wî, her ji du sê rojan carekê serê xwe dişuşt. Ji ber wê saetên zû ên sibehê radibû, ji bo ku kes nezanibe di tiwaletê de av li ser laşê xwe dikir. Bêyî ku hayê ti kesan jê çêbike li ber dibistanê li bendê dima.

Mêr ew kes bû ku divê hezkirina xwe nîşanî evîndara xwe neda. "dawe\*"ya herkesan hebû.

Dawe, kesa ku jê tê hezkirin, ya ku tê arzûkirin e.

Bê ji ber ci be lê ya ku tê arzûkirin her jin e. Paşê dîsa li ber dibistanan mêt bi komî li hev didan. Ji ber ku wî li "dawe"ya wî nêriye, wî jî bi "dawe"ya wî re axiviye hwd.

Mêtê yên hwd. in.

Jin nediketin nav van pevcûnan, ji ber ku daweya yekê ji wan jî tune bû. Bi çavekî baş li wê jina ku daweya wê hebû nedînêrîn.

Ew, careke din ketibû wî şerê ispatkirina mêtaniyê. Bêyî ku ti kes wî bibîne dev û

Dema bi şev bi xwe de dimîst, ji bo ku kes pê nehise, radibû çarşefa xwe diguherand û doşeka xwe paqij dikir. Ya jî ji bo ku bi temamî zuha bibe, ji nava livînan dernessike. Ne ew kîlî tenê bû ku ya ku dikete nava fediyê. Di lîteraturê de navê wê erekxiyona sibehê ye. Ji bo ku déya wî ew erekxiyona bi mîzê re çedibû nebîne, bi lez direviya tiwaletê.

Rewşa wî gelekî seyr bû. Ji bo ku xwe kesekî weke xwedîhêz nîşan bide gelek caran rezîl dibû, dikete dewsa qesmeran. Ji xwe re komeke nû û bihêz peyda kiribû. Kî dikete ber wan bi pihênan li wan didan û bi vî awayî diçûn heta dibistanê.

Diçûn wan kafeyan ku mêt û jin bi hev re rûdiniştin. Herkesî li wê keça ku li maseya hember rûniştiye dinêrî û herkes dikete nava xeyalan. Çîrok bi çebûna zarakan diqediya. Malek, odayêni ji hev cida, malênu ku jin lê li rabûn û rûniştina xwe baldar bûn.

Hema hema bavê her malê hebû. Yê wî jî hebû. Hebû lê kê bavtî ji wî re dikir? Bav mêtê asta bilind bû, ew bû ku piştî dewletê dihat. Bav jî weke her bavî bi tenê bû. Dema xwarina xwe dixwar, li televizyonê temaşe dikir, pare dida...

Bav e ku kesê metre di dest de ye û digere. Dîsa bav e ku mesafeya di navbera xwe û kesên li malbatê de di astekê de digire. Heke ku bapîrî bidîta bav ji zarokên xwe hez dike, nêzîkî zarokên xwe dibe, ew bav şermezar dikir.

Bapîr, di nava bav û dewletê de ye.

Bapîrî her mîrê ku nûgîhayî şermezar dikir. Xwegîhandina li gel wî bi metreyê nedibû. Nedibû jî ji xwe. Bav tenê nêzîkî dayikê dibû. Dema ku deng dibihîstin, ji bo neyê zanîn bê hişyar e, bi derewan dikir xirexir. Paşê bavî pê li wan dikir û diçû banyoyê.

Nexwe mîranî tiştekî wiha ye?

Pêlêkirina li jinê bû.

Heke ku hewce bike dikare xwe ji ser hemû kesan çeng bike...Bêyî pêzanînê bavî dersa herî mezin dabû wî. Divê wî jî ispat bikira ku bê çiqas xwendekarekî baş e.

Wê henekên bi destan li keçên polê bikira. Wê li paş keçekê xwe xûz bikira û wê ji hevaledî xwe bixwesta ku wê dahf bide. Heke ku ew nebûya wê porê wan bikişanda. Ev hemû pêşamadekariyên wê tundkariyê bûn ku wê di pêş de bikira.

Yek armanceke wî hebû ku bibe kurê bavê xwe û li gorî bendewariyan tev bigere. Car caran kirîna pêlaveke nû bû armanc. Car caran jî di tiwaleta dibistanê de bi hevalên xwe yên mîr re qedandina cixareyekê. Mînak, libakirina tizbiyê, avêtina lingan a li ser hev, çûna nimêja ïnê.

Yek jî, divê qet li xwişka hevalê xwe nenêriya. Ya herî zehmet jî ev bû. Têkiliyeke wî ya baş bi keçên polê re tune

bû, lê bi xwişkê re têkiliya wî baş bû.

“Merheba, Ehmet li malê ye? Hûn dikarin bibêjin ku Ew hatiye”.

Xwişkê car caran temam digot. Têkiliya wan her roja ku diço baştıribû. “Temam, ez ê bang lê bikim.” Wî car caran xwe nedigirt û digot “Temam, ez ê li bendê bim”. Hindik mabû ku wê bi jinekê re bûbuya heval. Heke ku bi birayê wê re navbera wan xirab nebûya. Heke ku bi bira nedaba hiskirin ku têkiliya wî û xwişkê her roja ku diçe baştıribû.

Ji ber vê rewşê, dawe bi dawî dibû, wî serî hildida. Li hemberî dê û bav û hewce bikira li hemberî dewletê.

Wî dewlet bi rengekî cidî cara pêşiyê bi vî awayî nas kir.

Nîvê şevê ci dikeve ber destê wî vexwaribû. Weke har bûbe li kolanan geriya bû. Dema ku pêrgî polisan hatibû, bêyî ku bizanibe ci bûye, çavêن xwe li qereqolê vekiribû. Heta destê sibehê hemû rewşen mîraniyê yên di lîteraturê de hene, xistibûn mejiyê wî.

Dîsa ya ku bi ser ketibu, mîranî bû.

Li her deverê fêrî mîraniyê bûbû. Xwe gelekî bi şens didît.

Niha ji zarokên taxê re behsa xwe dike.

Bi wan kesên ku dişibe xwe re radibe û rûdine, dijûnan ji her kesî re dike. Her bi hev re tevdigerin, ji ber ku divê mîr bi hev re bigerin, lê jin her tenê bin.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Senarîst û Derhêner e. Niha jî li bajarê ku lê dayik bûye, li Amedê dijî û fîlman çêdike. Di sala 2004an de yekem kurtefîlma xwe çekiriye. Bi giştî senarîst û derhênerên 10 kurtefîlman e. di sala 2013an de yekem fîlma metrajdirêja bi nave Kurtefîlm çekiriye. Di 2015an de filma ku bi navê Gîzlî (veşartî) kişandiye û f di Festîvala Fîlmên Stenbolê ya îfê de xelata herî baş ya SÎYADê stendiye. Di 28em Festîvala Fîlmên Kuira Hamburgê de xelata jûriye wergirtiye. Di sala 2017an de 3em fîlma metrajdirêja bi nave Genco çekiriye û di 28em Festîvala Fîlmên Navnetewî ya Enqereyê de bi fîlma herî baş hatiye hilbijardin.

#19 İRFAN  
DEĞİRMENÇİ

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## PARASTINA MIN LI PÊVEKÊ YE

Nivîskarekê mêt, bi tenê nivîskarek e lê dema jin be wek nivîskara jin tê binavkirin. Nayê gotin rojnamegerê mêt lê bi taybetî behsa jinbûna rojnamegerên jin tê kirin.

Li min biborin. Heke hûn mîrek bin ku ji we bê pirsîn “52 hefteyan, 52 mîr dê li ser tûndkariya mîr li jinan dîkin dê binivîsin, gelo tu jî dixwazî bibî yek ji wan mîran” dema hûn rûniştin pêşberê klavyeyê divê yekem hevoka we “li min biborin” be.

Li min biborin, bêyî ku bibêjim lê û lê belê, li min biborin. Lêborîneka bi dengekê kêm û sûcdariyê. Bi soza “ez ê careka dî nekim” bi awayekê semimî divê bê gotin.

Nivîskarekê mîr, bi tenê nivîskarek e lê dema jin be wek nivîskara jin tê binavkirin. Nayê gotin rojnamegerê mîr lê bi taybetî behsa jinbûna rojnamegerên jin tê kirin.

Tê gotin “de rûne û wek mîran binivîse” lê piraniya caran ez wek jinan dinivîsim. Ez hewil didim xwe bikim şûna wan kesan de ku li ser wan dinivîsim. Mesela ez niho xwe bikim şûna delalîka Michelle.

Michelle di sala 1999ê de dema 24 salî bûye hatiye Stenbolê. Ew rojnamegerekê gelek xweşlaw bûye. Dema ew li rojnameyeka li Izmirê dixebeitî xelkê bi tiliyan ew nîşanî hev kirine. Ew ji rojnameya lê dixebeitî hatiye avêtin û poşman e ku wî nameya xwe neparastiye.

Di nameyê de hatiye nivîsin dema ew çûyîn nûçeçêkirinê ji we ve wî şifîrê tirimbêla rojnameyê taciz kiriye. Hima kel û pelên xwe li çenteyê xwe kom kiriye û ketiye ser rîya Stenbolê. Li gor hevpeyvîna di sala 2013ê de Çîçek Tahaoglûyê ji bo bianetê bi wê re kiriye wê gotiye ew kurikê xweşlaw hingê li wê derê miriye, keseka bi navê Michelle Demishevich hatiye dinyayê.

Ew paşnaavê wê ji xwe re hilbijartiye ji xwe paşnavê malbata wê ye ku ji beriya ji Makedonyayê bar bikin wan ew paşnav hebûye. Ka vêca bisekinin.

Dema ez xwe bikim di şûna Michelleyê de gelo min ê bixwestiya piştî salan behsa wî xweşlawê berê bê kirin. No, wê di hevpeyvîna xwe de gotibe “ew miriye” hngê ew miriye.

Mivhelle li Stenbolê bû yekem nûçegihana trans. Herî dawiyê li IMC TVyê dixebeitî. Dema ku wê li caddeya Îstiklalê hewil dabû ji Sûmeyye Erdogan a keça serokwezirê hingê Recep Tayyîp Erdoganî pirsên xwe bipirse, polîsên parastinê tûndkarî li wê kiribû û bînerên ji rêzê yên bala wan ne gelek li ser televizyonan e jî ew nas kiribû.

Em cara pêşyê hingê bi wê re axivîn. Paşê min bala xwe da ser nûçeyên wê. Li IMC TV ya ku bûbû dengê “ew kesên dî” û hatiye girtin jî di roja pêşiyê ya xebatê de ew bi giriye xwe ve vegeriyaye mala xwe.

Li kargeha ku navenda televizyonê lê bû gelek kesan li cihê cixarekişandinê an jî li xweringehê Mihaelle nîşannî hev kirine ku tîktîk lê keniyane, karmendêñ parastinê yên taybet jî digel ku ew nas dikirin jî her car ew sekinandine û çûnûhatina wê zehmet kirine.

Michelleyê gotibû ka çawa di kongreyên bi rojnamegeran re dema wê pirsên xwe dikirin yên pirs jê dihatin kirin xwe nebihîstî dikirin û çawa hevpîşeyên wê jî xwe ji wê vedidan.

Hima bêje dibihîsim hûn dibêjin "dema ev tişt qewimîn te çi kir?" Min hewil da li nava medyaya navendî de, ji bo nûçeyên giştî li Kanal Dyê bi wê nûçegihana jêhatî re bixebitim.

Ew hewceyî nûçegihanekê bûn ku pirsên xwe bi wêrekane bipirse, şev û roj li pey nûçeyan bibeze. Tam niho divê lêborînê ji te bixwazim Michelle. Ji ber ku ji beriya bi serkaran re biaxivim, bi kelecanê vê fîkrê min ji te re got û hêvîyek li nik te çêkir.

Pêşiyê min nezanî meseleyê ji kê re bibêjim, paşê min got ez ê ji yên herî jorî re bibêjim. Ew destê rastê yê patronan bû. Li ser mijarêن ceribandinêن mîrbûnê yên piştî şêst saliyê dînîvîsî. Bi pantorê xwe yê pembe/sûf bi ser tabûyan de diçû. Qunciknivîskarek bû ku ji bo vê daxwazê bikim gelek baş dixweya. Min jî welê kir ji bo tu kar bikî min alîkarî ji qunciknivîskarî xwest. Bersiva "begê me" ez jî hêvîşkestî kirim.

Dema min behsa tercîha te ya zayendî kir, got: "Ne we be, patron ji wan gelek aciz dibe. Heke bibîne jî dê tehemmil neke. vê ji bîr bike." Paşê wî ez hişyar kirim û got ji ti kesan re jî nebêje.

Min nekarî karî ji te re çêkim. Li min bibore.

Loi vî welatî li mijarêن tûndkariyê jî behsa wan kesen trans nayê kirin. Heke karkereka seksê hatibe kuştin, ji xwe ji

ber ku ew li pey qebahetekê bûye ji ber wê hatiye kuştin... Zaro zêçen her kesan hebû û heke mirovên trans di nava rojê de bihatiya dîtin jî sûc bû.

Civak gelekê durû bû. Sibeyê ji bo lîncikirinê şevê ji bo sekskirinê diçûn ber deriyê transan. Cara paşiyê min û Michelleyê li taxa Denizkoşklerê ya navçeya Avcilarê [ya Stenbolê] hev dîtibû.

Piştî erdhêja sala 1999ê gelek xanîyan zererekâ mezin dît. Hin xanî hatin serastkirin. Ew kesen li cihê dî nekarîn stara xwe bikin xwe li wê derê sitirandibûn. Trans çûne wê derê.

Hinek ji wan xwediyyêن xaniyan bûn, hinek jî kirêdar bûn. Piştî nûçegihanekê nûçeyek çêkir. Xelkê taxê bi bizotiyêن xwe ve çûn ber deriyê transan û ji wan re gotin: "An derbikevin an jî em ê me bi saxî bişewitînin." Taciz û tehdîtkarî ji heddê tehêmilê borîbûn.

di nav wan kesen ku mirovên trans tehdît dikirin de jinek jî hebû. Wê destê zarokê xwe girtibû û sirreka mîran negotî got:

"Niho taxa me dê bê nûkirin, xaniyen me dê bihatir bibin lê ji ber van transan ti kes dê nekirin."

Min û Michelleyê li wê taxê hevdu dît. Ji ber ku min kar jê re çênekiribû ji min nexeyidî bû. Hem ew şev 15ê Tîrmeha 2016ê bû. Em çûbûn daweta hevkarekê xwe. Li Avcilarê li mîrgekê dawet dihat kirin.

Li twîtterê hin peuyam hatibûn belavkirin. Dihat gotin derbe hatiye kirin. Em mîr digel jinan ji dawetê westiyan û ketin ser

rêyan. Me ne zanî ka çi çêbûye. Da şarja telefonên me hemiyan xelas nebe. Me biryar da ku em ê bi dorê Twîterê vekirin.

Komeka hêsbûyî ber bi me ve dihat. Hinek jinê di koma me de xwe ji bo dawetê xemilandibûn û etekêن kurt li xwe kiribûn. Wê komê got "90 sal in ti nema we neanî serê me. Hûn gihan dawiya emrê xwe." Dema em bi taxa Denizkuşklerê re borîn kesekê ji şaneşîna xwe banî me kir.

"Derve tevlihev e, werin jorê. Yek du mîvanêن keçikêن me hene heke hûn jê aciz nebin werin li vê derê hinekê bêhna xwe vekin."

Ew kesa bakırî Michaelle bû. Wek di tofanekê de çikilekê zeytûnan dirêjî me kir.

Tesedifek bû ku gelek kêm tê dîtin.

Michelle niho li Almanyayê karê xwe yê rojnamegeriyê dike. Bêguman hûn bi vê nivîsê ne li bendê ne ku ez pêşniyaran li we bikim.

Li Stenbolê piştî ku min ji bo pêşkêsiyek kir ku dahatên wê ji bo saziyeka civakî bû, seroka Platforma Em ê Jinkuijî bisekinînin, Gusûm Kavê ji min re gotibû ew spas dike ku wek mîrekê min şîret li jinan nekirin.

Min hingê biryar da bila şîretên min ji min re bin. Jin kengê bixwazin ez ê li nik wan bim. Ez ê bi xwestina lêborînê dest bi wê bikim.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Xebatkarê televîzyonê, Nivîskar û Lîstikvan e. Dema li Zanîngeha Enqereyê di beşa rojnamegeriyê de xwendekar bû, di televîzyonan de dest bi kar kiribû. Li Enqereyê di buroyê televîzyonên Atv, Star, CNNTurk û Kanal Dyê de 10 salan nûçeyên jîyanê çekiriye û çîrokêن hatiye jîyandan kiriye nûçe. Di salên 2006-2017an de, li Fox TV û Kanal D ye nûçeyên sibehê amade û pêşkeş kiriye. Di sala 2017an de ji ber ku liser hesabê xwe yê twîterê gotiye ezê di referandûmê de dengê "Na" bikarbînim, ji aliyê Dogan Holdîngê ve ji kar hatiye derxistin. Du romanên wî yên bi nave Bir Uyuyup Uyanalîm û Herlanda hene. Di sala 1977an de li Enqereyê hatiye dine.

#20 MEHMET  
AÇAR

NE  
TESEDİF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TUNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## RAPÊÇA TUNDKARIYÊ

Temaşekirina belgefîlman a derbarê prîmatan ên ji ber testosterone tundkariyê dikin, dibe ku ji bo hemû mîran baş be. Dibe wê gavê em bifîkirin ku divê ferq û cewaziyeke mirovan hebe û em bibêjin “tekamul şert e!”.

Nayê hişê min ku di filmekî de yan di sitcomekê de temaşe kiribû? Tiştê ku tê hişê min, zanyareke civakî bû a ku behsê kiribû. Hevok wiha bû: "Heke ku hûn bi rastî jî dixwazin zilaman fam bikin, ez pêşniyar dikim ku li belgefîlmên prîmatan temaşe bikin".

Di serî de gelekî kenê min anî. Paşê dema ku ez rastî belgefîlmên bi wî awayî dihatim min dest bi temaşekirina wan kir. Min dît ku di nêrîna xwe de ne zêde neheq e... Bi taybetî têkiliya di navbera testosterone û tundkariyê ya prîmatan de mirov serwext dikir.

Di zarotiya min de kutek ango lêdan yek ji parçeyên perwerdeya zarakan bû li mal û dibistanê. Zarotî û ciwantî serdemekte wiha ye ku heke hûn rastî tundkariyê neyên jî hûn bi zimanê tundkariyê dijîn...

Hi her devera jiyanê de...

Li dijî zordestan heke hewce bike, divê yên baş jî zilaman bikutînin. Li tax û dibistanê hevsengiyan di navbera zilaman da an bi tundkariyê yan jî bi zimanê tundkariyê dihat avakirin. Zanîna pevçûnê û hînbûna parastinê şert bû. Ez di wê baweriyê de me ku niha jî ev rewş ne gelekî cuda ye.

Heke ku pirsgirêk "li mîraniya ku hatiye hînkîrin an jî hînbûn" diqede, gelo dibe her tişt têkildarî malbatê be? Ez ne di wê baweriyê de me? Mînak li lîseya mîran a bi şevborîn a ku min lê xwend, polêن bilind bi lêdanê polêن jêr ceza dikirin û ev jî weke kevneşopiyê bû.

Mamosteyan nekarîbûn çipiskek jî li

xwendekaran bidana lê tundkariya polêن bilind, yek ji hêmanêن jêneger ên jiyana dibistanê bû.

Di jiyana min a lîseyê de yekî ji min mezintir çavê xwe bera pareyê min dabû û şimaqek li min dabû. Ji bilî vê bûyerê tu bîranîneke min a gelekî xirab a derbarê tundrakiyê de nîne. Ez wan lêdanê bi dorê li me hemûyan didan nahesibînim ku bibûn parçeyek ji rêzê ya jiyana me ya rojane. Ew parçeyek ji kevneşopiyê bûn. Ji xwe me ji gelek "Kekê etutê" yên ku li me didan hez dikir. Ew kekênu ku neçar bûn vê kevneşopiyâ lêdanê berdewam bikirana.

Henek li hêlekê, li dibistanê zordestiyêن gelekê mezin nebûn. Heke ku hûn sedema wê bipirsin, zordest di tırsıyan ku em giliyên wan li gel yekê din bikin. Gilîkirina li gel rîveberiya dibistanê ya ji ber lêdanê ya yên ji me mezintir, ango gelacî súcekî herî mezin bû ku ti kes nedifikirî bikira.

Bi giştî, yên mezin li kesên di polêن berjêrtir nedidan. Lê di her şert û mercan de rîzikîn nenivîskî yên dibistanê hebûn û ev rîzik bi gefa tundiyê dihat pêkanîn.

Ez mînakekê bidim; di sala me ya pêşiyê de li dibistanê me û keçan bi hev re dixwend. Li dibistanê tenê keçen ku ji me mezintir hebûn. Mîrên ji me mezintir li dibistaneke din bûn.

Ji bo ku pîr û pergala li dibistanê ava bikin û desthilatê li ser me bidin rûniştandin keçen ji me mezintir digotin, "Em ê navê wan kesên li hemberî rîzikan derkevin bidin ên ji we mezintir, hûnê jî sala pêş lêdana xwe bixwin". Helbet me jî li wan guhdar dikir... Di encamê de, wê sala pêşiyê li dibistanê tiştên ku keçen ji me

meztir dixwest pêk hat.

Beriya 12ê Îlonê ya 1980yî rêexistinê siyasî yên çepgir, ji 1978ê û pê de dawî li tundkariya pola bilind a li dibistanê anîbûn lê wan jî di nava xwe de şer kiribû, lêdana gelacan û kesên ku dixwestin boykotê ji holê rakin tê de ji tundkariyê û zimanê tundkariyê nekarîbûn xwe dûr bixin. Hewce nake ku ez bibêjim piştî 1980yî kevneşopiya lêdana kesên ji me meztir dest pê kiriye.

Bi rastî jî li wê dibistanê min gelekî kêf kir, rojê min ên gelekî xweş çêbûn lê helbet van tiştan ew rastî neguhert ku pergala lêdanê parçeyek ji jiyana min e.

Dema ez ji lîseya mîran çûm zanîngehê min ferqa di navberê de yekser dît. Ji ber ku lir keç hebûn û dereng be jî di jiyana min de serdemeke şarmend û sivîl dest pê kiribû.

Ez gelek mîran nas dikim ku ji pevçûnê û şerkirinê hez dikan. Bi piranê mirovên baş in. Zordestiyê li ser kesî nakin, lawazan diparêzin. Heta hin ji wan ji bo parastina wan kesan li bende fersendekê ne. Gelek ji me bûne şahid ku mîrên destdirêjî li jineke di otobusê de kiriye, ji mîrekî din lêdan xwariye. Mînakên derbarê "tundrakiya ku dikare bê qebûlkirin" dikarin bêz zêdekirin.

Ez dixwazim bêm ser wê mijarê; car caran li bal başan car caran li bal xiraban bin jî tundkariya mîran, zimanê darê zorê li her qada jiyanê destdihalat e. Ev tişt cureyek ji rapêja tundkariyê ye.

Ew rapêç weke enerjiyê ye. Kêşeya esasî ew e ku, hemû mîr jî ji heman enerjiyê xweyî dîbin ku bêyî ferq û cewaziyê

têxin navberê, li jin û mîran didin û jin û mîran wan dikujin. Heta ku ev enerjiya vê tundkariyê derdixe holê neyê tunekirin, kêşe ti carî naqede.

Ne gelekî zehmet e ku mîrek ji rapêça tundkariyê ya ku her aliyê civakê dorpêç kiriye û testosterone di laşê xwe de kontrol bike.

Gelek mîr dikarin vî tiştî bikin. Lê heke têkiliya di navbera "mîrê ku ew pê hatiye hînkirin" û tundkariyê de çiqas bi hêz be, derketina ji nava wê rapêçê jî zehmetir dibe.

Mîrê ku li dijderketina tundkariyê weke lawaziyê, tirsê û şikestbûnê dibîne, heta hetayê wê di nava wê rapêçê de bijî. Neçar e ku tê de bijî.

Lewre, fikra ku dibêje tundkariya mîran û darê zorê hewce ye, toreke nayê dîtin a ku hemû civak rapêç kiriye. Kêşeya esasî ew e ku gelek mirov vî tiştî xwezayî dibînin û wisa difikirin ku ev ne gelekî bi zerar e.

**Temaşekirina belgefîlman a derbarê prîmatan** ên ji ber testosterone tundkariyê dikan, dibe ku ji bo hemû mîran baş be. Dibe wê gavê em bifikirin ku divê ferq û cewaziyeyeke mirovan hebe û em bibêjin "tekamul şert e!".

An jî em dikarin hemû sistema perwerdeyê, di çarçoveya ji holê rakirina tundkariya mîran û darê zorê de ji nû ve saz bikin... Lê li cîhana ku 'hêz li her devera jiyanê tê wateya her tiştî ye' ev bêguman ne tiştekî hêsan e.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rexnegirê Sînemayê, Rojnameger, Çîroknivîs û Romannivîs e. Rexnegirê Sînemayê yê rojnameya Haberturkê ye. Ji 1989an vir de rexneyên li ser fîlma dînivîse. Berpirsiyariya weşanê ya Kovara Dîgîturk û Sînemayê kiriye. Dema lîse û Zanîngeh dixwend bi şanoya amator ve mijûl bûye. Berhemên Shakespeare, Brecht, Beckett, Ionesco, Haldûn Taner û Max Frischî anîbû ser dike. Ji pirtûkekê Kafka senaryoya şanoyekê amade kiriye. Li piştî zanîngehê di şîrketa bi navê VTRyê de wekî asîstanê rejî kar kiriye. Nivîskarê pirtûkên bi navê "Anarşik Rehavet" (1998), "Siyah Hatıralar Denizi" (2000), "Hayatın Anlamı ya da Akhisarlı Hasan Tütün'ün Maceraları" (2005) ve "Kayıp Hasta (2017) ye. Di sala 1963yan de li Konyayê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Stenbolê û İzmîrê qedandiye. Amadehî Lîseya Galatasarayê temam kiriye. Li Zanîngeha Bogazîciyê beşa Edebiyata Ingilîzî qedandiye.

#21 MENDERES  
SAMANCILAR

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## BIHEŞTA DEREWÎN

Her meh miheqeq jineka li pavyonê kar dike xwe ji pirê diavêt an jî dihat kuştin. Mêran bi zorê jin li pavyonê didan xebitandin û heman mîran navê “jinên pavyonan” li wan kiribû.

Me dibihîst ku bûka maleka li taxa paşiyê, Mayayê xwe hilawêstiye.

Dibêjim qey dema ez hîn bûm ku piştî şerê navmalbatî jin û keç lêdanê dixwin ez 5-6 salî bûm. Min nedizanî ka ji ber çi ev şer tê kirin û min merea jî nedikir.

Her ku mezin dibûm min ferq dikir ka ji ber çi lêdana navmalbatî heye û sebebên wê yên bêwate çi ne. Serkêşa wan sebeban azadiya ramanê bû. Biheşt li bin pêyên mîran bû lê divîya hemî fîkrêwan û her gava ew diavêjin bi biryara mîran ba.

Qasî ku min didît hem cîranêñ dihatin mala me hem jî xizm û mirovên me di heman rewşê de bûn. Carinan rûyê hinekan şîn-û-reş dibû. Carinan min didît ku destê hinekan şikestî bû. Ji bo wan kesên ev rewş dîtin û bihîstîn ev rewş gelek ji rêzê bû.

“Ma çi ye mîrê wê lê daye.”

Min ev gotin ji mîran zêdetir ji jinan dibihîst nemaze ji yên pîr û kal.

“Keça min mîrê te ye hem dê li te bide hem jî ji te hez bike. Zimanê xwe gez bike, rûne ser dûvê xwe.”

Hingê wek niho jin nedihatın kuştin an jî me nedibihîst. Wek niho rîyêñ ragihandinê nebûn du sê kolaneyan dûrî me hinek bîhatiyan kuştin me yê piştî mehan bibihîsta an me qet jî nedibihîst.

Me herî zêde dibihîst ku jinan an jî zarokêñ keç xwe kuştine. Herî hêsanî bi werîsekê xwe dikuştin. Werîsek dihat hilavistin û wan bi xwe xwe pê dihilawêstin.

Kesên li taxê diçûn ew kesê xwe kuştî didîtin, ew kesên çûyîn û neçûyîn bi hev re dikirin hawar û qêrîn.

Dema keçek evîndar dibû divîya wê veşarta. Heke bav an birayê wê bizaniya an jî heke kesekê ji dûr ve xizmê wan jî bibihîsta bi ihtimaleka ji sedî heştî ew dikuştin.

Ji beriya ku biçim xerîbîyê çîroka ez şahid bûm çîroka Sunaya heşdehsalî bû.

Sumayê hej kesekî kiriye, malbata wê, wê nadin wî. Ew xwe ji pira Taşê diavêşe çemê Seyhanê. Termê wê piştî sê rojan hatiye dîtin. Heke hemî buyerên kuştinê mirina Sunayê jî hat jibîrkirin.

Bêhna termê miriyan li Çukurovayê belav dibû. Piraniya jinêñ dihatin kuştin ew jin bûn ku li pawyonan kar dikirin.

Rewşa Edeneyê diyar e. Li Tirkîyeyê pavyon, sînemayêñ havînî û qehwexane herî zêde li wê derê ne. Piraniya pawyonêñ li bajarî li rex çemî ne.

Li nêzîkî pawyonan pira hêsinî ya fransîyan çêkirî heye. Ew trênen diçin rojhilatî û rçwî bi ser re diçûn. Niho jî ew seref wek berê têne kirin. Taha me hima bêje li hemberê pirê bû.

Ji ber ku gelek kes bi taxa me re diçûn pavyonan, me ji beriya her kesan agahiyêni li ser pavyonan distandin.

Her meh miheqeq jineka li pawyonê kar dike xwe ji pirê diavêt an jî dihat kuştin. Mêran bi zorê jin li pavyonê didan xebitandin û heman mîran navê “jinêni pavyonan” li wan kiribû.

Sohbetên mîran jî her dişibîyan hev: Ew jin ji pirê avêtîne. Ê wê jî xeletî li maseyê rexêkiriye.

Gelek sohbetên bi vî rengî têne kirin her mîr yê biheq e. Heta ku wan ji jinan re gotiye “neke xwe li min nede kuştin...” Ev çîrok piştî demekê kurt di bin ronahiyêni melûl ên pawyonê divemirin.

Şevezê ez li kolanêni dûrî caddeya sereke dimeşiyam. Qêrîna jinekê dilê mirovan dişewiyand, erd dihêjand. Hewa gelek sar bû, wê cilikekê tenik kiribû ber xwe, rexa cilikê wê diriyabû. Diqêriya:

“Erê em orispî ne lê ji ber ku hûn bûne pêzeweng û we karê orispîtiyê çekiriye em orispî ne. Ma em bi vî halî jidayik bûne. Bêşerefno we em xistine vî halî.”

Dema min ev qêrîn bihîst jinêni li pavyona Edeneyê û bêçaretiya wan hat ber çavê min ber dilê min...



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Lîstikvanê filman e. Helbest, stran, senaryo û çîrokan dînivîse. Bi fîlma Înce Memed dest bi karê sînemayê kiriye. Yilmaz Duru derhênerê wê fîlma destpêkê bûye. Di van filman de lîstiye: "Kara Çarşaflı Gelin (Bûka Çarşef-Res)", "Sis (Mij)", "Zîkkimin Kökü (Quzzilqurt)", "Dönersen İslîk Çal (Tu Vegerî Fîzan Bide)", "Soğuk Geceler (Şevê Sar)", "Bereketli Topraklar Üzerinde (Li Ser Axên Bi Bereket)." Sê caran xelata lîstikvanê herî baş standiye (Zîkkimin Kökü-1993 Çîçeloka Zêrîn, Babamın Kanatları- 2016 Komeleya Nivîskarên sînemayê). Di gelek fîlmên navneteweyî de lîstiye. Sala 1954ê hatiye dinê.

Kurê herî biçûk ê malbatekê ye ku wê malbatê 8 zarok hene.

#22 BARIŞ  
ÜNLÜ

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# CÎHANA HIZIRKIRİNÊ Û MÊRBÛN

“Dema jin bi hêz dibin, azad dibin, xweser dibin, ji  
şêweyê bikaranîna laş bigirin heta xweîfadekirina wan  
a bi gotinan bixwebaweriya wan zêde dibe, dema bêhtir  
dikevin nava cîhana karî û rikberiya wan bi mîran re  
zêde dibe, dema hejmareke zêde mîran diguherînin û  
“mîrên nû” ji wan diafirînin...”

Demeke dirêje ez di nava cîhaneke wiha de dijîm ku em dikarin jê re bibêjin cîhana fîkr û ramanê. Ev cîhan ji akademisyen û entelektuelan pêk tê. Armanca min a ji gotina cîhana fîkr û ramanê ew e ku li vê cîhanê fîkr û raman bi xwe nirxeke û heta armanc e ke.

Çavlirêye ku kesê bikeve nava vê cîhanê xebata fîkr û ramanê bixe navenda jiyana xwe û baweriyê bi hêza ravekirin û veguherîneriya ramanê bîne. Ev jî tê wê wateyê ku, divê sînorêñ ramana xwe her gav fireh û kûr bike, hewl bide astengên li ber ramanê derbas bike û hewceyî çêbibe di ber ramanê de –ji ber ku raman ji bo wî/wê tiştekî cidî ye- li bendeyî rîskêñ kifş be.

Mirov dikare li hemberî vê nêrînê bibêje ku, cîhaneke wiha di rastiyê de nîne, ti kes di nava jiyanekê hîzrî ya xwerû de najî, tevgera hîzrî her gavê piştî tevger û metirsiyên din tê û kesên di ber pêşxistina fîkrêñ xwe de rîskan didin ber çavan li her derê û her gavê hindik in.

Her weha dibe ku bê gotin, tevgera hîzrî bi xwe di nava dîwarêñ hundirîn de çêdibe, yanî fîkr û ramana kesê di nava tevgera hîzrî de ye bêyî ku haya wî/wê jê hebe, ji hêla sînorêñ hisî, çînî, olî, zayendî û etnîk ve tê sînordarkirin.

Lê cîhana hîzrî ya ku dil dixwaze, îtirazên bi vî rengî jî cidî dibîne, li ser hûr dibe û bi cîhanêñ din ên ku di nava cîhana hîzrî de ne li bendê ye ku cîhana xwe û heta xwe bi xwe jî bike obje.

Ev îdeal, qet nebe ji Soktaresî û vir ve û

bi taybet du sed salêñ dawiyê yên cîhana hîzrî li dijî civat û dewletê xweseriyeke kifş bi dest xistiye, bi hêz û bi rêzdarî jiyana xwe berdewam dike.

Ez di dawiya salêñ 1999ê de dema li Fakulteya Zanînêñ Siyasî (FZS) ya Zanîngeha Enqereyê asîstan bûm ketim nava vê cîhana taybet. FZSyâ wan salan ji FZSyâ salêñ 1960 û 1970yan gelekî cuda bû ku Tûgrûl Eryilmaz di nivîsa xwe ya di vê rîzenivîsê de behs dikir. Hejmara xwendekar û mamosteyêñ jin gelekî zêde bûbû, weke rêje nêzîkî ji sedî 50yan bûbû.

Lê tiştê ji zêdebûna hejmarî girîngtir ew bû ku beşike girîng ji akademisyêñ jin feminîst bûn. Bi rengekî rast ez cara pêşiyê li vir leqayî feminîzmê hatim, bi qasî ku tê hişê min beriya wê bi çend mehan ez bûbûm asîstan.

Piştî firavînê dema min qehwe vedixwar û cixare dikêşand, min hin tişt digotin lê ji bilî peyvekê nayê hişê min ku min ci digot. Ew peyv tê hişê min, ji ber ku hevaleke min a feminîst a weke min asîstan bû bi gotina “divê tu nebêjî ‘bayan’, tu bibêjî ‘kadın’” li min hêrs bûbû.

Tiştekî din ku ji wê demê di hişê min de maye û ne mimkun e ku ez ji bîr bikim jî şermkirina min bû. Ez soromoro bûbûm. Lê ev rijdbûn, dema em şerma wan rojan nehesisînin, fêdeyeke mezin li min kir.

Bi saya vê azarê ya weke dersekê bû, min fêm kir ku hilbijartina peyvan ne hilbijartineke ji rêzê ye, li pişta wê dîrokeke gelekî mezin û hîyerarşîya hêzê heye, lewre li şûna wê peyvê, peyveke din hatiye hilbijartin û bi vê re biryar hatiye girtin ku nebe parçeyek ji wê dîrokê û bibe parçeyek

ji cîhaneke nû.

Ez li vir behsa xwe û tecrûbeyên xwe dikim lê helbet ev tecrûbeyên min ne bi min tenê ve girêdayî ne. Di nava salan de weke herkesan min jî gelek caran çavdêrî lê kiriye ku feminîst çawa akademisyenê mêt perwerde dîkin û wan diguherînin.

Ez wisa bawer dikim ku xala herî girîng a bûye sedema guhertinê, mecbûriyeta guhertinê bû.

Divê akademisyenê mêt biguheriyana lê li FZSyê (û li fakulteyên din ên Cebeciyê û li gelek zanîngehê din ê li cîhanê) bi hêza xwe ya mezin û rewa derketibû holê.

Di rewseke wiha de, ji hîzrên mîran bigirin heta gotinêwan, ji pirtûkên ku mîran xwe bi xwe hazir kirine heta panelên wan, ji meşen wan bigirin heta bikaranîna dest û piyên wan, ji nêzîkatiya li hemberî xwendekarêjin bigirin heta têkiliyên wan ên romantîk û heta hêrsbûnêwan, hemû şêweyên wan ên derbarê hebûnê û kîrinê de dihatin dîtin, pirsiyârikirin û rexnekirin.

Dawiya dawî mêt beriya ku di jiyana rast de pêrgî nêrînen rexneyî yêne feminîstan bê, di kontrol û erêkirina feminîsteke xeyalî ya di hişê xwe de derbas dibûn û li gorî wê tevdigeriyan.

Bell hooks, di pirtûka xwe ya li ser ihtimala guherîna mîran a piştî retkirina patriyarkayê de, dibêje ku di rastiyê de mêt dixwazin xwe biguherînin, lê ditirsin ku xwe biguherin, ji ber wê jî divê feminîzm alîkariya mîran bike, nexşerêya guherîne ya kifş pêşkêşî wan bike. [1]

Lê weke ku min di vê paragrafê de jî

behsa wê kiriye, li qadêñ kifş ên weke cîhana hîzrî, tîrs bi xwe jî (tîrsa dîtinê, ya biçûkxistinê, ya lipaşmayinê) dibe ku bibe navgîneke guherînê.

Lê sedema guherînê tenê ne negatif e, yanî guherîn tenê ne ji tîrs û mecbûriyetê çêdibe. Dema mêt hêza ji mîraniyê distînin û imtiyazên ku ji mîraniyê distînin winda dîkin û di encama vê de têkiliyekê wekhevtir li gel jinêni li derdora xwe datînin, ji barê mîraniyê yêne ku wan jî diçewisîne, hişk dike û di heman demê de him êşê dide, him jî wan dike kesen ji rîzgar dîbin.

Vî tiştî hiştiye ku li hêlekê astengiyêni li ser hîzrên xwe bibînin û di encamê de hîn baştır bifikirin. Li hêla din jî hevaltî û evîndariya ku bi jinêne feminîst re danîne, ji ber di nava xwe de wekheviyekê dihewînin, hiştiye nêzbûneke beriya niha jê ne agahdar bûn û nedizanîn nas bikin.

Bi saya vê nêzbûnê, mêt bi hestêñ xwe re diketin nava têkiliyekê, yanî dest bi fikra li ser wî tiştî dikirin ku ci his dîkin û çîma wiha his dîkin. Vê jî bi xwe re dihişt ku têkiliyê bi hestêñ mirovêñ li pêşberî deynin.

Bi taybetî xwebasdîtin û xwenaskirin ji ber ku dihêle mêt ji bandora ketûberkirina dîrok û civakê derkevin, mîrêñ ku vî tiştî tecrûbe dîkin his kirin ku ew azad bûne.

Ji ber van hemû sedeman, di cîhana hîzrî ya çepgiran de ku ez jî parçeyek jê me, mîrêñ sosyalîst dixwestin her bi jinêne feminîst re bibin heval û hezkirî. Mêrekî ku bi jineke nefeminîst re bibe heval, di rastiyê de biryara dicidemayinê distandin û li derdora xwe wiha dihatin naskirin.

Lê li wê cîhana ku ez parçeyek jê me mîrên wiha kêm in. Lewma mandora feminîzmê ya li ser sosyalîzmê ne tenê siyasî û hîzrî ye, di heman demê de şexsî ye. Ne mimkun e ku êdî feminîzm û sosyalîzmê cuda bifikirin, her çiqas ku ne heman tişt bin.

Ez naxwazim bibêjim ku mîrên li cîhana hîzrî ya çepgiran bi temamî dest ji mîraniya xwe berdane, weke mînak bêteše nebin, sohbata mîran nakin, ne dijminên jinan e, tundkariya laşî û fizîkî ya li ser jinan nakin, dest navêjin jinan.

Ev û jê zêdetir weke li her qadê li cîhana hîzrî jî hene. Lê ez dixwazim di vê nivîsê de –li şûna bala xwe bidim wan halên mîraniyê yên li cîhana hîzrî ku li cîhanê din berbelav in û desthilatin- li ser rewşa mîraniyê ya kifş ya li vê cîhanê belav e û rîzdar e bisekinim ku tenê di jiyana hîzrî de heye: Otorîteya entelektuel a mîran.

Liv û tevgera ku li derdora kesayetiya akademisyen/bîrewer/entelektuelên mîran e, bi desthilat û îdiaya desthilatê ya li ser zanyarî û teoriyê, bi fermandayinê û jixwebaweriyyê, bi nivîsandina gelek mijaran ya bi heman îdiyê ku ji xwe re weke mafekî dibîne, bi nirxandina mijarêñ mezin a bi hîzrîn bîhêz/rîjd an jî bi lê hûrbûna mijarêñ biçük bi rengekî berfireh tê avakirin.

Çi otorîteya zanyariyê ya ku bi pirtûk û maqaleyen tê avakirin û çi jî aqilmendiya ku bi qunciknîvîs û parvekirinê Twitterê tê avakirin, ev rewşa ku him weke kesayet di nava mijarê de ye û him jî bandora encaman lê dike ya ku dizane/dibîne/fam dike, dema bi piranî mîrên ji wan ciwantir bi hejmetkarî lê temas dikin tê pesendkirin

û temam dibe.

Bi gotineke dinê, ev performansên ku xwerûye bi dika hîzrî re, bi nîrînên hejmetkarî yên temaşevanê mîr re vediguheze otorîteyekê. Herçiqaş ku sihra vê sehneyê bi lidijderketina jinan re hinekî kêm bibe jî, mîr van lidijderketinan jî dixin nav û dikarin otorîteyê xwe yên entelektuelî berdewam bikin.

Weke mînak, li gorî J. M. Coetzeeyî “entelektueliya rasyonel û ya sekuler” bi hêsanî tehl nabe, dizane ku tehlbûn ji ber pozisyonike hîzrî ya lawaz çêdibe û wisa difikire ku serkeftina nîqaşa entelektuel a serbest wê li gorî qaîdeyêن aqilî diyar bibe. Heke ku ji ber gotinekê yan jî ji ber rexneyekê tehl bibe û hêrs bibe, li ser sedema tehlbûna xwe yanî li ser hestêñ xwe jî difikire, analîza hestêñ xwe jî dike û xwe ji derveyî mijarê digire.

Kesê/a entelektuel, li gorî prensîba “xwe nas bike” ya ji dema Soktaresî heta niha rûmeta xwe diparêze rexneyêñ li hemberî xwe û heta êrîşêñ biçûkxistinê bi xwe jî bi ken pêşwazî dike û cesaretê dide van tiştan. [2]

Her çiqas ku Coetzee, mîr/nivîskarekî ji her aliyî ve nû/nerm jî be û di encama ïzafîkirina xwe de binê otorîteya xwe dikole jî, ez wisa difikirim ku tenê mîrek dikare vê pênasekirina entelektueliyê bike: Cûreyeke wiha ye tehl nabe, heke ku tehl bibe jî rûmetê nade hestêñ xwe, rexneyêñ li dijî hîzrîn xwe bi xweşbînî pêşwazî dike û fêdê ji van tiştan digire.

Lê ev ne tenekê penasekirinek e. Entelektuelên mîr ên ji vî cureyî gelek in, ew nebe jî entelektuelên mîr ên ku

dixwazin bibin wiha jî gelek in û ev cure entelektuelî ji bo wan dibêjim qey di nava îdealên şexsî de ya herî mezin e.

Dema em di heman çarçoveyê de li disiplîna sosyolojiyê dinêrin, li gorî nêrîna min Pierre Bourdieu mînakeke gelekî balkêş e ku di pêncî salên dawiyê de otorîteyê herî mezin e. Bourdieu yê li ser çawaniya avakirina otorîteyê jî kar kiriye, otorîteya xwe ya şopînerên wî her gav ji nû ve çêdikin bi xwe ava kiriye.

Ev tişt, bi usluba xwe ya jixwebawer û biferman, bi têginiyêne dewlemend ê ku ji hêla wî hatine çekirin, bi xwebatên xwe yên li qadê, bi hewla xwe ya rengvedanê (refleksiyon) kiriye. Ev tişt ewqas bi pêş de bir ku bi baweriya ku wê karibe vî tiştî ji jinan jî baştir çêbike û ji serî de rexneyên ku dibe ji jinan bêñ da ber çavê xwe. [3]

Dîsa di vê çarçoveyê di dibe nêrîna li mînaka Immanuel Wallersteinî balkêş be ku yek ji navêñ herî mezin û yên herî bibandor ê sosyolojiya dîrokiyê ye. Wallersteinî bi “analîza xwe ya sîstemêncîhanî” û bi navgînên têgînî û bi saziyên akademik, ne tenê analîza dîrokî ya cîhanan kiriye, di heman demê de bi rengekî daimî li ser dahatûya cîhanê jî fikiriye.

Ez wisa difikirim ku îdia û hewesa zanîn, dîtin û pêşbîniya her tiştî ya xweser e bi entelektuelên mîr, hevaltiyê bi wê hestê re dike ku kirina her tiştan ji xwe re maf dibîne. Ji ber vê, zehmetiyê dikişînim di di xeyalkirina wî tiştî de ku sosyologeke dîrokiyê ya jin derbarê dem û cihêñ bi vî awayî berfireh de fîkrîn xwe bîne ziman û qîma xwe tenê bi rabirdûyê nîne û derbarê dahatûyê de jî biaxive.

Mirov dikare li şûna van entelektuelên mîr gelek gelek mînakêñ din jî bidîta, lê min Coetzee, Bourdieu û Wallersteinî hilbijart ku ez gelekî ji wan hez dikim û hema hema min hewl daye ku hemû pirtûkêñ wan bixwînim. Bi gotineke din, ti pêşdaraziyeke min yan jî antîpatiyeke min ji bo van navan tune bû. Berevajî vî tiştî, ez hejmetkarê uslup, têgeh, nêrîna wan im.

Hannah Arend di serdema 20emîn de yek ji wan birewerên jin e ku dikarîbû bi berfirehiya mijarêñ entelektuelên mîr pê re eleqedar dîbin û bi uslubêñ wan ên ku otorîteyê belav dîkin re têkeve pêşbaziyê, li ser pirsa hempîseyê xwe ya “Gelo hûn dixwazin bibin xwediyê bandoreke berfireh?” bersiveke wiha dide –ev bersiv bersiva pirsêñ di hişê min de ye jî:- “Dibe ku ez îronîk bim lê ev pirseke maskûlîn (mîrane) e. Mîr dixwazin her gavê bi awayekî gelekî mezin bibandor bin...” [4]

Lê ev tespît car caran di nava dilê min de metirsiyeke mezin çêdike. Gelo divê ez dest ji tiştêñ ku min nivîsandine û tiştêñ ku dixwazim binivîsim berdim? Ez ê nikaribim di mijara ku dixwazim de li gorî dilê xwe binivîsim? Ez ê xwe bi destê xwe kêm bikim? Heke ku ez dest ji vê jî berdim, wê ji hebûna min ci bimîne li holê?

Ez zû bi zû tînim bîra xwe ke ev ne “fîkrîn aqlî ne” lê hestêñ bêîstiqrar in”, yek ji wan mîrên ku feminîzmê ew guherandiye, divê ez ‘Ezîtiya xwe’ –qet nebe di wî halê di asta bîrê de- zêde cidî nenirxînim, lê ez nikarim bi xwe ku car cara têkevîm nava pêleke fikarêñ bi vî awayî ya bi van pirsan xwe xuya dika.

Her weha ez dizanim ku ev cure fikar ne para min tenê de, beşek mezin ji mîrên li

derdora min, bi minasebet û demên cida de dibêjin, "Êdî ev jî zêde ye, ma em vê vê jî bikin?". Lê dîsa jî mîrên di nava cîhana hîzrî de ne, ji bo derbaskirin û guhertina krîza mîraniyê xwedî sermiyanê çandî ne.

Ji ber ku çavlırêye xwediyê vê sermiyana çandî bin, cîhana hîzrî bi çavekî baş li mîrên di nava krîzê di dimînin nanêre, ew biçûk têñ xistin û ji ber vê sedemê krîza wan a mîraniyê her diçe kûrtir dibe.

Lê ne tenê mîrên xwediyê sermiyana ekonomîk, çandi û civakî ya bi bilindbûnê dikare vê krîzî derbas bike di nava vê krîzê de ne. Ji bo gelek mîran rîyeke guherînê, nexşerêyeke ku bikaribe ji guherînê fêdeyeke manewî û maddî bîdest bixe nîne.

Dema jin bi hêz dibin, azad dibin, xweser dibin, ji şêweyê bikaranîna laş bigirin heta xweîfadekirina wan a bi gotinan bixwebaweriya wan zêde dibe, dema bêhtir dikevin nava cîhana karî û rikberiya wan bi mîran re zêde dibe, dema hejmareke zêde mîran diguherînin û "mîrên nû" ji wan diafirînin, mîr bêhêztir dibin, hin îmtiyazên xwe ji dest didin, ditirsin, hêrs dibin, bi her tiştên xwe dixwazin desthilatdariya li ser jinê winda nekin ku tenê ev cure desthilat di destên wan de maye.

Dîsa krîza mîraniyê dema digihêje krîza netew-dewletan û newekhevî/nedîyariyê aboriyê yên zêde dibin, xurtir dibe. Neftera li dijî feminîzmê ya dibêjin mîran û netewan dişibîne jinan, dijminatî û tundiya li hemberî jinan û LGBTIyan zêde dibe.

Serokê weke Erdogan, Trump, Putin,

Modi, Orbânî yên nûnertiya nêrtiyê, hêzê, çavnetirsiyê, êrîşkarî û wêrekiyê dike, weke lehengê nêr û netewperest ê ku wê krîzîn mîran û netew-dewletan telafî [bike derdikeve holê û bi ser dikeve](#).

Hewl didin ku bi netewperestiyê mîraniyê, bi mîraniyê jî netew-dewletê û desthilata xwe zexim bikin. Biserketina Trumpî ya di hilbijartina serokatiyê de ihtimale ku qasî bi krîza Spîtiyê têkildarî krîza mîraniyê ye jî (Li heberî Obamayê Reş û 'mîrê nû', Trumpê Spî û "mîrê kevn").

["Belavbûna veganiyê ya pêşî lê nayê girtin"](#) bi xwe jî êrîşke li hemberî mîraniyê û netew-dewletê tê dîtin. Her çiqas tî îdiakirin ku belavbûna veganiyê ne têkildarî belavbûna feminîzmê ye jî (ihtimal e ku ne têkildar e), dema mirov difikire ku li Rojava beşek gelekî mezin ji veganan jin û ciwan in, wê baştır bê famkirin ku çîma baviksalarî ji veganiyê ditirse.

Feminîzm û veganîzm di roja me de dibe nûnertiya meylêñ herî xurt ên li dijî êrîşkarî û tundkariyê bin.

Wallerstein di serî de gelek çavdêrên ku bêhtir mîr in dibêjin ku Cîhan –krîza binyadî ya kapîtalîzmê jî di nav de- di nava krîzekê de ne ku gelek aliyêñ wê hene, wê ev bi dehan salan berdewam bike û encama wê bi têkoşîna di navbera çepgiriya kurewî û rastgiriya kurewî de dê diyar bibe.

Di rastiyê de jî herkes dibîne ku em di demeke rewşa awarte de derbas dibin, navend û fikra esasî herifiye, rastgirî û çepgiriya dijwarbihêz dibe. Dema em li avabûna van kampêñ vê têkoşîna ku wê demeke dirêj berdewam bike dinêrin,

herçiqas ku rewşa rastîn gelekî tevlihevtir û lêneveger be jî, ez wisa difikirim ku mirov dikare gelempereyeke wiha bike: Li hêlekê dewlet, rastgir, neteweperest, anti-feminist û "mêrên kevn", li aliyê din tevgerên ji nava gel dertê, çepgir, enternasyonalîst, feminîst û "mêrên nû" heye.

Baş e, di têkoşîneke wiha de şansê biserketina Jeremy Corbynê nûnerê "mêrên nû" û ji 50 salan zêdetir e ku vejeteryan e heye gelo li hemberî Tayyîp Erdoganî yê dibêje "Mafê ti kesî nîne Tirkiyeyê bike welatê şêran ê mahkûmî diyeta vejetaryan bike"?

Gelo li hemberî wan hêzên ku her cure çekên şerî û êrîşkariya laşî dîkin ên alîgirê newekheviyê ne, hêzên wekheviyê dikarin bi rêbazên dijtundkariyê û etîk têkoşînê bimeşînin?

Feminîst gelo dikarin tevlî "rêhevalên xwe yên mêt" ên ku ew nerm kirine û ji wan cûreyeke nû yê mîran derxistine vê di vê têkoşînê de bi ser kevin? Ango bi rengekî giştîtir, hêzeke ku her diçe nerm dibe gelo dikare bi hêzeke her ku diçe tundtir dibe?

Herçiqas ku meyla min a bersivêr erêni ya ji bo van pirsan hebe jî, ev ne pirsên retorîk in. Yanî pirsên wisa ne ku pêbaweriya min bi bersivêr wan nayê. Lê ez ji wî mantiqê ku pirsan di nava xwe de dihewîne jî ne bawer im, ji ber ez di hizrandina bi vî awayî de bi xwe nikarim ku pirsên bi vî awayî mezin tenê mîrek dikare bipirse.

[1] bell hooks, *Xwesteka Guherînê: Mêt, Mêranî û Hezkîrin*, wergêr. Zeynep Kutluata (Stenbol, Weşanên bgstyê, 2018).

[2] J.M. Coetzee, "Taking Offense", Giving

*Offense: Essays on Censorship*(Chicago: The University of Chicago Press, 1996), s. 3-5.

[3] Pierre Bourdieu, *Desthilata Nêran, werger. Bediz Yılmaz* (Stenbol: Weşangeriya Bağlamê, 2015).

[4] Hannah Arendt, *Formasyon, Sirgun, Totalitarizm: Ceribandinê Têgihiştinê* (1930-1954), werger. İbrahim Yıldız (Enqere: Weşanên Dipnotê, 2014), s. 40-41.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Akademîsyen, nivîskar û lêkolînerê serbixwe ye. Ji sala 1999ê heta 7ê Sibata 2017ê li Fabûlteya Siyasetnasiyê ya Enqereyê kar kiriye. Bi Biryarnameya Di Hikmê Qanûnan De ya 686. ji karê xwe hatiye avêtin. Li ser îxtisatê lîsans temam kiriye. Fakûlteya Zanistên Civakî master kiriye. Li Zanîngeha Binghamtonê doktora kiriye. Kitêbên wî: Bir Siyasal Düşünür Olarak Mehmet Ali Aybar(Ji Aliyê Rewşenbîrîyê ve Mehmet Ali Aybar, İletişim, 2002); Mehmet Ali Aybar'ın Müdafaaları ve Mektupları (Parastin û Nameyên Mehmet Ali Aybarî, 1946-1961), (berhevkarî.), (İletişim , 2003); İsmail Beşikçi, (berhevkarî, digel Ozan Değer), (İletişim, 2011); Osmanlı: Bir Dünya-İmparatorluğunun Soykütüğü, (Osmanî: Secereya Împeretoriyeka dinyayê Dipnot , 2011); Türkük Sözleşmesi: Oluşumu, İşleyishi ve Krizi, (Heppeymana Tirkîtiyê: Çêbûna Wê, Birêveçûna Wê û Krîza Wê, Dipnot, 2018). 1975ê li Konyayê hatiye dinê.

#23 BAĞIŞ  
ERTEN

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## MEZINBÛNA LI WARÊ XWENDEKARAN

Wan kesên li seyrgeha meydanê lîstina topa pêyan kom dibin bifikirin. Komek kesên xeber-reş, amade ku hinekan lînç bikin. Ev beşeka merbûnê bû ma yê ci be.

Ew kesên bi jinan re temas nakin, sosyalbûnê bi rêya sporê dikin, ew kesên bi tenê bi wan kesan re ne ku dişibin wan bi xwe, ji yên dî ûnefret dikin... Ew kesên bi serê xwe nikarin biaxivin lê bi komê re qêrdanê wek beşeka kesayetê dibînin...

## Min li warêñ xwendekaran xwendiye!

Wek hemî kesên li warêñ xwendekaran xwendîn ez jî bi vê yekê serbilind im. Ji bo min wek enstîtûyeka xwegihandinê bû. Bi xêra wê derê ez ji wesfê “berxikê dayika xwe” xelas bûm. Ez bûm “zelam.” Ez bi hêsrên çavan ji malê derdiketim, dayika min li şaneşînê destê xwe li min dihêjand, bi wê xemê diçûm dibistanê. Paşê ez elimîm. Ez jî bûm yekê “ji wê karwanê.” Wek gihadim pileya bibim şahê mîran...

Hemî rengên tûndkariyê li wê derê hebû. Her yên xurt lê digera yên lawaz tepeser bikin. Mesela wan henekên xwe li wan zarokên dî dikirin ku ew nizanin mastûrbasyon çi ye. Wan bigotiya ew dizanin jî heke guman heba bi zorê ew kar li wan dihat kirin.

Xwendekaran dema kesekê bêdeng bihata dîtin heta wan serî nehildaya bi ser wan de diçûn.

Di hefteyêñ paşiyê yên dewra xwedinê de dibû dema eziyeta li xwendekarêñ sefa jêr. Hima çi bê bîra we dema xwendekar dirazan ew bi yaneyêñ razanê ve dihatin girêdan, dolaba hinekan dihat şikandin û xwarinêñ ji memleketê wan hatî şandin dihat şelandin... Ji dizî ve keçen li warê xwendekaran dihatin tacizkirin. Her ku tê bîra min xwêdidim.

Herî zêde yên “Almancî” rastî tûndkariyê dihatin. Li dibistanê gelek ji wan hebûn. Li gor me yanî li gor “wan kesên normal” hinekê paşdemayî û nedîtî bûn.

Paşê me spor keşf kir. Piştî dema xwendinê, pêşıya wê demê, dema navberan hemî ji bo em li pey topê bibezin hêcet bûn.

Ew kesên nedilîstin wek kesên kîrnehatî dihatin dîtin. Ji ber wê ew kesên dizanin û nizanin ji bo xwe nişan bidin xwe diceribandin. Divîya dema lîstinê ne nerm bûna.

Ez kesek hûr im lê xweşbextane ye ku ez zû baliq bûm û bejna min ji ya herkesan bilindtir bû. Ez ne yek ji yên kurt bûm. Yên herî kurt, herî qelew, herî zeîf, herî dirêz... derd dikêşan.

Heqê vê nivîsê ye ku binivîsim min jî tûndkarî kirîye. Tê bîra min dema me topî dilîst ji ber ku kesek bêşîyan bû û ji ber wî tîma me bi ser nediket min her xerabî lê dikir.

Paşê me havîngehek ava kir. Her havîn em diçûn havîngehê. Dema warê xwendekaran qediya. Dema Edeneyîbûnê dest pê kir. Me bi topa pêyan dilîst, em pey keçikan diçûn, şer dikir.

Ev tiştêñ ez dibêjim ez ji bo dibistaneka taybet a kolej dibêjim. Dibistanêñ baş jî ji pêla vê rastiyê ne dûr e. Dema em mezin dibûn çanda me kurikan kêm zêde ev bû.

Wan kesên li seyrgeha meydanêن lîstina topa pêyan kom dîbin bifikirin. Komek kesên xeber-reş, amade ku hinekan lînc bikin. Ev beşeka mîrbûnê bû ma yê çi be. Ew kesên bi jinan re temas nakin, sosyalbûnê bi rêya sporê dikin, ew kesên bi tenê bi wan kesan re ne ku dişibin wan bi xwe, ji yên dî ûnefret dikin... Ew kesên bi serê xwe nikarin biaxivin lê bi komê re qêrdanê wek beşeka kesayetê dibînin...

Li vê wan gotinêن wek "mîrbûn"ê zêde bikin. Wehameta rewşê gelek xerab dibe. Êdî ferq nake ka ji kîjan çîn û nasnameyê ne. Ew kesên xwenda, hûnermend, dersdêr hemî ji nû ve "maçotiyê(zirzopiyê)" ji nû ve diafirînin.

Ez dema li xwe dinêrim erê ez bi wan rojêن li warê xwendekaran bûm serbilind im, di be ku dewra baliqbûnê ya ez tê de mame ev e.

Dema dibêjim ew der cihê kamilbûnê bû behsa wan demêن testeronê dikim an na, ferqeka biçük di navbera herdu fikran de heye. Hêvî dikim ez wan baş ji hev ferq bikim.

Ez hêvî dikim deminan min gelek zilim li gelek kesan nekiriye. Ne ew dewr bû ku bibêjim her kes welê bû ez cida bûm. Em hemî welê bûn.

Divê tam em vê biguherin. Wî qalibî bişkênin. Wê nasnameyê têk bibin. Divê em wî cihê futbollîstinê yê ku zayendperestî her roj ji nû ve tê çekirin biguherin, em rexneyê li dema baliqbûnê nekin zehmet e em bigihin ti deran.

Hingê nebûbe jî îro ma ne demê kirina wan karan e?



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Berpirsê weşana giştî yê Eurosport Türkiye ye. Dîrektoरê Ragihandina Werzîşê yê Zanîngeha Kadir Has e. Li rojnameya Cumhuriyetê dinivîse. Nivîsa wî ya yekem sala 1994ê hatiye weşandin. Ji wê demê ve li gelek cihan dinivîse. Li Weşanxaneya Îletîşîmê wek edîtor xebitiye. Li Zanîngeha Bogazîçîyê li ser dîroka nêzîk master kiriye. Li Zanîngeha Stenbolê Fakulteya Hiqûqê qedandiye. 1973yê hatiye dinê.

#24 TURGUT  
YÜKSEL

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## TRAMVAYA AZWERIYÊ

Ew nêrînen wî yê bêwate çûn û li şûna wan dîsa rastî wan nêrînên hatim ku du sal berê min dîtibû; di wan nêrînan de şermkirin, hesteke ku qebûlkirina girtina li ser kar nebû. Dîsa weke cinawirekî dinêrî ku nêçir ji dest dabû. Û dîsa heke ku sikakeke tenha bûya...

Beriya niha bi du salan bû, rojênu ku dibistan tune bû ez li şirketekê weke şeweke kar dixebeitîm. Ez zû ji kar derketim, ne şaş bim, saet li derdora 5an bû. Li rawestgeha Merter Tekstil Kentê ez li tramvayê siwar bûm. Ji ber ku hîna ne saeta jikarderketinê bû zêde kes li rawestgehê û tramvay tune bû. Li aliyê çepê li nêzîkî korîdorê rûniştîm.

Piştî min du sê deqîqeyan li derdora xwe temaşe kir, pirtûka xwe ya ji çenteyê xwe derxist ku êdî li ber qedandinê bûm. Min dest bi xwendinê kir. Li rawestgeha Zeytînbûrnûyê gelek kes li tramvayê siwar bûn. Hêdî hêdî cihêن vala tijî bûbûn. Paşê jî weke her gavê ber derê jî tijî bûbûn.

Bi pirsa "Em çawa dikarin biçin Uskuradê?" re bêhemdê xwe min serê xwe ji ber xwe rakir. Du xortê 20-21 salî, yên gir ji kalekî dipirsîn. Mêrik ji yê bejnkurt re rîya ku wê pê de biçin digot. Di vê esnayê de ji ber ku pişta wan li min bû, min dît ku di bêrîkên wan ên paşiyê de kîr hene.

Dîmenê bala min kişandibû, lê min paşê got ku dev jê ber de û min dîsa pirtûka xwe xwend. Piştî demekê, bi gotina "Tu nahêlî ez bibînim" min careke din serê xwe bilind kir. Ji ber ku bi dengekî bilind hatibû gotin. Ew xortê ku kalî jê re rîya çûna Uskudarê nîşan dabû dema ev rî ji hevalê xwe yê din re digot, ev gotin kiribû.

Dema ev gotin ji devî wî derdiket li 3 keçan dinêrî. Ji ber qerebalixê min nedîtibû ku kengî siwar bûne lê li gorî texmîna min li rawestgeha Zeytînbûrnûyê siwar bûbûn.

Li ser gotina xortî, hevalê wî jî berê xwe da keçikan. Bi wan nêrînan li keçikan dinêrîn ku weke pisîka li ser rî rastî çûkê hatibû. Him ji ber peyva wî xortî û him jî ji ber nêrînen bênavber tirsek ketibû nav dilê keçan.

Min pirtûka xwe girt û li her du xortan temaşe kir. Her ku diçû ber bi keçan ve dimeşîyan û mesafeya di navbera xwe û wan de kurt dikirin. Her sê keç nêzî hev bûbûn û li ber derî asê mabûn.

Min pirtûk xist çenteyê xwe û deftera xwe jî xist ber da ku çenteyê min stûr bibe. Min çenteyê xwe avêt ber sînga xwe ne pişta xwe û ez ketim navbera wan xortan û keçan. Min zik li rûyê xortan nihêrî. (Dema ez li tramvayê siwar dibim her ez çenteyê xwe tînim ber sînga xwe lê vê carê armanca min ew bû ku heke kîr ji bêrîkê derkeve, ez bi defter û pirtûkê xwe ji derba kîrê biparêzim. Ez ji nişka ve ji rastiya efsûnî ya Cortazarî ketibûm Bajarê Xwedê).

Di jiyanâ xwe de gelek caran ez rastî wan nêrînan hatibûm ku gef dixwarin. Lê cara pêşiyê min nêrînen bi vî awayî didîtin. Bi nêrîna cinawirekî li min dinêrîn ku ez bûbûm sedema nêçîra xwe ji dest bidin. Heke ku tramvay hinekî din vala bûya yan jî min li sikakeke tenha zeft bikirana wê ew kîr yekser bikişandana. Ev ne tasewasa ku min ji xwe re çêdirik lê nêrînen wan niyeta wan bi zelalî nîşan dida.

Gera bibêhtengî berdewam dike, nêrînê me bênavber didomin, bi vê re ger weke ku wê neqede derbas dibû. Keç tevlî qerebalixê li rawestgeha Topkapiyê daketin. Digel ku hejmara kesên di tramvayê de kêm bûbû jî em ji ciyê xwe nelebitîn û me her li hev dinihêri. Dema em hatin Findikzadeyê ez di navbera herdulan de derbas bûm û daketim.

Wê rojê û çend rojên li dû wê, ez her li ser wê gera balkêş fikirîm. Tiştên ji rêsê, destdirêjî, vandalî, şer parçeyek ji jiyana min bûn lê gelo çima ez ewqasî li ser vê bûyerê fikirîm?

Du xort hatibûn wî bajarê ku nas nedikirin lê ne ji bo mêtandarî, geştyarî yan jî karkirinê yanî ne ji bo rewşeke aram hatibûn. Ev ciyê nû wiha didîtin ku bixwazin destdirêjî li jinan bikin, kesên li hemberî vî tiştî derkevin an jî kesên ji ber sedemeke din bi wan re şer bikin, bi hêsanî kêr bikin.

Weke wan kesan in ku xwe xwedîyê her ciyê diçinê dibînin... Du sê salên dawiyê bû ku ez rastî vî cureyê nû dihatim. Ez li ser wî tiştî difikirim ku çima wisa dibe. Ez wisa difikirim ku min bersiva vê pirsî dît. Divê em careke din metalanguage ango zimanê berhevdanê binêrin...

Beriya niha bi salekê bû, vê carê berê min li Tophaneyê bû. Di nava salan de ez bibûm xwedî tecrûbeya wî tiştî ku li kîjan rawestgehê kîjan vagon tijî dibin. Ji ber wê ez ketim vagona yekê. Zêde kes lê nebû û ez çûm wê korîdora ku li piş kabîna vatman e. Ev der piranî ji ciyên din sakîntir e. (Zanyariyeke din: Ev der ciyê herî hênik ê tramvayê ye. Havînan baş e lê ji bo

zivistanan pêşniyar nakim.)

Li rawestgeha Aksarayê bi du sê kesan re jineke Ereb bi ereboka zarokan re li tramvayê siwar bû. Ji bo rêya çûnûhatinê negire çû li ber deriyê li hember sekinî û li ber ereboka xwe li ser piyan ma. Jineke hinekî bigoşt bû. Ji nişka ve mêtrekî ku li paldanga li pêşiya wê rûniştî bi dengekî bilind axivî. Ji ber ku pişa wî li min bû min rûyê wî nedidît. "Ev dixwin û vedixwin û dinin hev! Ji ber nîhandinê bûne weke berazan. Her der dagir kirine û hîna jî dizên."

Nizanim jinikê pê derxist ku tiştékî ji wî re dibêje lê li mêtirk nêrî. Nizanim mêtirk ji vê nêrînê nerehet bû yan cesaret jê stand lê bi dengekî berztir di dijûnên xwe de berdewam kir. "Hûnê binin van wê careke din nikaribin werin van deran..."

Ti kesî ji vî mêtirkî re tişték negot ku bixwe gelek bawer û di vê kîliyê de kîfxweşîyeke zayendî ya mezin dijiya. Weke li şîretên melayekî guhdar bikin bi bêdengî li van gotinênu ku ji wan re nedihat gotin guhdar dikirin. Dibe ku nedixwestin xwe bi vî zilamî bikin û bêdeng diman. Min axavtina wî ya bişehwet bi gotinênu "Fikrê xwe ji xwe re bihêle, li vir weşana zindî neke!" birî.

Li xwe zîvirî, çavên wî sor bûbûn. Min ji saleke beriya niha ev nêrîn naskiribûn. Vê carê ne weke cinawirê ku nêçîra xwe ji dest biriye, weke cinawirê ku nehatiye hiştin bi nêçîra xwe bilîze...

Paşê jineke ku li hêla din a korîdorî rûniştî, got rast e ne bêterbiye be. Çend kesên din jî axivîn. Mêtirk li ser vê bêdeng ma. Dema li Beyazitê daket dîsa bi heman hestan li

min nêrî, min jî li wî...

Mehek berê bû, dema ez diçûm dibistanê ez li rawestgeha Hasekiyê li tramwayê siwar bûm. Gelekî qerebalix bû. Ji ber ku min nekarî zêde bi pêş de biçim ez li nava nixavê sekinîm. Du jinênu ku bi rûsî diaxivîn bi min re li tramvayê siwar bûn û li teniştâ min a çepê ji xwe re cî dîtin, berê li min li wan bû. Mêrikekî ku bi me re siwar bû jî çû li cem wan sekinî.

Berê wî li min bû. Hemû kes nêzîkî hev sekinî bûn. Ya bêhemdî ne tê de lê ji bo temasê jî mirov dikarîbû niyeteke xirab jî di vê nêzîkiyê de bidîta. Jina ciwan a ku li teniştâ mîrik sekinîbû û bi hevala xwe re diaxivî ji nişka ve li hêla rastê zîvirî û li xwarê nêrî. Paşê li mîrik nêrî. Mîrik bêyî rengê xwe diyar bike di tramvayê de li ekranê dinêrî.

Paşê min li destê mîrik nêrî. Şûşeya avê ya nîv lîtreyî hebû. Min bala xwe da tevgerên destê wî. Bi awayekî nepen bi destê xwe lingê jinikê mîz dida. Jinikê careke din lê nêrî. An wisa fikirî ku ji ber şûşeya di dest de bi şaşî dest daye lingê wê yan jî ji ber bi tirkî nezanîbû dengê xwe dernexist.

Dema ku min fam kir wê mîrik heman tiştî bike, min li çavên wî nêrî û min got, "Vê neke!". Li rûyê min nêrî û got, "Çi nekim?" û di min hilanî.

"Ez dizanim ku tu çi dikî? Careke din neke!"

Ew nêrînen wî yê bêwate çûn û li şûna wan dîsa rastî wan nêrînen hatim ku du sal berê min dîtibû; di wan nêrînan de şermkirin, hesteke ku qebûlkirina girtina li ser kar nebû. Dîsa weke cinawirekî dinêrî ku nêçir ji dest dabû. Û dîsa heke ku sikakeke tenha bûya...

Ez li rawestgeha Cevîzlîbagê daketim. Ez vê carê li ser zêde nefikirîm.

Ji ber ku; "Ji deman dema herî baş bû, ji deman dema herî xirab bû, him serdema aqilî bû hem dewra ehmeqiyê him ya baweriyyê bû, him jî ya şikê, demsala ronakbiriyyê bû, demsala tarîtiyyê bû, him bihara hêviyyê bû, him jî zivistana bêhêvîtiyyê, him her tiştên me hebû, him tiştekî me tune bû, an em ê hemû rasterast biçûna cenevê, yan jî hêla li hemberî wê..." \*

\* Charles Dickens: Çîroka Du Bajaran

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Nivîskar, Nîgarkêş û Dersdêr e. Di çendîn rojname û kovaran de nivîsandiye. 11 pirtûkên wî hene. Her weha du pirtûkê wî yê hevpar û çar jî yên kolektîf hene. Edîtorî û Dîzayneriya gelek pirtûkan kiriye. Pênc pêşangehêن wî yên şexsî çêbuye û besdarî 11 pêşengehêن têkel bûye. Kuratoriya Pêşangeha Retrospektîfa Ogûz Aral kiriye. Derbarê mijarên Dizayn û ragihandinê de semîner û perwerde daye. Niha dersdêriyê dike. Her weha di radyoya açık de bernameyê pêşkeş dike.

#25 FIRAT  
YÜCEL

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

ÇÊDIBE KU ITIRAFKIRIN  
Û LI-XWE-MIKUR-HATIN JI  
PESINDANEKA NÊRANE BE

Welê tê dîtin ku mîrek nikare di fikreka cida de be.  
Mesela dema hûn behsa bêwatetiya “ew ne kesek welê  
ye” bikin hûn ê rûyek matmayî li pêşberê xwe bibînin.

Min li ser meseleya îtirafkirinê û cihê wê yê di sînemayê de tezeka doktorayê nîvçe hiştiye.

Dema ku ez ji bo tezê dixebeitîm min ferq kir ku mêt mêtaniya xwe ne bi tenê bi kiriyanê xwe yên rojane lê bi kiriyanê xwe yên berê jî ava dike: Îtirafkirin, lixwemikurhatin, poşmaniya dereng mayî, daxwaza qêrdanê...

Kulliyata îtirafan li ber min bû, ji ya Saint Augustine heta ya Rousseau hemî li ber min bûn. Bêguman gotinên burjuvane yên roja me jî (roman, serhatî, kitêbê xwegihandin û pêşdebirinê) hebûn.

Bêguman kitêbên teorîsyenên wek Michel Foucault, Kojin Karatani, Mark Nişanyan jî li ber min bû wan li ser îtirafkirin, hêz û desthilatê nivîsiye.

Wan diyar kiriye îtirafkirin gelek giring e lê divê me hay jê hebe ka "kengê" îtiraf hatiye kirin û çawa îtirafkirin dikare rûyê ji bo desthilatê xweş bike.

Ji aliyekê ve ketibûm dinyaya bêbinî ya fikran, ji aliyê dî ve min lê dinêrî zimanê îtirafkirinê di sînemayê de çawa ye.

Deng û hêma dihatin hişê min... Ew deng û hêmâyên ku piraniya wan mêtanî çêkirine, piraniya wan mêtanî nîşan didin...

Bergman, Antonioni, Tarkovski, Ceylan, Demirkubuz, Kaplanoğlu...

Ew mêtanî ku bi salan çavê xwe li sûcê xwe girtî xwe digire, digire û paşê hor hor digirîn...

Ew karakterê mêtanî ê dema diçê ber pencereyê xemgîn dibe...

Gelek filmên sînemayê yên li ser diyaya hestanî mêtanî... Ew kesen berê xwe didin dinyaya kevin pişta xwe didin dinyaya nû û li ser kaxezan îtirafan dînîsin...

Paşê min ji xwe pirsî di hemiya filmê de ew mêtanî ku naaxivin, li derinan dinêrin, keseran tînin, difikirin lê heta paşıya filmê tiştekê nabêjin an jî li paşıya filmê dibêjin çîma wek kesen zana têne nîşandan.(Wekî ku bi tenê wan zaniye jiyan gelek fişş û ne ji ti re ye.)

Gelo sebeba ku mêt ev qasê ji bo îtirafkirinê û li-xwe-mikurhatinê mîldar in ci ye, gelo sebep ew e ku ditirsin kesinê dî nirxandin û şîroveyan li ser wan bikin?

Bi serê xwe watedarkirina jiyanê, vegera li meydana zimanî, nîşandana sînorêni xwe û tu nehêlî kesinê dî bê wê meydana te ya kesane, ev hemî ci qasê bi [îtirafê] ve girêdayî ye.

Ez nikarim bibêjim ku demekê dirêj min teqîba van pirsan kiriye. Lê tişte min li xwe û li mêtanî li dora xwe dîdî, em nikarin xwe li hemberî hesta sûcdariyê ragirin.

Dema mijar mêt bin ew dixwazin bi xwe mesûliyetê bistînin. Belkî ji ber ku piraniya mêtan şîrove, rexne û nirxandinê ji derve tê dikin sebebeka krîzan.(Dema mêt têne rexnekirin gotinê wek "îtham", "lînç" û "reşkirin"ê belav dibin. Hişkatiya rexneyan jî piraniya caran naguhere.)

Hesteka xweparastinê ya bi vî rengî heye: Herî zêde ez xwe nas dikim, herî baş ez dikarim xwe dad bikim û hikmî li ser xwe bidim.

Xwe-rexnekirin, îtiraf, diristî, heta ku li-xwe-mikurhatin jî parçeyeka vî zimanî ye.

Li karên hunerî û li jiyana rojane mêt gelek hez dikin behsa xeletiyên xwe yên berê bikin. Lê dema ku bê diyarkirin wan heqaretek kiriye, gotinê zayendperest gotine û divê mesûliyeta wan gotinan li xwe bigirin, ew vê yekê wek heqaret dibînin û dest bi parstina xwe dikin.

Yên li derdorê bi pêşhikmekê dîwarên parastinê çêdikin...

"Ew ne yekê welê ye", "ew tiştên welê nake", "ez wî baş nas dikim" hwd...

Hûn ji nişkê ve ji wan kesên li derdorê van gotinan dibihîsin. Dema hûn li dijî gotinê "ew yekê welê ye" bisekinin hûn ê kesên cansîperane li pêşîya xwe bibînin.

Tiştîk ji rêzê ye, tevgereka bi vî awayî keyfane nikare kesê bêguneh bike, ti kes di hemîya jiyana xwe de, wek xwe namînin.

Rêexistina mêtan ne bi tenê li jiyana civakî, li medyaya civakî, li civatê minaqeşeyê herweha li jiyana taybet jî xwe nîşan dide û ji nû ve hildiberîne.

Mêt dema ku bi hev re dibin dost ew mêldariya wan heye ku mêtê bûyî dostê wan rasterast li aliyê wan e.

Welê tê dîtin ku mêtrek nikare di fikreka cida de be. Mesela dema hûn behsa bêwatetiya "ew ne kesek welê ye" bikin hûn ê rûyek matmayî li pêşberê xwe bibînin.

Paşê hûnê bibînin ew matmayîn diçe û ew kes axiftina xwe didomîne.

Rêexistina mêtan ne bi tenê li ser gotinan biryare dide ew herweha wê biryare jî dide ka kîjan gotin hêjayê guhdarîkirinê ye û kîjan gotin ne hêjayê guhdarîkirinê ye.

Li ser hemî halan re van demên dawiyê pêleka fikirî ya bi navê "rastiya antî-polîtîk" rabûye. Ev yek rewşeka welê çêdike ku xwediyyê fikrê guhdariya yên li hemberê xwe nakin û gotinê li hemberê xwe wek tehdîdeka li aliyê xwe/azadiya xwe dibînin.

Ya rastî ez bûme şahidê wê yekê jî li derdorê çand-hunersînemayê hin gotinê nexweş piştî hatîn gotin wek rastîparêziya polîtîk têne nîşandan. Vê yekê jî herî zêde ew mêt dikin ku ditirsin bi awayekê ew jî bêne sûcdarkirin.

Desthilata gotinê nêrane bi vî awayî tê parastin. Rexne wek rastîparêziya polîtîk têne binavkirin û sivikkirin.

Tiştî ez herî zêde bûyîm şahid jî ew e ku piştî tiştîk li xweşa hinekan neçû dibêjin "tu polîtîk dinêrî", "tu alîgir ï" bi vî awayî jî mijar tê guhertin. Statûkoya polîtîk bi van pirsan tê parastin...

Tê gotin ku li Tirkîyeyê çanda xwe-

rexnekirinê nîne. Ev rast e. Tiştekê ji vê jî xerabtir heye. Wek min li jorê jî got rexne tê bêtibarkirin, sivikkirin. Rexneyê dîkin monolog û rêya dîyalogê digirin. Monologkirin û tinekirina dîyalogê her dem di berjewendiya desthilatan de ye.

Ew ne yekê welê ye... Hevokek e ku diyar dike "ez bi tenê hesabî didim xwe."

Dema ku mîr ji rexneyan xwe vedidin, ew ji mesûliyetên xwe direve lê ji vê zêdetir

naxwaze fantaziya hêmaya xwe ya ji bo xwe biguhere.

Formûla mîran ji bo ji rexneyên vê demê birevin jî ev e: "Bijî dema te têra xwe tecribe kom kirin tu bi xwe dê biryarê bidî."

Ji ber wê li gor min divê em zêdetir li neynikan nenêrin. Divê zêdetir em li yên dî binêrin. Em li wan kesan binêrin ku li dijî hismendiya paderşah xwe birêxistine. Tam niho, ne dema wextê wê hat...



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Berpirsê Giştî yê Weşana Kovara Sînemaya Jêr-nivîsê ye. Edîtorê Pirtûka bernameya Navenda Fîlman ya Mîthat Alam e. Navenda Fîlman ya Mîthat Alam di sala 2000an de li Zanîngeha Bogazîciyê tê vekirin. Di dema edîtoriyê de bi hevalên xwe re kovara Sînemayê ya mehaneya Jêrnivîs derxistiye. Di rojname û kovarên wekû Asklepios, VS..., Konak Beykoz, İstanbul, Genîş Açı, Katharsis, Bant, Rolling Stone, Aralîk, Picus, Akşam, Radikal û Birgunê çendîn nivîs û hevpeyvînên wî hatiye belavkirin. Derbarê muzîkê kurtefîlman de xebatêن wî hene. Edîtoriya kataloga Festîvala Fîlmên Serbixwe ya Stenbolê kiriye. Berê li ODTUyê, piştre jî li Zanîngeha Bogazîciyê beşa Civaknasiyê xwendîye.

#26 FATİH  
POLAT

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# REWŞA MÊRBÛNÊ: RIHETİYEKE WIHA YE KU DEMA TU DEV JI XWE BERDÎ RÛBİRÛBÛYÎNÊ TUNE DIKE

Ew mîrên ku çepgir û birêxistin in û ji dîrokeke mîna  
dîroka ku ez tê de derbas bûme de derbas bûne,  
meyleke wiha bi wan re çêdibe ku dema cilûbergan  
dikirin rengên girtî û yên zenûn tercîh dîkin.

“Fatîh silav. Dibe ku bala te kişandibe. Bianetê dest bi rêzenivîsekê kiriye ku wê tevahiya sala 2018ê bidome. Navê wê '52 Mêr, 52 Hefteyan Mêrbûnê û Tundkariya Mêran Dînîvîsin” e. Ji serê salê û vir ve ye nivîs têñ weşandin. Ez koordinatoriya vê rêzenivîsê dikim.

“Bi vê rêzenivîsê tê armanckirin ku firk û raman û di rastiyê de tecrubeyên derbarê mîrbûnê û tundkariya mîran ên mîrên di warê xwe de karêñ girîng kirine tomar bikin. Ez gelekî dixwazim ku nivîseke te jî di vê xebatê de hebe.”

Dema ev e-maîl ji Şenay Aydemîr hat, ez pêsiyê hinekî rawestiyam ku salêñ dirêj me bi hev re kar kiriye û ez gelekî jê hez dikim. Ez wê rêzenivîsê dixwînim. Ji ber wî tiştî min girîngî didayê ku dawetî ser rûbirûbûyînekê dike ku mîr vî tiştî zêde nakin.

Lê ji bo min gelekî girîng e ku tiştêñ min mohra xwe lêxistiye di serî de divê jidil û rasteqîn bin. Heke ku ez nivîseke wiha binivîsim, divê her tiştêñ xwe aşkere bikim, yan jî divê ez qet tiştekî nenivîsim. Nivîsandina wan hevokêñ nediyar ne li gorî min e ku mirov nizane pesnê xwe dide yan rexneyê li xwe dike.

Ez xwe weke mirovekî wisa dibînim ku li qada civakî jî metirsiya şexsî ya rûbirûbûyînê ji ser xwe avêtiye. Lê ji ber têkiliyên min ên civakî û ji ber ku dibe bandora çîroka min li ser kesêñ di jiyanâ min de ne, ez ketim nava endîşeyê.

Gava min xwe bi xwe pirsa “gelo binivîsim

an na?” dikir ez wisa fikirîm ku divê ez bi hevjîna xwe ya kevin a 8 sal berê em ji hev veqetiya bûn bişêwirim. Ji ber ku me heft sal bi hev re borandibû û bandoreke kûr li ser jiyanâ min kiribû.

Di vê navberê de, paşê ez qet nezewicîm lê ji bo gotin di cî de be min got “hevjîna min a kevin.”. Wê ji bo nivîsê cesaret da min û bi vî awayî ji bo wê dema derbarê wê de jî min destûr jê wergirt.

Di eslê xwe de zaroktî beşeke gelekî girîng e di vê çîrokê de. Lê di vê mijarê de ne mimkun e ku ez destûr ji birayêñ xwe, xwişkêñ xwe û dêya xwe bistînim. Ji ber wê min biryar da ez wî beşî li gorî vê rastiyê binivîsim.

Û ez dest pê dikim.

Weke gelekan, ez jî li malbateke wiha ji dayik bûme ku têkiliyên patriyarkal tê de serdest bûn. Diya min û bavê min 52-53 sal berê ji Erziromê koçî Stenbolê kirine. Herçiqas ku ez li bajerê herî mezin e Tirkîyeyê ji dayik bûme û li vir mezin bûme jî, bandora wê rewşa bêdengiyê ya koçberî bûye sedem li ser min çêbûye û ji zaroktiya min pê de şexsiyeta min diyar kiriye.

Bavê min alîgirê Partiya Dadê (Adalet Partisi) bû. Heta em her sê xwişk û bira mezin bûn, jiyana siyasi û ya psîkolojîk a malbatê wî diyar dikir. Paşê ev desthilatdariya xwe winda kir.

Ji ber wan hincetên ku min li jor behsa wan kiriye, ez zêde nikarim aliyê xemgîn û dilşikên ên bavê min bûne sedem ên di têkiliya diya min û bavê min de kûr bikim.

Lê dema ez vedigerim û lê dinêrim digel hin taybetmendiyên wî yên ez bi rêzdarî bibîr tînim, helwesta bavê min a li dijî diya min birîna zaroktiya min e ku bandor li min kiriye û hiştiye ku ez wisa bifikirim, ‘divê têkiliyên min cuda bin’.

Zaroktiya min li Eyupa ku ez lê ji dayik bûm û mezin bûm borî. Di zaroktiya min de tiştê ku nehiştiye ez têkevîm nava çeteyan de, azweriya xwendin û sporê bû. Di wan salan de Teksak, Tommiks, Xwediyyê Maskeyê Sor, Zagor, Bonanza, Mister No pirtûkên ku min herî zêde dixwendin bûn. Bi pareyên ku bavê min didan, min ev pirtûk dikirîn û bi kêfxweşîyeke mezin dixwend û di carekê de diqedan.

Êdî pereyan têrî min nedikir. Min çareyek jê re dît. Li ber Sînemaya Zengîn a li Gaziosmanpaşayê –êdî nîne- a ne dûrî mala me dezgehêن pevguhertinê yên Teksas û Tommiksan hebû. Min pirtûkên xwe li wir pevdiguherandin.

Piştî sal li ser derbas bûn û ez lê zivîrim û min dît û ferq kir ku lehengên gelekî kêfa min ji wan re dihat û dixwend her mîr bûn û ev jî têkiliya di navbera lehengiyê û mîrbûnê de ji nû ve saz dike.

Ez dibêjim qey, paşê van pirtûkan bandoreke gelekî mezin di daxwaza xwendinê de li min kir. Xwendin, ji bo yekî weke min ku li taxeke xaniyên neqanûnî ji dayik bûye, weke deriyê veguherînê yê watedar bû.

Dema ez diçûm lîseyê, li qursa ingilîzî mamosteyê min pirtûka ‘Germinal’ a Emile Zolayê pêşniyarî min kiribû. Ez wisa difikirim ku ev pirtûk bû sedema gavêtineke mezin ji bo min. Beriya wê min dest bi xwendina Yaşar Kemal, Azîz Nesîn, Rifat Ilgazî kiribû lê Zola bandoreke wiha li min kiribû ku ew rêya van nivîskaran vekiribû bi wê berfirehtir bûbû.

Paşê di salên zanîngehê de du mamosteyên min ên jin herî zêde di kûrbûna min a ji hêla fîkr û ramanê de bandor li min kirin. Eser Koker û Meral Ozbek. Û weke gelek xortênu ku qonax bi qonax ber bi sosyalîzmê ve diçe, min ew rewşa rûbirûbûyîna bi xwe re weke gava yekê ya pêşketinê didît.

Dema ku min wan salan kuliyyata sosyalîst dixwend, min gelek pirtûkên derbarê dîroka têkoşîna azadiya jinan de jî xwend. Û di nava hevalên têkoşîna ciwanan de yek ji mijarêن sereke ên di sohbetên me de ‘rûbirûbûyîna bi têkiliyên desthilatdariya mîran re’ bû.

Helbet ne hêsan bû ku vê rewşa ji bapîrên me ji me re mayî derbas bikin.

Di zaroktiya min de di nava malê de me nedikarî gelekî zêde behsa parvekirina karên malê bikira. Yanî li gorî desthilatdariya mîran li malê tevgera li malê çêdibû. Di nava demê de ez û birayê xwe me karê malê jî kir. Min bandora

vî tiştî di dema zanîngehê de li malên xwendekaran jî ferq kiribû.

Hevalê minê malê Bakiyî wêneyekî ji wê rojê mabû diyarî dabû min ku min karê li malê dikir. Li paşê wiha nivîsî bû: "Ev fotograf nîşaneyâ wî tiştî ye ku wê rojekê şoreş jî çêbibe".

Di karêñ malê de hevalêñ min ên mér ên ji min zîrektir û ên ku bêhtir besdar dibûn hebûn. Nirxandina min qasî ya ku Bakiyî dabû min bû. Bêguman pozisyona di karêñ malê de tenê yek ji pîvanêñ têkiliyêñ desthilatdariya mîran e. Û nirxandina mirovan a derbarê xwe de divê bi vê tenê sînordar nemîne. Ez vê besê weke yek ji mikurhatinêñ yek ji xeletiyêñ xwe tînim ziman.

Ez dikarim bibêjim ku beşeke mezin ji veguherîna pêvajoya rûbirûbûyina bi 'rewşa mîrbûna desthilatdar' re di jiyanâ min a zewacê de çêbû. Min bandora hevjîna xwe ya li ser xwe her gavê weke 'tevgereke çîrpandinê' nirxandiye.

Beriya ku vê nivîsê binivîsim, min ji bo destûrê ji wê re nivîsand, wê wiha bersiv da min: "Em jê re nebêjin çîrpandin. Lê di nava mérêñ ku bi jinêñ feminîst re dijîn de kesêñ meyla wan a veguherînê heye, vediguhezin. Di rastiyê de min tenê hewl dida ku ji te re behsa xwe bikim."

Hevjîna min weke jineke narîn û têgihiştî vê rewşê wiha bi nav dike lê ez dîsa jî vê pêvajoyê weke tevgereke çîrpandinê, weke ku di dema lîseya pîşeyî de nîşanî me dan tevgera 'kirtirkirinê, rastkirinê' dinirxînim.

Hevjîna min yek ji mîmarêñ rewşa min a rastkirinê ya niha ye. Li gorî nêrîna min,

ji ber ku sosyolog bû ev rewş bandoreke erêni li ser pêvajoya min a veguherînê kiriye.

Piştî ku me dest ji hev berda bi heft salan, em şevekê hatin ba hev û me xwarin xwar û araq vexwar. Di dema xwarinê de yek ji wan mijarêñ em li ser axivîn ew bû ku tecrubeya min a pêşiyê ya lixwekirina sandaletê ya ji derveyî demêñ betlaneyê bû.

Ew mérêñ ku çepgir û birêxistin in û ji dîrokeke mîna dîroka ku ez tê de derbas bûme de derbas bûne, meyleke wiha bi wan re çêdibe ku dema cilûbergan dikirin rengêñ girtî û yên zenûn tercîh dîkin. Qet nebe ji bo kesêñ ji nifşê min e ev tişt derbas dibe. Ez nizanim ev ji ber sekna 'mérê giran' e an na lê rewş wiha ye. Cesareta min a lixwekirina cilûbergân rengêñ zindîtir, di wan heft salêñ zewacê de çêbûbû.

Em vejerin ser mijara xwe. Ew sandaleta ku min li bajêr cara pêşiyê li xwer me bi hev re ecibandibû û ji bo ji derveyî qalibên xwecihî ez sandaleteke moderntir bikirim min teşwîq kiribû.

Lê rengê wê jî di navbera gewr û reşê de bû. Di salêñ pêş de min yeke rengêñ zindîtir bikiriya. Lê tişt nabe, ev jî qonaxek bû. Û hevjîna min piştî bi salan di wê dema xwarinê de behsa vê kiribû.

Bi şev dema ez ji rojnameyê vedigeriyam malê bi diltirsî min jê re gotiye, 'dikandarî li sandaleta min nêriye'. Piştî wê bi çendîn salan em gelekî bi vê keniyabûn.

Di rastiyê de bi gotina 'dikandar weke ku ez efemîne bim tevgeriya' min heyfa xwe

bi xwe anî bû. Dema mirov ji aliyê din lê binêre, ji bo mirov li ser wê rastiya ku li vî welatî jin her roj rastî tiştên girantir û travmatîktir têr bifikire ev daneyeke bû.

Ez ê mînakekê bidim ku weke birînekê di dilê min de maye û divê ez behsa wê bikim.

Di demeke ku me nîqaş dikir û dengê xwe bilind dikir de tê bîra min ku min ji hevjîna xwe ya kevin re gotibû, "bes bike pitepit". Di rastiyê de ev gotineke wiha zayendperest e û dihêle ya li hember biazire ku ji bo jinan di cîhana me de tê gotin, hatiye hînbûn û nifş bi nifş berdewam dike. Ez gotina 'tu li min guhdar nakî' ya her du jinênu min û wan jiyana xwe bi hev re par vekirine jî bi vî tiştî re girêdidim.

Min îdia dikir ku ez guhdar dikim lê ev rastiya ku du caran ji min re hatiye gotin, wî tiştî nîşan dide ku ez ne guhdarvanekî baş im, dema ez dikevîm tengasiyê bi gotina "pitepitê neke" ya zayendperest dixwazim xwe ji pirsgirêkê rizgar bikim.

Û heta niha ez çiqas hatibim guhertin keda hevalên min ên jin ên ku ez bi wan re xebitîme jî ciyekî girîng digire.

Ji ber ku salên dirêj in hem ji hêla entuelektuelî hem jî ji hêla pêvajoya karê em bi hev re dîkin ez bi jinênu bihêz û gihîştî re kar dikim. Ev jî ji hêlekê mirov hişyar dike. Divê ez mafê wan hevalên min ên jin ên di nava jiyana birêxistin a ku dewam dike û tecrubeya giştî ya me jî bidim.

Weke mîrekî bi salane rêveberiyê dike, her çiqas ku ez bibêjim di karênu me de karkirina demokratîk derdixim pêş jî

nirxandina hevalên jin wê rastir be.

Ji ber ku rewşa mîrbûnê jî bi hemû tiştên xwe weke îdeolojiya fermî ye, tenê mirov dikare ji derive lê binêre û bêhtir rastiya wê bibîne.

Di encamê de divê mîr her roj ji nû ve bi têkiliyên desthilatdariya mîran re rûbirû were. Ji ber ku mîrbûn car caran bêyî hay jê hebe rihiyeke wiha çêdike ku dema hûn dest ji xwe berdin, dîsa hûn li wê rewşa mîrbûnê ya rihet vedigerin.

Ew tiştên ku heta wê demê we digot qey hûn veguherîne, we kom kiriye bilez tune dîbin. Yanî mirov nikare bibêje ku min ew borandine. Rastiyeyeke wiha ye ku divê her roj ji nû ve rûbirûyî wî tiştî werin.

Û yek jî, rîtuela 'mîrê giran' heye ku divê ji hêla dîroka mîrekî sosyalîst ez tiştekî bibêjim. Di rastiyê de ev jî car caran em car caran jî civaka ku em lê ne sedemên we. Bi vî awayî bi hêsanî nirxên desthilatdariya mîran li me bar dike. Hinekî sivikbûna ji vî tiştî xemla kesî xirab nake.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger û Berpirsê Weşana Giştî ya Rojnameya Evrenselê ye. Endamê Komeleya Rojnamegerên Tirkiyeyê û Sendîqaya Rojnamegerên Tirkiyeyê ye. Di Însiyatîfa ez Rojnamegerim de xebatêñ xwe didomînin. Di sala 1991an de di kovara bi navê Nokta de dest bi rojnamegeriyê kiriye. di kovara heftane bi nave Gerçek (rast) de nûçegîhanî û nûnertiya wê ya Enqereyê kiriye. Ji sala 1995 vir ve li rojnameya Evrenselê, di qadêñ cûrbicûr de kar kiriye. Beşa Rojnamegeriyê li Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Enqereyê qedandiye. Di çend pirtûkan de derbarê mijarêñ pîşeyî de gotarêñ wî hene. Di sala 1969an de li Stenbolê ji dayik buye.

#27 TANIL  
BORA

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## MÊR Ü MÊR

Têkiliyeka sexte di rihetiya di navbera mîran de û nezaketa ji bo jinan “tê bexşkirin” de heye. Ew dema mîr û mîr dikevin rihetiya bênezaketyê rîyê li şextebûna nezaketa bi jinan re jî vedike.

Em bi dîmenekê kevin dest pê bikin.

“Ez tana derpiyî bûm. Divîya min cilikên xwe li xwe kiriba. Qet nebe divîya min dermanên xwe kom kiriba û bibira nik xwe. Ez rabûm. Min dest bi xwe-amadekirinê kir. Lê yarbay ji odayê dernediket. Min ji wî re got ku divê ew derkeve. Wî got ma çi ye, tu jî mîr î ez jî. Min jê re got di nêvbera mîran de jî divê nezaketek hebe. Paşê çû.”

Ev rîzikên henê, beşek ji notên Celal Bayarî yên wî li Girtîgeha Qeyserîyê nivîsîn e. (5ê Çiriya Pêşiyê, 1963) [1]

Ez nizanim ka mîla jinan jî heye ku mahremiyeta hev binpê bikin an no. Ez bawer nakim qasî ya mîran hebe.

Gotina “ma em hemî ne mîr in” gotinek e ku mehremiyetkuj e. Dema mîr û mîr bin tê wê wateyê vekirîtî, zelalî wê rîyê vedike ku ci bê ber devê we bibêjî an bikî.

Ew meseleya “tiştekê em veşîrin tine ye” ew tişt e ku tê bawerkirin bi tenê dikare di navbera mîran de hebe.

Halbûkî mafê mehrûmiyetê yek ji pîvanên medeniyetê ye. Ne rîbazeka “veşartina tiştinan” e. Derfetek e ku mirov bi serê xwe bimîne. Xweseriya mirovan e. Ew sekna mîr û mîran jî li dijî wê xweseriyê ye...

“Ka em mîr û mîr biaxivin.” Dema bavek bi vî awayî kurê xwe vedixwîne. An dema mam, xal, zava, kirîv, heval mîran vedixwînin. Carinan jî ev vexwendin wek çîx-xwestinê ye. Axiftina mîr û mîran rê dide mehremiyet binpê bibe ya xerabtir

we dike ku tiştên müstehcen jî bêne eşkerekirin. Ji xefan xelas dibin. Ew axiftinê mîr û mîran nêzîkatiyê zêde dike li nik wê wan kesên dî ku jin jî tê de ne kêmî wê koma bijare dibînin.

Antropolog û prîkologên veguherînê dibêjin: Dema em komên giyanewerên şîr-jî yên ku jimara mîran zêdetir e dinêrin em dibînin ku tûndkarî û êrîşarî zêde ye. Li koloniyên rojavayê Amerîkayê dema jimara jinan zêde bûyî jimara kuştina mirovan digel wê yekê kêm bûye. Mîr û mîrbûn we dike ci tê ber hisû devê we hûn bikin û bibêjin, har bibin. Li nav mîrên ciwan axiftina mîr û mîran şeklekê bêperwabûnê/pîşelênekirinê ye. Wek tola wan demên jin jî heyîn rakin bi çavbirçîtiyê...

Dema ku hin kes bi gotinê “jin li vê derê ne” têne şiyarkirin. Ew hewildanên ji bo jimara jinan li temaşegehêne meydanên futbolê zêde bibe... Di salê 1970yan de, bernameyên şahiyê yên digel jinan bi xwendekarêne mîr ên warê xwendinê û dibistanêne leşkerî re hatine çêkirin... Lê em gelek medenî nebûn. Piraniya caran rojê em mirov bûn şevê zirzop û pespende. Ew demên mîr û mîrane ew qasê giring bû û ew qasê pêgirî dihat kirin ku otorîteyeka çavdêriyê çêdikir. Bi tenê te dikarî tu bi çavekê li keçan binêrî. Heke te bi çavê hevalan lê binêriya ev dibû sebebê heneklêkirinê. Niho dema em mîr û mîr kom dibin em ji xwe re dibêjin “xwelîsero!”

Dema tevgerên kesekê bi hebûna jinan  
gelek guherî ez dikevim şiq û gumanê.  
Ji xwe ew kesên ku difikirin dema jin li  
civatê heyîn divê mirovan hay ji xwe hebe  
an jî baldar be, nîşanên wê yekê ne ku  
dema jin nebin ew nezaket tê nemîne.  
(Ew nezaketa Celal Bayarî jî behsê kirî  
dê nebe.) Ji bo wan kesan civata mîran  
avêtina barê nezaketê ye. Wekî ku nezaket  
dermanek e dema em biçin nik jinan em  
li rûyê xwe didin. Wek ti qedrê wê nîne.  
Wek nezaket ji bo tesîrê li hinekan bikin e.  
Wek çavkaniyekê ye ku dema lazim bike tê  
bikaranîn.

Ji xwe ne lazim e ez bibêjim li dîwanêñ  
mîran nezaket rabûye, ew wek jinîtî heta  
ku hevzayendîtiyê tê dîtin.

Nezake wek nazikîyê tê dîtin. Dema jin  
nemaze ew kesên hevzayend, bêedeb û  
bêperde diaxivin an jî “argo” diaxivin mîr  
xwe li pişt sînorê nezaketê xwe vedîşerin.  
Ev nezaket ji bo homofobîyê tê bikaranîn.

Têkiliyeka sexte di rihetiya di navbera  
mîran de û nezaketa ji bo jinan “tê  
bexşkirin” de heye. Ew dema mîr û mîr  
dikevin rihetiya bênezaketiyê rîyê li  
şextebûna nezaketa bi jinan re jî vedike.  
Nezaket dema wextê wê qediya dê bibe  
rêxweşkera tûndkariyê û zirzopiyê.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Di Weşanxaneya Îletişimê û kovara Bîrîkîmê de editor e. li Tirkiyeyê zêdetir li ser mijarên fikrên siyasî û îdeolojiyan lêkolînan dike. Di vî warî de çend pirtûk û wergerên wî he ne. Li Lîseya Mêran ya Stenbolê û li Fakulte ya Zanistên Siyasî yê Zanîngeha Enqereyê xwendina xwe qedandiye. Di sala 1963an de li Enqereyê ji dayik bûye.

#28 TAN  
MORGÜL

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## TU LI ÇI DINÊRÎ WILAN!

Formuleke wiha ye ku weke cinsek ji bo xwe bi xwe rizgar bike û tune bike hatiye çekirin, weke jehrîbûna ji xwarinê ye. Merbûn û tundkariya zaroka wê ya herî "safî". Ji bo dermankirinê dem pêwîste!

“Gelek tişt hene mirov bibêje, mejî gelekî tevlihev e, li gorî wê jî qayde ya gotinê jî dê tingûring be. Ji ber wê, ji kerema xwe nivîsê weke li keserekê guhdar dikin bixwînin”!

Aşkere ye ku nexweşiyeye ‘cins’, ya her yek ji ferdên vî ‘cinsî’ û ji ber mijara me ya erdnîgariyê heye. Hekena, Ti zindîwereke din nîne ku ji bilî dema kirina tiştên xwezayî yên weke zayîn û xwarin xwarinê, bela xwe li her tiştî bide.

Lê em dîsa jî şêweyê tundkariya mîran a kolektîv dînin aliyekî ku bi sedan salan gerstêrk kiriye gola xwînê û sedsala borî jî ji eyarê xwe derketiye; lewre rewşa mirovahiyê ya li kolanê, li malê, li dibistanê, li kargehê, di trafîkê de û di zaroktiyê û balixiyê de dikele û çavkaniyê ji hemû tiştên cinûs re dike jî gelekî bi bereket e.

Dema ku ji mirov tê xwestin di mijareke wiha de binivîse, ji adetê ye hema berê xwe dide zaroktiya xwe.

Dibe ku ez hinekî mezin dikim lê di dest de derfet û fersend hebûya, gelo wê çend zarokên li sikak û taxa me di filmê “Xwedayê Mêşan” (Ez dibêm ne hewce ye ku bibêjim hemû jî zarok kur bûn) ê William Goldingî de nelîstiba.

Ji xwe hinek ji van zarakan mezin bûne û hêrsbûna xwe di dersên dewletê de parzûn kirine û di çarçoveya derfetên xwe de di wan ‘filman’ de lîstine û hîna jî dilîzin.

Heke ku li derdorê xapandineke mîrên mezin hebe, divê wergereke vê ya

zaroktiyê jî hebe. Heta kelûpel hebin, wê ev werger bibe yeke wiha ku tundiya wê gelekî mezin be. Ji kerema xwe re beriya ku em li hember derkevin bilez vejerin zaroktiya xwe û vejerin.

Heke ku me dît em gelekî zehmetiyê dikişînin, wê gavê zêde bi dûr de neçin; Em ji Columbineyê dest pê bikin û li qetlîamên zarokên kur ên biçûk ên li lîseyen Amerîkayê kirine binêrin. Lê li vir li şûna sûcdarî divê zarok (ango zaroktî) li kategoriya mexdûran bê nivîsîn. Mijara hebûna me ya civakî, vestrîna me ya bi tecrubeyê hînbûyî û tiştên weke wan. Lê bi her awayî diyar e ku di rîya hebûnê de, li gorî rewşa desthilatê û hêzê pozisyon tê standin.

Yanî hemû rê ber bi Romayê ve diçin!

Fetleke berbat e ev; tundkariya mîran dikare mexdûran jî bike zombî. Me nedizanî ku di filmên derbarê ciwanan de ew xortêni di serî de ji çav dihatin derxistin, yên herî cahil, ji hêla fizîkê ve yên herî ‘dilmayı’, qelew, xwedî berçavk, tirsonek wê bi bêdengî li bûyerê temaşe bikin.

Helbet wê planeke wan jî ya tolhildanê hebûya, ji xwe jiyan wiha berdewam nake...

Û tew ew plan mafê beşdariya nimayışen mîraniya kolektîv bibin bide wan ku ev nimayış di bin kontrol û hîmayeya desthilatdariyê de ne. Wê gavê cahildî, sernermî, dilmayıbûn û tirsonekî dibe “belaya” zaroktiyê.

Di eslê xwe de her tiştî gelek baş dest pê kiriye, nafikire ku zirarê bide ti kesan, jiyanekê wiha ye ku bi bêdengî radibe ser tiliyên lingên xwe û di hembêza hezkirinê ya dayikê de ye.

Paşê ew jiyana bi zarokên ‘neçê’ yên kolan û dibistanê re dest pê kir. Tinaz dihatin kirin, li nermika guhên wî dihatin xistin, nedihat hiştin ku bedarî nava lîstikê bibe, dema destûra lîstinê dihat dayin jî her gav dihat azirandin, berçavkên wî diavêtin erdê, gelek caran bi şandina lîstika ‘keçan’ ‘gef’ lê dihatin xwarin.

Her lîstika li kolanê, her bêhnvedana li dibistanê dibû dojeh.

Tê bîra min, di salêن lîseyê de hevalekî me yê bi vî awayî, di bêhnvedanê ji polê dernediket ji derve, car caran serê xwe datanî ser maseya xwe û heta dersa din jî ranedikir. Car caran jî ji bo kes nêzîkî wî nebe (lewre kes ji bo sohbet û qencyî nêzîkî wî nedibû) diranên xwe diqiriçandin, hêrs dibû, çavêن xwe hûr dikir û li kêlekekê disekinî.

Lê ya herî nebaş, li dijî wê seansa xirabiyê ya ku ez nizanim cara çendê bû, serê xwe bi hêl li maseyê xistibû. Me bi milên wî girtibû da ku serê xwe lê nexe lê ew kurikê lawaz û yê cahil bibû xwedî hêza mîrekî zirmezin. Demeke wisa bû ku madê her kesên şahidî lê vê kiriye ji jiyanê dixeland.

Lê ya herî hebaş, me nekarîbû derbeya dawî li wê ‘lînca’ kolektîv bixista...Dibe ku roja hevalê me ya herî bextewer be ew roja ku dema zingilê dawiyê li dibistanê lê da.

Wê gelek zarok hebin ku di zaroktiya xwe de rastî vê orîna vandalî, destdirêjiyê

hatibin û jiyanekê ku di tirs, hêrs û êşa zarokên asta jêr de pijiyayî be... Lê niha hemû welêt mexdûrê van orîn, destdirejî û lêdana wê mîraniyê ye.

‘Temaşekirina’ li tiştîn qewimiye bi xwe jî bes e; lê bersiv û ew kompozisyonâ devkî û laşî ya ji wê bersivê hatiye holê amade ye: “Tu li ci dinêri wilan!”

Mîraniya ku bi dozîna ‘zayîn-nêçireke’ daimî û netêrbûyî tevdigere, weke dêwê kabûs derketiye ser sînga me. Nîşaneyeyeke bi vî awayî ye ku, weke ku hemû kolan ji dersa sporê ya bihenekî pengiziye; sîng bel û nepixî, mil bilindkirî, serî weke yê beranî li pêş, ling weke yê kevcal sekiniye, diranên li jorî dev li lêva jêrê kiriye, damarên stû nepixîne, dest vekirî ne û di asta mil de li pêş e, deng weke dewê meşkê û lewyê, kevir, ço, kêr û ya herî neçê çeka ku hatiye veşartin.

Ü li dijî vê cinûsa heyî, civakeke birîndar a ku bi xeyalên hatina ‘Mesîhî’ ve dijî. Ew Mesîhê ku dema civak dikeve xewê, wê ji lêdan û destdirêjiya heyî rizgar dike û ji nava filmî derdikeve û tê. Lê hêla wê ya balkêş ew e ku dema ew Mesîh were, wisa xuya dike ku ‘ew kesê di asta jêr de yê ku serê xwe li maseyê dida’ wê destûra tiştîn divê bêkirin nede wî kesê pîroz.

Car caran ev mîrbûna bêhiş û bêsinor dixwaze yê/a li hemberî xwe bike zarok; dixwaze wan bixe rewşa belawela a bêkontrol û metirsîdar a zaroktiyê.

Wiha tê xeyalkirin ku dema Mesîh hat, ne li bendê ye ku bi kesê pêşberî xwe re biaxive û ji bo bibe mirovîkî biserûber li ber bigere. Madem kû ketiye xewnê, wê demê, ew ‘zarokê’ asta jêr ci dixwaze divê ew bibe.

Wê ‘dev û diranên wî bêñ şikandin’ û hesab ji kesê ku nebaşî li wî kiriye bê xwestin, her dema wî wê bikin zindan, mala wî bi ser serê wî de birûxînin û malikê lê wêran bikin û...

Hêdî!

Bi rastî jî vîruseke berbat e; vîruseke wiha ye ku xeta di navbera mezlûm û zaliman de tune dike, di her rewşê de dikare laşekî ji xwe re bibîne ku hêkên xwe bera nav de, rehêñ wê di kûrahiya demê de veşartî û kevnare ye. Formuleke wiha ye ku weke cinsek ji bo xwe bi xwe rizgar bike û tune bike hatiye çêkirin, weke jehrîbûna ji xwarinê ye. Mêrbûn û tundkariya zaroka wê ya herî “safî”.

Ji bo dermankirinê dem pêwîste!

Bi verişandinê wê her tişt dest pê bike!

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger, Nivîskar û Geştyar e. Di sala 1973an de li Stenbolê hatiye dine. Di pirtûk û kovar, internet û rojnameyên cûrbicûr de, li ser mijarêñ tevgerên bajariyî û civakî, çanda futbolê, jîngeh û çanda geştyariyê û xwerinê ve nivîsandiye. Hevpeyvîn û lêkolînêñ wî hatiye weşandin. di du sale dawî yê Kovara Stenbolê de berpirsê weşanê bû. Bi koordînatoriya Bînnaz Toprakê li gel Nedîm Şener û İrfan Bozan di projeya bi nave “di Tirkîyeyê de cûda bûyîn: di çarçoveya ol û muhafazakariyê de yên din”de cih girtiye. Di rojnameya Radîkalê de 2 sal û nîve nivîsên wî yên derbare çanda masiyan de hatiye belavkirin. Di Ansîklopediya Rakîyê û Ansîklopediya Radyoya Açık de xal amade kiriye. Bi Ulus Atayurt re pirtûka bi nave “İstanbul Meyhaneleri ve Balık Lokantaları” nivîsandiye. Nivîskarê pirtûka “Rakı and Fish: A Mediterranean Seafood Odyssey” ye. Pirtûkê di sala 2014an de xelata Gourmandê wergirtiye. Senarîst û derhênerê belgefîlma bi navê “İstanbul Meyhaneleri: Vuslatın Başka Alem”e. koordinatorê rêsê pirtûkêñ çanda futbolê (Futbol Kültürü Kitapları) yê weşanxaneya îthakî ye. Li Londrayê dijî.

#29 HAŞMET  
TOPALOĞLU

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## LI HEWA RE YE

Tûndkariyê fîstanê bêdengîyê li xwe kiriye.  
Li hemîya malê digere. Ez dizanım ku heke biçim  
odeya piştê jî ez ê nekarim nefesê bistînim.

Li heware ye, têr û tîr e û bêdeng e. Ne hewce ye ku serê xwe rakim û lê binêrim. Ji xwe ez dizanim li wê derê ye. Her li wê derê bû. Hingî tê bîra min li ser serê me difire.

Ez piştrast im ji ber ku ez dizanim rayên wê li nik me ye.

Ji ber ku dêya min ji bo amadekirina xwarinê dereng maye bavê min bi hêrs radibe. Ji sarîncê hin pêxwarin tîne. Bi tevgerên req rûdine ser maseyî. Bi lezgînî dixwe. Xwarin amade ye lê ew rûyê xwe tirş dike. Dest li xwarinê nade. Li dêya min nanêre. Napeyive.

Tûndkariyê fîstanê bêdengîyê li xwe kiriye. Li hemîya malê digere. Ez dizanim ku heke biçim odaya piştê jî ez ê nekarim nefesê bistînim.

Min navek nîne. Çawa min nîne, belê belê min nîne.

Ez nizanim çawa çêbûbû, dema navê serokên komên li polê hatîn gotin jî navê min nehatibû gotin.

Keçikeka porkezî li min digirnijî, na heta ku li min dikenî. Êdî ew bûbû seroka pola 8 kesî. Bêhna min teng bû. Dema zengila bêhnvedanê lê da ez ber wê re borîm. Min enîska xwe hiçka lê da û borîm. Ew giriya.

Ê pa bila ew qasê jî ji min hebe ma ne?

Jineka cîrana me çûye bazarê, her tiştên anî li ber deriyî nijiland. Ti hal û taqeta wê nemaye. Li qumçika zengila mala xwe da.

Ji mala pênc mîr tê de, bi tenê alîkarîyek tê kirin ew li qumçika vekirina derîyî didin.

Ti kes nayê alîkariyê. Ji pencereyê nanêrin. Bang nakin ka alîkarî lazim e an no. Ji wan re ne xem e.

Ji xwe heta niho me ji aliyê dî yê dîwarî qêreqêr û daxwazên wek fermanan bihîstîne.

Wek sîyekê tûndkarê nesewiyayî li ber wê xanimê re borîm.

Bi sietan bû min hewil dida deriyê dolabê çêbikim lê çênedibû. Min aliyek digihand hev aliyê dî ji hev diket. Paşiyê tam şikest. Min xwe bi wan parçeyên saxlemmayî re aciz kir.

Jina ji min hez dike hema welê li min dinêrî. Min bi pencereyê re li derive nêrî. Du mîr sekinîne. Li serê caddeyê ne. Yek ji wan birêvebirê avahiya pirqet e. Yek ji wan mixtar e. Mêrekê ajovanê teksîyan xwe bi jinekê re aci dike. Qêreqêra wan e.

Şagirtê dikandarî, pakêteka çixareyan di destê wî de ye û xwe spartîye sarînca berfeşîrê. Mêrê bi jinê re şerî dike wekî ku bi destê xwe dibêje here û belaya xwe ji min veke. Rûyê mîrî sor bûye.

Ez ketim stresê û ji pencereyê dûr ketim.  
Min pencere girt.

Min dest avêtibû telefonê. Mi serikê wê guvaşt. Jina bi min re dixift israr dikir û digot divê ez îlanê mezintir bikim û bi faksê rêkim. Her ku diçû dengê min direcifî. Min digot ne lazim e ji beriya ku reşbelek bê qebûlkirin ez faksê bişînim.

Em pazdeh deqîqeyan axivîn. Ew berpirsa mişterîyên ajansê bû. Ez xeleka paşiyê ya ajansê bûm. Dengê wan her wek hev bû. Her ku diçû dengê min bilind dibû.

Kompleksek di dilê min de hebû.

Ew ji jor ve bang dike ez ji jêr ve diqêrim. Ez li bîra wê tînim ku ew nû hatiye. Ew gotina paşiyê dibêje û telefonê digire. Tûndkarî li milê min ma. Her kesen li ofîsê ketine stresê. Hewil didin, min haş bikin. Lê mexseda min xerab e. Ez behsa bêtecrûbetiya wê dikim, paşê behsa ehmeqîyê. Ez piştî her gotinê gotina jin dibêjim.

Hevala min got em qehwelian bibin û biçin li parqa li rexa mala min rûnin. Me welê kir. Sohbet germ bû. Li kursîkê rexê kesekê ji taxa me rûniştiye. Bi salan e ew bêkar e. Piçekê mehçûbane silavek li min da. Wî çıxareya xwe berdayê, dema mijan jê dikêşe li me dinêre.

Li parqê kurik û keçikekê dilîst. Kurikî li keçikê dida û direvî. Camêr, pêyên xwe vehêjand. Bêhizûr dixweya. Ji cihê xwe rabû. Şimaqek li keçê da paşê li kurî. Wek lêborînê ji me bixwaze destê xwe li me hêjand.

Me ji bilî neletlêbaranê tiştek nekir.

Şaşeya makîneya nîşan dide ka dora kê ye xera bûye. Dema kesek ji derîyî derdikeve dengekê ji-hal-ketî digot bila kesek ji dorê bê. Em di stresê de ne. Li dorê dinêrin. Me ne nîyet e em dora xwe bidin ti kesan.

Kesekê li pişt min bêyî ku bisekine diaxivî. Ya rastî hewil dida biaxive. Diyar dibû ku kesek bi ser wî de dihat, sivikayî lê dikir, êrîşî wî dikir. Min mereq kir. Min li rexa xwe nêrî. Mêrek ciwan eniya xwe digemirand. Li rexa wî jin û zarokên wî hebûn. Bêdeng bûn û li rexa hev rêzkirî bûn.

Piştî bidawîbûna axiftinê mîrî dest bi gazindan kir, gazinda ji dorê, ji sîstema saxlemyî, gazinda ji bijîşkan...

Hêrsa wî li hewayê belav dibe, reng diguhere. Her ku diçû axiftinê wî kirêttir dibû. Dijûn li her gotina xwe zêde dikir. Ji çavê wî diyar bû ew hînî tûndiya bi gotinan nebûbû, tirsa ji kêmtecrûbetiyê dixweya.

Tam min an pîrejina li rexa min dê tiştek bigota karmendên parastina nexweşxaneyê hatin. Hêrsa wî mîrî vemirî lê tûndiya li me kirî ma.

Li ser maseyekê mezin me li hev dinêrî. Piçekê bi xemê û piçekê bi mehçûbiyê. Demekê dirêj bû ku me hevdu nedîtibû û neaxivîbûn. Em ji cihê xwe hêdîka rabûn û her kes ber bi mala xwe ve çû.

Em li ser poşmaniyê xwe, tecrûbeyên xwe yên xerab axivîn me pêşniyar ji hev re gotin.

Cara pêşiyê bû ku ev qasê zelal me behsa zeîfiyê xwe, xeletiyê xwe û sedemên wan kir.

Nizanim ji ber çi bû dîsa em ne rihet bûn.

Bi rastî jî niho qediya, dê dîsa nebe?

Bêtëhemilî, hesûdî, hêrsbûn, xeyalşikestin  
û qelsîyên ku me diguherin gelo wê rêyê  
didin me ku mafê me hebe em wan  
kiriyan bikin?

An jî heke em wan tiştan bibêjin, em ê  
bihêztir bibin û ji tûndkariyê azad bibin?

Em hêdîka serê xwe rakin û li asîmanan  
binêrin.

*Têbînî: Ketiye jiyanê, hatiye bihîstin, hatiye  
dîtin û hatiye xeyalkirin.*

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Nûçegihan, Derhêner, Dizayner, Pêşkeşvan û Şêwirmend e. Di kanalên wek ATV, 32 Gun, NTV û TRT'ê de kar kiriye. Li du qonaxên cûda de Rexne li ser fîlman nivîsandiye. Ji sala 2002yan vir ve di qada film û belgefîlman de derhênerî û dîzayneriyê dike. Di nava fîlmên wî de fîlmên wekî, 34 Taksî, Beş Yapı Ustası (belgefîlma derbarê pêvajoya kişandına fîlma Anlat İstanbul e), Bu Ne Güzel Demokrasi (derbarê berendamên parlamenteiyê jin de) û Şîmdîkî Zaman hene. Filma Şîmdîkî Zaman (Dema Niha) heft xelat stendiye.

#30 RAUF  
KÖSEMEN

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# ÎNKARKIRIN NEXWEŞIYA HAFIZEYA MÊRAN E

Mêrê ku difikire hesabdîtina xwe bi mîraniyê re qedandiye, nexwe ew bîranînên ku li hemberî rewşên mîraniyê têk diçin ji hişê xwe dibe.

Bi qasî ku tê bîra min, hemû bûyerên tundkariyê yên di zaroktiya min de, yan weke bêgunehiya terlika dayikê, yan weke lehengiya rizgarkirina birayê min, an jî weke teseliya di gotina "ji xwe her kesî ji wî mamosteyî lêdan xwariye" de bû. Lê tiştên piştî wê, ew tiştên di salên lîseyê de baş têr bîra min ku li hêlekî wê êrîşên testosteronê, li hêlekî din jî ezmûna ketina zanîngehê hebû.

Di salên lîseyê de mîrbûn di navbera gotina, "min jî kulguk lê da" û "heke ku bi min negirtana min ê dev û diranên wî bişkanda" diçû û dihat û mîrbûnê bi gotina "vaye jinek!" dengek ji nava xwe ava dikir. Xuya ye ku ez bisiûd bûm. Ji ber ku fişara exlaqî ya hişkbawer a dê û bavê min ên mamoste bi taswasa zanîngehê re dikete nava hev û hevsengiyek çêdikir. Vê hevsengiyê nehiştibû dengên dilê min min bike êrîşkarekî hişk.

Ji xwe ez qet di salên lîseyê de nehatim çewisandin. Li kolanan min qet lêdan nexwar. Tirs bi min re çênebû û ez gotinên "ti li çi dinêrî wilan" ên mîrên nenas ji nedîtî ve nehatim. Ez ji cin û periyam netirsiyam, li hemberî cinvedanê min ti dia ji ber nekirin. Ji ber êrîşa yekî ji min girtir an jî wêrektir, min qet baz neda. Min xwe li ser serê kesên ji min biçüktir û bêhêztir mezin nekir. Ji ber jîrbûna xwe min xwe li ser yên din mezin nekir û ew biçük nexist. Xizmîn min ên wiha nebûn ku dema min alîkariya karêن biçük ên malê dikir bi gotina "serjinik" henekên xwe bi min bikirana. Kêfa min ji erebeyan re nehat, ew hêvî qet bi min re çênebû mekîneyekê bixim şûna laşê xwe yê lawaz û xwe bîhêz

bikim. Ez û zordestan zêde pêrgî hev nehatin, dema em pêrgî hav hatin jî yan min ew kutan yan jî min li wan mîze kir ku ji ber tirsê bêyî li du xwe binêrin direviyan.

Min destdirêjî li ti jinan nekir. Min li qalçeyên keçen ku bi bayî re kirasên wan bilind dibûn nenêrî. Ez neketime paş perdeyê û min li jinên di rê de derbas dibin nefîkand. Ji ber li hevala min nêriye min hevalên xwe kom nekir û çavê ti kesî netirsand. Baweriya min bi wî tiştî nehat ku keça cîranan bilikê min gelekî meraq dikir, heta dema dêya min ne li mal bû, bi zorê xwe kontrol dikir ku ji bo xwe navêje mala me û ez nekevim ser dilê wê. Min dilê xwe ne bijand wan hevalên xwe ku li ser dekolteya mamosteya min difikirin û masturbasyon dikirin û bi kêfxweşî ji me re behsa vê dikirin. Ez nebûm yek ji wan kesan ku ji ber keçka xweşik a taxê, li kurikê karmendî yê ku nû hatiye bajêr dinêre, dibêjin "em wî kurikî bikutin". Baweriya min qet bi wî tiştî nehat ku jinbî hîsterîk in, keçen azib har in. Min hewl nedida wî tiştî ku dema şev diket erdê û deng ji herkesî dibiliya li weşanên erotîk binêrim.

Min carekê bi tenê jî bawer nekir ku jin bêhêz in û hewceyî bi mîran in. Min qet dijûn nedan û nexwest dijûnan bidim. Ji ber ku ji me hinekî din dilşikeşti û narîntir bûn, min ji bo hemzayendêن xwe negot "îbne" û ez li paş wan neaxivîm. Min bi kelecan li wan çîrokêن li ser kerxaneyan guhdar nekir ku yên ji me meztir digotin. Min bi kelecan li wî tiştî guhdar nekir ku digotin, xalekî dest avêtiye jina cîranî û ji ber wê jî helbet baweriya min bi wî tiştî nehat ku xalekî din dema li ser jina cîranekî din hatiye girtin hatiye kêr kirin û ev jî heq kirîye. Min guh neda wan zarokêن

gundî yên li pola min ku digotin ew çawa bi ker an jî seyekî ketine xelwetê. Min ew sûcdarî asayî nedîtin ku hekeman îbne dibîne, jinên xwedî karaktera hişk lezbiyen dibîne û mîrê pordirêj serjinik dibîne. Bala min neçû ser çekan, min heqê kuştina wan kesan di xwe de nedît ku min ji wan hez nedikir an jî dijminên welatî bûn.

Ez dûrî wan bîranîna me ku kekêن me behsa wan dikir. Ew kekêن me yên li leşkeriyê qet lêdan nexwarine, digotin ku bi hinceta çûna nobedariyê dicûn bi keçen sûbayan re radizan. Min leşkeriya xwe 28 rojan kiriye û ez di vê demê de nebûme yek ji wan kesan ku her serê sibehê bi qajewaj dihatin hişyar kirin û rojê heft caran dihatin hejmartin. Ez di van rojêñ hindik de qet nehatime biçûkxistin û min çavdêrî li biçûkxistin, dijûn û lêdana leşkerêñ din nehatime ku wan leşkeriya demdirêj dikirin. Di dema leşkeriya xwe de min dijûna ku di devan de bûbû benîst neda.

Min beşek ji yên li jor kirine ku min gotiye nekiriye. Ez bûm şahidê hinan ji wan. Hin ji wan tecrubeyêñ min bi xwe ne. Min hin ji wan jî ji bîra mîraniyê ya hevbeş berhev kirin.

Ez ne bawer bim ku mîrekî yek ji van nekiribe hebe. Li gor nêrîna min nekirina yek ji wan wê nebe ferqeke mezin. Dawiya dawî hemû jî weke hişê mîrbûnê yê hevbeş kom dibil û dikevin zêhna me. Ji ber wê ye ku ew rewşen mîrbûnê yên em tecrube dikin jî, weke proteza bîrê di zêhna xwe de digirin.

Dema mijar dibe bîr, her gav di navbera rastî û çîrokê de cudahî çêdibe. Çîrokê rast û rewşen ku hêjayî vegotinê têñ dîtin

jî gelek caran ne heman tişt in. Çîrokêñ şexsî jî di heman çarçoveyê de ne. Ez weke mîrekî dijîm û ji pencereya mîraniyê li rastiyê dinêrim. Heke ku ez tomarkirinêñ xwe ji bîra mîrbûnê berhev dikim, wê gavê ez çîrokê jî bi mîrbûnê vedibêjim.

Heke ku hûn nêrîna min a fermî ji min bipirsin, min ev kêseya mîrbûnê çareser kiriye. Ji xwe ez mîrekî xwende me. Ez di navbera zayandan de cidaxwaziyê nakim. Mejiyê min di mijara zayenda civakî de vekirî ye. Jidil ez dixwazim dûrî zimanê mîraniyê bibim. Ez hevsengê di navbera xwe mîrbûnê de çêdikim, wan kontrol dikim.

Lê rastiya meseleyê ev e ku, ez jî weke ew kesen ji diya xwe mîr hatine dinê û baweriya wan bi wî tiştî tê ku wê di demê de bi vî tiştî re hesabê xwe bibîne, ji his ketime.

*Yekta Kopanî di beşeke nivîsa xwe de wiha gotibû ku ji bo vê rîzenivîsê nivîsandibû:* “Qey dema mîrek li hemberê mîrekê dî têk diçe hişê wî wê bûyerê paqij dike. Ez ji vê perspektîvê berdewam bikim; Mîrê ku difikire hesabdîtina xwe bi mîraniyê re qedandiye, nexwe ew bîranînen ku li hemberî rewşen mîraniyê têk diçin ji hisê xwe dibe.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Dîzayner, Rêveber û di Radyoya Açık de bernamevan e. Avakerê Konferansa Sudmendiya Civakî ya Hemzemîn û Endamê Lijneya Rêveber ya Komeleya Ofîsa Çandê ye. Endamê GMK, ÎTMK û RYDyê ye. Her weha avaker û rêveberê, Ben Bugün Bi'şey Öğrendim (Ez îro tiştek hîn bûm)e û Dîzaynerê Saziyên Sîvîl ên Civaki ye. ji bo birarziyê xwe yê 11 salî wekî Ap dixebite. Pêş de Endamê Komîteya Rêveber a Weqfa Dîrokê bû. Li Zanîngeha Kulturê dersdêrî û di hinek kovarande niviskarî kiriye.

#31 SÜREYYA  
EVREN

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## Jİ BO DEMA PÊŞ 7/52

Xweşkiyeke formata rastiya 7/52yê ew e ku, heke di 52 hefteyan de mîrek bi tenê jî nikaribe bendewariyê bi cî bîne wê ev fetl berdewam bike. Bila bi qasî xwesteka wan şâşîtiyan bihewînin. Format li hemberî van, ji destpêkê xwedî bexwedanekê ye.

Ji bo projeyeke bianetê ez vê nivîsê dinivîsim. 52 mêt wê li ser tundkariya mêtan binivîsin û her heftê wê yek ji van bê weşandin.

Ez hewl didim ku bingeha vê mijarê fêm bikim. Dema em bixwazin 52 mêt li ser tundkariya mêtan binivîsin, gelo em çi van 52 mêtan dixwazin? Weke hejmara 52yê ji bo projeyê li salê belav bike, weke fetlekê ye, weke sembolîzmek be. Dibe di hefteyekê de heft nivîs bihata nivîsandin û hew. Ha 52, ha 7, armanca wê yek e. Yanî hejmareke bêsinor, yanî ne hejmareke diyar, yeke berdewam dike, tiştekî ku dibe berdewam bike, aliyekî wê hetahetayî vekirî.

Wê gavê em vî tiştî bipirsin: Heke em ji hejmareke mêtan bixwazin li ser tundkariya mêtan binivîsin, gelo em çi ji wan dixwazin?

Ez vî tiştî bi vê xeyala xwe re didim ber hev; weşanek heye, bi 52 welatiyên bijarte yên welatê Xê re hevpeyvîn kiriye. Hevpeyvîn derbarê dagirkirî, talankirin û kolonyalîzma Xê li Yyê kiriye de ye. Anglo derbarê qetlîamên li ser gelê Qyê kirine de ye. Yan jî em ji 52 çermîspiyan ên binyada wan digihêje xwediyê kolejan, dixwazin ku derbarê nijadperestiya li reşikan hatiye kîrin biaxîvin. Hin mînakên din ên politîk têñ hişê min lê her yek ji wan bi giraniya xwe û belavkariya xwe têñ hişê min. Ji ber wê ez dixwazim sînordar bikim. Gelo em ê ji niştecihê welatê Ayê yê azadîxwaz an jî ji çermîspiye azadîxwaz bixwazin biaxive û bide ispatkirin ku ew azadîxwaz e? Weke li ber devê derî em jê bixwazin ku karta xwe

ya derbasbûnê li ber derî bihêle. Ez wisa nafikirim, divê armanc ne ew be ku hin kesen ji nava “nebaşan” biseridînin û hin kesan jî di ser de bigrin. Divê ji vê zêdetir be.

Em bibêjin ku çermîspiye behsa nijadperestiya çermîspiyan a ku bûye şahidê wê dike û vê jî bi bûyereke krîtîk bi mînak dike. Em ê wisa bifikirin ku vegotina wî ji ya reşikekî wê cidatir be. Gelo ev cidahî ji ber rexneyeke “bêalîtir” û “objektîvtir” e?

Dema em li lîseyê bûn, filmekî li dijî tecawizê bûbû populer The Accused (Şahid, 1988). Me du sê mêtan lê temaşe kiribû. Roja din, dema hevalekî ku me bi hev re li fîlmî temaşe kiribû ji keçkîn sinifê re behsa filmî kir, wiha gotibû; “Ez li ser fikirîm û min biryar girt ku ez ê ti caran tecawizê li jinan nekim!”

Tê bîra min ku kîfa ti kesan ji vê şîrove (û sozê) re nehatibû.

Gelo reşikan qet dixwest bibîhîzin ku çermîspiye bibêje ez ê çi caran nijadperestiyê nekim? Min ne bawer e. Ez wisa difikirim ku sedema esasî ya vê dilsariyê ew e ku di gotina “min biryar da ku ez nekim” de “ihtimala kîrinê” û “ya hewesê” zindî ye. Dibe ku pêwistî bi betalkirina vê ihtimalê heye.

Bîranîneke din. Vê care ne salên 80î, lê ez wisa dizanim ku salên 90î ye. Hevalekî hunermend, şevekê dema li Kolana û Istîklalê dimeşe, dibîne ku li kolana teng a li kêleka Konsolxaneyâ Fransayê, mîrek li jinekê dixe. Gotibû ku ew li serê kolanê sekiniye, bêyî ku tiştekî bike li lêdana mîr li jinê kiriye temaşe kiriye û piştî lêdan qediya ye û mîrik sekiniye, ew jî ji ciyê xwe lebitî ye û ji wir meşiya ye çûye. Gelo wî hevalî bigota "Piştî bûyera li Beyoglûyê, di rewşen wiha de ez ê wêrektir bim û mudaxeleyî bûyerê bikim", wê kêfa me ji vê soza wî rebihata? Gelo em ê bixwazibin ku 52 hefteyan vî tiştî bixwînin? Em çima naxwazin?

Weke ku em naxwazin bîryarek hebe lê em dixwazin xwezayîtî hebe. Ji xwe ber be. Û em dixwazin nîşaneyekê bide me ku wê ji xwe ber be. Heke ku 52 hefteyan 52 mîr işareteke wiha bide te tû yê bixwînî. Hemû reşik wê bixwînî.

Wê gavê em dixwazin gotineke ku fikra me ya derbarê xwezaya çermîspî/mîr de nû bike hebe. Çima? Gelo hewcedariya me bi hizra wî tiştî hebe ku nebaşî bi hemû tiştîn xwe nenebaşî ye? Heke ku hebe ji bo çî?

Bi qasî ku ez dibînim, di esasê xwe de, ji bo ihtimala jiyana bi hev re li ser lingan bihêle, ji bo dahatê ye. Ne ji bo tolhildanê lê ji bo jiyaneke nû û ji bo pêbawerî ji nû ve bi jiyânê bê.

Pyotr Kropotkîn, yek ji giregirê anarsîzma klasîk, behsa meseleke etîk dike: Li beramberî vê pirsê Kîjan bersiv a herî etîk e? Dema hûn bibînin zarokeke keç dikeve avê û difetise, hûnê bi ci sedemê wê rizgar bikin? Piştî hinek kolandikê bersiv wiha diyar dibe: Bêyî li ser bifikire

û beyî ti hincetan nîşan bide, bi armanca rizgarkirinê xwe bavêje avê, helwesta herî etîk ev e.

Ji ber wê ye ku lixwemikurhatin û behskirina çewisandinê aramîyê nademe. Weke ew dengê ku dibêje "Tu rastiyê bixwazî berê, dema ku min reşik didîtin dilê min ji bo zordestiyê lê dida, dema jinan behsa veqetandinê dikirin gelek caran min dixwest li wan bidim lê min bi darê zorê xwe digirt, gelek caran min di dilê xwe de dixwest tecawizan bikim lê min hemû jî da sekinandin, lê we hay jî jê nebû û hwd" û me biricifîne.

Behsa hewesên xwe û ji wan helwestên etîk ên di encama hewesan de derdikevin neke. Ev ne mijara me ye. Hêviyekê ji bo derfeta jiyana bi hev re bide min. Tiştîn baş ên di xwezaya xwe de nîşanî min bide.

Em dixwazin lehengî hebin lê bila neberçav bin –em çîrokên lehengiyê naxwazin. Bila Schindler lîsteya Schindlerî bi xwe nenivîse.

Ne lixwemikurhatin, ne çîrokên lehengiyê, ne nimayîşen mezin ê wicdanî, ne jî hetîketiyêñ lixwegirtî pêşiyê lê vedikin.

Pêwistî bi wê hestê heye ku bêdeng be, bêdanezan be û bizanibe rastiyên ji dil li wir in.

Xweşîyeke formata rastiya 7/52yê ew e ku, heke di 52 hefteyan de mîrek bi tenê jî nikaribe bendewariyê bi cî bîne wê ev fetl berdewam bike. Bila bi qasî xwesteka wan şaşîtiyan bihewînin. Format li hemberî van, ji destpêkê xwedî bexwedanekê ye.

Li şûna anekdotên xirab dibe anektodên

baş bêñ vegotin, dibe mînaka wan jî bêñ dan. Dibe nivîsên dem û helwestêñ alîgirêñ jiyanê jî bêñ nivîsandin. Lê em ê nexwazin bi mînakêñ baş bibin alîgirêñ jiyanê. Divê jixweber û pêbawer be. Divê baweriya me bi wî tiştî hebe ku dema em di avê de difetisin bêyî tiştekî bifikire kesek me rizgar dike. Bi vê re em ê bawer bikim ku dema yek di avê de bifetise bêyî em tiştekî bifikirin xwe bavêjin avê û rizgar bikin. Em bi vî awayî ji xwe hez bikin û baweriya me pê bê ku em ji yê din hez dikan.

Heke gotinêñ dumahikê leheng bin ji ber wê jî pêwîstiya nivîsên wiha û rêzenivîsên wiha bi gotinêñ dumahîkê nîne, pêwîstiya wan bi hîkmetê nîne, bi qet bi belavokêñ mezin nîne.

Ji bo projeyeke bianetê ez vê nivîsê dînîvîsim. 52 mîr wê li ser tundkariya mîran binivîsin û her hefte wê yek ji van bê weşandin.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Di Arterê de editör e. Ji sala 1991an ve xebatêñ xwe diweşîne. Du pirtûkêñ wî; Buluntu Kitap: Edebiyat ve Gündelik Hayat Üzerine Denemeler (2017) ku ji cerebeyan pêk tê û romana Yakınafrika (2018). Di kovara Sanat Dunyamız de weşandina gotarêñ pêşangehan bi sernavê "Bi mirûzkirî gerîna li nav pêşangehan" berdewam dike.

#32 OLKAN  
ÖZYURT

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# BAVÎTÎ: DI GOTİNÊ DE WEK AGIRÎ YE, DI KIRIYARÊ DE DIKE BIKEVE

Bavîtî ne karek e, navê wê têkiliya te ya bi zarokên te re ye... Ji ber ku hêj zû ve haya min ji vê yekê çêbû ez bi şans û siûd bûm.

Dema mîrek agahiyekê distîne ku ew ê bibe bav, difikirire ku ew ê bibe bavekê bêhempa û dê ne wek bavê xwe be. Lê paşê, bi borîna demê rastyên jiyanê xwe der dikan. Mîr ji bavîtiya bêhempa derbasî bavîtiya ji rêzê dibe.

Erê ji ber çî?

Çar sal in ku bav im û dibêjim qey bi tecribeya xwe ya çar salan ez ê bikarim bersivekê bidim...

Dema ku hevîna min hat û ji min re got ez ê bibim bav wek her kesan ez jî bi kelecaniyê ketim tarîtiyeka şîrîn. Dema min xwe ji beriya bavbûnê amade dikir de, ji kesen li derdora xwemin zanî ku li gor çandê, bavbûn yek ji bileyên qedirbilind yê mîrbûnê ye.

Dema ku hin kesen li derdorê hatin û gotin “êdî tu jî dibî bav” di eslê xwe de peyamekê idin ji bo tu ji bo bavîtiya ji rêzê amade bî.

Hev zayendê min ên ez pîroz dikirim bi peyama veşartî di eslê xwe de, bêyî hemdê xwe karê xwe pêk dîanîn.

(Ji bilî çend hevalan) ji bo parvekirina tecribeyan her kes ketûm bûn. Tiştê xerîb jî ew bû ku mîrên hez dikan li ser her tiştî biaxivin dema mijar bibe bavîti bi gotinên “şevêñ bêxew li pêsiya te ne” bavîtiyê li ber dilan reş dikan. Ya rastî ev gotin nîşanên wê yekê bûn ku bavîti wezîfeyek e.

Tu zarakan çedikî, berbirsiyariya wan didanî ser milê xwe, hewceyîyê wan

pêk tînî, bi wan re wextekê derbas dikî, fedakariyê ji bo wan dikî, nahêlî bibin hewceyî ti der û kesan...

Paşê ew ê mezin bibin. Tu jî dê karê xwe temam bikî.

Tam hingê dîmenekê ji Yeşîlçamê(filmên kevin yên tîrkan) hat ber çavêñ min:

Kur: Bavo te ji bo min ci kiriye?

Bav: Min nehiştiye ti kêmâyî li te bibin, min tu dayî xwendin û mezin kirî.

Kur: Belkî te pere dida min, di berîka min de pere hebûn lê te ez ji hezkirinê bêpar dihiştîm. Dema min ev keşf kir min zanî ka ji ber çî li van deran bav dema ji zarokêñ xwe hez dikan jî wê rasterast diyar nakin.

Halbûkî bavîti ne karek e, navê wê têkiliya te ya bi zarokêñ te re ye... Ji ber ku hêj zû ve haya min ji vê yekê çêbû ez bi şans û siûd bûm. Ji beriya ku zarokêñ me çêbibin, em çûn cihê perwerdeya ji bo “jirokbûna xwezayî”(Ne hewce ye em derewan bikin berê min gelek kêm dît, paşê dema hevalekê israr kir min dest ji tevgerêñ xwe berda û çûm.)

Min li wê derê zanî gelek tiştîn me ji ber kirine ne rast in. Min li wê qursê zanî bavîti ne navê wezîfeyekê ye navê têkiliyekê ye.

Dema Alî Guney jî hat dinê min bi vê pîvanê têkilî pê re danî. Heta ku gotinek adayika min ji min re bû rêber: "Kurê min ew zarokek e, dê harbînîyan bike, dê guhdariya te neke, dê wek delalkîyan tev bigere. Hemî jî normal in, tu dest ji dilrehmiyê bernede."

Her tişt di rêya xwe de çû. Em keyfxwêş bûn. Ji ber ku em zarokparêz bûn û me ew jî kir şirîkê jiyanâ xwe em keyfxwêş bûn.

Dema hûn bibin bawekê ne ji rêzê dikare gelek tişt bêne serê we jî. Serpêhatiyeka min a bi Alî Guneyî re ji bîra min naçe. Em li navenda girtî ya bazarê bûn. Paçikê binê wî dê jê biketiya. Ez çûm cihê guhertina paçikê binê zarokan. Min hin dît ku qedexe ye mêt biçin wê derê.

Dayikekê nehişt biçim. Ji ber ku li heman derê dayikan şîr jî dida zarokan. Ew cih wek cihê mehremiyeta jinan hatibû çêkirin. Lê binêrin çawa li gor erkên ji bavan re hatîn dayin mîmarî û avahî jî hatiye guhertin.

Destpêkê têkiliya me li ser wekheviyê bû. Piştî zarok mezin bû êdî ziman jî ket. Êdî bersiv dida gotina min. Li hemberî gotina min gotina wî... Êdî bi hesta desthilata di gotinan de ez pê hesiyam ku hewil didim ne hişk jî be sînoran danim ber wî.

Wê pêvajoyê ez ber bi bavîtiyeka otorîter ve dibirim. Dema ez dibêjim otorîter jî xelet fêm nekin. Ya baş ew e ku ez ê nimûneyekê bidim.

Dema sibeyê divê kurê min biçe dibistanê min ew hişyar dikir. Divîya wî ji bo dibistanê amade bikim. Lê dema ew hişyar dibe hişê wî li ser pêlîstokên wî ye.

Ez dixwazim wî amade bikim lê ne xema wî ye. Hingê ew xeta zirav ya otorîteyê tê şikandin.

Piştî hevjîna min ez hişyar kirim ez ji wê rîyê vege riyam. Ez çûbûm ber deriyê bavîtiyeka ez naxwazim û jê vege riyabûm. Pêsiyê min nedixwest qebûl bikim ku ber bi wî deriyî ve diçûm. Paşê min qebûl kir.

Divê bibejim ku qebûlkirin jî gelek zehmet bû. Gelo ez bavekê xerab im, na. Em bi hev re wextekê xweş diborînin, erê. Gelo fedakar im, belê. Ji bo bavîtiya xerab jî heman gotin dihatin gotin. Ez dîsa hatim serê meseleyê.

Ew qebûlkirinê mîraniyê ji dizî ve lio dora min digeriya. Wê kengê valahiye li min diît xwe diavêtê. Herweha em diketin dubareya bêsekin. Şikandina wê dubareyê zehmet e. Ev yek jî nişan dide ka çawa mêt ji bavîtiya bêhempa vediguherin bavîtiya ji rêzê.

Dema ez di nava bavîti û mîraniyê de vedigevizîm, min dît ku kêşeyen bavîti û mîratîyê li rexa me bûn.

Dema hûn nû dîbin bav hûn dibêjin "em ê bi hev re mezin bibin" lê paşê bêyî ku lê bihesînin hûn dikarin barê hestebariyê danin ser milê dayikan.

Dema hûn nehêlin zarok xwe bi dilê xwe ifade bike. Dema em bifikirin ku zarokên kur li bavê xwe diçin. Em ê li rewşeka bêçare asê bibin.

Ev rewş dê başê bibe çavkaniya kêşeyan.

Mesela têkiliya we ya bi zarokên we re dikare tesîrê li têkiliya wan a bi civakê

re bike. Ji ber wê min fêm kir ku bavîtî ji îmtihaneka ciddî ye. Ew wek eynikeka we ye. Tiştên heta hngê we li xwe kom kirîn. Zanîn û dîtîn nîşan dide.

Hûn di gotinê de dikarin wek agirî bin lê bi kiriyarê?

Bi têkiliya xwe ya digel zarokên xwe hûn bersiva vê yekê didin. Min ya rastî bersiva xwe stand. Di kiriyarê de mabûm îmtihana duyem a telafîkirinê. Rojekî Alî Guneyî ji min re got "dema tu ji min aciz dibî, ji min dûr bikeve û paşê were nik min."

Dema wî ev gotin gotîn ew çar salî bû. Ev gotin ji min re bû mîladek. Paşê me dîsa têkiliyeka bingehê wê li ser wekheviyê danî.

Her tişt serast dibin.

Ez niho xwe amade dikim ku bibim bavê keçekê.

Ka em lê binêrin pêvajoyeka çawa li pêşıya me ye.

Dema em wê bijîn em ê wê jî bizanin.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger û nivîskarê sînemayê ye. Di rojnameya Sabahê de editöriya pêvekên dawiya hefteyê dike... Di Sala 2000an de di beşa çand û hunerê ya rojnameya Radikalê de dest bi rojnamegeriyê kiriye. Di sala 2008an de jî di beşa çand û hunerê ya rojnameya Sabahê de dest bi kar kiriye. Di kovarêni Milliyet Sanat, Popüler Tarih, Sinema, Empire Türkiye, Aktüel, Arka Pencere de gotar û rexneyên wî yên li ser sînemayê hatiye weşandin. Nemaze li sînemaya tirkî hûr bû. Endamê SIYADê ye û hê jî dixebite. Di sala 1977an de li Yozgatê ji dayik bûye. Di Beşa Maliye ya Fakulteya Îqtîsadê ya Zanîngeha Stenbolê û Beşa Radyo, Televîzyon û Sînemayê ya Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Marmarayê de xwendîye.

#33 TUNCA  
ÖĞRETEL

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# BÊ-RÛ(BARÎ)BÛN!

Divê em tenê rûbarî tiştên ku me kiriye bê?  
Divê em rûbarî wan ‘bûyeran’ jî neyên ku ji  
çîrokên erdnîgariya me re dibin ‘çavkanî’?

Nizanim ez ê çawa dest bi vê nivîsê bikim. Na, helbet hin tişt hene ku ez behsa wan bikim. Lê ez nizanim ‘Bi kîja lixwemukirhatinê re bihêlim hûn nefretê ji min bikin’ û ‘ez bi kîja xerabiya xwe re rûbirû bibim’.

Ez 20 salî bûm. Weke her şevê dîsa me xwe li quncikekê nixamtîbû. Ez û hevalên min, ên weke min ‘xwîngerm’. Me behsa çavşoriyên xwe dikir û behsa lêdana wî zirxortî dikir ku ji ber lêdanê ji ser hişê xwe çûbû. Ji ber ku di bin çavan re li me nêrîbû me lêdabû.

Min Ahû di şeveke wiha de dît...Ew Ahûya ku hefteyekê berê ji mala dê û bavê xwe veqetiyabû û li bajarekî din bi cî bûbû. Xwendekara zanîngehê bû.

Piştî wê şevê jî min ew her dît...Kî dizane, dibe ku ji bo ez wê bibînim min, tevdigeriya. Xweşik bû. Dizanîbû ku ez lê dinêrim. Di rastiyê de dilê wê jî di min de hebû lê xwe giran dikir ew a çirtik.

Şevekê, bi fîstanê xwe yê kurt careke din li quncikê xuya kir. Min da pê... Nayê bîra min ku min da pê wê bi xwe yan da pê ranên wê yên dawetkar. Me yek du kolan borand bi vî awayî. Li ber mala Renaya Rûm min bi dest avête milê wê. Bêjiyên me yên bonzaiyê dikişînin, xwe li wir digirtin. Li gorî gotina bavê min mîrê wê di destpêka zewaca wan de miribû. Li gorî gotegotan, piştî mirina mîrê xwe Renayê ‘karmendiya’ hemû mîrên taxê kiriye.

Weke dengê bêhnstandinekê hat. Na, ne veceniqî...Dizanîbû kesê bi milê wê girtiye

ez im. Wê jî dixwest û min ev dengê hîsterîk, ji filmên pornojê dizanîbû ku min li wan temaşe dikir!

Min destûr nedayê ku yek gotinê jî bike û min ew ji deriyê şikestî yê mala xirbe ya Renayê xiste hundir. Gotinên wê sar sar bûn. Weke reş tarîyê. Min maç li lêvên wên kir, bêdeng ma. Min fîstanê wê jê kir û destê xwe li ranên wê gerand, deng nekir. Yê min rep bû!

Paşê, ji nişkê ve lêvên wê liviyan: “Neke.”

Weke difetise, weke qêrîna kêzikekê. “Neke!” Ez behitîm...

Kefa destêن xwe da ser sînga min û bêyî ku hêzek tê de hebe min dehf da.

Ez hêrs bûm. Ez bi ser de qêriyam û min got, “Çawa neke orispî! Te heta vir min li dû xwe kaş kir, niha jî tu xwe binamûs nîşan dide?” Di her kiteyeke min de lerizi. Şaş fam nekir, pê xweş dihat!

Min xwest ez Ahûyê li ser kevirî dirêj bikim... Li ber xwe da. Min kulmek li ser devê wê xist. Tarî bû. Min ferq nekir ku tiştê destê min şil kiriye xwîna ji lêvên wê yên qelişî ye yan rondikên çawê wê ne.

Kete erdê... Min bincilkê wê jê kir û ez ketim nava wê. Zêde dirêj nekir, ez zû vala bûm. Min şerm kir. Pêşiyê min îske îskên ne diyar bihîst, paşê qêrînên weke wan sîrenan ku dema bombeya atomê avêtibûn Hîroşîmayê hatibûn lêdan. Ez tırsiyam. Gelo pê xweş nehatibû? Yan henekê xwe bi min dikir? Min kulmek din lê da. Dengê xwe nebirî. Yeke din, yeke din, yeke din... Deng jê biliya, lê kela min hîn jî daneketibû. Ti kes nikare min ewqas biçûk bixe. Him wê bi fîstanê xwe yê kurt bi rojan cîlweyan bike, him bi min şâ bibe û paşê jî henekê xwe bi min bike ha?

Min dest xist qirikê, min jidand. Jidand. Jidand. Ronahiya lawaz a lempeya kolanê ya ku şewqa xwe dida odeya tarî, di çavên wê yên hingivî de xuya dikir. Çavên wê vekirî bûn. Lê nedidît. Min xwe xwar kir, guhê xwe ber bi lêvên wê ve bir, bêhn nedistend.

Ma ne wisa, bi bayê re hat bi baranê re çû.  
Di heqê orispiyê de bû!

Hûn aciz bûn? Aciz nebin!

Heke ku ez, şevezkê li ser komputerê rûniştibim û min çîrokeke wiha nivîsandibe, heke ku van tiştan, dalan ango korîdora mejiyê min tijî kiribin, heke ku xaka ez li ser wê dijîm soza van tiştan dide min...Gelo divê ez rûnêm û rûbarî van tiştan nebim?

Divê em tenê rûbarî tiştên ku me kiriye bêñ? Divê em rûbarî wan 'bûyeran' jî neyên ku ji çîrokên erdnîgariya me re dibin 'çavkanî'?

Di encamê de, ew bilokê ku em nîşanî xalan didin, gelo hîna di yek saliya me de

me nake hînbûyê mîraniyê? Şîfreya "kurê min wê bavê de hêrs bibe" gelo piştî salan deriyê gotina "Neaxive orispî"yê venake?

Weke ku min gotî, divê ne tenê bi kiryarêñ xwe, divê em rûbarî wan gunehêñ xwe jî bêñ ku xeyalêñ mi tijî dikin.

Û tenê ne çalakiya Tûncayî, divê ez rûbarî çalakiya kesê Leylaya çar salî kuştiye û laşê wê yê rût avêtiye kêleka çemî, kesê tecawizî Ozgecanê kiriye û ew şewitandiye, kesê stranbêj Deger Denîz fetisandiye û ew qetil kiriye, kesê zarokêñ li malêñ terîkatan istismar kirine bibim. Her heyîna ku bi mîrbûna xwe jinan û zarokan tune dike...



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger e. Ji bo Taraf, Diken, Journo, Taz, Deutsche Welle, Vocativ ve Al-Monitor nûçe, gotar û hevpeyvîn amade kiriye. Endamê TGS û IFJyê ye. Di Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Bîlgîyê ya Stenbolê de perwerde dîtiye.

#34 ZAFER  
YILMAZ

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# EZ NERAZÎ ME!

Bêguman navendeka ji bo îmtihankirinê li ti deran nîne. Îmtihan jî ne îmtihanên ji dil in. Ji destpêkê, mîratiya "parastvan" û "pehlewanî" wê sextekariyê nîşan dide.

ofîsa îmtihankirinê kar dike.

Hima bêje ne mûmkin e ku em li Tirkiyeyê jiyaneka derveyî zoradariya mîran xeyal bikin. Demek bi tenê jî tune ye ku ev yek li me neyê kirin, em biawayekê ji dil vê yekê nekin û nîşan nedin. Ji ber ku em biçin kî derê em vî awayê têkiliyan bi xwe re dibin. Em di her têkiliya xwe de vê [zordariyê] ji nû ve çêdikin.

Em vê têkiliyê gelek rihet dikarin nas bikin. Em dikarin wê li otobûsan, di rêyan de, dema xebatê, di nêrînên hemzayendêن xwe de, di meydanxwestinan de nas bikin.

Dema em vî cûreyê mîrbûnê dibînin jî ev yek rîyê li me nagire ku em jî wê dubare bikin. Heke em îtiraz bikin jî bi dengekê nifs dikan. Li ber dengê bilind ê nêrbûnê ew deng bêqedir e.

Çawa jî be ev îtiraza me ya qels rîyê li mîrbûna serdest nagire ku ew xwe ji nû ve çêbike û biguhere.

Ez li Stenbolê li taxeka xir-û-cira wê zêde mezin bûme. Me di salêن 90an de gelek wext li kolanêن wan taxan derbas kir. Bêyî ku em li ser bifikirin me gelek tişt qebûl kirine.

Mirov paşê hîn dibe ku wek îdiayêن mîran ew ne “mert,bihêz,qahîm û bihêz” in ew xwe welê nîşan didin.

Mirov bi serê xwe hînî vê mîrbûnê nabe. Komeka mîran vê mîrbûnê hîn dike. Xwediye wî tiştê ku wê komê pêk tîne; pere, hêza fizîkî, zanîn, desthilat wê komê bi rê ve dibe. Ew birêvebir ne bi tenê kiriyañê mîran erê dike, herweha wek

Hngê jî wek niho mîrbûn ew bû ku divîya her dem tu ji bo îmtihanê amade bî. Ne di zarokatiyê de, ne di ciwaniyê de, ne jî di dema pîrbûnê de ne rihet e ku mirov ji wan îmtihanen birevin.

Bêguman ne rast e ku em ji bo herkesan biaxivin lê li gor tecribeya min a xwendekariyê û dersdêriyê, dersdêrêñ mîr hewil didin komek axwendekarêñ heyranêñ xwe çêbike û mîrîtiya neteweyî çêbike. Lê jin zêdetir hewil didin zanyarîyan ji xwendekaran re bibêjin.

Li Tirkiyeyê ji bo zanîn û hînkirinê zayend yek ji pîvanêñ herî giring e. Tesîra îmtihankirinê ya mîran û nîşandana hêzê jî gelek e.

Li Tirkiyeyê her dem îmtihaneka ji bo mîraniyê heye. Mîr hewil didin îmtihanen dî jî bi şêweyêñ xwe yêñ despotîk û hegemonîk çareser bikin.

Carinan ev îmtihan bi gotinêñ “hinekê mîr be” an “ma tu jî mîr i” û carinan jî “tu mîrekê çawa yî” têne kirin.

Li Tirkiyeyê dema ku we vedixwînin îmtihanen bi şêweyeka tehdîdkar, meydanxwez we mecbûrî xw-îspadkirinê dike. Lê welê tê texmînkirin ku ev îmtihan zeîfiya mîran nîşan dide, ev ne rast e. Ev yek alaveka xwe-ji-nû-ve-çêkirinê ye.

Îro mîraniya li tirkiyeyê di krîzekê de ye, zordar û hegemonîk e, bi awayekê gelek xelet ev yek wek zeîfiya mîraniyê tê dîtin. Lê mîraniya li Tirkiyeyê bi van îmtihanen ji nû ve û ji nû ve xwe çêdike. Ew kesêñ xwe îspad kirin li ser yêñ dî xwe disepînin û wê

mêraniyê ji nû ve çêdikin.

Ev ferman carinan li otobûsan bi nêrînekê carinan, carinan li bingeheka leşkerî û carinan di tengaviyan de bi refleksan xwe diyar dike.

Em mêt dildarên besdariya îmtihanen in. Yêne wek me bin em wek qels, çav-şor û yêne kêmayî li mêraniya xwe kirîn dibînin. Ev jî ji bo domkirina îmtihanê rîyek e.

Ev mêranî dîwarekê li dora mêran çêdike, li hemberî mêtren li aliyê dî yê dîwarî êrîşkar in û rîyekê ji xwe re dibînin ku mêtren dî xwe nekin di nav karêwan re.

Bêguman navendeka ji bo îmtihankirinê li ti deran nîne. Îmtihan jî ne îmtihanen ji dil in. Ji destpêkê, mératiya "parastvan" û "pehlewanî" wê sextekariyê nîşan dide.

Ev şovên mératiyê ji bo wan kesên xwediyê şovê şêweyeka domkirinê ye. Ji bo wan kesên mêranî lê hatî kirin hesasiyetekê çêdike, li nik wan daxwaza tolhildanê peyda dibe. Bi vî awayî sîstem dom dike.

Li dema leşkeriyê, li dibistanan, li siyasetê, di pevçûnan de, di siyasetê de û di akademyê de ew kesên derb xwarîn û hessasiyet li nik çêbûyîn ne mimkin e bikarin vê hesasiyetê ragirin. Bêguman dema em mexdûrkirina jinan tînin ber çavên xwe ti qîmetê vê hessasiyetê nîne. Lî ji bo em bibînin mêt çawa li dinyaya mêran ji nû ve mêraniyê çêdikin giring bû em behsê bikin.

Îtiraza me ya mezin ji bo wê mêraniya serdest a bi awayekê wehşîyane tûndkariyê li jinan dike ye. Herweha mêt

bi şêweyêñ xwe dibin şîrîk, şîrîkêñ sûcî hecgo mecbûr in li wê derê hevkariyê bikin.

Ji ber wê gelek giring e ku mêt li dijî desthilata mêtren a despotîk bin û rîyê nedîn ew mêranîyê ji nû ve çêbike.

Mêraniyek heye, her ci qas îtiraza me jê re hebe jî me ew li ser xwe qebûl kiriye. Mêrbûn, carinan bi îtiraz û şerê xwe em wê ji nû ve çêdikin, nexesiyeck e ku vedigire, bêhnçikîn e û zordar e.

Ev mêraniya vedigire ne bi tenê li kolanan, li kargehan û li civatan vedigire. Bi xwe di hêsinê mêrbûnê de heye û belav dibe.

Em belavbûna mêtîtiyê bi tenê bi çekdariyê, dewletê, neteweperestiyê û newekheviya zayandan ïzah bikin li gorî min kêm e.

Em ew kesên li dijî vê mêrbûnê disekekin, îtiraz dikin, şerî bi wê mêraniyê re dikin, behsa tecrûbeya xwe ya mératiyeka cida bikin giring e lê ne bes e.

Mesele ji mesûliyetêne me yê exlaqî gelekê zêdetir e. Ji ber ku ji ber exlaqê dema hûn bi mijarekê re rû-bi-rû disekekin hûn bi hesta sûcdariyê tev digerin. Hûn dikarin vejerin exlaqê berbelav û ji nû ve rê bidin xwe-ji-nû-ve-çêkirina mêraniyê.

Li şûna ku mêraniyek bi mêraniya dî re şerî bike, li şûna em desthilata wan teşhîr bikin. Divê em di peywendiyê de bin û hewil bidin bi hev re biguherin. Bi hev re mezin bibin.

Divê mêtren ku li dijî vê derdikevin jî li her qadê lêpirsînê li van tiştan bikin û bikevin nav micadeleyekê.

Hêza jinan û hêza hereketên wan hêvîyêن me geş dîkin û me hînî gelek tiştan jî dîkin lê ez di wî fîkrî de me ku esil tişta rizgarbûna mîrêن dij de diyarkere ew e ku....

Ji bo ve yekê jî divê em pêşî hîn bibin gelo pirsgirêkên mîranîyeke bi vî şîklî çi ne?

Gelek xebat û rexne di wî fîkrî de ne ku pirsgirêka vê mîranîya xwe li ser zor û qewetê ava kiriye pirsgirêka îqtîdarê ye. Lê bi min li gel vê pirsgirêkê îqtîdarê pirsgirêka xulamtiyê ye jî û divêe li ser vê jî bê axafin.

A ku tê piştçavxistin jî xulamtiyâ ku serkeftinêن ji ezmûnan hatine bidestxistin û îktîdarê ye ku li ser pişta hilgirê xwe dike bar e, ev pirsgirêk an nayê dîtin an jî ji alîyê hilgiran ve ji bo nîmetên vê yekê bi zanîn tê piştçavxistin.

Ev cureyeke mîranîyê ye ku di nava wan daxwazêن îqtîdar, hêz, û ceribandinêن xwe yî serdestiyê de tê xapandin ji alîyê wê hêzê ve dîsa tê bindestkirin û dibe xulam.

Di rastiyê de mîranîyeke kêm, xulam, xwe

bîçûk dibîne û bi hêsanî tê rêvebirin bi awayekî veşartî rêhevaltiyâ vê mîranîya muqtedîr, serdest, parêzer, bi hêz, sînorker û muhefezekar dike.

Ev mîrêن ku ji hestêن xweş û ji hezkirinê dûr mane di jiyna xwe tevî de bi vi şîklê ku hîn bûne; bê hest, despot, bê arezû tevdigerin û xemgînîyê didin der û dora xwe jî.

Bê şik ev cure mîranî di vê pirsgirêka rizgarbûnê de yek ji xalêن herî giring e. Xilasbûn an Dewamkirina vê serdestiyê de jî girêdayî kirinêن me ye, di destê me de ye ve yek.

Divê em guh bidin wan gazinêن deng bilind ku ji jinan têن û em rîyeke bi bandor ji vê micadeleya bi mîran re tê kirin re bibînin, rîyeke bêdeng ûbihêz. Divê em tişta ku karê rîya vê tiştê bigre bibînin.

*Ji bo vê jî em li ku bibînin bibînin ewil divê em bêhes herin nik wê û em bêtirs li hmber bisekin, jê re bêjin ku em îtiraz dîkin, helbet divê em guh bidin îtirazêن ku têن al3iyê me jî û em guh bidin wan piştre bi hev re bikevin micadeleyekê.*

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Akademîsyen e. Ji sala 2002yan ve li Zanîngeha Enqereyê dixebeitî lê belê di 7ê Sibata 2017an de bi KHKya OHALê ya bi hejmara 686an, ji ber ku danezana aştiyê ya "Em nabin şîrîkêن vî sûcî" imze kiribû, hatiye îxrackirin. Lîsans û mastera xwe li ODTUyê, doktoraya xwe di Zanîngeha Enqereyê de çêkiriye. Di dema doktorayê de li Berlin, Freie Universität, Sosyolojî û Brunel University Londonê li ser siyaset û dîrokê û her wiha pişti doktorayê li University of California Berkeley wek lêkolîner û hîndekarê mîvan xebitiye. Di kovarêن Toplum ve Bilim, Praksis, Mülkiye Dergisi, Turkish Studies, Ayrıntı ve Birikim de gotêن wî hatin weşandin û pirtûkek wî ya bi navê Yoksullari Na Yapmalı? ku ji weşanê Dipnotê derketiye, heye.

# NE TESEDIF E

52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN

#35 CEM  
ERCİYES



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## KÎ BI KÊ BIKARIBE

Li her devera ku mirov weke civak lê dijîn navê hêzê mîrbûn e. Divê em destê xwe deynin ser wicdanê xwe û biaxivin, me bi hev re ev tişt ava kir û me xwedî kiriye û mezin kiriye.

William Golding di romana xwe ya bi navê "Xwedayên Mêşan" de behsa komeke zarokan dike ku li graveke bimircan dimînin. Di roman de nivîskar behsa veguharîna van zarokan dike.

Veguharîna wan a ber bi civakeke dirinde. Piştî ku li ser serê wan mezin an jî qaîdeyên civakî ên hevsarê wan bixe destê xwe namîne, di nava zarokên xort de şer û pevçûna bidestxistina hêzê û desthilatdariyê dest pê dike.

Em hostatiya Goldîngî ya ku çawa mijareke ji rêzê karibe bike berhemeke herî mezin a ji wêjeya cîhanê dînin li hêlekê. Sedema bingehîn a hezkirin û ecibandina vî tiştê ku behs dike ew e ku hemû mîr ne xerîbê wê ne.

Ne hewce ye ku we balixbûna xwe li dibistanekî şevborîn a tijî zarokên xort borandibe. Di hevalên we yên lîstikê de, di tîmê de, di koma mîran a biçûk a dibistanê de, li her derê ew şerê bidestxistina hêzê ango tundkariya vekirî zû bi zû xwe diyar dike.

Ev tişt, hinekî însiyakî ye û dibe bêhtir jî ji hînbûnê tê. Di dema pêşbirka rîbertî û rikberiyê de kesên lawaz têni diyarkirin û tundkariya 'xwezayî' ber bi wir ve diherike.

Bila ti kes behsa xwezaya mirovan neke, em weke navê xwe dizanin ku çîrok ji pêkanîna tevgera bêşînor a hatiye hînbûn pêk tê.

Belê, em li xwe mikur bêñ, hemû jî dikarin di nava wî tiştî de kom bibin ku em jê re

dibêjin "mîrbûn". Tundkariya ku mîr li mîran dikin, gelek caran tundkariya herî bêmerhemet û ya herî bênavber e. Lê ew ihtimala ku mexdûr bibe zorba, dibe sedem ku em vî tiştî asayî bibînin. Em dizanin, di tundkariyê de rewş ew rewş e ku 'kî bi kê bikari be'.

Ew ê di nava keriya mîran de dibe lawaz e dibe 'cûkeke boyaxkîrî'. Herkes jî bi wî dikare. Dibe ku tê bîra yekî ji wan ku wê wiha nebe, wê wiha nedome. Lê wê gavê, yên balixbûyî wê ne weke balixan lê weke zarokan tevbigerin û ew bêgunehî ya biqiyemet ya kêmpeyda dikeve şûna zilmê.

Ew însiyak her gav ji bo ber bi ya lawaztir ve biherike amade ye ku nehatiye perwerdekirin û wisa hatiye hînkirin ku her gav ji bo tehrîkirinê li ser piyan disekine. Ji ber vê ye aramiya wê jinê ne domdar e ku li malê him ji hêla madî û him jî ji hêla manewî ve bi mîr ve hatiye girêdan û ew aramiya wê jî li bendeyî însafa wî mîrî hatiye hiştin. Kesa/kesê ku ji me lawaztir her carê vedigure muxataba xwezayî ya wê tundkariyê. Evîndarê me, jinê me, dayikê me, li kar hevalên me yên jin gelek caran dîbin hedefîn daimî yên hêrsa di dilê me de dikele û lêgerîna bidestxistina hêzê.

Gelo laneta herî mezin a mîrbûnê ne ji ber wî tiştî ye ku çortî, tundî û her cure hovîtî bi "mîrokî" tê binavkirin? Bi qasî tundkariya ku mîr li mîran dikin, tundkariya jin li jinan dikin, jin li mîran dikin jî encama tevgerên hînkirî û nîşandana hêzê ye.

Em weke navê xwe dizanin ku nîşandana vê hêzê ne tenê ji tudkariya fizîkî pêk tê. Gelek rîyêñ çewisandina, êşandina mirovan hene. Herçiqas ku rê û rîbazên

civakî soza hinekî aştî û aramiyê bide  
mirovan jî, rêya wê zilmê dîsa jî tê dîtin. Li  
her cihê ku lêgerîna hêzê hebe jî wê xwe  
nîşan bide.

Jin jî dixin weke mîran, paşê jî pesnê  
wan tê dayin. Dixin “jina weke mîran”. Em  
dizanin ku wê gavê jinê hevrik car caran ji  
mîrên şerker xerabtir dixin...

Li her devera ku mirov weke civak lê dijîn  
navê hêzê mîrbûn e. Divê em destê xwe  
deynin ser wicdanê xwe û biaxivin, me bi  
hev re ev tişt ava kir û me xwedî kiriye û  
mezin kiriye.

Dayik in ên ku van zarokêن xort xwedî  
û mezin dikan. Dayikêن dixin maxdûrêن  
mezin ên rewşa vê mîraniyê. Keç dixwazin  
bibin weke birayêن xwe û hewl didin li ser  
lingan bimînin. Rêya herî hêsan a rizgariyê  
ye ku ne “weke keçan” lê “weke mîran”  
erebeyê bajo, alkolê vexwe û li kargehê, li  
kolanê, li nava mirovan bijî.

Heke israr bikin weke jinan bimînin, wê  
gavê dixin hedefa xwezayî ya mîran.  
Nikarin xwe ji wî tiştî rizgar bikin ku ne  
weke kesayetyeke wekhev û berdar a  
civakê lê weke amûreke zayok û pasîf bê  
dîtin.

Ya zehmet ew e ku li derveyî van rolan  
bimîne. Jinan gelekî hewl dane ku him  
weke jinan bêñ xuyakirin, weke jinan  
tevbigerin, him jî têkiliya xwe ya bi jiyanê re  
xurt bikin û daxwaza her tiştî bikin û bibin  
xwediya wan. Di vê dema dirêj de hinek  
tişt bi dest xistine. Bi milyonêñ jinêñ ku ji  
vê re dibêjin na, bûne jehrbira mîraniya  
me jî. Em dikarin çi bibêjin, baş e ku ew  
hene...



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger e. Ji sala 2016an de dîrektoरê Dogan Kitap Yayınê ye. Di rojnameya Dunya de dest bi rojnamegeriyê kiriye. Ji 1997an heta 2016an di Radikalê de xebitiye, karên edîtorê çand û hunerê, koordînatorê weşanê yê pêveka pirtûkan, derhênerê weşanên pêvekî û derhênerê weşana internetê kiriye. Li Patnosê ji dayik bûye. Li Çanakkaleyê dibistana seretayî û li Îzmîrê lîse xwendiye. Beşa Têkiliyên Navneteweyî ya Zanîngeha Marmarayê qedandiye. Di Zanîngeha Stenbolê de li ser heman besê master kiriye.

#36 ÖZCAN  
SAPAN

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## LI EYNEYÊ BINÊRE!

Dema em li gotinêñ we dinêrin hûn dibêjin “em dixwazin mêtîn li ser mijarekê bi ser ketîn, behsa fîkrêñ xwe yên li ser mîrbûnê û tûndkariya mêtan bikin û di eslê xwe de em dixwazin fîkrêñ we qeyd bikin.” Divê bi taybetî em binê gotina “tecribe” dax bidin.

Gelo bi rastî we hay jê heye hûn çi dipirsin? Gelo çend mêt dikarin bibêjin “belê min tûndkarî li jinan kiriye?” Heke welê jî be em civateka welê ne ku em ê bibêjin erê lê belê...

Dema em li gotinê we dinêrin hûn dibêjin “em dixwazin mêtîn li ser mijarekê bi ser ketîn, behsa fikrên xwe yên li ser mîrbûnê û tûndkariya mîran bikin û di eslê xwe de em dixwazin fikrên we qeyd bikin.” Divê bi taybetî em binê gotina “tecribe” dax bidin.

Gelek kes dê bi tenê behsa wan tiştên wan dîtîn bikin. Civakê nîşanî me kiriye ku bi tenê tiştên em dibînin têra me bike. Tûndkarî bi xwe wek exlaq û rêzdariyê tiştên welê ne ku çi qas bixweyî divê ew têra me bike, em hînî vê yekê hatine kirin.

Gelek rîyêن xwe-îfadkirinê hene. Hin kes bi axiftinê xwe baş îfade dikin hin kes jî bi nivîsînê xwe îfade dikin. Hin kes bi lêdan û şimaqan hin kes jî bi gotin-gezkî... Tûndkarî ne bi tenê lêdana rep û rût e.

Gelo fêmkirina mirovan bi emr, tecribe an jî karê wan ve girêdayî ye. Gelo em cidayê çandan, exlaq û têkiliyên bi malbatê re li ber çavêن xwe neynin em ê bikarin çi qas bi ser bikevin.

Dema di nava civakê de mêt li jinan dide em hemî dikarin rabin lê heke mîran ji jinan bidaya dê çi bibûya? Carekê li meyxaneyekê min dît ku jinekê li mêtê xwe da. Me ti kesan ti tişt nekir. Nizanim ji ber çi gelo ji ber wê yekê ku em difikirin jin hewceyî parastinê ne. Erê em çi ji nimûneyên dî bikin. mafêن mirovan,

siyaset, çepgirî, diya min, pîrika min... Gelo ez ê bikarin objektîf bibim.

Salê 80yan... Ez û hevalêن xwe kom dibûm û diçûn Beyoglûyê ku tiştekî vexwin. Ji ber ku li cihê em diçûnê me bi pereyê xwe dilîst ji bo vexwarina çayê ji me nedixwestin. Cihekî rihet bû. Ew cih gelekê nedihat zanîn jî. Niho baş nayê bîra min lê dibêjim qey tabelayeka wê ya wek “komeleya çûkhezan” hebû.

Lê li wê derê ti kesan behsa çûkan nedikir. Carinan me behsa tirimbêlan dikir.

Rojek ji rojan sê kes li benda lîstikvanê çarem bûn. Wan ji min xwest heta hevalê wan bê ez bi wan re bilîzim. Ji ber ku min lîstik dizanî min bi keyfxweşî qebûl kir. Dema hevalê wan hat ez ji rex wan rabûm. Dema hevalekî min dît ez rabûm xwe bi min re aciz kir. Wî ji min re got çawa ez çûme û bi wan re min lîstiye. Min jê pirşî çîma bi acizî ji min re welê dibêje. Wî ji min re got: “Ma tu dizanî ku yek ji wan xwediyê basekê ye û yek jî xwediyê teksîya ticarî ye.”

Min ê bigotiya ma çi ye. Xwe dîn neke. Piştî demekêê dirêj min rewş fêm kir. Dema ku dibêje basa wî heye tê wê wateyê ku li seksxaneya pereyî ya Karakoyê dostika wî heye. Dema dibêje teksîya ticarî heye hingê jî dostika wî ya bi telefonê heye.

Dema ez li jina xwe fikirîm diya min hat bîra min. Bavê min gelek caran li diya min dida. Carinan tê bîra min ji deriyê nîv-vekirî min dengê giriyana diya xwe dibihîst.

Carinan dema ti kes neyîn diya min derdê xwe bi dengê bilind digot. Paşê bi heman gotinê bêdeng dibû. "Heke zarokên min nebûna ez ê yek deqîqeyê jî nesekiniyam."

Ez bi vî rengî mezin bûm. Li bin wî barî, diya min ezîyet kêşa.

Min hin dijûn dida nayê bîra min ka kê dibihîst.

Min carekê dît ku diya min digiriya. Wê nedixwest ji min re bibêje lê ji pêsiya hingê ji xwe ez hîn bûbûm. Min zanîbû ku wê lêdan xwariye. Min ji xwe re sond xwaribû min jî dê li diya bavê xwe yanî li pîrika xwe bidaya.

Min du sê kulm danîn wê. Ya pêsiyê lê neket lê yên dî çêdibe ku lê ketibin. Piştî çend rojekan min dît ku cihê min lê dayî reş û şîn bûye. Bi salan ew re û şînî ji ber çavêن min neçû. Ez qehîrîm, êşiyam û bi rojan giriym. Min biryara xwe da û terka malê kir.

Carekê min li ber deriyî ji bavê xwe re got tu careka dî li diya min bidî vê carê ez ê li te bidim. Bavê min ji van gotinan neditirsiya. Ji xwe çêdibe ku wî nebihîstibe.

Ji min re girîng bû ku bibêjim û ew deng li dora malê vebide.

Jiyana taybet bi tenê cihek e ku di nava dîwaran de be, bi perde, derî û pencereyan hatibe girtin...? Gelo malbat zirxek e? Gelo kêşeyên malbatê ti kesên dî eleqedar nake? Gelo zirxek e ku rê dide her tiştên ne di rê de tê de hebe?

Tiştê min fêm kirî, di jiyana taybet de jin her tim êşê dikêşe.

Dema min ev nivîs dînîvîsî kitêbek hat bîra min. "Jinê xwedan-şîyan ên li bin siya mîrên navdar de mayîn." Inge Stephanê ev kitêb nivîsiye. Gelo we fikiriye ka ji ber çi gotina "çûka mî hêlînê dihone" heye.

Tûndkariyeka veşartî di vê gotinê de heye. Jin heke qebûl bike ku ew li bin siya mîran e û digel her tiştî dê keyfxweş bibe... Lê heke hizûr têk biçe jî ji ber jinan têk çûye.

Mîrbûn û mîratî ji xwe desthilat e. Dema gotina mîran cihê xwe digire hingê felaket dest pê dike.

Wek Oscar Wilde dibêje "du felaket hene felaketa yekem ew e ku hûn tiştên dixwazîn bi dest nexin. Felaketa duyem jî ew e ku hûn tiştên dixwazî bi dest bixî. Ya duyem felaketeka mezintir e."

Her kes bi heman zimanê mîraniyê diaxivin. Dema behsa netirsîyê(wêrekîyê) û hêzê dîkin van rojan behda axiftinên Trump, Putin, Erdoganî dîkin heta ku vê paşiyê behsa Macronî dîkin.

Ji xwe jiyan bi xwe siyasetek e. Hinek rastî hene ku li ti deran naguherin. Nazim Hîkmet gotiye "Jin ew kes e ku cihê wê yê li sifreya me piştî gayê me tê..." Ne girîng e ka kê ji ber çi gotiye. Cihê jinan li çepgiran ev e.

Sala 1976ê li mektebame ji aliyê sîyasî ve ez yek ji berpirsan bûm. Me bihîst ku têkiliyeka hestebar di navbera du kesan de heye. Min ders mers her tişt da aliyekê û ew keçik bir lîstikgeha topa pêyan. Min jê re got "we xêr e!" Wê li çavên min nêrî û wek bibêje min efû bike got: "Em ji hev hez dîkin." Min got çenabe. Kurikî xwe parast jî lê bêfeyde bû. Ew têkilî li wê derê qediya...

Ev ji min re bu dersek. Li her cihê ku min ew keç didît min ji xwe şerm dikir. Ez amade bûm ku xwe biguherim. Min xwend û demekê kurt de min xwe îkna kir ku ez nerm bûbûm, bûbûm yekê nûjen.

Di civînê de hevdîtina kin jî evîna keçikê jî hemâ li wir xilas bû. Lê min têrî behskirina kirina xwe nebûm, ku min digo min çi tiştekî rast û di rê de kir. Min ev tişa sala borî li hevala xwe kirî bi vê mînakê dixemiland û behsa rastîya vê kirinê dikir. Min bi vê mînakê vedigot û pê serbilind dibûm. Lê min gelek piştre fêhm kir ku mesele meseleya çandê ye, zihniyetê ye, xwendin tenê têrê nake, ji bo xwe biguherînî divê tu gelek kêferatê bibînî.

Gava yek li we bixe hûn ê jî lê bixin. Dijûna li we bike hûn ê jî bikin. Tûndkarîyê li we bike hûn ê jî tûndkarîyê lê bikin. Lê gava ji we re bêje ku ji we hez dike, hûn ê çi bikin?

Zimanê min lal bû; min bi barê xwe ve girêda...

Ji mêj ve ye gava em peyva rexneyê bibihîzin rîya rihet hildibijîrin û dibêjin xwerexne. Gava em peyva tûndkarîyê dibihîzin jî behsa sikûnet û aştîyê dikan. Lê me fêhm nekiriye ku tûndkarîyeke çiqas mezin e gava bavek ji zarokên xwe re bêje "tu hiş be, tu nizanî". Tew em gotinên "tu bi aqlê xwe yî jina tevlî nebe", "tu jin ï divê tu bizanibî hiş bî" û hwd ji tûndkarîyê jî nahsibînin. Bi taybet em çepênen xwe yî ku di mijara jinê de gelekî biaqil, zana û hestiyar in bixin polekî û ezmûn bikin dê sê salan li ser hev di polê de bimînin. Bi Giştî çepê Marksîst di derheqa mijara jinê de bi pirsgirêk e. Pirsgirêk jî hewaleyî Sosyalîzmê kirine. Naxwe em ê heta bi sosyalîzmê çawa li vê mijarê binêrin.

Helbet dê her kes tişa ji malbata xwe hîn bûye nîşan bide. Ji bo wê heger di dîroka çepê de jin hevaleke serdar hebe teqez li pişt wê jî rîhevalê wê heye. Mîrê wê heye.

Diroka çepê me bi Krupskayayê dest pê dike, her çiqas agahîyeke xelet jî be bi Tanyayê dewam dike, bi a xwemalî û neteweyî dewam dike. Mixabin em jî tam di nîvê xelekê de ne. Rubinntain dibêje; "An tu di nîvê evînê de yî di navendê de; yan jî tu li derveyî, di hesreta wê de..." em jî tam di nîveka vê girêkê de ne.

Û erdnîgarîyeke ewqasî bi bereket e ku, Misilmantî bi çavê "parsû"yê li jinê dinêre ew jî têrê nake nimêja xwe dike, rojîya xwe digre û zikata xwe dide. Ew jî têrê nake ji jinê re dibêje; " Ger jin 5 rikaet nimêja xwe bike, rojîya xwe yî mehekî bigre, namûsa xwe biparêze û îteetî mîrê xwe bike 'wî wextî tu ji kîjan derîyî bixwazî di wî de biekeve bihuştê". Yek ji îbadetan jî "Namûsa xwe biparêze û îtaeta mîrê xwe bike" ye.

Divê di civakeke ku dibêje "di rîyan de here bila dûr be, jinan bîne bila keç be" de ne pêşveçûna ehlaqê çandî ne hevqasî zehmet bûna. Ci cudahîya me ji yên din dimîne dema ku em jî gotinên ku newêrin li nav çavên wan binêrin û bêjin bi biwêjên xwe bi awayekî koroyî bi qîre qîr ji wan re dibêjin? Wextê em dibê "di sifreya me de ciyê wan piştî gayê me tê" yan "ez nexweş im gewrê, were ser min..." cudahîya me ne tenê di gotinê de dimîne?

Wextê tu di erdnîgarîyeke ku gotin, stran, biwêjê wê hevqasî gunehkar bin de mezin bibî êdî tu sîsetmedar ï yan kesekî di karê xwe de pispor ï ferq nake. Di hemû olan de, di hemû pirtûkan de, di hemû

termînolojîyên sîyasî de jin gunehkar e. Xirabkera malan e. Dûvik dihejîne. Ez û tú çiqas cuda bin jî qeweta me têrê nake em vê yekê biguherînin. Çikî di hemû civakênu ku hatine û çûne de serdestîya hemû karan heta a huner û edebîytê jî aîdî mîr e. Jin tenê bûne amûr û alîkarênu wan. Wek Bilge Krasu jî di berhema xwe yî “Încire ve Gazele” de gotî amûreke ji bo ku mirov bigihêje xweşîya cînsî. “Heneka jinê û hejîrê, edebîyata wê yî ku bi mîr ve têkildar e, hem bêje li hemûyê Akdenîzê bi nav û deng bûye, êdî gotina hejîrê bûye gotineke şermê. Heta bi menawê Erziromî jî bersiva pirsa min jidan û bûhayê mîweyî ji min re gotibû...”

Jin pirî caran bi sûreke ku ji alîyê mî ve hatiye avakirin de tê hepskirin, hepseke bêguheh. Ku Hewwa fêkîya qedexekirî xwr û bi Adem jî da xwarin hingî ew bêgunehî qirêjî bû. Hemû nebaşî û gunehênu li dinê piştî vê bûyerê hatin jixwe. Êdî ji wê û pê de helbet dê mîr li dinyaya ku jinê herimandiye bibe desthiatdar. Ji roja ku birayan xwîna hev rijand ve nam^us bi xwînê tê paqirkirin, û qaşo mîr jinê bi vî awayî diparêze. Jin ji bo Namûsê lêdanê jî dixwe tê kuştin jî.

Li neynikê binêre... Te bêrîya bavê xwe kiriye qey...

Li neynikê binêre... A hatî fêrkirin ev e, lê guherandina vê yekê di destê te de ye. Pêşî ji zimanê xwe dest bi guherandinê bike. A ku rê li pêşîya destê te jî zimanê te jî vedike ûjdana te ye. Ehlaqê te ye...



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhênerê giştî yê weşanê yê Weşanxaneya Chiviyaziliyê ye. Damezirînerê Akademi Kitabevi Cafê ye. Di gelek rojnameyên rojane û kovarên heftane-mehane de nivîskariya nûçe, gotar û quncikan kiriye. Di sala 1986an de, di pêvajoya avakirinê ya Komeleya Mafêن Mirovan (ÎHD) de cih girtiye. Sê serdeman rêveberiya şaxê ÎHDyê ya Stenbolê û serdemekê jî ya Navenda Giştî ya ÎHDyê kir. Di pêvajoya yekbûna çepgiran de cih girtiye û bû damezirînerekî Partiya Azadî û Hevgirtinê (ODP). Di 1988an de dest bi weşangeriyê kir û di gelek weşanxaneyan de editörî û derhêneriya weşanê kiriye. Pirtûkên Beyaz Ölümün Güncesi (1992), Ve Geçip Gitmediler (2000), Şeylerin Tarihi (2004) nivîsandin. Bû damezirîner û endamê lijneya weşanê yê kovarên Humanite, Kafkasya Yaziları û Mjora. Bi Beyaz Olumun Güncesi di beşa roportajê ya Xelatên Rojnamegeriyê yên Mûsa Anter ên 1992yan de xelata yekemîniyê û ji ber dozêن ku lê hatine vekirin Xelata Azadiya Fikr û Ramanê ya Yekitiya Weşangerên Tirkîyeyê (2013) wergirtin. Di sala 1960an de li Stenbolê hatiye dinê.

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN

#37 MAHİR  
ÜNSAL ERİŞ



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

DAYÊ DAYÊ,  
DAYKA MIN,  
DAYKA MIN A MÊR!

Ez bûm dêya kurê xwe. Gotineke komîk an jî gelekî  
îdealîst e ne wisa? Lê rastiya meseleyê ev e. Heke  
ku “xwedîkirina pitikî” yan jî “bicîanîne hemû  
hewcedariyên wî” dêtî be, ez jî dêya kurê xwe me.

Nîşandana bilikî, sinetbûn, hevaltiya bi keçan re, çûna leşkeriyê, di vegerê de zevac, paşê bavîtî û tiştên weke van... Û di van qonaxan de bicîanîna gelek tiştên ku di pirtûka mîrbûnê de nivîsandî. Çi dizanim, şopandina maçên fitbolê, kombûna mîran û henekên wan ên hirçan, axavtinên li ser keç û jinan, temaşekirina vídeoyê pornoyê û yên weke wan. Di vê çerxa mîraniyê ya ku ez behsa wê dikim de, bi neçûna leşkeriyê min ev silsile ji hêlekê ve pêk neanî. Şikir ji Xwedê re min cil û bergên ti artêsan li xwe nekir. Lê min her dixwest ez bibim bav. Di her demên zaroktiya min de, di ter û tezetiya xwe de min her gotî "heke kurekî min çêbibe, ez ê navê wî bikim filankes" û xeyala bavîtiyê kirî. Û îsal di meha adarê de kurekî min çêbû. Me navê wî kir, Ethem. Me navê hevalê min Ethem Sarisülükî lê kir ku di dema Geziyê de bi guleya polîs Ahmet Şahbazî ya bi zanebûn hatibû avêtin, hat kuştin. Bila bi rûmeta navê xwe bijî.

Piştî ku ez bûm bav, bi gotina ku gelekî tê gotin, jiyana min bi temamî guherî. Helbet ez tenê ne behsa şevêne bêxwew, bi mîzdana piştê derxistina gazê ya heta serê sibê, girî û tiştên din dikim. Têkiliya min a bi cîhanê, bi Ethemî, bi bavtiyê, bi mîrbûnê, bi dahatûyê, bi rewşa siyasî ya welêt, bi nivîskarî û wergêrî ya ku min ji xwe re kiriye karî û bi heman tiştan re ji nû ve şekil stand. Heta ez dikarim bibêjim ku her roja ku diçe, dubare car ji nû ve teşe distîne.

Ez kurê wî bavî me ku taybetmendiyê mîrbûnê tê de gelekî zêde bûn. Bavê min, ji min jî, ji birayê min jî dixwest ku em bibin

mîr, "qûnektiyan" nekin, mîrên wisa bin ku lingên xwe li erdê xin û xwînê ji wî cihî bipijiqînin. Qet nebe heta demekê dixwest em wisa bin. Paşê, qebûl kir ku em ê nebin, em naxwazin bibin ew kesên wî dixwest. Di dema salên dibistanê de ji bo her zarokên ku me li wan dida, pare dida me. Di eslê xwe de min li kesî nedida, min ê li wan neda. Her roj, min çîrokek pevcûnê ji xwe re dihûna, li gorî vê çîrokê min her roj li yên pola xwe dida û min rî ji xwe re çêdikir ku ez çend qurişan bistînim. Her çiqas ku ez nebûbûm mîrekî weke guran lê bi vî awayî bûm çîrokbêjek.

Beriya jidayikbûnê bi hefteyekê dê û bavê min hatin mala me. Min bi darê zorê bavê xwe derxist piyaseyê. Helbet armanca min ew bû ku derbarê bavîtiyê de çend tiştan ji wî hîn bibim, hin şîretan li min bike. Ma ne ew bû ku bavîtiyê, vî karî çil salin dimeşîne. Di dema piyaseya me de min got "bavo, ez gelekî bi heyecan im. Wê çawa bibe?" Bala bavê min ne li ser wê meseleyê bû, heta baş fam nekir ku min ci jê pirsi. Got, "Çi, wê çawa bibe? Wê zarok çêbibe, ji ber xwe mezin bibe. Ji kesên zindî re roj derbas dibin." Di kîliyekê de min got dibe ku bi nîteke baş, ji bo ku bêhna min fireh bike, vê "bavîtiya" ku li pêşîya min weke çiyakî bilind bûye ji min re hêsan bike, wiha dibêje. Na, ne wisa bû. Bavê min bi rastî jî wisa difikirî ku, zarok bi xwe bi xwe mezin dibin. Wiha difikirî yanî, Piştî ku Ethem çêbû, min ev fam kir.

Ü Ethem ji dayik bû. Ji ber ku bi zesaryenê çêbûbû, dêya wî nekarîbû bi rojan xwe ji cihê xwe bileqîne. Yanî, ji bilî mêtana şîrî, ez neçar mam ku hemû wezîfeyên dêtiyê bigrim ser milên xwe. Helbet di gotina neçar mam de bi xwe jî ew qurretiya bavîtiyê ya xwe di zimên de veşartî heye. Dema em bixwazin bi awayekî din bibêjin, "Dêya wê ne guncav bû, ez neçar bûm ku lê binêrim. Di rastiyê de wezîfeya dêyê ye xwedîkirina zarokî. Ji ber ku bebek ji ber xwe mezin dixin. Dê tiştên ji wan re hewce peyda dikan, ew jî bêyî destwerdana bavan mezin dixin."

Ez sosyalîst im. Çarçoveya îdeolojîk a Sosyalîzm ê, di avakirina nêrîna min a li jiyanê de, ji min re bingehêke gelekî wicdanî û biewle ji min re daniye. Ez ji feminîzmê, ji têkoşîna jinan jî agahdar im. Helbet ez ji fezayê nehatime. Lê piştî ez bûm bav, heta ez li xwe mikur bêm, piştî ez bûm dê min fam kir ku ew tiştê jê re dêtî tê gotin, ji hêla bavan ve hatiye penasekirin.

Ethem niha şeş mehî ye. Di van şeş mehan de ji paqijkirina bin wî bigirin heta şuştina wî, ji jêkirina neynûkên wî heta xistina wî ya xewê min hemû kar kirin. Piştî bi mehan min karî xwe ji fikra "ez alîkariya dêya wî dikim" rizgar bikim. Min ferq kir ku ez vê rewşê ji nû ve bi nav dikim. Dêtî -ji bilî mêtana şîrî û hin tiştên weke wê- ne taybetmendiyek jinan e. Dêtî hemû wezîfeyên ku di dema xwedîkirina pitikan de, di qonaxên pêşketina wan de derdikeyin holê ye. Helbet têkiliyeke taybet di navbera jin û pitikê de heye ku çavkaniya xwe ji hormonan, hestiyariyê û jidayikbûnê (ducanîtî, ava amniyoyê, plasenta, navik û yên weke wê) distîne. Lê ev têkilî nabe bibe sedema wî tiştî ku

hemû wezîfeyan ji dayikan re bihêlin. Belkî ya herî baş ew e ku dêtiyê û xwedîkirina pitikê ji hev cida bikin.

Ez bûm dêya kurê xwe. Gotineke komîk an jî gelekî îdealîst e ne wisa? Lê rastiya meseleyê ev e. Heke ku "xwedîkirina pitikî" yan jî "bicîanîne hemû hewcedariyên wî" dêtî be, ez jî dêya kurê xwe me. Ji bilî mêtana şîrî, ez dikarim her tiştên ku dêya wî pêşkêsi wî dike, bêyî silbûnê bidime wî. Ü li gel vî tiştî hêla vê ya "bavê min" derkete holê. Dema ji aliyê mîran li meseleyê dinêre, bavê min paqijkirina binê Ethemî "sempatîk" dinirxîne. Li gorî wî, ez alîkariya jina xwe dikim, ez xortekî têghiştî me. Ev jî portreya bavê modern e di nêrîna wî de.

Em hez ji wî tiştî dikan ku ji jinan re bibêjin wê ci bikin an jî nekin, tiştên ku wê bikin dê çawa bikin. Ji ber vê divê em qebûl bikin ku di bin navê tundkariya mîran de ne tenê tundkariya psîkolojîk an jî laşî heye. Em dixwazin jin li gorî xwestekîn me şekl û şemalan bistînin û tevbigerin. Ev jî şêweyekî tundkariya mîran e.

Penasekirina wezifeya dêtiyê, di eslê xwe de ji hêlekê ve hewldana avakirina qada desthilatdariyê ye ku jê de bavîti tê gotin. Yanî divê jin bibin dê da ku mîr bi hêsanî bibin bav. Dema em di çarçoveya wê rastiyê de bifikirin ku bavîti fîgura otorîteya xwerû û desthilatdariya bêhezkirin e. Wê gavê em dikarin bibêjin, mîrê ku di bin guyê pitika xwe de maye di çavê meqamê "bavîtiyê" de ne xwedî gotin e. Yanî bavîti ew e ku jine ber bi dêtiyê ve dahf dide û qadê ji xwe re dihêle. Ü ev qad qadeke wiha ye ku desthilatdarî li vir bêtirs hespa xwe dide bezandin û tundkariyê ji derveyî wê nahêle.

Hezar cureyên tundkariya mîran hene. Ez xemgîn im ku piştî bûm "bav" min hay ji ev cure tundkariyê çêbû. Helbet ez enerjiya xwe li fedîkirina vî tiştî xerc nakim. Lê heyfa min li wê dema min a ku ji destê min çûye jî tê. Ya heta min qebûl kir ku xwedîkirin ango mezinkirina zarokî karê hevbeş ê dê û bavan e. Herçiqas ku hê jî bavê min bi nêrîna "kurê min ê şareza piştgiriya jina xwe dike" lê binêre jî, ez êdî di ferqa xetereya meseleyê de me. Min dixwest ez bi berfirehî behsa wî tiştî bikim ku ci fam dikim. Lê Ethem hisyar bû. divê ez xwarina wî germ bikin.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Nivîskar û wergêr e. Ji çend zimanan pirtûk, gotar û çîrok wergerandin û hê jî werdigerîne. Pirtûkên wî yên Bangır Bangır Ferdi Çalıyor Evde (2012), Dünya Bu Kadar (2015), Benim Adım Feridun (2016) ji Weşanên İletişimê derketiye. Bi Oldugu Kadar Guzeldik (2013) 60em Xelata Çîrokan a Sait Faik Abasiyanikî wergirtiye. Di sala 1980yan de li Çanakkaleyê ji dayik bû. Li Bandirmayê mezin bûye. Arkeolojî xwendîye.

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN

#38 ULAŞ  
BAYRAKTAR



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

“JIN JIN E,  
MÎRAZA MIN EW E  
KU NEBE WEKE MÊRAN”

Miqabilê vê yekê, desthilata mîran, tûndkariya mîran kêm nabe berevajiyê wê zêde dibe. Ji ber ku mîr di fikarê de ne. Hin jin êdî hene ku dikarin bêjin na, mahir in, siyaset, zanist, hûner û rojnamegeriyê ji wan re nahêlin.

Ez Ulaş Bayraktar im, 43 salî me, ji xwe ve perwerde-bûyî me, ji çîna navîn [a ekonomîk] im, zewicî me, bav im û ji bo femînstbûnê ti îdiayên min nînin.

Gelo ji ber çî?

Ez kurê mezin ê jinebîyekê me ku ew di 33 saliya xwe de bûye jinebî. Wê jinê pêşiyê li gundê malbavê paşê li bajarekê ku li wê derê ti kesan nas nake zarokên xwe mezin kirin. Bi sero xwe li dijî zehmetiyêن bûrokratîk, civakî û ekonomîk têkoşîya. Ez bi xwe bûm şahidê vê yekê.

Ji ber wê jinê di hişê min de jinbûn ew e ku tiştê tu dixwazî çi bibe bila bibe tu pêk tînî. Ji ber ku li maleka bêbav, bêmîr mezin bûme li ser tûndkariya mîran jî çêdibe ku hinekê nezan bim.

Herî zêde ew roj têne bîra min ku dema dayika min bi bapîrê min re minaqeşe dikir, me bi wan kesên li qeta jêrî re nedıaxift.

Min li dibistaneka bijanîyan xwend, ez nikarim îñkar bikim ku dema baliqbûnê me hinekê lewçetî dikir. Dema ew rojên me têne bîra min ferq dikim ku hevalêن me yên keç hingê em kêm didîtin heta ku dilê wan li me dişewitî.

Dema destgirtiya hevalekê me çêdibû hema zûka ji wan tevgerê me dûr diket, dema destê destgirtiya xwe digirt û ew hembêz dikir ciddî dibûn.

Ew qasê xwe giran dikirin ya star, wek wan ji me re digot "Xwedê we xelas bike."

Dema em li tiştên beredayî yên baliqbûnê ve mijûl dibûn gelek tişt ji destên me derketin.

Me mecbûrî li dersan kitêba "mişk û mirov" dixwend paşê me henekê xwe li Lennyê dikir. Ji fîlma 1984ê bi tenê dîmenek dihat bîra me ku memikêن Jûlîayê dixweya.

Dema erdhêja Erzinganê çêbû me fêm nekir ka çîma dersdêrekê me bi dildarî çû wê derê. Me ti qîmet nedida dersêن ji bo nivîsîna efrîner.

Lê keçan bi vê rewşa hêvîbexş keyf dikir.

Dema ez çûm zanîngehê min dît ku hin keçen ji vê rewşê sûd girtî xwe gihandî û entellektûel hene ku ji rojhilatê welatî hatibûn.

Da ku bi wan re demî biborînim, zêdetir bi wan re bim min hewil dida li gor hiqûqa navneteweyî li hiqûqa xwezayî binêrim, min hewil dida wateya gotinêن ji "sê xuşk"ê fêm bikim.

Bi tenê li klûba çûna serê çiyayan em biserketîtir bûn. Me centeyêن giran bi wan palan ve dibirin û em pê keyfxwes dibûn ku em serkeftî ne.

Piştî çakakiyêñ çîyageriyê ez bûm rêberê gerê. Min nedizanî ez ê nexşerêya jiyana xwe li wê derê bibînim.

Min "ew" li wê derê dît. Wê dest bi akademîyê kiribû. Min heta hingê li ser pîşeya xwe nefikirîbû. Min berê xwe da wê pîşeyê. Min her tişt piştî nérînên wê dikirin. Akdeniz û Toros bûn şahidên evîna me. Paşê sînema, kolan û mekanên Stenbolê watedar bû.

Li parîsê min û çavên wê hevdu nas kir. Me ew der kir mala xwe, paşê Adaya me çêbû. Paşê me Mersîn kir meskenê xwe. Paşê Umut(Hêvî)yê me çêbû.

Min ji wê jinê fêm kir ku mirov dikare jinekê wek hevala xwe, rêbera xwe, hevpîşe û hevrêya xwe bibîne.

Bêguman jinê nasên min ne bi tenê destgirtî, hevalên polê û xizmên min pêk tê. Min gelek jin dîtin ku êş kişandibûn, tecawi li wan hatibû kirin, mobbbing li wan hatibû kirin, lê kêm kes ji wan ew tecribeyên tûndkariyê ji bo xwe-êşandinê bi kar anibûn.

Ne wan dilê xwe bi êşen xwe dişewitand ne jî jiyanê direviyan. Çi ji wan jinan bihatîya bêyî ku xwe biçemînin wan pêk tanî.

Ji bo dîtina wan jinan bi tenê li rêxistinên femînîstan nenêrin. We ew li Gezîyê, li nav Akademîsyenên Aştiîxwaz, li nav Dayikên Şemiyê û li Zozanên Behra Reş ditîn.

Miqabilê vê yekê, desthilata mîran, tûndkariya mîran kêm nabe berevajiyê wê zêde dibe. Ji ber ku mîr di fikarê de ne. Hin jin êdî hene ku dikarin bêjin na, mahir in, siyaset, zanist, hûner û rojnamegeriyê ji wan re nahêlin.

Jin hene ku dixwazin bibin destgirtî

naxwazin bizewicin. Kirin û nekirina seksê ne li gor daxwaza mîran dîkin. Hin jin hene ku dixwazin bixebeitin, dixwazin ji mîrên xwe cida bibin, ev yek jî mîran diêxe di fikarê de.

Ew hikmê mîran, desthilata bedenê û desthilata ji bo gihadina şertên xwendinê bi lezgînî diguhere.

Rêbaza nû ya ekonomîk êdî naxwaze masûlkên we zêde bin û hûn bi hêz bin, ew ji we dixwaze hûn afrîner bin. Hûn bi sebir û nazikiyê projeyan çêbikin û wan pêş de bibin.

Edî ne karê jinan e lê ev rêbaza nû welê ye ku yên afrîner û xwedanên sebrê(bêhnfireh) dê bikarin bi ser bikevin.

Nivîskara rojnameger ya Amerîkî, Hanna Rosinê di kitêba xwe ya bi navê "[The End of Men: And The Rise of Women](#)" (Dawiya Mîran: Bilindbûna jinan) de û di nivîseka li kovara [The Atlanticê](#) de weşandî guherîna zayenda civakî bi eşkereyî diyar dike.

Li gor idiaya Rosinê êdî dinya guheriye berê giradayî hêza bedenî bû lê êdî girêdayî têkiliyan, şîyanêن civakî û motîvasyona li ser karan e û ji bo vê yekê jî jin ji mîran zîrektir in.

Ji xwe Rosin behsa 15 pîşeyan kiriye. Em niho dibînin ku ji bilî di pîşeyan ji li pîşeyên dî bi ser ketine.

Heta ku bi vî awayî diguhere jin dê ne bi tenê di ekonomiyê de herweha ew ê di siyasetê de jî bi pêş bikevin û bibin rêber.

Digel ku ez gelek qîmetî didim pêşketina vê yekê, di firseta pêşiyê de divê bibêjim

ku bi zêdebûna jîmara jînan a di sîyasetê de çêdibe hişê mérane yê siyasetê neguhere. Zêdebûna "Leydiyên Hêsinî" Merkel, Çiller û Riceyan hişê siyaseta mérane naguhere.

Çêdibe mérani xwe bi rêya jinê mérane heyî bike. Ne bi tenê di nav sîyasetê de di nav berxwedêrên femînist de jî ez hin jinê mérane dibînim. Di berxwedaneka bi tenê li dijî mérän, ya ku hewil dide miqabilê wê be dişibe wê. Ez nikarim vê tespîtê nekim.

Halbûkî berxwedana rastî ew e ku jin tiştên ji dilê wan tê bi şêwe û nêrîna xwe bikin. Helbet ez gelek jinê di nav berxwedêrên femînist de dibînim ku bi vî rengî ne. Ez wan kesan nas dikim lê piraniya berxwedêran vê berxwedanê bi

gotingezkîya li mérän û daxwaza mafan ji mérän dikin.

Lê belê li gor min halê hazir de jin bihêz bûne û divê ev ji mérän azade be.

Ji ber ku berxwedana li dijî mérän belkî dê bêedaletiya heyî li gor daxwazên jînan biguhere lê belê ji bo zayenda civakî dê rîyê li sîstema heyî negire.

Halbûkî jin bi şêweyê xwe yê fikirîn û kîrinê dikarin pêleka vekhevîxwaz rake û ev belkî tekane rê ye.

Çi kêfxwe şim, min gelek jin nas kîrine ku di vê rîyê de dimeşin û em rasta hev hatine.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Ji hevparêñ damezirîner ên Kulturhaneyê ye û wek xebatkarekî wê, karê ku pê dizane bi awayekî cihê hewl dide berdewam bike. Akademîsyenekî Aştiyê û zanyarê siyasetê ye. Di Beşa Rêveberiyêñ Giştî ya Zanîngeha Mersînê de hîndekar bûye (Doç. Dr.). Di 29ê Avrêla 2017an de bi KHKyê hatiye îxrackirin. Ji Beşa Rêveberiyêñ Giştî ya Zanîngeha Galatasarayê derçûye. Master û doktoraya xwe li Enstîtuya Zanistêñ Siyasî ya Parîsê qedandiye.

#39 VEYSİ  
ALTAY

NE  
TESEDIF E  
52 MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSIN



Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## MÊR Ü MÊTINGER

Ji ber ku dema ez mezin dibûm hizrek hebû:  
Tûndkarî asayî ye û di hin rewşan de lazim e.

Dema jinek bi ser diket dihat gotin  
“jineka wek mêran e” û bi vî awayî  
wesfên qenc ji bo mêtaniyê dihatin gotin.

Ez ne ew kes im ku ji bo berxwedana li dijî tûndkariya mîran şîretan li jinan bikim, lê belê kesek im ku xwe berpirsê sekinandina tûndkariya mîran dibînim.

Ez ew kes im ku armanca min a pêşiyê tinekirina tûndkariya di jiyana min bi xwe de ye û bi van hestan dînîsim.

Ez bawer dikim ku bi beşdariya mîran tişteka berbiçav dê li gotinê jinan zêde nebe. Lê bi vê hêcetê ez ê hewil bidim kêmahiyêن xwe yên di vê rêu de binivîsim.

Mêr û mêtînger ji zarokatiya xwe ve hînî wê yekê dibin ku ew dalalîk in, pişka serê dilî ne.

Ew dixwazin vê yekê di hemiya jiyana xwe de bijîn. Min jî bi zanebûnî an ji nezanî ev mafê xwe yê delalkîbûnê şixulandiye.

Ji bilî cidabûna laşê jin û mîran, ez gelek derengî pê hesiyam zayenda civakî heye. Rolên civak dide zayandan hene.

Ji ber ku dema ez mezin dibûm hizrek hebû: Tûndkarî asayî ye û di hin rewşan de lazim e. Dema jinek bi ser diket dihat gotin "jineka wek mîran e" û bi vî awayî wesfêن qenc ji bo mîraniyê dihatin gotin. Paşê pê hesiyam dema jinekbihêz û quđret bûya jê re dihat gotin "wek dewletekê ye" yanî hêz û quđret ya dewletê ye.

Paşê di xebatêن xwe de min dît ku jin gelek caran li sefêن pêş in û ne "mêr" in ne jî "dewlet" in.

Dema min bi jinêن Cizîrî re belgefîlmek

çêkirî min dît ku jin ne wek dewletan ne jî wek mîran tam wek jinan bi awayekê jinane berxwedêr bûn. (Wek Marxî digot ji xwe-şermkirin dilpakî ye. Min dît û hînî wê yekê bûm.)

Herweha dema min berxwedana 33 salan ya Dayika Berfo dît, dema bûm şahidê 3-4 salêن berxwedana wê min mîraniya xwe ji xwe pirsî.

Asiye Doganê re haman tişt... Dewletê mîrê Hediye Coşkunê li ber çavêن wê kuştiye, kurê wê sala 1995ê hatiye desteserkirin. Min dît ew jin çawa ji bo mîran li hemberî "hêza dewletê" wek jinekê disekine.

Bêguman rû-bi-rû-bûna(xwenasîn) a min bi saya Tevgera Jinêن Kurd dest pê kir. Berxwedana Tevgera Jinêن Kurd ya li hemberî hişmendiya mîrane ya mîrên di nav "tevgerê" de, lêgerîna ji bo nasname û jinbûnê, ew fedakariya min paşê fêm kirî, bi sebrê ez/em perwede kirin.

Bêguman di wê dema sebirkirinê de, dema pirs-ji-xwe-kirinê û dema nikarî wek pêwîst bersiva keta ji bo te tê dayin bidî gelek noqteyên kêm li mirovî dimînin.

Eynî wek têkiliya mêtînger û mêtîngahan e. Yen mêtînger pirsan ji xwe nakin, xwe dad nakin û naxwazin kêmahîyekê li xwe bibînin.

Bi wê ji-xwe-baweriyê li şûna xwe biguhere, armanca wê ya bingehîn li gor xwe guhertina yên dî ye. Dema fikrên mixalif hebin li şûna xwe biguhere, hewil dide tiştinan bibîne ku nîşan bide ya wî/wê rast e. Têkiliya Kurd û Tirkan jî û jin û mîran jî welê ne.

Heke ez behsa xwe bikim. Veguherîna min a herî mezin mijarek e ku ji ber ez mîr im wê we kir ez ji xwe nefret bikim. Ji ber wê dixwazim binê wê mijarê dax bidim.

10ê Tebaxâ 2015ê li Gimgima  
Mûşê, mîrîn dest-li-xwîn yên hêzên parastina dewleta bi wê xwînê xwe serbilind dihesibîne, piştî kuştina Kader Kevser Eltûrkê(Ekin Van) ji bo bêrûmetkirin(kêkirina) wê termê wê yê tazî li nava Gimgimê “ji bo nîşandanê” danîbû. Dema em li rastiyê binêrin ev nîşaneka wê yekê bû ku ka dema gotinê “jina wek dewletan” an “jina wek mîran” têñ gotin mexsed çi ye.

Ji ber ku bi hişmendiya wê(dewletê) jin namûsa mîran û civakê bû û bi vê kiriyarê namûsa gelê kurd kirêt kiribû.

Halbûkî wan nedizanî ku ji bo wan jinênu dê bi salan li ber xwe bidin û mîrîn wek min qismî jî be xwe guhertîn, ew laşê tazî rûmet û serbilindî ye.

Ji bilî van tiştan ji ber ku ez bi jinênu xwedanêni hişmendiya femînist xebitîme û bi wan re bûme heval di wê pêvajoyê de ez hîn kirim û bû alîkar ku pirsan ji xwe bikim.

Ji ber ku di navbera fêmkirina teorîya tiştékî û kiriyara di jiyanê de ferqeka mezin heye. Yanî dema min fêm kir ew tiştên ez dibêjim qey mafêñ min in bi hişmendiya

civakê ji bo min hatine dayin ne hat wê wateyê ku ez ê bi rihetî dest ji wan berdim.

Qet ne hêsanî bû ku dest ji wan berjewendiyêni patrîyarkayê dayî min berdim. Ji ber ku jinêni femînist her dem me rast dikin û pirsan ji me dikin, welê kir ku ez zêdetir hewil bidim [xwe rast bikim.]

Îro her çend ez hewil didim zimanê nîrane bi kar neînim, tiştan dikarin wek tûndkariya psîkolojîk, ekonomîk, bi gotinan û fizîkî dikare bê dîtin nekim jî gelek zehmet e bêjim ji tûndkariya mîran a li derdora xwe gelekê dûr im.

Hê jî carinan dibêjim “erê lê belê.” Ji bo nimûne dema ez bibînim kesekî bi gotinan tûndkarî li jinekê kiriye ez hin li xwe dinêrim ez ji xwe re bibêjim “erê lê belê tûndkariya fizîkî nîne.”

Ne hêsaniye ku mirov çîxê mîraniyê bixwaze(meydanê ji mîraniyê re bixwaze). Ji ber ku gelek bilez tiştên me li xwe kom kirîn dikarin tine bibin, ne mûmkin(pêkan) e em bibêjin “min ew hel kir.” Ev rastiyek e ku divê hûn her dem rû-bi-rû bibin.

Ji bo ku em mîr li hemberî wê tundkariya em îdia dikin em li dijî wê ne bisekinin, divê pêşiyê em bixwe dest ji tûndkariya xwe berdin. Pêvajoya ku em pirsan ji mîrîtiya xwe dikin ji wê demê dest pê dike.

Divê em bizanin ku dema em bibêjin em ne di nav de ne ne rast e û dema jin îtiraz dikin divê em deriyê hişê xwe ji dil ji wan re vekin û guh bidin gotinêni femînistan.

Da ku em mesafeyekê bêxin di navbera xwe û mîratîyê de, ji bilî ku divê em rîyêni têkoşîna li dijî wê bibînin nîne.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

20 sal e bi fotograf û sînemayê re mijûl dibe. Di Komeleya Mafêن Mirovan û Rêexistina Efûyê ya Navneteweyî de bi salan rêveberî kiriye. Endamê damezrîner ê Komeleya Ret a Wijdanî ye (2013). Li Serêkaniyê (2013) û Kobanê (2014) nûçegihaniya şer kiriye. Ji kurdî bo tirkî û ji tirkî bo kurdî wergerên sîmultane û nivîskî dike. Albuma fotografan a bi navê Kaybolan Biz (100 fotograf, 100 çîrok) ku ji çîrokên windayan pêk tê, weşandiye. Derhêneriya belgefîlmên Faîlî Dewlet, Sessiz Hayatlar, 33 Yıllık Direniş - Berfo Ana, Nûjîn û Bîr (Kuyu) kiriye. Di sala 1976an de hatiye dinê.

#40 MURAT  
UTKU

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# SALEN DIBISTANA DERYAYIYAN, JIYANA MEDEÑÎ Û REWSÊN MÊRBÛNÊ

Hişmendiya civakê, siyasetê û helbet a dewletê, jinê ji civakê cuda dike. Lê bi vê jî nayê ser û li dijî jinan, li malê, dibistanê, leşkeriyê û her devera civakê hêrseke bêwate dixe mejiyê mîran.

Li serê sikakê kaşekî tîk hebû. Ez û bavê xwe di germa havînê de pê de hilkişyan.

Bavê min kire minmin û got, "Ma deriyê nexweşxaneyê wiha dibe?". Mafdar bû. Kaş gelekî tîk û dirêj bû. Dema em hatin ber deriyê nexweşxaneyê, leşkerê nobedar got, "merheba, gelo hûn ji bo muayeneyê hatine?". Demeke din ez ê bibûma 14 salî. Simbêlên min nû nû derdiketin. Em ketin hundir, me kaxizên xwe dane wan, qeyda me girtin, serbazekî deryayî li gel me, em derketin bexçeyê navîn ê nexweşxaneyê.

Li bexçe kêmanî 50 ciwanên di emrê min de hebûn. Dema balixbûnê hatibû û malbat ketibûn tatêleka zarokên xwe.

Bi qasî 10 rojan muayeneyê berdewam kir. Ji serî heta binî hemû laşê me kontrol kirin. Cara ewilî di wan rojan de ez rastî homofobiyê hatim.

Lewre dema em hemû li ser hev bûn ji bo bizanibin ka em homoseksuel in an na, me kontrol kiribûn. Hewce nake ez behsa hesta biçûkxistina vî tiştî bikim.

## 'Bahriye yan jî bahrî?'

Bi vî awayî dest pê kir salên xwendekariya leşkerî ya asta testosterona wê gelekî bilind.

Piştî vî tiştî, ji bo dilpakiyên 'leşkeriya deryayî' û xalên girîng ên jiyana mîran ango leşkeran li me ferz bikin, bi hemû giranî û bi dilhişkiya xwe mekanîzmayek dane meşandin.

Di vê metodê de -di wan salan de- cih ji jinan re tune bû. Ji bilî mamosteya ingilîzî ya serpel a di dema pola amadekariyê de, em rastî jinan nehatin.

Efserên mîr jî li nava çavên vê efsera jin dinêrîn û behsa serdestiya mîran dikirin. Heta rojekê yekî ji wan got, "derya weke jinê ye, bêbext e, divê mirov baldar be" û wiha berdewam kir: "Ji ber wê ji deryayê re 'bahriye' dibêjin, heke ne wisa bûba, wê 'bahri' bigotana." Tê bîra min ku em wê rojê bi vê heneka 'xav' kenyabûn.

## 'Çi karê jinan di keştiyê de heye?'

Karê leşkeriyê di wê demê de karekî gelekî girîng bû. Lewre ji bilî ceribandinan, sê derbe me li du xwe hiştibû ku her ji 10 salan carekê çêbûbûn. Tırkiye, di bin rêveberiya leşkeran de, di nava serdema tarî de bû ku faşîzma 12ê Îlonê derxistibû.

Weke her devera welatî, li leşkeriyê jî pirsgirêka jinan, ji wan pirsgirêkan bû ku, hewce nedikir mirov li ser biaxive. Weke di mînaka 'bahriye-bahri' de, jin di navenda henekên 'xav' de dihatin dîtin.

Di vê navberê de, leşkeren deryayê, bi sedan sala ne dixwazin baweriya herkesî bi wî tiştî bînin ku heke jin li keştiyê siwar bibin, wê bêyomiyê bînin. Bi vî tiştî, mîr dixwazin wê rastiya xwe veşîrin ku nikarin xwe kontrol bikin.

## Cilûbergên spî

Weke tê zanîn, leşkerên deryayê cilûbergên ango unîformayêñ spî li xwe dikin. Tê îdiakirin ku cin herî zêde ji vî cilûbergên spî ên leşkerên deryayê hez dikin. Di dilê xwe de vê weke serbilindiyekê dibînin.

Ji ber vî cilûbergê spî, leşkerên bejayı û yên hewayî, ji leşkerên deryayı re digotin ‘yenge’ (jinbir, amojin). Leşkerên deryayı gelekî ji vê gelek aciz dibûn.

Li hêlekê bi dehan henekên ku jin pê biçûk dixistin dihatin kirin, li hêlekê jî dihat gotin ku, ji bo cil û bergên keçan gemarî nebin, destmalên spî ji bêrîkên xwe derxin û ew cihê ku wê keç lê rûnên pê paqij bikin. Lê bêguman kubarî ne ev bû, min ê paşê pê derxista.

## Jiyana medenî

Serpêhatiyêñ min ên dibistana leşkerî piştî ez ji Dibistana Şerî vejetiyam bi dawî bû ku pênc salan berdewam kiribû. Min gelekî zehmetî nekişandin di adaptasyona li jiyana medenî de.

Salên dirêj min li dibistaneke leşkeriyê ya ku tenê mêt diçûnê û bi şev jî li wir diman perwerde dîtibû. Ew dibistana keç û xort bi hev re lê perwerde dibûn, ji min re bibû fersend ku li hêlekê ez xwe û li hêla din jî jinan nas bikim.

Piştî ji dibistana leşkerî vejetiyam bi salekê, xwendekarêñ jin karîbûn biçin dibistana şerî. Ez ne şahidê wê demê me. Lê ez dizanim bê ka di nava ewqas xwendekarêñ xort de çi hatiye serê wan xwendekarêñ keç ên hejmara wan kêm.

## Têkoşîna li dijî doktrîna ‘zilamtiyê’

Yek ji şaşiyêñ din ji salêñ dibistana leşkerî jî ew bû ku, min havînêñ demêñ balixiyê, bi destgirtiyêñ xwe re diborand û digot, dibe ku bi vê re ez têkiliya di navbera jin û mîran de fam dikim û minn bi van tecrubeyêñ bêxêrûber jiyan dinirxand.

Derbarê têkiliyêñ di navbera jin û mîran de ji bo ji hevalêñ xwe re behs bikin, me çîrokêñ kurt ên evînê yên weke çîrokêñ seydvanan kom kiribûn.

Û helbet yek ji van jî ti nêrîn li ser jiyana têkel ya ‘ji derive’ çênedikir. Ji ber vê jî ne hêsan bû ku rewşa mîraniyê ji ser xwe bavêje, ew jiyana ku leşkeriyê nedîhişt gotineke xirab li ser bê gotin.

Gelo yekî weke min ku ji ciwaniya xwe rastî doktrîna ‘zilamtiyê’ hatiye dibe ku bi nêrîneke cuda li jinan binêrê? Ev doktrîna mîraniyê ya ku îdeolojiya avakar, di sala 1920an de standartek ji bo wê çêkiriye û li ser bingeha berdewamiyê heta roja me hatiye.

Bi ceribandinan, bi destpelkê min hewl da ku pêş de biçim.

## Azadiya nîvco

Di demêñ piştî wê de min bi jineke ku hevkara min an jî destgirtiya min bû, li nava kolanê bi dengê bilind şer kir, li hemberî jinêñ din cure cure bênezaketî jî.

Min xwe li ser serê jinekê kir mameste jî –ew helwesta ku mansplaining dibêjin- di

biryarên derbarê laşê wê de destwerdanêن  
biçük ên bêhed jî kir.

Neslê mîran her çiqas ku piştî têkoşîna  
mafêن jinan nas bike û wê fam bike jî  
nikare hin tiştan sererast bike. Demêن  
wisa çêbûn ku di mijara serpoşê de min  
destpêkê piştgiriyeke nîvco dabû, lê paşê ji  
ber vê helwesta xwe ez xemgîn bûbûm.

**Başlık Li dijî zayendperestiyê û  
homofobiyê...**

Piştî vê pêvajoyê, li dijî zayendperestiyê  
û homofobiyê, li gel têkoşîna feminîzmê,  
ez hewl didim ku jiyanê ji çarçoveyeke din  
bibînim û ez ê hewl bidim.

Lewre him tiştê ku min di xwe de dît û him

jî li derdora xwe dît, ew "zilamtiya" di navâ  
mîran de bi hêsanî bi dawî nabe.

Hişmendiya civakê, siyasetê û helbet a  
dewletê, jinê ji civakê cuda dike. Lî bi vê  
jî nayê ser û li dijî jinan, li malê, dibistanê,  
leşkeriyê û her devera civakê hêrseke  
bêwate dixe mejiyê mîran.

Ji xwe bandora kompleksa rezîl a ku  
jineke bihêz li mîr dike, mixabin bi hêsanî  
bi dawî nabe.

**Têkoşîneke cewherî pêwîste.**

Dema ez li xwe vegerim: Ji bo li hemberî  
mala xwe û hevala xwe bêhtir bibaldarî  
tevbigerim, qonaxa ku divê ez derbas  
bikim heye.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Ji Dibistana Cengê ya Deryayê veqetiya. Ji Fakulteya Îqtîsad û Zanistên Siyasetê ya  
Zanîngeha Stenbolê destûryar bû. Di Radikal, Nokta û Aktuelê de nûçegihanî û di CNN  
Türk, Doğan Haber Ajansı ve Al Jazeera Türkê de wek nûçevanê televîzyonê kar kiriye. Di  
serî de yên li Rojhilata Navîn, qeyran, erdhej, hilbijartin, pevçûn, şer û şerê sala 2006an ku  
bi êrişa Îsraîlê li dijî Lubnanê dest pê kir, şopandin. Carinan ji bo bianetê dînivîse.

# NE TESEDIF E

52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



#41 BURAK  
KURU

Obianet  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## YÊN JI XWE RE DIAKIVIN: TIRKIYE JI VÎ DENGÎ HEZ DIKE

Sernûser destpêkê qebûl dike paşê difikire ku ew jin ne ew qasê delal e ku wêneyê wê yê mezin bê weşandin. Wêneyekê wê yê biçûk tê weşandin.

Digel ku giraniya werzîşa me li ser fûtbolê(topa pêyan) ye jî piraniya serkeftinên me ji besên dî yên werzîşê ne. Ev serkeftin jî bi xêra jinan bûye.

Lê dîsa jî “di meydanê de” li medyaya werzîşê ji bo wê yekê wek pêwîst e, “qîmet” nîne. Jin rastî kiriyarên ne di rê de yên mîran an jî tûndkariya mîran têne ji xwe mijara vê rîzenivîsê jî ew e.

Ka em ê ji destpêka şikestina fûtbolê nimûneyekê bidin. Hingê minaqeşe hebûye gelo divê jin jî fûtbolê bilîzîn an no... Rojnameya Akşamê 28ê Gulana 1929ê karîkatûrek weşandiye. Jin û mîrek fûtbolê dilîzin û axiftina wan ev e:

Fûtbollîzê mîr: Xanîma nazenîn heke destûra te hebe ez ê topekê ji cenabê te re biavêjim...

Fûtbollîza jin: Ka deqîqeyekê bisekine! Ka ez ê xwe bi dermanan bixemîlînim paêşê ez ê pêyê xwe li topê bidim. [1]

Ka em li salên 50yê binêrin. Em li beşeka nîvîsa Tugrul Eryilmazî ya “rîzenivîsa tûndkariya mîran” binêrin.[2]

“Piştî em çûyîn Lîseya Karşıyakayê jî ew tevgerên em dikarin bibêjin taciz e neguherîn. Neguherîn û bi ser re zêdetir bûn. Hin xwendekar miskîn bûn. Ji xwe re wek miskînan digerîyan û fûtbol nedîstin. Hin nasnav(lepqe) li wan hatibû kirin: “Ehmedê keç, Mistefayê nermik... Hingê ti kesan ji min re negotibû ku divê besdarî tîmîn fûtbolê bibim û ti bala min jî li ser fûtbolê nebû. Ji ber ku ez tîrsiyam

ew nasnav li min bêne kirin min xwe kir qelevan. Min xwe bi wî awayî xelas kir, ya rastî min got qey min xwe bi wî awayî xelas kir.

Vêca ez ê behsa şahidiyeka salên 90ê bikim. Rojekê xebatkarên beşa werzîşê yên rojnameyeka mezin li ser dîmenekê diaxivîn. Dîmenê lîstikvanên Tîma Voleybolê ya Jinan a Eczacibaşiyê bû, lîstikvanan li ber behrê ji xwe re dilîstin.

Ew kesê dîzayna rûperê rojnameyê dikir bi dengekê bilind got gelo ez li bin vî wêneyî çi binivîsim. Dema wî li ser wê yekê difikirî. Civatê dest bi yarî û henekan kirin.

“Ez çibinivîsim, ma binivîsim Or..pî xwe didin tavê” paşê li rûperî jî welê nîvîsiye. Rojname bi wê hevokê çap bûye. Hatiye ferqkirin û guhertin lê heta hatiye ferqkirin çend hezar rojname hatine çapkiran. Paşê ew rojname hatine belavkirin jî.

Civata fûtbolê wan salan bala xwe dide ser malbata fûtbollîzan. Wêneyê jîna wan an jî zarokê wan nîşan didin û dijûnan dikirin.

Dema em li sala 2000ê binêrin. Di Tîrkiyeyê bi salan ti serkeftin bi dest nexistibû. Elvan Abeylegesse di atletîzmê de bi ser ket.

Werzîşvana jin li Atletizmde Golden League rekora dînyayê bi dest xistibû. Bi alaya Tîrkiyeyê tûr diavêt. Yek ji birêvebirên rojnameyekê dixwaze ew wêne bibe wêneyê sereke yê rûperê destpêkê yê rojnameyê. Sernûser destpêkê qebûl dike paşê difikire ku ew jin ne ew qasê delal e ku wêneyê wê yê mezin bê weşandin. Wêneyekê wê yê biçûk tê weşandin.

Rewşa Tirkiyeyê ev e lê rewşa dinyayê jî jê ne gelek çêtir e.

Nimûneyek heye ku nîşan dide ka jin li meydanên lîstina fûtbolê çawa têne dîtin. Derhênerêkê Amerîkî ji ber dîmenên têne hilbijartin avê “honey shot(dîmenê hingivîn)” li lîteraturê zêde kiriye. [3] Ev tê vê wateyê dema fûtbol tê lîstin dîmenê jinê delal têne nîşandan. Ji sala 1970yê heta niho jî ev tevger dewam dike.

Ew şîroveyê zayendperest jî heta niho tê kîrin lê bi xêra medyaya civakî civak dikare nerazîbûna xwe li ser vê yekê nîşan bidin.

Zehmet e ku em bibêjin ev tevger kêm bûye.

Çapemeniya werzîşê ji empatiyê dûr e, piraniya şopînerên wê mîr in, li ser mijara zayenda civakî herî kêm çapemeniya werzîşê hêjayî rêzlegirtinê ye. Gelek rojname jî bi wî zimanê nîrane yê medyakarêni li ser werzîşê dinivîsin rûperên xwe tejî dikan.

Pirsa me ev e, erê ev rewşa ev qasê xerab çîma naguhere.

Dema em li rêjeya jin û mîrên xebatkarêni medyaya li ser werzîşê dinêrin, piraniya xebatkaran mîr in. Çîma jin hebin. Ji ber çi ji amadekaran heta nûçegihanêni diçin meydanên lîstina fûtbolê rêjeya medyakarêni jin kêm dibe?

Dîsa di rêzenivîsa tûndkariya mîran de em li gotinêni Tanil Bora û Bagış Ertenî binêrin.

Tanil Bora:

“Antropolog û prîkologên veguherînê dibêjin: Dema em komên giyanewerên şîr-jî yêni ku jimara mîran zêdetir e dinêrin em dibînin ku tûndkarî û êrîşarî zêde ye.

Li koloniyêni rojavayê Amerîkayê dema jimara jinan zêde bûyî jimara kuştina mirovan digel wê yekê kêm bûye.

Mîr û mîrbûn we dike ci tê ber hiş û devê we hûn bikin û bibêjin, har bibin. Li nav mîrên ciwan axiftina mîr û mîran şeklekê bêperwabûnê/pîşelênekirinê ye. Wek tola wan demêni jin jî heyîn rakin bi çavbircîtiyê...” [4]

**Bagış Erten:**

“Wan kesêni li seyrgeha meydanên lîstina topa pêyan kom dibin bifikirin. Komek kesêni xeber-reş, amade ku hinekan lînc bikin. Ev beşeka mîrbûnê bû ma yê ci be. Ew kesêni bi jinan re temas nakin, sosyalbûnê bi rîya sporê dikan, ew kesêni bi tenê bi wan kesan re ne ku dişibin wan bi xwe, ji yêni dî ünefret dikan... Ew kesêni bi serê xwe nikarin biaxivin lê bi komê re qêrdanê wek beşeka kesayetê dibînin...

Li vê wan gotinêni wek “mîrbûn”ê zêde bikin. Wehameta rewşê gelek xerab dibe. Êdî ferq nake ka ji kîjan çîn û nasnameyê ne. Ew kesêni xwenda, hûnermend, dersdêr hemî ji nû ve “maçotiyê(zirzopiyê)” ji nû ve diafirînin.”

Midûrê beşê werzîşê yê rojnameya Radikalê, Uğur Vardanî li ser navê rojnameya AMK nivîseka rexneyî ya bi navê “gelo hûn gelek fikirîn ku wî navî dbibînin” nivîsîbû. Rojnameya AMKyê dê wê rojê dest bi weşanê bikira. [5]

[Rojname diyar dike AMK navê kurtkirî yê “Açık Mert Korkusuz” yanî Zelal, Merd, Bêtirs e. Lê di civakê de AMK wek kurtkirîya dijûna “Min ku../niha qu.te” tê bikaranîn...Têbînîya wergêrî: Murat Bayram] [6]

Vardan:

"Li ser xêrê be iro li ser navê sporê(werzîşê) gaxeka baş dê bê avêtin. Rojnameyeja nipûnû dê iro bigihe xwendevanan. Lê navê wê feacaat e: AMK. Ew nav kurtkîriyê "Açık Mert Korkusuz"ê ye. Lê ev nav bi tenê li ser kaxezê ye. Li gor zimanê Twitterê kamûflaja wê dijûnê ye ku hûn dizanin. Tirkiyeyê bi zimanê tûndkariyê, serdestiya mîran, ziamnê şerî gelek deng ji xwe da û li ser vê yekê dewam jî dike.

"Ev wek neynika jiyanê ye ku fûtbola delalîka me jî tê de ye. Ew kesên li fûtbolê temaşe dikan, temaşevan û birêvebir gelek cara hin gotinêne di rê de bi kar tînin. Carinan jî hemî gotin ne di rê de ne. Gelek caran digel faşîzmê ev yek tê bi kar Înan. AMK wê tevgerê ji nûve diafirîne, we dike ew tevgerêne di rê de bibin tiştêne ji rêzê."

Rojnameyê piştî vê rexneyê doz li nivîskarî vekiriye û ji wî 20 hezar tezmînat xwestiye. Dadgeh vê dozê qebûl nake yanî rexneyê di rê de dibîne.[7]

Di sala 2018ê de rewşa me ev e: Ew rojnameya Ugur Vardan sernivîserê beşa werzîşê bû û ez jî salên 2009-2014ê ji bo

wê xebitîm hatiye girtin. Li wê rojnameyê heta ji me dihat em ji tûndkariya mîran dûr diman. Lê êdî ew rojnameya Radikalê nema.

Xebatkarênen rojanemeya AMKyê kedeka baş didin lê digel wî navî li ser karê xwe dewam dike. Bêguman em ê li ber xwe bidin lê ji bo vê demê encama ku ez gihamê ev e: Tirkîye ji vî zimanî hez dike.

[1] *Murat Toklucu: Futbol Kadını Bozar Mı? Socrates, Mart 2016*

[2] *Tuğrul Eryılmaz: Sur Karşıyaka Cebeci Babıali, [Bianet](#)*

[3] *Andy Sidaris: [The Man Who Invented Sports Television's Honey Shot](#)*

[4] *Tanıl Bora: Erkek Erkeğe, [Bianet](#)*

[5] *Bağış Erten: Yatılı, Çukurovalı ve Tribün Çocuğu Olarak Büyümek, [Bianet](#)*

[6] *Uğur Vardan: Bu İsmi Çok Mu Aradınız? Radikal*

[7] *AMK'nın Uğur Vardan'a Açıtığı Dava Düştü, [Medyatava](#)*



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnamger e. Ji bo Hürriyet Kitap Sanat, Posta Kitap û pêvekên dawiya hefteyê yên Hürriyetê nûçe û hevpeyvînan çêdike. Di Radikal, Hürriyet û msn.comê de wek muhabîr-edîtor xebitiye. Di Weşanxaneya Çinar&Kirmizi de edîtoriya pirtûk û kovaran kiriye. Di pêveka Cumartesi ya Cumhuriyetê de geştnâme nivîsandiye. Di kovarênen wekî GQ, İstanbul Art News, L'Officiel Hommes de hevpeyvîn û nivîsên wî hatine weşandin.

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN

#42 BURAK  
GÖRAL



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## DI SERÎ DE JIN Û ZAROKAN RIZGAR BIKIN!

Li gorî lêkolina “Bikaranîna Teknolojiya Înformatîk a Zarokan û Medya” ya Saziya Îstatîstîkê ya Tirkiyeyê (TÜİK), ji sedî 92.5ê zarokên temenê wan di navbera

6 û 15yan de her roj li televizyonê temaşe dikan.

Li gorî heman lêkolînê, piştî 10 saliyê zarok kêmtir li xêzefilman temaşe dikan û bala wan bêhtir diçe ser film û rêzefilmên xumalî.

Gelo di zaroktiya min de lehengên min ên mîr kî bûn? Ez li ser vê difikirim. Ne zêde be jî çandeke min a xwendina xêzeromanan hebû. Min Zagor zefh dixwend.

Û Mister No. Lê di yên Mister No de serê lehengê me yê maceraperest bêhtir ji ber jinan dikete belayê. Dilê wî gelekî li ser jinan de bû. Ji hêla 'femme fatale'yan ve bi hêsanî dihat xapantin. Ew 'femme fatale'yên gelekî rind hatibûn xêzkirin.

Lê xêzeromana bi navê Zagor di van mijaran de zêde pêl cihêن şil nedikir. Zagor li daristanê Darwoodê dijiya û dixwest sîstema adil a li vir berdewam bike. Têkiliya wî û jinan ne di pêş de bû.

Paşê rojekê min li sînemayê li "Star Wars"î temaşe kir û guhertineke gelekî mezin di jiyana min de çêbû. Êdî lehengê min ê yekem Han Solo bû. Firarî bû, firariyekî maceraperest, bi tena serê xwe bû û ji bo kêf û dahata xwe dijiya.

Destpêkê ji bo berjewendiyêن xwe, paşê jî ji bo dilê wî kete Prensel Leiayê kete nava isyankaran. Di berdewama çîrokê de ji boarmancêن berztir dikaribû xwe bixe nava xetereyan.

Lê Prenses Leia ne jî wan prensesan bû. Li bende nedima ku hin kes werin wê rizgar bikin. Serhildêr bû û dema pêwîst dikir dibû şerker. Vê bêhtir bala min dikişand. Xuya ye ku wê demê bala min çûye ser jinêن xwedîkarakter û bihêz.

Piştî me li Star Warsê mêze dikir, em zarokên malbatê bi şev derdiketin seyranê û ci dema em dihatin ser hev, me lîstika "rizgarkirina prenesê" dilîst. Di çavê me de jin dewlemendî bû ku diviya mîr wan ji nava destê mîrêن xirab rizgar bikin.

Gokçena xweşik, keça xalê min, di malbatê de tekane zaroka keç bû ku dikarîbû bi me re bilîsta. Yan dibû prenes yan jî "keça serokî" ku ji bo pereyan dihat revandin.

Senaryo û karakterên lîstikan min amada dikirin. Me li sînemayê û di televizyonê de li kîjan klîşeyan temaşe dikir, hemû jî dixist nava lîstikên xwe. Lê min her gav Gokçen hişyar dikir û digot, "Tu jî car caran hêrs bibe û xwe bixeyidîne, weke bûka lekî nebe!"

Helbet dema em zarok bûn bandora 'jina sekşî ya ji lehengan re dibû xelat' jî li ser me çêdibû ku bi filmêن weke James Bond û bi reklam û rêzefilman pêşkêşî me dikirin. Me digot qey ji bo em 'cool' xuya bikin divê em qedir nedin jinan.

Hûn dizanin, keçen di dema lîseyê de bêhtir bala wan li ser "kurikênebaş" e. Di dema lîseyê de her hewldana min a ku ji bo ez bibim 'kurikênebaş' têk diçû. Ne ku weke bêqedir in ez nêzîkî jinan dibûm. Ji ber wê jî di salêن lîseyê de ez her bûme hevalê jinan ê herî nêzîk lê nebibûm hezkiriyê wan.

Helbet her wextî li sînema û di televizyonan de ew film û rêzefilm hene ku di wan de mêt jinan gelekî istismar dikan. Bi taybet jî di filmên ji bo gîşeyê de, yên sînemaya Yeşilçamê...

Lê divê em balê bikişînin ser wê hevsengiyê ku bi TRTyê re hatiye avakirin. TRTyâ weşangeriya civakî dike. Weke mînak rêzefilmê bi navê "Perihan Abla". Lehenga sereke ya rêzefilmî "Perihan Abla" ye ku bikêrhatî, herkesî jê hez dikir û hurmetê nîşanî wê didan û di jiyana civakî de serkeftî bû. Dîsa giringî dida çanda jiyana taxan û alîkariyê. Rêzefilm behsa van tiştan dikir ku bişahînet û pozitîv bû. Dibe ku ji ber hêla maderşahiyê derxist pêş, di nava salan de lehengê sereke yê rêzefilmî ji xwe dûr xistibe.

Bi zêdebûna kanalên taybet re, bi zanebûn an jî bi nezanî hişmendiya cidaxwaz û istismarî di dramayêne televizyonan de bêhtir ji xwe re cih dîtin. Em bi Kadirîzman, bi nivîskarên ku pirtûka mîrbûnê dinivîsandin û bi Polat Alemdaran hatin heta van rojan...

Êdî di gelek rêzefilm û filme me yên komedî de jin pasif û bêyî hebûna mîrekî nikarin bijîn, mêt jî li ser navê karîzmayê bênezaket û maço tên nîşandan. Û weke ku "neçar in van tiştan bikin."

Li gorî lêkolina "Bikaranîna Teknolojiya Înformatîk a Zarokan û Medya" ya Saziya Îstatîstîkê ya Tirkîyeyê (TÜİK), ji sedî 92.5ê zarokên temenê wan di navbera 6 û 15yan de her roj li televizyonê temaşe dikin. Li gorî heman lêkolînê, piştî 10 saliyê zarok kêmîtir li xêzefilman temaşe dikin û bala wan bêhtir diçe ser film û rêzefilmên xumalî.

Rêjeya temaşekirina rêzefilmên xumalî di navbera zarokên temenê wan ji 6an heta 10an ji sedî 44 e, ev rêje di navbera yên temenê wan ji 11 heta 15yan ji sedî 77e.

Ev jî dide xuyakirin ku di nava müşteriyê rêzefilmên xumalî yên li televizyonê Tirkîyeyê tên nîşandan de rêjeya zarokan gelekî zêde ye. Baş e, gelo di van rêzefilman de temayêne ku wê bandoreke erêni li jiyana zarokan bike heye? Helbet ne rast e ku di hemû rêzefilman de em li berpirsiyareke bi vî awayî bigerin.

Lê dema di bin navê televizyonvaniyê de hûn mantika nifşan rakin û piştî nûçeyên şevê rêzefilmekî çar pênc saetan berdewam dike nîşan bidin, mirov hinekî li berpirsiyaran jî digere. Rêzefilmên me berê mirovan nadî karkirine yan jî bala wan nakişîne wî tiştî ku bibin mirovên baş.

Ne diyar e ku karakterên mêt ên dewlemend çawa gihiştine wan mertebeyan. Gelek ji wan ji malbatên dewlemend in û dema ku kar dikin nayê nîşandan. Nadin xuyakirin ku ci perwerde dîtine. Gelek ji van mîran nînazik in û êrîşkar in.

Jin jî wiha tên nîşandan ku ne mêt bin nikarin bijîn. Hema hema qet lehengên jin ên bihêz ên ji bo zarokên keç bibin rol moden nînin. Lê di serdema me de ev rêzefilm di lîsteya temaşekirina zarokan de di cihêن herî girîng de ne.

Mehêñ derbasbûyî di rêzefilmekî televizyonê de lehenga film a ji ber tundkariya mîran direviya, di rewşeke gelekî xirab de hatibû nîşandan. Me ev rewş bi taybetî li ser medyaya civakî gelekî rexne kiribû.

Çêkerên rêzefilmî gotibûn ku ew dixwazin "bala mirovan bikişînin" ser rewşê û xwe bi vî awayî parastibûn. Lê li civakeke ku her diçe zarafet û narînî winda dibe, bala civakê bi vî awayî nayê kişandin. Bi taybetî jî di rewşeke ku zarok jî temaşevan bin de...

Baş e, gelo li sînemayê rewş çawa ye?

Beriya niha bi pênc şeş salan, dema ez bi kurê xwe re li parkê bûm, bi bavekî din re me dest bi sohbetê kir. Dema karê min ji min pirsî û min jê re got, bang li kurê xwe yê pênc şeş salî kir.

Ji wî re got, "Binêre mamê te karê sînemayê dike. Ha weke Recep İvedikî bike bila bibîne." Kurê wî zikê xwe werimand û dengêن 'hohahaha' derxist. Bi vê tevgerê re ji nişkê ve di jiyana min a karî de merheleyeke nû vebû.

Paşê min dest pê kir û min kontrola hesabêن medyaya civakî ya hin dê û bavan kir. Min çavdêrî li dê û bavêن kurê xwe jî kir. Hemû filmêن komediyê yên xumalî wiha dibînin ku bi malbatî dikarin biçin temaşe bikin. Piştî wê min beşek ji xebatêن xwe li ser vê mijarê kir.

Gelo hûn dizanin ku li hemû cîhanê dê û bav hewl didin zarokêن xwe ji kîjan dîmenan dûr bixin? Li gorî encamêن lêkolînan, em ji tiştan natirsin bi qasî ji tazîbûnê ditirsin! Ziravê me ji tirsâ diqete ku zarok wê li ser perdeya sînemayê mirovêن bi hev şa dibin bibînin... Û li Tirkîyeyê tiştê herî kêm jê tê tirsîn jî henekêن derbarê destavê de ne. Ev jî xetereyeke din nîşan dide.

Mîzaha derbarê destavê de ew tişt e ku

bi tiştêن weke gu, mîz an jî fiskirin, verişîn û yên weke wan re mijûl dibe û wan weke mînaka henekan nişan dide.

Digel van tiştan, di hin komediyêن Hollywoodê û gelek komediyêن me yên xumalî de, zimanê nêrza yê piştgiriya zayendperestiyê jî dike, bikaranîna argoyê, cidaxwaziya li ser zayendperestiyê tê kirin, hovîtî û car caran jî bi dijlehengiyê mîzah tê kirin.

Gelek guhdar û temaşevanêن vê mizahê heye. Lê biyanî heta ji destê wan tê, bi mekanîzmayeke otokontrolê ya biewle, zarokêن xwe li derveyî vê girseyê dihêlin. Weke mînak sîstemeke wan a senifandinê ya temenan heye ku gelek caran serî lê didin.

Ji ber ku heke zarok ne di temenê temaşekirina van cure filman de bin û li wan temaşe bikin ihtameleke mezin e ku lehengêن van filman ji xwe re bikin mînak û wan şaş fam bikin.

Lê li welatê me film bi vî çavî nayêن nirxandin. Sînemagerêن xumalî ji bo wê destûrnameyê bidest bixin gelekî hewl didin ku kesêن temenê wan 7 û berjortir in bikaribin li van filman binêrin. Piranî jî bi dest dixin. Filmêن herî bênezaket herî zêde destûrnameya ji bo kesêن temenê wan 13 û berjortir distînin. Lê divê piranî destûrnameyê ji bo kesêن temenê wan 15 û berjortir bistînin.

Mirov dikare birek mînakan bide. Lê ya herî tê dazîn, wê hêsanter be. Di beşa çarem a filmê bi navê "Recep İvedik" de, İvedik beşdarî pêşbirka li girava Survivorê dibe. Li vir jineke qelew reqîba wî ye. İvedik wê bi zimanekî gelekî xirab biçûk dixe, ev ne

bes e, di sahneyekê de tundkariya laşî jî lê  
dike.

Vî filmî destûrnameya ji bo kesên temenê  
wan 7 û berjortir standiye. Û mixabin hin  
zarok li dibistan û derdorê weke İvedik  
tevdigerin ku wî xwînşîrin û pêkenî dibînin.

Ez hêvî ji Xwedê dikim ku ew kurikê pênc  
şeş sal berê pêrgî wî hatim û xwe dikir  
weke İvedikî, li dibistanê henekên xwe bi  
hevalên xwe yên keç nake.

Ya herî xirab jî ew e ku ev dê û bavêñ  
ditirsin zarokên wan memikan bibînin,  
dixwazin bi heft belayan zarokên xwe yên  
temenê wan kêmî 7an jî, bixin van filmên  
komedî yên bi dijleheng û tundkariyê li  
herkesên derdora xwe bi taybetî jî li jinan  
dikin.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rexnegirê fîlman, nivîskar, senarîst û hîndekar. Ji Fakulteya Zanistên Îqtîsadî û Îdarî ya Zanîngeha Marmarayê derçûye. Ji sala 1994an ve di Sinema Dergisi, Milliyet, Esquire, Yeni Yüzyıl – Café Pazar, Cumhuriyet, Posta, Arka Pencere ve Sözcü de rexneyên fîlman û nivîsên sînemayê nivîsandiye. Sê pirtûkên wî yên sînemayê û sê jî senaryoyêne wî hene ku fîlmên wan hatine kişandin.

#43 MEHMET  
BOZOK

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

XEBATÊN LI SER MÊRANIYÊ  
YÊN BI NÊRÎNA REXNEYA LI  
MÊRANIYÊ (NE GELO) Û MÊR

Dema em minaşeşeyê li ser mîran û mîrbûnê dîkin  
divê em xwe ji cewherparêziyê dûr bikin, divê em ji bîr  
nekin ku mîrbûn beşek ji avakirineka civakî ye.

**and so castles made of sand,  
fall in the sea, eventually\***  
- Jimi Hendrix

Piraniya xebatêñ li ser zayenda civakî ji destpêka sedsala 20ê dest pê dikan. Ev destpêk ji aliyekê ve rê dide hingê li rojavayê zayenda civakî û femînmîz derbikeve û bilind bibe. Ji aliyê dî ve di serî de li ser psîkanalîzê û dewra destpêka antropolojiyê xebat hatine kirin. Ew minaqeşeyêñ li ser wan mijaran piştî salên 1960an û 1970yan pêla duyem ya femînmîzê radike, xebatêñ li ser LGBTQIA+an geş dibe û zayenda civakî derdikeve. Rexneya femînist bi taybetî bi dirûjma “tiştêñ şexsî polîtîk in” bi pêş ket. Ew mijarêñ ku berê li akademiyê behsa wan nedihat kirin êdî bûn mijara behsê û di warê polîtîkayê de jî temasî jiyanê kir. Ew minaqeşe hatin radeyekê ku êdî mîr jî mecbûr bûne bersivan bidin. Berhema vê yekê di salên 1970yan de derket û xebat li ser mîrbûnê û mîran jî hat kirin.

Dema em li xebatêñ li ser zayend civakî dinêrin li gor qinaeta min em du nîşanan dibînin ku ew nîşan hevdu temam dikan. Ya yekem ew e ku bi ferqêñ zayandan li zayenda civakî lêkolîn hatin kirin. Ev ferq ne bi tenê ew ferqêñ di navbera mîr û jinêñ heteroseksûel, mîla li nasnameyêñ zayendî yên LGBTQIA+ bûn. Ne bi tenê ferqêñ di navbera çanda wan de jî bûn. Ji bo nimûne yek ji wan kesêñ xebatêñ li ser mîran kirine Raewyn Connell e. Wî diyar kiriye mîranî ne tiştaka bingehîn, îlahî, gerdunî ye û dikare bê guhertin. Halê hazir mîranî bi tenê bi şeklê biyolojîk nikare bê eşkerekirin. Vê yekê ferqêñ li çand, dîrok,

civakê û mîla zayendî, nijad û çîn diyar dike. Tiştaka dî jî ev e ku dikare biguhere û bê guhertin.

Nêrîna duyem jî ew e ku divê ji bo nirxandina zayenda civakî ji perspektîfa desthilata civakî ve bê nêrîn. Ji bo nimûne xebatêñ li ser LGBTQIA+an eşkere dikan ku homofobî û transfobî ne qeder e. Femînmîzê rîyek vekiriye ku minaqeşe li ser sîstema mîr lê desthilat, vegotinêñ jinan kêm dikan, pederşahî bê kirin. Wan diyar kiriye ku ev dikarin bêne guhertin.

(Dixwazim li vê derê eşkere bikim ku hin kes digel ku li ser zayend civakî minaqeşeyan dikan jî naxwazin statûko bê guhertin. An jî bi wî awayî tevdigerin ku potansiyela rexneyê ya têgehê pûç dibe.)

Wek min li jor diyar kiribû minaqeşeyêñ li ser mîran û mîraniyê bi bersivêñ minaqeşeyêñ li ser femînmîz û LGBTQIA+an derketiye. Ev xebat ji ber ku rasterast li ser zayenda civakî bûn ji rexneyê dûr bûn. Ji destpêkê hin kes hebûn û piştevanêñ wan jî li Amerîkayê hebûn ku difikirîn mîranî ji destan çû(!) ji ber femînmîzê kêmâyî li mîran bûye(!) û krîza mîran çêbûye(!) Ji aliyê dî ve komek hebû ku ji destpêkê ve xwe ji femînmîzê dûr girtin û diyar kirin mîrbûnê herî zêde zerer daye mîran. Lê koma sêyê jî heye ku van salên paşiyê rayêñ wê belav bûne û xurt bûye. Ew li mîran û mîraniyê bi nêrîna “pro-femînist” û “cidaxwaziya zayendî” dinêrin.

Têgeha Raewyn Connellî ya bi navê "mêrîtiya hegemonîk" û "mêrîtî" êdî bûye wek nîşana ji hev cidakirinê.

Ew diyar dike ku "Mêrîtiya hegemonîk" li gor mératiyên dî di hin rewşan de ji bo avakirina méraniyê dikare serkeftîtir be. Têgeha "mêranî" yê jî diyar dike ku mérani ne tişteka gerdunî ye dikare pirjimar be û bê guhertin. Bi vî awayî wek femîzmê ew jî destnîşan dike ku mérani dikare bê guhertin. Di zanistên civakî de her ku diçe cihê "mranî û lêkolîn û rexneyên li méraniyê" her ku diçe zêdetir dibin. Her roj hin kesên dî vê têgehê nas dikan. Li Tirkiyeyê û li dinyayê ev qada zanînê her ku diçe berfirehtir dibe.

Ew kesên femînist û ew kesên li ser LGBTQIA+ ji xebatê profemîstan û dij-zayendperestan ne piştrast bûn. Fikreka holê hebû ku dihat diyarkirin ji xwe li ser paderşahî û heteroseksîstan xebat hebûn ci hewce bû ku li ser mérân û méraniyê xebat bê kirin. Ya rastî xebatê li ser méraniyê jî bi bersiva vê pirsê tê diyarkirin.

Connell û hevalên wî ew kes bûn ku ji çavkaniya femîstan xwe gihadibûn, salên 1970yê ew ji tesîra paderşah a neyînî ya li ser jin û LGBTQIA+yan aciz bûne û ne bi çavê meydaneka popûler lê belê bi çavekê polîtîk û bi mereqdariya akademîk li mijarê nêrîne. Xebatê li ser femînist û LGBTQIA+yan bi nêrîna heteroseksîs ya paderşahan li LGBTQIA+ û jinan dinêrin. Ew mérén ku bi xwe hakimê vê mijarê bûn bala xwe nedidanê ka méraniya xwe çawa ava kirine. "mérbûn û lêkolînen li ser mérbûnê" bala xwe dida vê yekêku li ser wê lêkolîn nedihatîn kirin.

Beşa "mér û lêkolîna li ser mérbûnê"

rexneyek li navmala mérân dikir. Ji bo vê yekê wek beşeka rexnegiriyê ya zanistên civakî ye. Ev beş li hemberî mêtîngerîyê, cidaxwaziyê disekine û li hemberî wê yekê ye ku hewildanek heye jinan û LGBTQIA+yan wek çîna duyem dibînin. Ji ber ku ev beşa zanistê popûler bûye têgehê Connellî yê "méraniya hegemonîk" û "mérbûn" berbelav bû. Ev belavbûn ne ji ber popûleriya Connellî bûye. Girîngiya wî ji ber tiştên polîtîk in. Ew sebeb jî ew e ku divê avakirina mérbûnê rasterst mérniya mérân biguhere.

"Mér û lêkolîna li ser mérbûnê" beşeka lêkolînê ye ku ji salên 1970yê ve cil sal bi ser re boriye. Di vê demê de hin mijarêne nehatîn rojevê yê wek: kodê mérbûnê, dewrê emri yê mérân, bavbûn û bavîtî, têkiliyê xebatê û mérbûnê, tesîra vegotinê paderşahane yê li ser bedena mérân, temsîliyeta mérân a li sînema, medya û edebiyatê, mérân û vegotinêniijadperestane, têkiliya spor û mérbûnê hatin rojevê û minaqeşe li ser hat kirin.

Beşa mérbûn û mérân dibe ku ji aliyê wan mérân ve hatibe destpêkirin ew li pey femîzmê çûne û xwe rexne kirine. Lê îro qasî mérân jin jî li ser vê beşê dixebeitin. Ez dixwazim vê yekê li vê derê berçav bikim ku dema lêkolîn li ser zayenda civakî tê kirin, an demên ku em dijîn divê em xwe ji rexnekirinê nevedin. Berpirsên tûndkarîyê, tacizê, tecawiz û cidaxwaziyê mérén paderşah û heteroseksûel in. Ew ew kes in ku we dikin dema jin diçin derive dilê wan di destê wan de ye, ew kes li ekonomiyê, li hiqûqê heta ku li metroyê li her astêniyiya rojane li gor daxwaza xwe cihan dagir dikin. Kurtasî ew kesên li gor paderşah û mérân "lîstikê" dilîzin jîyanê teng dikin. Ji ber wê ji beriya em li

ser mîran û mîrbûnê bifikirin em nikarin li ser mijara mîran û desthilatê qelemê li kaxezê bidin. Mesela em nikarin dema li ser mîran û mîrbûnê bifikirin wek li ser berdaqeka(îskaneka) avê bifikirin bêhest lê bifikirin(li gor min îskana avê jî polîtîk e). Em nikarin bi çavê popûleriyê li kapîtalîzm, paderşahî, heteroseksîzmê binêrin bi vî awayî gelek tişt dê ji destêne me derbikevin. An dema em li ser mîran minaqeşeyê dîkin em nikarin bêyî paşxaneya civakî û çandî binêrin. Em nikarin bi tenê kesan súcdar bikin. Heke em hemiyan wek parçeyên hev nebînin ji bo rexneyê gelek tişt dê ji destêne me derbikevin.

Dema em minaqeşeyê li ser mîran û mîrbûnê dîkin divê em xwe ji cewherparêziyê dûr bikin, divê em ji bîr nekin ku mîrbûn avakirineka civakî ye.

Ez dikarin vê yekê bibêjim li ser mîran û mîrbûnê karênen wesiblînd têne kirin ku min kelecanî dîkin. Ji bo em li ser mîran û mîrbûnê minaqeşeyekê bikin (hebûuya baş bû lê belê) ne hewcye teorîyên

berfireh hebin. Mîr û mîrbûn li derdora me ne. Ew rastî ne ku em û yên li derdora me rastî wê têne. Ji ber wê yên rexneyê li mîrbûnê dîkin berê tîrêne rexneya femînîst pêşiyê bide xwe gelek giring e. Heke ev yek nebe ev mijar bêwate dibe. (Mesela heke mîrên tûndkar an ew mîrên homoseksûelan kêm dibînin rexneyê li mîraniya xwe bikin dê ci bibe? An em wê pirsa mezin bikin, mîrên ku herî zêde ratî paderşahiyê têne heke mîraniyê rexne bikin ma dê ci bibe?).

Gelek giring e ku em bi rexneyan li mîran û mîrbûnê binêrin. Ji ber ku derthilata mîran û heteroseksîzm mîr jî tê de jiyanha her kesan dike wek dojehê. Dewamkirina li ser vê yekê li jiyanê nayê. Derfetek ji bo xebatêne li ser mîrbûnê li akademiyê heye. Lê heke ew rexnegir bin dikare kêr bêne.

Ji bo paderşahî û (hetero)seksîzm nemîne divê mîr biguherin. Guherîn mûmkin e.

[\*] Jimi Hendrix berhema “Castles Made of Sand”

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE


Akademîsyen e. Ji pazdeh salan zêdetir li ser mîran û mîraniyê ya li Tirkîyeyê lêkolînan dike û gotaran dînivîse. Ji Beşa Felsefeyê ya Zanîngeha Hacettepeyê destûryar e. Mastera xwe li ser mijara “Di şevnişînên Enqereyê de rîtuelêne ketina qonaxa mîraniyê” di Beşa Antropolojiyê ya Zanîngeha Hacettepeyê de çekiriye. Doktoraya xwe jî di sala 2013an de bi mijara “Li Trabzonê Înşâkirina mîraniyê” li Beşa Sosyolojiyê ya ODTUyê kiriye. Di sala 2011an de ji bo Komeleya Navenda Pêşxistina Sosyal û Wekheviya Zayendî (SODEP), da ku di perwerdeya xwendekarêne mîr ên zanîngehan de bi kar bîne Soru ve Cevaplarla Erkeklik nivîsandiye. Di salên 2016-2017an de wek lêkolînerê sereke ji bo AÇEVê Li Tirkîyeyê Lêkolîna Bavîtiyê meşand ku ev lêkolîn hê jî lêkolîna herî berfireh e ku li Tirkîyeyê li ser mîr û bavan hatiye kirin. Her wiha bala xwe dikşîne ser koçberiya bi darê zorê jî. Hîndekarê Beşa Sosyolojiyê (Îngilizî) ya Fakulteya Zanistêne Mirovî û Civakî ya Zanîngeha Maltepeyê ye.

#44 YENAL  
BİLGİCİ

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## BILA MÊR JI KEREMA XWE RE HIŞ BIN

Em mêtîn ku bûne sebeba ev qas neheqîyan,  
me post vegirtine û em çavêن xwe li neheqîyan digirin,  
êdî bila em ji kerema xwe re hiş bibin.

Ji beriya her tiştî ji bo diristîyê dixwazim bibêjim baweriya min li wê yekê nayê ku mêt bi xwe re rû-bi-rû bisekine. Ji xwe ez bawer nakim ku mêtên li ser jinan jî mafê xwe dibînin biaxivin lê rêyê nedin jinan bi xwe re rû-bi-rû bisekine jî rast bibin.

Ew rasterast failên tûndkariyê ne, dengê meddûran ji xwe kêm derdikeve vêca ew jî xwe bikin di nav karê wan re û bibêjin "ez jî dê biaxivin" ma di rê de ye?

Belkî gelek kes piştgiriya vê fikra min nekin lê divê mêt her gav neaxivin hinekê bisekinin û bifikirin.

Ez ê hewil bidim ji pîşeyê xwe, ji rojnamegeriyê sûd bigirim û sebebên vê yekê eşkere bikim.

Ji ber ku digel gelek kêşeyên dî, ji ber nehekheviya jimara rojnamegeran tûndkariya mêtan baş nayê "teşhîrkirin."

Ez dixwazim hûn bi vî çavî li vê nivîsê binêrin.

Em bi agahiyeka nû dest pê bikin. Demekê kurt ji beriya niho min li rêzefîlmeka popüler, li 'Bodyguardê temâşe kiribû. Dema min dest bi temâsekirinê kirî min dizanî rêzefîlm li ser têkiliyên wezîreka karên navxweyî û bodyguardê(parastvan, heres) wê ye.

Çîroka filmê diherikî. Merek nekin ez ê spoîleran nedim. Film bi dîmenekê dest pê dike, kesekê xwe kuş di trênekê de ye û ber bi Londonê ve diçe... Polîsê me yê mêt vê yekê dibîne û midaxele dike.

Tiştê pêşiyê ev e: Ew kesa xwe kuj jinek e ku bi zora mêtê xwe mecbûrî karekê

bûye... Polîsê me diçe ji şefa trêne re dibêje, şef jî jin e.

Hêzeka taybet midaxeleyî trêne dike, serfermandara wan jî jinek e.

Nîşangirek xwe amade dike ku xwekujê bikuje, tiliya jinekê li ser dîkikê qenasê ye. Tîma îmhakirina bombeyan tê, ew kesa bi xwêdan û zehmetiyan hewil dide bombeyê bisekinîne jî jinek e.

Mêtê qehreman ê serleheng, pileya wî ya karî bilind dibe, ya ku pileya wî bilind dike jî jinek e.

Karê serlehengê me yê nû ew e ku bibe parastvanê wezîrê, wek min li destpê jî got wezîr jî jinek e.

Ma ci ferq dike, ci mêt ci jin be kar kar e. Lê rastî ne ew e.

Ez li ser navê xwe bibêjim min cara yekê jineka nîşangir dît, şefa hêzên taybet jî welê... Ev qas jin bi hev re aktif di operasyonekê de bûn ez dibêjim qey ev ne bi tenê ji bo min ji bo her kesan tiştaka nû bû.

Piştî min li rêzefîlmê temâşe kir min lê nêrî ka li ser vê mijarê hatiye axiftin an no. Li Brîtanyayê gelek kes li ser axivîne. Heta ku hin temâsevan(piraniya wan mêt) minmin kirine û gotine heyina ev qas jinan ji rastiyê dûr e. Bi ser her tiştî re hem ekonimiya welatê wan hem jî ekonomiya Yekîtiya Ewropayê ku hewil didin jê veqetin jin bi rê ve dibin... (Ev rêzefîlm li BBCyê tê weşandin, bila bê bîra we ku demekê beriya niho eşkere bûbû li wê televizyonê mehaneya jin û mêtan ji hev ferq e.)

Vêca heke ew rolên min behsê kirî mêtan bilîstiya ti kesan dê ti negotiyan, ma ne?

Erê lê ji ber çi?

Çima li me ecêb nayê ku karên jin û mîr dikarin bikin her dem mîr dîkin? Ez behsa xwe dikim lê dizanim ku ji bo vê bêheysiyetê ez ne bi tenê me. Ez ne bi tenê me, ji vê derê pê ve ez ê bêjîm em. Em vê normal dibînin.

Madem tê xwestin em rû-bi-rûyê xwe bibin. Ez ê ne behsa rêzefîlman, rêxistina polîsan û rêvebirêن dewletan bikim ez ê behsa cihê ez dizanim bikim. Behsa rojnameyan bikim.

Eve ji we re pirseka hêsanî ji ber çi jin di nêv birêvebirêن sereke yên rojnameyên me de nînin?

Min li sê rojnameyên navendî kar kiriye. Hin rojname hene ku ez neçûmê lê hevalên min li wan deran hene.(hebûn niho piraniya hevalên min bêkar in.)

Berpirsên weşanê hema bêje hemî mîr in carinan li hemberî deh mîran jinek an du jin hene. Carinan jin nînin.

Jinek dido hene ku bûne berpirsên weşanê wek efsaneyan behsa wan tê kirin. Heke hûn lê binêrin ka şefêن beşan hene an no, hûn ê yek du kesan bibînin.

Ev qas e.

Erê ji ber çi?

Peyamnêrên gelek baş ên jin hene. Jin hene ku hevpeyvînan dîkin û firotina rojnameyan girêdayî wan e.

Hin jinêن edîtor hene bi zîrekî, lezgînî û baldariya xwe ber bi çav in.

Erê jin çi jê têن ku bilind nabin. Dibin wexm

û difirin ma?

Ma birêvebirina rojnameyekê ji wezîrîyê, ji birêvebirina dewletê girîngtir e an jî ji pisporiya teqemeniyan zehmettir e.

Çima ji bo tiştên hemî civakê eleqedar dîkin de(piranîya wê jinan eleqedar dîkin) jin bîryarê nadîn. Bîryarê nadîn ka li ser wan mijaran çi dê çawa û çi qas dirêj bê nivîsîn.

Gelo binasê/sebebê vê yekê em bi xwe ne?

Ka em lê binêrin vê yekê çi aniye serê me.

Gelek tişt hene lê ez ê behsa ya herî giring bikim. Gelek giring e bê zanîn kî bîryarê dide tûndkariya mîran dê bi çi awayî bê nivîsîn û çend rojan israr dê lê bê kirin. Rojnameyên ku mîr derdiêxin û tercîhên wan dê cida bin.

Çi qas samîmî jî be ez bawer nakim ku mîrek bikare wek jinan xemê ji vê meseleyê bixwe.

Ji bili bûyerêن civakê şok dîkin tûndkariya mîran li rûperên sêyem in. Hûn dikarin vê yekê ji bo gotinêن min wek nimûneyekê bibînin.

Ez bawer dikim ku heke jin bîryarê bidin rîjeya nûçeyêن li ser vê mijarê dê gelek bilindtir bibe.

Dema ku jin ne di nav wan kesêن xwedanê bîryarê de bin newekheviya di navbera jin û mîran de her ku diçe bilindtir dibe.

Ev newekhevî dengê jinan dibire. Divê tam niho dengê wan derbikeve. Min got min li medyaya navendî kar kiriye û wê derê dizanim. Ka cihêن ez nizanim em bipirsin.

Gelo rojnameyên çepgir ferq in?

Rojnameyên Rastgir ferq in?

Rojnameyên Entellektûel ferq in?

Rojnameyên li ser ûnternetê ferq in?

Sendîka û rêxistinê pîşeyan ferq in?

Ka ew jinê rojnameyan bi rê ve dibin?

Çima ew ne li wan deran in?

Vêca em li meseleya destpêkê vejerin, ez ê bêjim ji ber çi ez bawer nakim ku mêt bi xwe re rû-bi-rû bibin. Em mêtênu ku bûne sebeba ev qas neheqiyan, me post vegirtine û em çavênu xwe li neheqiyan digirin, êdî bila em ji kerema xwe re his bibin.

Ew mêtênu ku dibînin li rêzefilmekê hemî rolêngiring jin dilîzin û pê matmayî dabin bila em bêdeng bibin.

Çira bila em his bibin? Ji ber ku heta niho em bêdeng bûne. Ew mêtênu berpirs ma heta niho ev yek ferq nekiribû?

Ez dibêjim heta niho lê niho jî rewş neguheriye.

Ez jî tê de heke em wan mexdurîyên em bûne şahid danin ser hev dê bigihe perêñ esmanan.

Digel vê yekê jî li rojname, zanîngeh, kovar kurtasî li her deran em bûne şahid û me nepirsîye ku jin û mêt ne wek hev in. Me xem ji vê yekê nexwariye jî.

Nizanim ji ber çi ye ku me ev rewş qebûl kiriye. Ev rewş kêrî me hatiye. Qasî rêzefilmeka BBCyê jî em ji normalê derneketine. Ma jin dikarin bibin nîşangirênen qenasan, ma dikarin bibin serbazê hêzêni dij-teror? Ma jin dikarin bibin birêvebir?

Li me ecêb nehatiye. Karê me mereqkirin e lê me mereq jî nekiriyeye. dema me nûçeyêni li ser jinê tramvay û bûsan diajon çêkirin li me ecêb hatiye halê me bi xwe li me ecêb nehatiye.

Vêca ne hewce ye em rûnin û xwe ji gunehan bisûn. Bila em bela xwe jê vekin bila ew bifikirin.

Dema dema wê hat bila em mil bidin milê wan, dengê wan bi dengê xwe negirin, dema bi wan re dimeşin pê li pêyêni wan nekin û piştgiriya wan bikin.

Lê bila em xwe bidin rexekê, bila jin biaxivin.

Bila qêrveqêra me kêm bibe.

Piştgiriya herî mezin bêdengî ye êdî.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger e. Di kovar û rojnameyên Nokta, Aktuel, Newsweek, GQ Türkiye, Haberturk û Hürriyetê de xebitîye. Hê jî di hin rojname û kovaran de dinivîse. Herî zêde jî di bloga xwe de ([eskiusul.blogspot.com](http://eskiusul.blogspot.com)) dinivîse.

#45 KIVANÇ  
SEZER

NE  
TESEDIF E  
**52** MÊR  
HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## TIRALIYA MÊRAN

Ne ku me hay jê nîne, lê ji ber ku li hesabê me tê em  
vê tiraliyê berdewam dikan. Bi vî awayî zehmettir bû ku  
jinên kar nakin bikaribin têkevin nava jiyana kar û barî,  
jinên kar dikan bibin xwedî zewqên  
taybet û mijûlayiyê wan çêbibin.

Ez nizanim ji ku destpê bikim. Mijareke gelekî aktuel, dilsoj û dilşewat e.

Ji tundkariya li ser Silayê, heta destdirêjiya li Elit İşcanê, ji tundkarî û mobbingê heta destdirêjiya li asîstana cilûbergan Ozge Ş. yê, rewşa méraniyê ya di sektora sînemayê de li her derê û her gavê dertê, ew tiştên li pêş perdê ne. Helbet ne tenê yên sektora sînemayê.

Ez vê dizanim; wê sedsala 21emîn bibe serdema jinan û divê bibe.

Jin li her deverên cîhanê ji bo her kesên ku heman karî dikan heman mehaneyê bistînin, derbarê mafêن xwe yên kurtajê û jiyana xwe ya zayendî de û meylêن xwe de têن ba hev, li dijî tundkarî û destdirêjiyê xwe bi rêexistin dikan û li ber xwe didin. Ev dengê lingêن jinan e ku ji bo sedsala 21emîn bibe sedsala jinan e.

Digel hemû rewşa fişarê ya li welatê me, her sal di 8ê Adarê de, hikûmet mudaxeleyê li meşa biheybet a li Kolana Îstîklalê ya li Stenbolê nake. Ev jî nîşaneyâ rewatiya vê têkoşînê ye.

Ji ber wê jî, tiştê li me mérân dikeve, divê ji dil em bi rewşa xwe ya mérbûnê rûbirû bibin. Dîsa divê em xwe ji hemû biryar û tevgerên xwe rizgar bibin ku nahêlên em jinan di her deverên jiyanê de wekhev, azad û serbixwe bibînin.

Ji bo vê jî divê di serî de em rasterast li jiyana xwe binêrin.

Çend mijar hene ku ez di wan de pesnê

xwe didim. Di jiyana xwe de min tundkarî qet li jinekê (ji bilî çend bûyerên biçûk ên di salêن dibistana navîn de li mérân jî) nekiriye. Yan jî, min zor nedaye ti jinan ku bi min re razêن, em bi hev re şâ bibin. Yan jî ti tevgerên min li hemberî wan çênebûye ku weke destdirêjî bê binavkirin.

Ev ne ji qenciya min e. Ji ber, ez ne di malbateke wiha de mezin bûme ku tundkarî li wir asayî bû. Lê ez li malbateke ku hezkirin li wir zêde bû, mezin bûm.

Dibe ku di navbera min û malbatê de demên taybet derbas nebûn lê tekez zaroktiya min asayî bû. Bi giştî jiyanekê baş tê bîra min. Yek du bûyer ne tê de qet tundkarî li min nehat kirin. Ez bi ken behsa van bûyeran dikim.

Her çiqas ku di mérbûnê de hêla herî kêm pêşketin tê de çêbûbe nîşandana tundkariyê be jî hêleke wê ya din heye ku nayê dîtin. Tiraliya mérân.

Tiraliya ku mér ji xwe re weke maf dibîne. Her çiqas ku gelekî ji rêzê, pûç û nas be jî diyardeyeke girîng e. Di vî cure tiraliyê de quretiyeke veşartî heye û herî zêde xwe di berpirsiyariya karêن malê û ya dê û bavêtiyê de nîşan dide.

Li gorî daneyêن Rêexistina Geşepêdan û Hevkariyê ya Aboriyê (OECD), li Tirkîyeyê jin rojane 261 deqîqeyan karêن malê dikan. Lê mér tenê 21 deqîqeyan. Belê tenê 21 deqîqeyan!

Di vê newekheviyê de em li du Hindistan û Meksîkayê, di rêza sêyem de ne. Belê, rast e newekhevî li her deverê cîhanê heye lê li welatên Skandînavyayê jî ev rewş di aleyhê jinê de ye ku ev welat gelekî nêzîkî wekheviyê ne.

Di cejn, şahî, şîn û rojêن taybet de, di civatêن malbata mezin de jinêن malê xwarinêن me her gav çêdikirin. Em ji ser sifreyê rabûn û me xwe li cihê xwe dirêj kir.

Carekê dema ku min xwest lalîka di destê xwe de bibim metbexê, keça bixaltiya min a pênc salî bi min keniya bû. Me aqûbeta cilêن xwe, lalik, kevçî û tebeqêن xwe xistibû stûyê jinan û car caran me paqijiya laş û bedena xwe jî kiribû karêن wan. Digel ku ew jî bi qasî me kar dikirin.

Dema ji bo kirîna tiştekî em derdiketin derive, lîsteya kelûpelan wan dida dest me û me jî ev kar ji jêhatîbûna wan û serwextiya wan re hiştibû. Di ser de jî me ev kar her gav biçûk û tiştên ne gelekî girîng didîtin. Me nedigot, lê me wisa didît.

Rastiyêن jiyanê, têkiliyê aboriyê gelekî bilez diguherin, digel ku em mirov di jiyana xwe ya şexsî de nekaribin bigihêjin wê lezê. Têkiliyê feodal ên dîrokî û cîhana me ya modern li hev nakin.

Dema ku mîr li ser hespêن xwe li dû dagirkirinê bûn, mal bi temamî ji jinan re hatibû hiştin. Beriya niha bi sedsalan û bêyî ku kes neasayî bibîne. Lê niha nema tê veşartin.

Çi gava ku jin ketin nava jiyana kar û xebatê û weke kesayet di nava jiyana civakî de cih girtin, wê gavê hevsengî jî xera bû.

Digel ku di ser xerabûna hevsengiyê re gelek serdem derbas bûbin jî, têgihiştin û avantaj li gorî berjewendiyêن mîran in û ji ber vê jî me hewl da ku em vê sîstema rûniştî biparêzin.

Ne ku me hay jê nîne, lê ji ber ku li hesabê me tê em vê tiraliyê berdewam dîkin. Bi vî awayî zehmettir bû ku jinêن kar nakin bikaribin têkevin nava jiyana kar û barî, jinêن kar dîkin bibin xwedî zewqêن taybet û mijûlayiyêن wan çêbibin.

Di van rojêن ku min 35 saliya xwe borandiyê divê ez lêborinê ji dêya xwe, xaltîk û ji jinbipêن bixwazim. Ji ber ku ez di zaroktî û ciwantiya xwe de li wan bûme bar.

Niha kêmîtir be jî ji ber tiraliyêن ku min di salêن pêşiyê de dikirin ez lêborînê ji hevjîna xwe dixwazim. Ez lêborînê ji van mirovan dixwazim ku min nirxêن çepgiriyyê, wekheviû heqîya ku ez parastina wê dikim, di jiyana xwe ya rojane de pêk neaniye û ev rewşa biawantaj li hesabê min hatiye.

Wekheviû, dadmendî û azadî bi lêborînan nayê helbet. Girîng e ku mirov di her devera jiyanê de bizanibe jin ne tenê dayik, hevjîn, xwişk in, lê her yek ji wan kesayetyîen serbixwe ne û lehengên çîrokê xwe ne û divê mirov vê bêhtir bibîr xîne. Her weha li hemû qadan mil bi mil bi wan re bin. Li gel vî tişti, tiştekî din jî bi qasî vê girîng e ku divê me fam bikin ku her gav em di nava guhertinê de ne. Divê em bikaribin jiyana xwe ya şexsî bikin yek ji parçeyêن cîhana em dixwazin tê de bijîn.

Ez ê di filmê xwe yê nû de hewl bidim li ser vê mijarê bisekinim. Ji ber wê jî ji her gavê

bêhtir ez niha di nava xwe de vê nîqaş  
dikim.

Bila ev tekst bibe gotineke girêdanê ya van  
nîqaşan. Em bi wî tiştî dest bi rexnedayina  
xwe bidin ku tiştên biçûk di rastiyê de ne  
tiştên ewqas biçûk in. Em cîhaneke nû,  
xweşik û wekhev bi vî awayî bibin ber ji  
dahatûyê ve.

Tiralî mafek e.

Lê tenê ne mafê mîran e.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhêner û montajker e. Fîlma wî ya yekemîn a bi navê Babamin Kanatlari, di Festîvala  
Fîlman a Antalyayê ya 53yem de, di nav de xelata Fîlma Herî Baş a Pêşîn jî, şeş xelat hildan,  
her wiha di Festîvala Fîlman a Edeneyê ya Navneteweyî ya 23yemîn de, di nav de Xelata  
Fîlma Herî Baş a Yilmaz Guney jî, bi giştî heft xelat hildaye. Promiyera fîlmê ya cîhanê  
li Mîhrîcana Fîlman a Karlovy Vary ya 51em pêk hatiye. Li Zanîngeha Egeyê perwerdeya  
endezyariyê dîtiye. Li Îtalyayê beşa honaka sînemayê xwendîye. Di sala 1982yan de li  
Enqereyê ji dayik bûye. Li ser projeya xwe ya nû ya bi navê Kuçuk Şeyler dixebite.

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN

#46 ÖMER  
MADRA



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

# GUHERÎNA ÎKLÎMÊ TÛNDKARIYA MÊRAN NE TESEDIF E

“Guherîna her tiştî” ji bo sed milyonan  
keçan rasterast “guherîna qederê” ye.

## Destpêk: Strana hirçan

Tê gotin ku “çil stranên hirçan hene her çil jî li ser rêriyan e” ya me jî wek wê ye. Divê li her tiştên dibin(erê rewşa jinan jî tê de) em bi têkçûna gerdûnî ya bi guherîna îklîmê binêrin. Qey min zêdegavî kir? Xwedê ne tam welê ye!

## Dîmenê giştî: Greta – Chomsky – Atwood

Keçeka 15 salî ya aktîvîst heye navê wê “Gretaya Mang-gir” e. Di dema hilbijartinan de her roja Xwedê çûye ber deriyê parlemana Swêdê û neçûye dibistanê. Wê gotiye “di demekê de ku dizanim di dîroka mirovatiyê de em rû-bi-rûyê felaketa herî mezin dibin çaw ez ê xwe di ewlehiyê de hest bikim.”

Gretaya 12 salî felaket ferq kiriye.

Dema min cara pêşiyê germbûna gerdûnê bihîst min got: Na, ev ne rast e. Çenabe hatibe wê astê ku hebûna me biêxe di xetera tinebûnê de!”

Çima ez welê fikirîm? ez welê fikirîm ji ber ku heke ne welê bûya divîya me behsa ti tiltên dî nekira.”

Piştî hilbijartinan jî Gretaya Mang-gir çalakiyên xwe domand. Li xwenîşandana ji bo guherîna îklîmê wê li hemberî 10 hezar kesan bangî xelkê kir ku ew li ber xwe bidin.

Bi ser her tiştî re li Awistiralyayê li dibistanêñ xwendina navê û li lîseyan xwenîşandanêñ girseyî yên herî mezin ên wî welatî dê bê pêkanîn. Wê axiftinê îlham daye vê xwenîşandanê.

(Divê em diyar bikin ku pêşîkêşen xwenîşandanêñ li Awistiralyayê keç in.)

[“Greta Grevde” - 2. Ders: Dersleri Asarak Verilen Sivil İtaatsizlik Dersleri](#)

### İklîm İsyani Dünyaya Yayılıyor!

Erê dema em li ser difikirin ji bilî wê her tişt bêwate dibe. Bi vî awayî aktîvîsta xwendevan Gretayê em hisyar kîrin. Ew kesê duyem ê me hisyar dike jî akademîsyenekê aktîvîst, Chomsky e ku zêdetirî sed kitêban nivîsiye.

Paşê jî helbestkar-nivîskar û mûcîdê bi navê Margaret Atwood em hisyar kîrin. Margaret Atwood nivîskareka ji Kanadayê ye. Wê li ser guherîna îklîmê romanek nivîsiye bi heman navî rêzefîlmek jî hat çekirin navê wê “çîroka jina ji bo zayinê” ye. Mijara fîlm û romanê ew e ku jin têne guhertin û mîr wan welê dikin ku bi tenê kérî zayinê têne.

Wê li ser vê mijarê rojê destpêka meha Hezîranê li British Libraryê gotarek pêşkêş kiriye û du rojan li ser vê mijarê bi awayekê berfireh axiviye. Li gor Atwoodê rewş gelek zelal e. Guherîn ne bi tenê guherîna îklîmê bûye guherîna her tiştan bû.

Erê jin? Guherîna îklîmê dê rasterast bandor li jinan bikira.

"Lehî dê rabin, ax dê ziwa bibin û bi vî awayî dan û nan dê nemîne. Dema kêm bibe edaleta ji bo parvekirinê dê ji niho hêj kêmtir bibe. Ji ber wê bara jin û zarokan dê ji niho kêmtir bibe."

Atwoodê eşkere kiriye ku bi guherîna îklîmê hizûra civakî dê nemîne şer dê derbikevin. Ew dibêje:

"Jin di dema aştiyê de dikevin di rewşen xerab de, di dema şerî de dikevin rewşeka gelek xerab de."

### Under Her Eye: Women and Climate Change

### Margaret Atwood: women will bear brunt of dystopian climate future

## Guherîna îklîmê – Guherîna her tiştî – guherîna qederê

"Guherîna her tiştî" ji bo sed milyonan keçan rasterast "guherîna qederê" ye. Par dawiya salê rojnamegerê lêkolîner, Gethin Chamberlainî li ser keçen di emrê zarokatiyê de têne zewicandin hevpeyvîneka muazzam amade kiriye. Di destpêka hevpeyvînê de wek şimaqekê li me bide mijarê tîne bîra me:

"Gelo ji ber çi guherîna îklîmê nifşeka dî ya keçen di emrê zarokatiyê de zewicîn çêdike."

### Why climate change is creating a new generation of child brides in Africa

Chamberlainî gotiye ji bo guherîna îklîmê

her kesan fikra xwe heye. "Ji bo hinekan giravên nû dê ji nav qeşayê derkevin û firsetelk e, ji bo hinekan bajarên li bin avê mayîn e. Ji bo keçen Efrîqayî ew e ku ew ê li ber deriyê xwe zarokên xwe danin kuşa xwe û li hevalên xwe yên diçin dibistanê binêrin."

Gelek pispor difikirin ku hem ew rastîyek e hem jî krîzek e ku her ku diçe mezintir dibe: Encameka rasterast ya guherîna îklîmê nifşekê keçen di emrê zarokatiyê de zewicîn çêdike.

Projeyeka bi navê Bûkêñ Rojê heye, bi fona rojnamegeriyê ya Navenda Rojnamegeriyê ya Ewropayê hatiye amadekirin. Malbatêñ keçen di emrê zarokatiyê de zewicîn çîrokên xwe gotine. Hemî gotin li me nas in. Îklîm diguhere, dema hatina baranê diguhere, baran derengî dibare, hin derêñ baran nedibaran lehî radibe. Rewş gelek xerab dibe. Malbat dikevin di rewşeka xerab de. Tenê çareyekê dibînin, keçen xwe yên hêj 13 salî dizewicînin.

Fona Nifûsê ya Neteweyêñ Yekbûyî, sala 2015ê diyar kiribû ku ew texmîn dikan 4 milyon û nîv keç ji 15 saliyê biçûktir zewicîne. Li gor texmîna wan her roj 37 hezar zarokên keç ên ji 18 saliyê biçûktir dihatin zeewicandin. Her roj 37 hezar zarokên hatin zewicandin! Li gor hesaban bi tenê li welatê bi navê Malavî ji sedî 30-40 sebebê zewicandina zarokan guherîna îklîmê û xêzaniya bi wê yekê peyda bûyî ye. (agy)

Li gor Bankeya Cîhanî û rêxistina Parastina Zarokan li welatêñ feqîr ji her sê keçan keçek ji beriya bibe 18 salî tê zewicandin.

Ev jimar diltezin in lê hin jimarêن dî jî hene. Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî diyar kiriye ku heke rewş wek 2015ê bidome. Li Efrîqayê zarokêن keç ên hatîn zewicandin dê heta 2050yê bibe du qetêن xwe û bigihe 310 milyonan.

### More than 20,000 underage girls marry illegally each day, claims study

Li gor rapora UNICEFê ya 2018ê rewş hêj xerabtir e. Li gor raporê, jimara keçen ji beriya bibin 18 salî hatîn zewicandin gihaye 700 milyonan. Ev kes ne bi tenê ji zarokatiya xwe bûne herweha ew ji civakê tecrîd bûne. Ew ji piraniya têkiliyên digel malbat û hevalan re mehrûm in. Ew ji çavkaniyên maddî û meinewî mehrûm in. Rêjeya wan a perwedebûn û karkirinê hima bêje sıfir e. Tiştê xerabtir jî ew e ku rewşa ciwanêni naho û nifşen bê jî xerab e. Li gor hesaban di 12 salêni bê de ev jimar dê ji 700 milyonê bibe 950 milyon yanî hima bêje dê bibe milyarek. Milyarek zarokêñ zewicîn.

### Child Marriages: 39,000 Every Day

Me di vê nivîsê de bi tenê cih da "Zarokêñ Zewicîn" û me pirtirînê nivîsê ji bo guhertina îklîmê cida kir. Me behsabihêzkirina keç û jinan, digel mîran wekhevkirina şert û firsetan nekir. Heke em bi tenê behs atıştekî bikin:

Li gor Rapora Pêşketinê ya Dikare Bidome ya 2018ê li Başûrê Rojavayê Asyayê di salêni 2000-2017ê de rêjeya zarokêñ hatîn zewicandin ji sedî 40 kêm bûye. Digel vê yekê jî diyar e ku ji bo guherînê gelek kêmâyîyen bingehîn hene. Neteweyên Yekbûyî di Rapora Pêşketinê ya Dikare Bidome ya 2018ê qet

cih nedaye guherîna îklîmê û bi vê yekê guherîna jiyanâ civakî.

### The Sustainable Development Goals Report 2018

Di vê nivîsê de ji zarokêñ zewicî zêdetir em cih bidin rêjeya zarokêñ bûyîn ducanî yên li Tirkîyeyê bikin(Piraniya wan zarokan ji Sûriyeyê ne) dikare baş be.

Li gor nûçeya Bariş Terkogluğuyî ya li ODA TVyê, di sala 2017ê de li nexweşxaneyekê 392 zarok hatine dermankirin lê dadgeh û berpirsên edlî ji vê yekê nehatine agehdarkirin. Piştî ev skandal eşkere bûyî serdozgeriyê doz vekiriye.

### "İstanbul'da bir hastaneye çoğu Suriyeli 392 hamile çocuk getirildi, savcılık 59 doktor hakkında soruşturma başlattı"

Ü, skandala duyem! Li Stenbolê eşkere bûbû ku di 5 mehan de 115 zarokêñ ducanî çûne nexweşxaneyekê lê berpirsên edlî ji vê yekê nehatine agehdarkirin.

Li gor nûçeyeka Birgunê ev rêje bi tenê "dûvî gayî" ye.

### Hamile çocuk skandalını ortaya çıkaran uzman: Bunlar buz dağının görünen kısmı

Erê têkiliya vê yekê bi guherîna îklîmê re heye? Mixabin divê em ji bo vê yekê jî bibêjin "belê û gelek." Yek ji sebebêñ bingehîn yên barkirina xelkê Sûriyeyê jî ew e ku bi nebarîna baranê erd ziwa bûne û zewî beyar mane.

### Profesör Harvey Weiss ile İklim ve Uygarlık Üzerine Bir Söyleşi

## Ka em ji aliyê dî ve li mijarê binêrin: Em dikarin qedere biguherîn

Di dema rewşa herî xerab êdî mezin bûye  
û berçav bûye de hin tiştên erêni jî bûne.  
Aktîvîstê bi navê Andrew Simms difikire ku  
qeder dikare bê guhertin. Ew yek ji çêkerên  
kampanyaya The Rapid Transition  
Alliance (Hevgiriya ji bo guherîna mezin).

Simmsî meha borî li rojnameya Guardianê  
nivîsek nivîsiye. Ew dibêje di civakê de hin  
normên nû derketine û divê em wan geş  
bikin.

Li gor daneyên zanistî. Em dikarin gelek  
encamên xerab û felaketên bi guherîna  
îklîmê çêbûyîn bi plandanîna bajaran û  
guhertina tevgeran asteng bikin.

Ew diyar dike ku civak êdî bi lez diguhere.  
Wî behsa tevgera jinan ya #MeToo(#EzJî)  
kiriye. ew tevgerek bû ku di demekê kurt  
de belav bû û hegemonyaya mîran li  
erdê da. Nimûneyeka dî jî ew e ku tevgera  
veganan li gelek welatan bilind dibe.

Simmsî gotiye #MeToo hêviyekê dide  
wî. "Em niho jî dikarin guhertina îklîmê  
bisekinînin."

The speed of #MeToo gives me hope – we  
can still stop climate change

## Pasgotin

Margaret Atwood rast dibêje guhertina  
îklîmê guhertina her tiştan e.

Ê, nexwe – Ka em jî her tiştî biguherînin.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhêner, bernamevan, sazkarê Açık Radyo (94.9) û aktîvîstê jîngehê ye. Di rojname û kovaran de wek derhênerê weşanê, nivîskar û edîtor kar kiriye. Teza xwe ya doktorayê li ser "Peymana Mafêni Mirovan a Ewropayê û Mafê Serlêdana Kesane" li Fakulteya Zanistên Siyasî yê Zanîngeha Enqereyê de çêkiriye (1977). Di heman fakulteyê de 13 salan hîndekarî kiriye. Di Zanîngeha Bilgiyê de dersên hiqûq û têkiliyên navneteweyî daye. Pirtûkên wî yên bi navêni Migrant Workers and International Law (Enqere, 1985), Romanımla Sana Bir Ses... (Remzi Kitapevi, 1991) Rüzgâra Karşı-1 (1996) û Rüzgara Karşı-2 (2001), Kuresel Isınma ve İklim Krizi (Ömer Şahin sordu, Madra yanıtladı/2007) hene.

#47 MÜFİT CAN  
SAÇINTI

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## EHMEQIYA ÇEKIRÎ

Ma gelo we bihîstiye ku xebatkarekî mobîng,  
tacîz an jî tundkarî li Guler Sabancî yan jî  
Leyla Alatonê kiriye? Na.

Gotina heywên, xweşgotine ji mîran re, lê heqaret e ji bo heywên.

Lewre li xwezayê yek heywanekî nîr jî nîne ku tundiyê li heywana mî bike.

Dibêjin wê zekaya çêkirî serwerî her tiştî bibe. Zekaya çêkirî dikare her tiştî bike lê nikare tundiyê li jinan bike.

Lewre ti têkilî di navbera tundiya li ser jinan û zekayê nîne.

Ji bo tundiya li ser jinê divê ehmeqiya çêkirî îcat bibe.

Di dîroka mirovahiyê de yek serdem tenê heye ku, mirovan tundî li mirovan û di encama vê de mîran li jinan nekiriye. Hin ji vê re civaka seydvanî û berhevkarîyê dibêjin, hin jî civaka komunal a seretayî dibêjin.

Taybetmendiya vê serdemê ew e ku hişmendiya semyan nîne.

Em dikarin encameke wiha ji vê derxin ku "semyan bingeha tundkariya li ser jinan e".

Bav û kalê me dema li ser hespan bûn, dayiksalar bûn. Jin hêz bû, yê din pêvak bû. Em koçer bûn, mal û milkên me tune bûn.

Pere nebû, pevguhertin hebû...

Gava ku ji hespê peya bûn bav û kalê me... Gava ku bûn xwedî mal û milk û dest bi çêkirina ango çapkirina pereyan kirin... Bav û kalê me asta jinê daxistin.

Spora bav û kalê me ye ku bi dîtina pere û mal û milkî re daxistina asta jinê.

Bila bigihê guhê wan kesan ku dipirsin û dibêjin, çîma dema mîr dîbin xwedî pere, berê erebeya xwe paşê jî jîna xwe diguherînin...

Em werin li ser meseleya cidakariya zayendî... Ka em pêşiyê li wî tiştî binêrin ku kîjan ajên nîr navêñ taybet li ajalêñ mî dike... Mirîş û dîk... Mîh û beran... Çelek û ga... Me ji ya mî re gotiye jin-keç...

Gelo çîma wiha ye? Ji ber ku kapîtalîzm girîngiyê û navekî taybet nade wê zayenda nikaribe keda bixwe... Kapîtalîzm pergaleke mîran e.

Di kapîtalîzmê de tundkariya li ser jinê ne bi perwerdeyê lê bi meqam ve girêdayî ye. Ew mîrê ku roja yekşemê li ser kursiya qehwexaneyê rûdinê, nikare tacîzê û tandkariyê li wê jinê bike ku li kargehê midûra giştî ye.

Ma gelo we bihîstiye ku xebatkarekî mobîng, tacîz an jî tundkarî li Guler Sabancı yan jî Leyla Alatonê kiriye?  
Na.

Ji ber ku di vê mijarê de (di pergala kapîtalîzmê de) sînorê hizirkirinê heta ber deriyê paldankê ye. Kesên ku li kargehê mobîngê dikin, tacîzê dikin, hêza xwe bi qasî ji mîraniyê, ji wê paldanka ku li ser rûniştine jî distînin. Têkiliyeke xurt di navbera hêza tundkariyê û pênas û samanê de heye. Zidê vî tiştî îstisna ye.

Me kapîtalîzm xist bin lingan lê ma yên beriya wê gelekî baş bûn...

Du tişt hebûn ku tekez ji bav derbasî kurê wî dibûn: Yek jê mîrîtî... Ya din jî bilik e...

Ji ber wê ye ku sîstema mîrîtiyê tiştekî weke bilikî ye...

Em bi gotina seyda Neşet Ertaşî biqedînin:

Em mîrîtî mirovan in. Ji ber ku jîn mirov in.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhêner, lîstikvan û senarîste. Wek derhêner û lîstikvanê sereke yê fîlma "Mandira Filozufu" hatiye nasîn. Di dema xwendekariya xwe de di kovarên Yarin, Genç İnsan, Otomobil, Boom Muzik de xebitiye. Di Tiyatroya Atolyeya Hunerê ya Kartalê de wek lîstikvan kar kiriye. Li sala dawî ya xwendina xwe ya di Dibistana Bilind a Çapemenî û Weşanê ya Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Stenbolê de li TRT yê dest bi kar kiriye. Nivîskariya bernameya televîzyonê ya bi navê "Olacak O Kadar" kiriye. Senaryoya fîlma bi navê Geldiler nivîsandiye. Di televîzyonê Kanal 6 û Kanalturk de bi navê Aranan Adam bernameyeke komediyê çêkiriye. Di fîlma bi navê Kuşatma Altında Aşk ya Ersin Pertan de bi rolekê rabûye. Di navbera salên 2012-2014 de derhêneriya rêzefîlma Seksenler kiriye. Senaryoya wî ya bi navê Kahrolan Şey ji hêla Festîvala Fîlman a Hevdîtina Serbixweyan a 21em de ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye lidarxistin, hêjayî xelata Mansiyona Rûmetê hatiye dîtin. Di sala 1968an de li Sungurlu ya Çorumê ji dayik bûye.

#48 CAN  
TONBİL

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## BI DESTÛRA WE...

Li gelek qadan em mêt mêrsplainingê dikan.  
Hin caran bi baweriya ku em ê karibin hêza di dest  
xwe de (meqam, mewkî, pere, temen û hwd.) bi kar  
bînin û hin caran jî weke ku em ji malbatê fêr bûne,  
lê her gav ji ber ku em mêt in mêrsplainingê dikan...

Ez yek ji wan zarokên bisiûd im. Min ew lîstika ku di zarokatiya xwe de dilîst, dema hinekî mezin bûm weke kar ji xwe re hilbijart. Navê min Can e. Zêdetirî 7 salan e ku ez di radyoyan de kar dikim.

Di salên dibistana seretayî de em û dotmama min Emel cîran bûn. Dotmama min bi yek du salan ji min mezintir bû. Teybeke me li malê hebû. Min û Emelê me dengê xwe li ser kasetan tomar dikir. Serpêhatiya min wiha dest pê kir. Destpêkê me silav dida, paşê me hin nûçe dixwendin û me dengê xwe diguherand û weke mîvan em beşdarî bernameyê dibûn. Me ji teybeke din stran didan guhdarkirin û bêyî ku em li dengê xwe yê tomarkirî guhdar bikin, me dengên din li ser heman kasetê tomar dikir.

Nizanim min di wan rojan de gotibû, "Ez ê vê lîstikê ji xwe re bikim kar û pişê", nayê bîra min. Ji xwe piştî demekê mala Emelê bar kir û ez neçar mam ku navberê bidim kariyera xwe ya radyovaniyê. Di dema dibistana navîn de bi saya lîstika computerê ya bi navê Red Alert 2, min hay ji "das û çakûcê" çêbû. Di dema lîseyê de beşdarî çend çalakiyên biçûk bûm ku di dema dawî de min xwe ji copê polisan rizgar kiribû di van çalakiyan de. Min di zanîngehê de sosyolojî xwend û di encamê de bala min çû dereke din. Piştî ku min zanîngeh qedand, pêşiyê ez bûm pirtûkfiros paşê jî min xwe di karê rêxistinê civaka sivîl de dît.

Piştî hin rêzetesedif û parêzvaniyan vê carê min xwe li pêşberî mîkrofoneke rastîn dît ku 18 sal in ez her roj vî karî dikim.

Ew lîstika ku min di dema zaroktiya xwe de bi Emelê re dest pê kiribû, niha bi alîkariya 3 mîran, ez bi awayekî "profesyonel" berdewam dikim. Yek ji van mîran li ser maseya teknîkê ye, yê din ji mala xwe piştgiriya edîtoryal dike yê din jî di dema weşanê de li nik min e.

Di serî de li ser guhêraniya îqlimê ya kurewî, li ser mijarêne weke jîngeh, mafêne mirovan, tevgerêne civakî, polîtîkaya hundir û ya derive, aborî û sporê, di nava hefteyê de her sibe nûçeyan radighînim, van bi hev girêdidim û rave dikim. Helbet têkiliya di navbera wan û bûyerên berê de jî vedibêjim.

Lê ez dizanim ku hin tiştên kêm hene. Ji sedî 50,2yê hejmara welat mîr in û ji sedî 49,8ê wê jî jin in. Ji sedî 49,6ê cîhanê jî jin e. Lê em 4 mîr teswîra cîhaneke bi vî awayî dikin ku kêmasiyek di vir de heye. Ev kêmasî jî bivê nevê rîska mansplainingê bi xwe derdixe ku newekheviya herî zêde em di nava rojê bi kar tînin.

## Açûkleme\* (mansplaining ango mîrsplaining\*\*) çiye?

Mansplaining ew rewşa mîraniyê ye ku salên dûdirêj e heye lê teşxîsa wê nû hatiye kirin.

Di malpera [wikipedia.orgê](https://en.wikipedia.org) de ji bo "açûkleme" ango "açûklama" yê wiha hatiye gotin ku di dema min ev nivîs dinivîsand, 584 roj li ser qedexeya malperê derbas bibû lê min beriya wê li gel xwe qeyd kiribû:

Mansplaining, di ingilîzi de ji gotina man (mîr) û splaining (ravekirin, ızahkirin)

pêk hatiye. Tê wateya ku “mêrek jinekê kêm bibîne û xwe li ser serê wê mezin bike û behsa tiştan bike”. Lily Rothman a ji Kovara The Atlanticê mansplainingê wiha rave dike: “Zanyariya kesê ku behsa mijarekê dike, ji zanyariyên guhdarî/ê kêmtir e lê bêyî guhê xwe bide vê rastiyê di axavtina xwe de berdewam dike û bi giştî mér li janan dikin vî tiştî”. Rebecca Solnit nivîskara feminîst vê meseleyê bi gotina, “hevbirîna bixwebaweriya zêde û nezaniyê ye” rave kiriye.

Di tirkî de weke gotina açüklama û erkekleme hatiye wergerandin.

Liv û tevgera wan mérwan e ku pisporiya wan be yan ne be, şîroveya her mijarê ji jinêni li nik xwe dikin. Li her qada jiyanê ihtimal e ku ev rewş derkeve pêşberî me. Li malê, li kolanê, li ser kar, di civînan, televizyon û radyoyan de... Li gelek qadan em mér mîrsplainingê dikin. Hin caran bi baweriya ku em ê karibin hêza di dest xwe de (meqam, mewkî, pere, temen û hwd.) bi kar bînin û hin caran jî weke ku em ji malbatê fêr bûne, lê her gav ji ber ku em mér in mîrsplainingê dikin...

Dem ji bo mîrsplainingê guncav e. Em dîsa bibîr bixin:

Li Tirkîyeyê sala 2017ê hejmara jinan bûye 40 milyon û 275 hezar û 39, ya mérwan jî 40 milyon û 535 hezar û 135.

Yanî ji sedî 49,8 jin in, ji sedî 50,2 jî mér.

Hejmara Tirkîyeyê 80 milyon e û 250 hezar mér ji jinan zêdetir in.

Rêjeya vê ya di hejmara giştî de ji sedî 0,4 e. Digel vê rewşê jî di jiyana karî de ferqeke

gelekî mezin heye:

“Li gorî zanyariyên ku Rêxistina Karî ya Navnetewî (ILO) belav kiriye, sala 2017ê rêjeya besdariya karî li Tirkîyeyê ji sedî 51,5 e û bi vê hejmarê li cîhanê di nava 188 welatan bûye welatê 163em.

Rêjeya besdariya karî ya jinan li Tirkîyeyê ji sedî 32 ye û bi vê rêjeyê di rîza 165an de ye. Li welatên OECDyê rêjeya besdariya karî ya jinan ji sedî 51 e. Di rêjeya besdariya karî ya mérwan de Tirkîye di ser asta nîvekiya OECDyê de ye ku li welatên OECDyê ji sedî 68,5 e. Tirkîye bi vê rêjeyê di nava 188 welatan di rîza 104ê de ye. (Bankeya Cîhanê, 2017)”.

## **Medyaya ku mîrsplainingê dike**

Di wê bernameya radyoyê ya em çar mér bi hevkariyê amade dikin de digel ku em nûçeyên xwe dispêrin raporêng zanistî, gotar û nûçeyên li nava welêt û ji derveyî welêt tên belavkirin jî, girseya ku em dengê xwe digihînin wan ne kluba mérwan e. Di bernameya de du mér diaxîvin û di vê bernameyê de em behsa çîroka jin, mér, LGBTI+yan dikin.

Li saziyên medyayê yên din jî rewş ne gelekî cihê ye. Sala 2014ê ji bianetê Çîçek Tahaoglûyê di nûçeyeke xwe rewşê wiha aşkere dike:

Di kunyeyên rojnameyan de ji sedî 19 jin hene, ji sedî 81 mér in.

Di kunyeyên malperên rojnameyan de ji sedî 36,5 jin, ji sedî 63,5 jî mér in.

Di kunyeyêñ malperên nûçeyan de ji sedî 40,9 jin, ji sedî 59,1 jî mér in.

Dema em li van hejmara dinêrin em dibînin ku digel rêjeya me ji sedî 51, ya jinan jî ji sedî 49 be û bi ferqeke mezin em ji wan zêdetir bin, em mér dikarin karî bibînin, biaxivin û binivîsin. Em xwediye van avantajan e û ji ber wê jî em pişta xwe disipêrin hejmara me ya zêde ya di nava civakê de û zêde zêde mansplainingê díkin.

## Ez mîrsplainingê mîrsplaining dikim

Dibe ku dema ez van tiştan dibêjim jî ez mîrsplainingê dikim. Lê niha ez xwe naspêrim wan mafan ku bêyî wekheviyê bi dest hatine xistin. Ez pişta xwe didim vê qada sterîl ku bianet ji bo mér ji mîran re behsa tundiya mîran bike ava kiriye.

Û rewşeke wiha heye ku dizane mîrsplainingê dike û mîrsplainingê dike. Ew jî dihêle ev mijar bê nîqaşkirin û ew gotina xweşik ya bi navê xwerexnekirin, dixe kêlekeke hişî. Di dema nivîsin, axavtin, temaşekirin û xwendinê de pirsên weke "Gelo niha ez mîrsplainingê dikim?", "Heke na min gavek berê mîrsplaining kir?", "Çima di vê civînê de hemû axavtvan mér in?" di hişê mirovî de bi cî dike.

Çi têkilî di navbera mîrsplainingê û tundkariya mîran de heye? Ez hê jî li ser vê difikirim. Lê em bi gotina "rastiya vî karî ev e" mîrsplainingê díkin û jinan derdixin ji derveyî qada civakî û tundiya laşî jî di nav de deriyê mekanîzmaya gelek tundkariyan û fişaran vedikin. Em hin caran rê û

rêbazêñ entelektuelî jî bi kar tînin...

Ji ber ku têgeh nû ketiye nava lîteraturê, dibe serî hinekî tev li hev bibin û hin pêwîstî bi mînakêñ berbiçav hebin. Bi destûra we ez dixwazin behsa nivîsa beriya vê nivîsa xwe bikim ku bi navê "[Ehmeqiya Çêkirî](#)" hatibû weşandin. Ez ê behsa wî tiştî bikim ku bê çawa mirov mîrsplainingê mîrsplaining dike.

## Mîrsplaining?

"Dibêjin wê zekaya çêkirî serwerî her tiştî bibe. Zekaya çêkirî wê bikaribe her tiştî bike lê wê nikaribe tundiye li jinan bike".

Di serî de em xebera ne xweş bibêjin: Zekaya çêkirî bi qasî ku tê gotin ne bêguneh e ku Saçintiyî di nivîsa xwe de îdia dike ku wê di dahatûyê de serwerî het diştî bibe.

Çiriya Pêşiyê (Cotmeh) a derbasbûyî Amazon, zırşîrketa mezin a elektronik a DYAYî programa xwe ya zekaya çêkirî betal kiriye. Amazonê ji bo wî karî program dabû dest pê kirin ku kesên dixwestin li şirketê kar bikin wê ji hêla zekaya çêkirî ve bihatana hilbijartin. Sedema betalkirinê jî ew bû ku zekaya çêkirî cidaxwazî li jinan kiriye.

Derketiye holê ku sîstem jinêñ namzet ji nedîtî ve hatiye ku lêkolîn li ser kurtejiyana xebatkarêñ şirketê û kesên ji bo karî serî lê dane kiriye. Sîstemê di vê lêkolînê de li 50 hezar miftepeyvan nêriye û 500 modelên cuda yên qebûlkirina karî pêşniyar kiriye.

Digel [temîrkirinê jî sîstem hatiye betalkirin.](#)

Ji rojnameya Haberturkê [Ayşe Ozbek Karasûyê](#) bi bîr xistiye, li gorî wê, zayendperestiya zekaya çêkirî ne bi zîrşîrketa cîhanê ya kirîn û firotinê re sînordar e.

Alex Shams li Zanîngeha Chicagoyê doktoraya antropolojiyê dike. Bi eslê xwe ji Îraniyê ye lê Amerîkanî ye. Shamsî ferq kiriye ku dema "Google Translate" a serwerî 103 zimanen e, dema ji tirkî wergerê ji bo ingilîzî dike, pîşeyên di çavêن civakê de xwedî cihekî erêni ne weke pîşeyên mîran nîşan dide. Dema cînavka "O"yê (Ew) ya tirkî bi rengdêr an jî bi pîşeyekî re tê bikaranîn, tê dîtin ku gelekî encamên cidaxwaz derdikevin holê. Gotina "O Çalışkan" (Ew zîrek e) weke "He is hardworking" yanî bi cînavka ji bo mîran, gotina "O tembel" (Ew tiral e) jî weke "She is lazy" yanî bi cînavka jinan werdigerîne. Jin xweşik, mîr nexweşik, jin newêrek, mîr wêrek jin nebextewer, mîr bexweter û bi vî awayî wergerê dike.

Heta motora lêgerînê ya LinkedInê jî navêن jinan dernaxe lê yên mîran derdixe.

Rewseke weke vê di nûçeya [Artigerçekê](#) de hatiye ragihandin; di lêkolîneke ku Zanîngeha Princetonê kiriye de, ew erk dane zekayêن çêkirê ku bi algorîtmaya GloVeyê peyvan li hev bînin. Zekayêن çêkirî di halê xwe de hiştine û ew jî ji bo zimanê mirovan fam bikim, metnêن online bi kar anî ne.

Ji bo sazkirina GloVeyê databasa Common Crawlê hatiye bi kar anîn ku xwediye lîsteya 840 milyar gotinê tevlihev bûye. Di vê databasê de hatiye dîtin ku gotinê "jin" û "mê^" li gel gotinê bi karên malê re têkildar, yên "mîr" û "nêr" jî bi

gotinê zekaya matematîkî û endezyarî re têkildar hatine bikaranîn.

## Gelo zekaya çêkirî çîma vî tiştî dike?

Dîsa li gorî nûçeya malpera Artı Gerçekê ku ji The Guardianê ragihandiye, Joanna Bryson pispora computeran a ji Zanîngeha Bathê bersiva vê pirsê wiha dide:

"Gelek kes dibêjin, ev dide xuyakirin ku zekaya çêkirî pêşdaraz e. Na. Ev dide xuyakirin ku em pêşdaraz in û zekaya çêkirî ji me fêr dibe".

Di mînaka jor de navê du şîrketan heye ku yek ji wan Google-e. Li gorî hejmarên 2018ê di Google-ê de ji sedî 69,1ê xebatkaran mîr in.

Li Google-a ku gelek xort û qîz dixwazin lê kar bikin, ji ber tacîzêن cinsî û polîtîkayêن newekheviyê yên li ser hempîşeyên wan ên jin, meha borî gelek xebatkaran li qada cîhanê çalakî kirine. [Di dema vê çalakiyê de dest ji kar berdane](#).

Piştî di rojnameya New York Timesê de gotarek hatiye weşandin ev xwenîşandan çêbûne. Rojnameyê bi belgeyan aşkere kiriye ku rêveberê mîr ê payebilind ê ku ji ber tohmeta tacîza cinsî ji kar hatiye derxistin, digel ku zerûriyeteke wiha nebe jî bi milyonan tazmînat standiye.

Jef Bezos dewlementirîn mirovê li cîhanê ye û xwediye Amazonê ye. Li Amazonê rewş wiha ye: "Ji sedî 73 xebatkarên profesyonel mîr in, ji sedî 78ê rêveberên payebilind û midur jî dîsa mîr in. 10

kes hene ku rasterast li şîrketê raporan pêşkêşî Jeff Bezosî dikan. ji bilî Beth Galetti, dîrektoรê têkiliya bi xebatkaran re, yên din hemû jî çermispî û mér in.

Li gorî rapora [Amazon's Unfair Deal of the Day](#) ê, tenê li beşekî Amazonê hejmara jinan nêzîkî ya mérän e. Ew jî beşa kedkaran a ku karêن giran dikan û beşa xizmetkaran e. Li vî besî ji sedî 65 mér, ji sedî 45 jin kar dikan.

Di şîrketên din ên informasyonê de rewş ji vê ne gelekî cihê ye. Li Apple-ê rêjeya jinêن di asta bilind de kar dikan ji sedî 19 ye. Li CISCO û Facebookê ev rêje ji sedî 30 e.

Di şîrketên ku li Tirkiyeyê jî kar dikan, newekheviyeke mezintir heye. Li gorî lêkolîna TUİKê, li gorî daneyên sala 2016ê, li şîrketan di asta payebilind û ya navîn de, [ji sedî 16,7](#) jin kar dikan.\*\*\* Lê tenê ji sedî 12 CEO jin in. Tenê ji sedî [19,3](#) jin di 10 besên endezyariya comtuperê de dest bi perwerdeyê kirine ku ev beş programçekerên zekaya çêkirî perwerde dike.

Bi kurtası, patronên mér dihêle midûrên mér dest bi kar bikin, li jêr van midûrên mér jî programçekerên mér kar dikan. Zekaya çêker ji hêla van programçekerên mér ve tê sêwirandin. Li gorî vê rewşê em dikarin zekaya çêker ji zayendperestiyê berî bibînin...

## Baş e, lê paşê?

Gelo sibê şoreşeke sosyalîst çêbibe, yan jî em ber bi civaka koçberan ve bi paş de biçin, gelo em ê wan mafêن jinan li wan vegerînin ku bi rêya semyanê me ji dest

wan derxistiye û bi rêya kapîtalîzmê me ev rewş qayîmtir kiriye? Ez nizanim.

Lê rewşa heyî ne weke ku Saçintiyî dibêje. Yanî tundkariya laşî û ya hestyarî ya li ser jinan û tacîza cinsî bi bilindbûna meqamî re nayê astengkirin.

Li gorî encamên "[Rapora Lêkolînê ya Di Têkiliya Nêzîk De Bandora Tundkariyê li Xebatkarêن Jin ên Berstûk Spî û Kargehan](#)", ji sedî 75ê xebatkarêن jin ên berstûk spî herî kêm carekê rastî cureyekî tundkariyê hatine ku gelek ji wan zanîngeh qedandine. Ji sedî 40ê xebatkaran rastî tundkariya psîkolojîk-hestyarî, ji sedî 35 rastî tundkariya civakî, ji sedî 17 rastî tundkariya ekonomîk û ji sedî 8 jî rastî tundkariya laşî hatine.

## Baş e, lê yên herî payebilind?

Mufit Can Saçinti di nivîsa xwe ya bi navê "Ehmeqiya Çêkirî" de vê pirsê li xwendekarêن xwe dike:

"Ma gelo we bihîstiye ku xebatkarekî mér mobîng, tacîz an jî tundkarî li Guler Sabanci yan jî Leyla Alatonê kiriye?"

Bersivê jî ew bi xwe dide: "Na".

Em gotina Rothmanê bibîr bînin:

"Zanyariya kesê ku behsa mijarekê dike, ji zanyariyêن guhdarî/ê kêmtir e lê bêyî guhê xwe bide vê rastiyê di axavtina xwe de berdewam dike û bi giştî mér li janan dikin vî tiştî".

[Niha em guh bidin Leyla Alatonê:](#)

Not: Dotmama min Emel piştî ji cîrantiya  
me çûn, dest bi karê wênekêşiyê kir. Niha  
di nav fotograferên navdar ên Tirkiyeyê de  
ye. Serê sibê dîsa li me guhdar dike.

\*Malpera 5harfliler ji bo mansplaininga  
ingilîzî, di tirkî de peyva açüklema bi kar anî  
ye. malperê di peyva açıklama ya tirkî de  
guhertin çêkiriye û gotina çük xistiye nava  
peyvê. Çük di tirkî de tê wateya bilik ango  
kîr. Ji ber vê jî me dest ew peyva resen a  
tirkî neda.

\*\*Mêrsplaining: Di ingilîzi de ji gotina man  
(mêr) û splaining (ravekirin, izahkirin) pêk  
hatiye. Tê wateya ku "mêrek jinekê kêm  
bibîne û xwe li ser serê wê mezin bike û  
behsa tiştan bike". Lily Rothman a ji Kovara  
The Atlanticê mansplainingê wiha rave  
dike: "Zanyariya kesê ku behsa mijarekê  
dike, ji zanyariyên guhdarî/ê kêmtir e lê bêyî  
guhê xwe bide vê rastiyê di axavtina xwe  
de berdewam dike û bi giştî mêt li janan  
dikin vî tiştî". Rebecca Solnit nivîskara  
feminist vê meseleyê bi gotina, "hevbirîna  
bixwebaweriya zêde û nezaniyê ye" rave  
kiriye. Me jî li şûna mansplainingê gotina  
mêrsplaining bi kar anî.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnameger, radyovan û aktîvîstê îklîmê ye. Di sala 2010an de Beşa Sosyolojiyê ya Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê qedand. Hê jî li heman zanîngehê di bernameya Medya û Pergalên Ragihandinê de lîsansa xwe ya bilind dike. Di 2012an de dest bi serencama Açık Gazete ya Açık Radyoyê kir û hê jî didomîne. Her wiha li ser guherîna avhewayê û muzîka cîhanê du bernameyên radyoyê amade dike.

#49 DERYA  
BENGİ

# NE TESEDIF E

52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## TEP Û REP!

Ji stranê li ser tûndkariyê hatî nivîsîn strana  
herî baş rasterst behsa lêdanê dike straneka tirkî ye.  
“Pata-Pata (Dayak Cennetten Çıkma, Tep û rep, lêdan  
ji Cinetê hatiye).” Tûndkarî bêyî kînaye û henekan wek  
tişteka şîrîn tê nîşandan wê meşrû dike.

Di salên 80yan de dîmenekê gelek meşhûr heye. Emily Kimberly birêvebira nexweşxaneyekê ye. Diçe di odayekê de ku jinek tê de ye. Mêrê wê jinê lê daye. Jinek li ser cihê xwe ye. Rûyê wê şînûreş bûye, çavên wê werimî ne. Gazindan dike û dibêje "cihek tine ku biçimê, ti kesên min nînin. Xanima Emily guh nadî senaryoya filmê û dibêje "çîma dema mîrê te li te dide tu mecbûr î derbikevî?" Xwe nagire û gotinê xwe didomîne "heke heman tişt bîhatiyan serê min, min ê tiştak bidîtiya û li ser ê wî bidaya."

Li seta çêkirina rêzefilmê her kes matmayî dîbin. Jina ku rola birîndariyê dilîze gotinê di senaryoyê de dibêje: "Pereyên min têra terapîyê nake." Emîliy li ser van gotinan zêdetir aciz dibe û ev gotin ji devê wê derdi Kevin:

"Ma kê behsa terapîyê kiriye? Jineka bêpere û çar zarokên wê heyî ci hewceyî terapîyê ye."

Senaryoya bi hişmendiya mîran hatî nivîsîn têk diçe. Ev gotin di rêzefilmê de têne weşandin. Ji nişkê ve birêvebira nexweşxaneyê dibe parastvana mafêن jinan. Ji her derêن Dewletêن Yekbûyî yên Amerîkayê(DYA) ji bo televizyonê nameyan dişînin û heyraniya xwe ya ji bo filmê diyar dîkin. Di rêzefilmê de Dorothy Michaelsa ku rola Emily Kimberly dilîst li hemiya welatî nav dide.

Rêzefîlma ku em behsê dîkin "Tootsie" ye û ew kesa rolêن Emily Kimberly û Dorothy Michaels lîstî jî Dustin Hoffman e. Serlehengê filmê lîstikvanekê

fîlman e. Dema bêkar dimîne ji bo li nexweşxaneyekê kar bike daxwaza karî dike. Ew dema tê hilbijartîn, ne bi tenê reng û dermanê jinan li xwe dide, hest û îdeolojiya jînbanê jî li wî der dibe.

Di rastiyê de Hoffman bi hin kiriyaran tê sûcdarkirin û diyar e wî dersa xwe ji wê rolê nestandiye lê ew mijara bi henekan hatî nîşandan rêya rast e.

Ew mîrên ku li dijî tûndkariyê ne. Divê dest ji gotinê "tootsie" (cana min, nazika min, delala min) berdin û sîngê xwe li hemberî vê yekê vegirin.

Heke "tootsie"bûn xeyalek û fantaziyek be ku nekare bê pêkanîn, ma zordarî û tûndkariya mîran jî nayê astengkirin?

Hefteya borî fîlma Muslim hat nîşandan. Beşen biçük ên jiyana wî bûye bi kêmâyên xwe ve jî be bûye fîlmek. Ew tiştê ku gelek ji me ji bîr kiriye, lêdan jî beşek ji fîlmê ye.

Piştî Muslim li jina xwe Muhterem Nurê dide poşmanîya wî û bi vê yekê germtîrbûna evîna wan hatiye nîşandan. Ev ne kêmâyîyek afîlmê lê ya vê dema em dijînn e ku welê hat nîşandan.

Rastiyek heye: Muhterem Nur ew jimane mîrane yê wek arabesk tê nîşandan ji Muslimî zûtir û baştir temsîl dike.

Muhterem Nur pêşiyê jinek bû ku hema digiriya. Di sala 1967ê de hewil dide dest ji sînemayê berde. Li gazînloyen çînên duyem dest bi dansoziyê dike. Hingê strana "Ömrümce Ağladım, di hemîya emrê xwe de giriyyame" gotiye û plakeka 45î derêxistiye. Gulseren İşerîyê sala 2017ê biyografiya Muhterem Nurê kiriye kitêbek

û bi heman navî weşandiye.

Gotinê staranê Ümit Yaşar Oğuzcanî nivîsîne. Wî li ser bergê paşiyê yê plakê holê nivîsiye.

“Muhterem Nura ku ji dûr ve li jiyana wê ya dilşewat dinêrim, pîroz dikim ku hewil dide li ser pêyên xwe wek şitlekê bisekine. Ji ber wê dema xwest ez ji bo yekem plaka wê stranekêê binivîsim min rasterast qebûl kir.”

Muhterem Nurê Yeşîlçam kir Yeşîlçam.  
(Yeşîlçam: Fîlmên klasîk ên Tirkân.)

Bi tenê em li ûlanêñ rojnameyan binêrin em ê bibînin ka ew çawa dihat nasîn.

“Mijara Fîlmê felaketeka malbatekê ye ku ji jiyaneka rastî hatiye aamadekirin.(Son Şarki-Strana Dawiyê).

“Fîmek e ku dê hemî jinan hor-û-hor bigirîne, mîran pey xwe bibeziñe û ji ciwanan re dersan bide.”(Annemin Gözyaşları-Hêsrên Dayika Min).

“Şaheser e ku her jina gunehkar, her mîrê lewçe û her kesêñ hûnerhez dê bi heyraniyê temâşe bikin.” (Ben Kahpe Değilim, ez ne qehbik im.)

Strana Tracy Chapmanî “Behind the Wall” strana Suzanne Vega “Luka”, ya Billy Bragg “Levi Stubbs’ Tears” ya Eminem “Stan” behsa tundkariyê kirine û me ew stran kirine taca serê xwe.

Lê ti kesan stran wek Bertrand Cantat bi êşê gav bi gav nedaye hestkirin.

Kurd Cobain li ser navdarbûna xwe weha gotiye:

“Ez wan kesêñ albûmêñ me dikirin nas nakim. Nizanim kî ne, dengê xwe didin kê. Hinek ji wan belkî li jina xwe didin. Hinek jî belkî dema bar dikan kûçikê xwe li kolanan dihêlin.”

Ma kê dikarî bizane ku rojekê Cantat dê li gor teirîfa Cobainî be. Mirov nikare garantiya vê yekê bide ku berhem û xwedanêñ berheman dê wekî hev bin.

Ji stranêñ li ser tûndkariyê hatî nivîsîn strana herî baş rasterst behsa lêdanê dike straneka tirkî ye. “Pata-Pata (Dayak Cennetten Çıkma, Tep û rep, lêdan ji Cinetê hatiye).” Tûndkarî bêyî kînaye û henekan wek tişteka şîrîn tê nîşandan wê meşrû dike.

Miriam Makeba, piştî salêñ 1960ê li Efrîqayê yek ji sembolêñ tevgerêñ azadîxwaz û femîzmê bûye.

Jiyana wê di nav tekoşînê de borî. Bi saleke biçük zewicandina xwe ya pêşî bi polêsek re kir û rastî heqaret û lêdanen hat. Piştî ku çû Amerîkayê di salêñ 60î de jiyana xwe bi trompetçî Hugh Masekela re berdewam kir. Hugh Maskela yek ji pêşengên tevgera anti-apartheîdê yê hunerê ye. Piştre dersînorkirina xwe ya ji Amerîkayê jî da berçavan û bi Stokely Carmichael re zewicî. Stokely Carmichael yek ji serokên tevgera Panterêñ Reş e.

Strana “Pata Pata” di sala 1967an de li seranserê cîhanê bi nav û deng bû. Strana “Pata Pata” bi ahengeke herikbar, bi awazeke xwezayî û bi gotinêñ di zaravêyê Xhosa ya herêmî de guhdarvanan dikêşê nava xwe. Strana “Pata Pata” straneke nuwazeya dansê ye. Di besêñ resîtatîfêñ îngilîzê yêñ stranê de behsa

Johannesbûrgiyêñ ku di dawiya hefteyê de coşbûna wan a bi vê dansê tê kirin.

Aliyên stranê yên polîtîk, him di yek girtina dans û berxwedana ku li dijî desthilatdariya spiyêñ nijadperest de him jî di şêwaza dansê de hebû. Dema polês di kolanêñ Johannesburgê de li ser û go yê xelkê digeriyan bi tevgerêñ dest û piyêñ xwe xelk bêzar dikirin. Fîgurêñ bingehîn yên dansa "Pata Pata" yê jî tevgerêñ dest û piyê polêsanin yên dema gerîna li ser û goyê xelkê de bikardianîn. Herweha peyva "Pata Pata" jî tê wateya "destlêbide destlêbide".

Nivîskar Ulku Aker û stranbêj Rana Alagoz strana "Pata Pata" bi vî awayî wergerandiye :

"Nebe wî eciz(hêrs) bike  
Dê lê bide tep û rep  
Paşê min kar pê nînin  
Ew pir bi rike tep û rep  
Binêre lêdan li beheştê derketiye  
Dê lê bide tep û rep  
Nebe bigrî tu megrî  
Lê me de tep û rep  
Li cîhanê kesên lêdan nexweriye nîne  
Em hemû vîya dizanin  
Pêşî dayika me, piştre mamosneye me  
Piştre dê kî lê bide?  
Ka bizanibin  
Ax eman hêrs meke  
Dê lê bide tep û rep  
Hezkiriyêñ we jî li we didin?  
Li berxwe nekevin tiştên weha dibe  
Herî dawî kengî sîle li we da?  
Dê veneşêrin canê min  
Her kes lêdanê dixwe ."



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Rojnamegeriya serbest, nivîskarî, edîtorî û kuratoriye dike. Derhêneriya weşanê ya kovara Roll kiriye (1996-2009). Di rojname û kovarêñ Express, Bir+Bir, Esquire, FHM, Aktuel û Radikalê de li ser muzîk û çanda populer nivîsandiye. Edîtoriya muzîkê ya Ansîklopediya Rakîyê kiriye (2010). Kuratoriya pêşandanêñ "Uzayda Bir Elektrik Hasıl Oldu: 1960larda Müzikli Türkiye" (Depo/2012) û "İşte Benim Zeki Müren" (Navenda Çandê ya Yapı Kredi/2014) kiriye. Bi jêrnavê "Sazlı Cazlı Sozluk" du pirtükên lêkolînî weşandin; 50li Yıllarda Türkiye - Şimdiki zaman beledir (YKY/2017) û "60lı Yıllarda Türkiye - Dünya durmadan dönüyor" (YKY/2018). Di sala 1966an de li Enqereyê ji dayik büye.

#50 RAMİN  
MATİN

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## ‘İSTIQRAR’

Zaroktî bi gotinê weke “Hey min bilikê te xwaro” dest  
pê dike û ev jiyan bi gotinê weke “Kesê mêt di bin vî  
tiştî de namîne” berdewam dike.

Dema ez li leşkeriyê bûm, komeke ji çar kesan pêk dihat hebû. Hevalên hev bûn. Hemû dema xwe ya vala bi hev re diborandin û bi ti kesên din re nedıaxivîn. Heta ji destê wan dihat ji leşkerên din dûr diman û dema yekî biyanî dicû gel wan nedıaxivîn. Ji bilî pirsên fermandaran, bersiva ti pirsên kesên din nedidan.

Bi hev re ji axavtinê zêdetir bi kulmikan, bi pihînan diaxivîn û hin dijûnên ku min li ti derên din nebihîstibû ji hev re didan. Weke ku her gav bi hoş bûn lê di nava vê coşbûnê de yekî kulmikek li milê yekî dida, yê din pihînek li qûna yê din dida û piştî vî tiştî jî bi dengê bilind dikeniyân.

Dijûnên wan dijûnên zayendî bûn ku gelek caran ji xwuşk û dayikên hev didan. Dijûnên wan gelek bi detay bûn. Di serî de tiving, gelek alavên din jî di dijûnên xwe de bi kar tanîn û ev dijûnên wan weke kurtesenaryoyan bûn.

Zehmet bû ku mirov têkiliya di navbera wan de fam bikira lê yek ji wan serkêş bû. Wî biryar dida ku wê kî kengê û çi bike. Xwe wiha dida xuyakirin ku weke gelek serpêhatiyêñ wî hebû.

Rojeke ku ez çawîşê nobedar bûm, kom li cihekî dûr, li mîrgekê rûniştibû. Rûpelê rojnameyekê ji dest hev direvandin û dikeniyân. Ji nişkê ve yekî ji wan ji serkêşî re got "kurê min bide vê". Bêdengiyek çêbû. Her du yên din çend gavan bi paş de çûn. Tırsê xwe li ruyê wan dabû der.

Serkêş hêdî hêdî rabû ser lingan. Dema ew rabû hevalê wî bêhtir tırsiya. Min fam

nekiribû ku bê çi dibe. Min nizanî bû ku çîma ji nişkê ve rageşiyek di navbera wan de çêbû. Serkêşî ji nişkê va kulmek li ruyê hevalê xwe xist. Paşê jî pihînek li qûna wî da.

Kurik şewişî lê ne behitî. Yê din jî ne behitîn. Serkêşî bi dengekî bilind got, "kurê min tu ji kê re dibêjî lawê min?". "Kî kurê kê ye lawê min!". Yê din dizanîbû ku xete kiriye lê bi qasî ku min fam kirî, êdî dixwest rûmeta xwe biparêze. Heke na wê bihetikiya.

Kulmek li serkêşî da. Li guhê serkêşî ket. Bi wê êşê re destê xwe bir ber guhê xwe. Weke ku hinekî şewişî bû. Hevalê wî ev fersend ji dest berneda û bi pehînekê ew avête xwarê. Bi gotina "Ji kê re dixwazim ez ê bibêjim pîç kurê pîçan" li ser wî rûnişt û kulmeke din lê da.

Ez behitî bûm, li cihê xwe sar sekinî bûm. Min bi vî awayî li wan temaşe dikir. Divê min mudaxele bikira. Lê min leşkeriya demkurt dikir û yên demdirêj zêde guh nedidan me û ez hîn bûbûm ku divê ez xwe tevlî karê wan nekim.

Min le derdora xwe nêrî. Lê ji ber ku herkes dûrî cihê bûyerê bû, hayê kesî jê nebû. Serkêşî bi awayekî hevalê xwe ji ser xwe avêt û pengizî. Dest pê kir û pehîn li serê hevalê xwe da. Bi qêrîn digot, "Tu nikarî ji min re bibêje lawê min".

Êdî diviya ku ez mudaxeleyê bûyerê bikim. Bi bazdan û bi gotina "Bisekine, tu çi dikî" ez çûm bi ber wan ve. Dema ku min dîtin, ew her du yên li teniştê disekinîn, ji ber çi bû ez nizanim, lê her du ji hev vegetandin û gotin ku "keko bisekine".

Di wê demê de rewşê bala hinên din jî kişandibû. Ew jî bi bazdan hatin. Serkêş bi lez ji wir bi dûr ket. Ruyê hevalê wî di nava xwînê de mabû. Nekarîbû ji erdê rabe.

Ew rakirin û birin revîrê. Dema min pirsî ku ji ber çi li hev dane, bersiv nedan. Serkêş ji bo mehekê bi cezayê disiplînê hate cezakirin û ew şandin qawîşa disiplînê. Yanî leşkeriya wî mehekê dirêtir bû. Dema fermandar jê pirsî bû gotibû, hevalê wî dijûn ji wî re dabû.

Hevalekî min hebû. Gotibû ku dê û bavê min her roj bi dengê bilind pev diçinin. Dixwest ku dest ji hev berdin. Malbateke resen bû û rewşa wan gelekî baş bû. Li gorî rewşa wê demê şehreza bûn. Zivistanekekî, bavê wî gotiye ez ê biçim gera karî lê derketibû holê ku çûye "Ewropayê da ku dostika xwe" bibîne.

Hevaleke dêya wî bi tesedifî ew li paytexteke wenatekî Ewropayê li restoranteke luks dîtiye. Dema bavê wî vegeriya ye li malê şerekî mezin qewimî ye û dest ji hev berdan e.

Xaniyekî wan ê mezin û serbixwe hebûye. Bavî çûna ji malê qebûl nekiriye û li odayeke malê bi cih bûye. Gotiye ku di vê rewşa heyî de ew nikare debara du malan bike. Her sibehê ji malê diçe karî û êvarê jî vedigere odaya xwe.

Hevalê min şîva wî li ser siniyekê dibe

odeya wî, weke xizmetkarekî. Di navberê de bav hewl dide ku navbera xwe û dêya wî çêbike lê bi pevcûnên nû ev hewldan bi dawî dabin.

Rojekê, dema hevalê min ji dibistanê vegeriya ye dîsa qerebalixiyek bihîstiye. Ji ber ku gelek caran ev xirecir hebûye li malê, bêyî xwe nîşanî ti kesan bide, çûye odaya xwe. Ji nişkê ve qerebalixî qut bûye. Saw ew girtiye.

Dema çûye salonê, dîtiye ku bavê wî dest xistiye qirika dêya wî û dixwaze wê bifetisîne. Ruyê dêya wî soromoro bûye. Demildest bi bavê xwe girtiye û ew ji malê qewirandiye. Demekê bi hev re neaxivî ne. Paşê bavê wî bi rêya telefonê lê geriya ye û lêborîna xwe jê xwestiye. Ji bo bi hev re biaxivin ba wî kiriye ku biçe cihê lê dimîne.

Ji wê gavê û pê de hevalê min hinekî ji me dûr ket. Dema em bi hev re diçûn sînema û xwarin xwarinê, em xwendekarêñ dibistanê diçûn geştan bi me re nedihat. Heta êdî beşdarî gera me ya li Kolana Îstîklalê jî nedibû ku yek ji wan tiştên herî zêde jê hez dikir û em ji dibistanê direviyan diçûn. Me digot dibe ku ji ber xemgîniyê be, piştî demekê wê bibe weke berê.

Paşê ez pê hesiyam ku, piştî bavê wî ji malê çûye, gotiye ez nikarim debara du malan bikim û êdî pere ji wan re neşandine. Odaya oteleke luks ya ku li geliyê behra Marmarayê dinêre bûye mala debara wê dike. Hevalê min heftê carekê du caran li wir serdana wî dikir, di nav re jî pereyekî baş ji bavê xwe distend.

Çi dema ku diçe gel bavê xwe, bavê wî jî jê re dibêje "ev çi beredayîtî ye, dêya xwe qani bike, ez êdî vegerim malê. Me hinekî

tolazî kiriye, hewce nake ku em mezin bikin”.

Carekê jî behsa wê bûyerê kiriye ku bûye sedema nîqaşên di navbera bavê û dêya wî de dest pê bikin. Gotiye wî ew plan gelekî bi hûr û kûr plan kiriye, heke ku ne hevala dêya wê bûya wê gelekî baş bi rê ve biçûya. Weke senaryoya filmekî bûye.

Dêya wî ji bo debara malê pêşiyê pere ji hevalên xwe deyn kiriye. Paşê çi li ser navê wê hebe, firotiye. Bav hê jî li ser gotina xwe ye ku dibêje “wiha nabe, nabe min ji malê bavêje. Heta ji kurik re gotiye ku “dêya te nikare li te binêre, ew tiştekî ji van karan fam nake wê pereyan ji dest bibe” û xwestiye kurik bitirsîne.

Ev her du bûyerên mirovên ji derdorêن civakî yên cida, ji nifşên cida tê de bûn qet ji hişê min neçûn ku weke ti têkîlî di navbera wan de nebe. Lewre ne mimkun bu ku ez her du yan jî fam bikim.

Leşker rastî ewqas heqaretan hatibû lê bi ken hemû pêşwazî kiribû. Digel vê rewşê bertekkek bêpîvan li dijî gotina “lawê min” dabû. Min fam nekiribû çima ev bertek daye û êrişike li ser rûmeta xwe dîtiye. Min inyada wî bavê jî fam nekiribû ku ji bo ew têkiliya ku rûxiyaye li ser linganbihêle, jiyana kurê xwe, heta dahatûya wî dixe nava xetereyê.

Piştî salêن dirêj, dema ez li ser projeya rewşa méraniyê ya li Tirkîyeyê dixebeitîm, ev her du çîrok bêhter bi wate bûn li ber çavên min. Min dît ku ew “rewşa mérbûnê”, hin liv û tevgerên derbarê mérbûnê de yên ji zaroktiyê û pê de li zarokan têن barkirin, di hemû mérân de dewseke kûr çêdike.

Zaroktî bi gotinêن weke “Hey min bilikê te xwaro” dest pê dike û ev jiyan bi gotinêن weke “Kesê mér di bin vî tiştî de namîne” berdewam dike.

Mirovên veduguhezin keriyên belengaz ku di binhişê wan de divê her gav û li her deverê mérbûna xwe ispat bike.

Ew mérên di rastiyê de şikestî ne û ji ber vê jî her gava ku diavêjin dizivirînin nimayîşekê û wisa difikirin ku her gavê di bin gefan de ne. Kesê ku îstiqrarê di dest xwe de digire, wisa difikire ku divê îstiqrarê di dest xwe de bigire û vê jî weke delîlê mérbûnê dibîne, dema dikeve tengasiyê, weke ajalê di quncikê de asê maye, serî li tundkariyê dide.

Dibe ku ev tundkariyeke laşî, pejnî yan jî madî be lê naverok yek e. Tundkariya wî mérî û ya bavê ji heman cihî çavkaniya xwe distîne. Ew jî di wê demê de derdikeye holê ku dema mér îstiqrarê winda dikan û mérbûna xwe di bin xetereyê de dibînin.

## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Derhêner e. Fîlma wî ya yekemîn Canavarlar Sofrası (2011) û ya duyemîn jî Kusursuzlar (2013) bû. Fîlma wî ya metrajdirêj Son Çıkış (2018) di van rojan de di sînemayan de tê nîşandan. Ji Beşa Sînemayê ya Zanîngeha Loyola Marymount a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê derçûye (1999). Lîsansa xwe ya bilind li Beşa Sînema û Televîzyon a Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê kiriye. Di sala 1977an de li Enqereyê ji dayik bû û li Fransayê dest bi perwerdeyê kiriye.

#51 EMRE  
SENAN

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÛNDKARIYA  
MÊRAN BINIVISIN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

“YÊ MÊR BE” DIKARE  
DEST JÊ BERDE

Heke dîrok di rêya maderşahîyê  
de bimeşîya dinya dê gelek rihettir ba.

Digel ku guman li ser bersivan heye jî divê em hin pirsan bikin û li ser bifikirin û li gor wê bi giştî biaxivin? Carinan, erê carinan divê ev yek bê kirin.

Ez bi xwe dikim.

Em dikarin van pirsan rêz bikin:

- Mêr çi ye? Pêşgira wê ya erk[mêr bi zimanê tirkî erkek e û pêşgira wê erk- e. Têbîniya wergêrî.] çêdibee ku bi xwe bûbe navê zayendekê.
- Gelo hema bêje çavkaniya hemî agahiyên rast û çewt berbelav yên li ser jin û mîran hatîn nivîsîn ne yên mîran in?
- Ma dîroka şaristaniyan ne mîran bi nberçavikê mîran nivîsîye?

- Gelo zimanê nêrane ne ji zimanê çînî, îspanî û ingilîzî berbelavtir e?
- Gelo çîma hemî desthilatê di dîrokê de tûndkar in, gelo ji bo desthilatê pêwîst e?
- Rojên borîn yên paderşahane qedera rojên bê yên paderşahane çêkiriye an na?
- Heke welê jî be ma mecbûr e dîrok wek xwe dewam bike?
- Tûdkarîyeka ne nêr/mîrane heye?
- Ji bo em ji tûndkariyê xelas bibin gelo em ji mîraniyê xelas bibin destpêkeka çawa ye?

Hûn dikarin texmin bikin ka bêyî dudilîyê  
min ci bersiv dane van pirsan û bi giştî  
daxivim. Bi dilekê rihet ez gihamê vê  
encamê:

Heke dîrok di rêya maderşahîyê de  
bimeşıya dinya dê gelek rihettir ba.

Lê nebû.

Erê piştî niho çêdibe ku bibe?

Belkî. Barekê mezin ê vê yekê li ser tevgera  
gerdûnî ya jinan e.

Mêrên wijdana wan heyî jî dikarin hin  
tiştan bikin.

Ez li ser navê xwe diaxivim, ez dikarim ne  
ji zayenda nêr lê dest ji mîraniyê berdim.


**DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE**

Hunermend e. Avakar, hevpar û derhênerê afirîner ê ajansên reklaman ên bi navêن Yorum, Markom, Reklamcilik û Euro RSCGye. Ji sala 1980yan ve di warê dîzayn, sînemaya anîmasyonê û hunerên nûjen de bi awayekî aktîf kar dike. Di Saziya Pîşeyî ya Grafîkeran û Komeleya Xêzefîlmkaran de endamtiya lijneya rêveberiyê û seroktî kiriye. Di Beşa Dîzayna Grafîkê ya Zanîngeha Hunerên Xweşik a Mîmar Sînanê de wek şêwirmendê projeyan ders da û di sala 2017an de bi xwesteka xwe malnişîn bû. Bi Prof. Ayşegul Izer re Weqfa Dîzaynê ya Emre Senan (ESTV-2005) ava kiriye. Projeya Xebatêن Dîzaynê ya Yahşîbey ku qezencê armanc nake, da destpêkirin û malpera [www.yahsiworkshops.com](http://www.yahsiworkshops.com) da xebitandin. Di 2018an de Pêşangeha Sala 10emîn a Xebatêن Sêwiranê yên Yahşîbey vekiriye. Di çapemeniyê de bi domdarî karîkatur xêz kirin. Ji bo rêxistinêن civaka sivil bi dilxwazî sêwiran çêkirin. Di 2007an de buroya xwe ya dîzayîn û şêwirmendiyê vekiriye. Bergêن pirtûkan û îllustrasyon çêkirîye. Pirtûka wî ya bi navê "Karikatur" ji Weşanêن Metis derketiye. Li welat û li derveyî welat di pêşbaziyêن dîzayna grafîkan, karîkatur û xêzefîlman de gelek xelat hildaye. Berhemêن wî li Kanada, Swîsre, Almanya, Îran, Awustralya, Çekya, Fransa û Koreyê di pêşangehan de hatin pêşandan û ji bo muzexaneyan hatiye qebûlkirin. Bi awayekî aktîf bi hunerên nûjen re têkildar dibe. Li welat û li derveyî welat 14 pêşangehêن şexsî vekiriye. Di hinek pêşbaziyêن navneteweyî de endamtiya lijneya hilbijêr kiriye. Di sala 1954an de li Konyayê hatiye dinê. Bi ïngilizî dizane û bavê du zarokan e. Ji Koleja Îzmîrê derçûye. Li Zanîngeha Bogaziçiyê salekê endezyarî xwend. Ji Beşa Sêwirana Grafîkê ya Dibistana Bilind a Hunerên Endustriyê yên Nerîtî ya Akademiya Hunerên Xweşik a Dewletê derçû. Li wê dibistanê dest bi asîstaniyê kiriye. Dema ku qanûna YOKê derket, wî jî istîfa kiriye.

#52 YILDIRIM  
TÜRKER

# NE TESEDIF E

## 52 MÊR HEFTEYAN

WÊ LI SER TÜNDKARIYA  
MÊRAN BINIVİSİN



**Obianet**  
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI

## HÊSÎRIYA DI DESTÊ ERKÊ DE

Mêr, çıqas di nava diranên mekîneya erkê de dieciqe, bêhtir jê dike, belav dike, perçe perçe dike û dikuje. Baş e, gelo azadbûna mîran wê ji ku dest pê bike? Helbet bi jêpirsîna her cure erkê.

Mêr, ji ber tirsê dikuje.

Heke weke demên berê min ji hêza başkirina li xwe mikurhatinê bawer bikira, min ê çi jin çi mîr ji xwendevanan bipirsiya; min ê bigota, de ka bibêjin. Kî ji we heye, tenê ji ber ku jin bû, jinek ne êşandiye? Ne qediya. Gelo di nava we de ti kes heye ku vê, bêyî bizanibe, bêyî bixwaze kiribe?

Ji zû de ye ku ez ji hêza başkirina li xwe mikurhatinê bawer nakim. Ez di nava tarîtiyê de ji merheleyeke din a dilsafiyê mezûn bûm. Ji vînparêziyeke besît a ku di demeke jiyana me hemûyan de ne tenê ji ber hêsaniyê, ji bêsebriyê û gewîtiya hêviyê zeft dike...

Ji bo zalimên hov, li xwe mikurhatin gelek caran dibe sparteyek ku xwe dixin paş wê.

Ji ber wê jî ez biqîrînim û bibêjim "jinan neçewisînin" wê çi fêdê bike. Veguherîn ji guhan dest pê nake.

Jin, dijûneke. Em hemû vê dizanin.

Dehfik e, cirav e, pê nebawer e, tirsonek e. Gef e. zorbazî ye.

Dewlet, malbat û hemû rêexistinê erkê, li ser wê bingehê hatine avakirin ku mîr ji jinê diparêzin.

Bâş e, gelo ew mîrbûna ku bi ewqas tundkariyê tê parastin, gelo wê çawa bikaribe bi vê tîzektiyê erkê bimeşîne?

Jinê li gorî erka xwe dixe şêweyekî, navekî lê dike, diçewisîne, dipelixîne, heke hewce bike, dikuje. Yanî bi vî awayî dimeşîne.

Ew kesên ku wezîfeya leşkeriya pîroz kiribin, baş dizanin. Dema mîr bi awayê komî li cihekî tê asêkirin, dema dîbin koleyê erkeke mezintir a divê şik jê neyêkirin, bi awayekî ecêb, bêhna wan fireh dibe. Di vê demê de hemû tiştên dizanin derbarê mîrbûnê de ye didin aliyekî ku dizanin ev rewş demkî ye û di vê demê de bêyî li hember derkevin, ji bo hemû biçûkxistinan amade ne. Baş tê bîra min ku çawîş bi gotina "keçikno" bang li qawîşê dikir. Kesên ku leşkeriyê dîkin li hemberî wan gotinan hema hema bibêjin gelekî nazdar dîbin ku li kolanekê ji wan re bêgotin, wê bibe sedema kîrkirinê.

Ev, ji me re behsa hin tiştan dike, ku divê tekez em çareser bikin.

Nazikbûna mîran, parastina xwe bi hêrsbûnê dike,

Mîr bi piranî nikarin hêrsa xwe kontrol bikin. Hêrsbûn ji bo mîran şeref e. Çeleng e. Gelek caran çavê mîran sor dîbin.

Yek ji wezîfeyê bingehîn ên jinan jî, aşkirina mîran e. Helbet bi gotinê xweş û bi dilovaniyeke şikestî.

Mîr ji wê hestê gelekî hez dîkin ku dema hêrs dîbin, bêş aşkirin. Di rastiyê de kurteya jiyana jinan e ev. Jin ew tiştê ku di navbera mîr û hêrsa wî de dijî. Ev, em dizanin erkeke wisa ye ku tirsa mirinê li ser heye.

Xweşbînî li rewşa wî mêtî tê kirin ku 'hêrsa wî rabûye', 'çavê wî sor bûye'. Ji ber navtêdan di sûcê wî de heye, cezayê wî tê xistin û tê xelatkirin. Jina ku mêtê bi dehan caran lê dabe, xwestibe wê bikuje, kuştine, tenê dikare van tiştan di xewna xwe de bibîne. Bi kurtasî hêrsbûn, navtêdan tenê ji bo mêtan hene.

Hejmara imtiyazan ewqas zêde ye ku bi hejmartinê naqetin.

Ew rihê seferberiyê, atmosfera xwecihî û milî ya li nava civakê tê belavkirin, van imtiyazan xurtir û zexmtir dike.

Min di nivîseke xwe ya kevin di nivisibû ku jineke kurd, bi dehan caran rastî tecawiza leşkeran hatiye, pêşiyê hiştibû çapemeniya mezin hêrs bibe. Ez wî tiştî ji bîr nakim ku Ozkok, bi devê girêz heqaret li min kiribû û giliyê min li ba dewleta xwe kiribû. Ji ber ku leşker tecawizê nakin.

Li gorî bekçiyên erkê, heke behsa tecawiza komî ya li hin bajarên biçük li zarokên keç hatine kirin, bikin, ev jî gelekî dilşikên e. Qedexeye ku mêtan weke kerîya tecawizkar binav bikin. Weke Qetlîama Ermenan. Weke bûyereke munferit tê qebûlkirin.

Mêt, çiqas di nava diranên mekîneya erkê de dieciqe, bêhtir jê dike, belav dike, perçe perçe dike û dikuje.

Baş e, gelo azadbûna mêtan wê ji ku dest pê bike? Helbet bi jêpirsîna her cure erkê.

Helbet gelekî zehmet e ku xwe ji wê rola şerkeriyê ya erk her gavê dixwaze wê dahf bide, her gav xwe bi bîra wê dixwe paqij bike. Bi ser de jî, zimanê erkê, erkperestî

ne tenê taybetmendiyekê mêtan e. Li hemberî bendewariyan û daxwazan û arezûyan mêt divê têkoşîneke zehmet bide. Heke ku tu xwe bi dest berde, her tişt hêsan e. Rewatiyeke wiha yê mêtbûnê heye ku ti kes hebûna wê napirse.

Heke ku wê bibe mirov, divê bi tirsêñ xwe re rû bi rû were.

Divê li gorî wê qaîdeyê bijî ku bêyî ku hezkirin, nefret û namûsa xwe bi mirinê bipîve, bêyî ku hêza xwe li ser kesen lawaz biceribîne. Lazim e em ji wê atmosfera mêtbûnê derkevin ku dilşikenandinê weke gotinlirû, bêeedebiyê weke wêrekî, hesûdiyê weke evîn, kuştinê weke namûs dibîne û cîhan li me hemûyan dike zindan.

Ji zû de ye dema wî tiştî hatiye ku hemû cîhan divê jina di nava xwe de keşif bike û wê azad bike.



## DERBARÊ NIVÎSKARÎ DE

Nivîskar, helbestvan, dramatûrg û wergêr e. Di kovarên Express û Öküz de nivîsi ye. Di rojnameya Radikal û Radikal İki (dû) de qunciknivîs bû. Di 12 Tebaxa 2012an de ji ber ku nivîseke wî nehatiye weşandin îstifa kiriye. Di Şanoya Bajêr a Stenbolê de wekî dramaturg xebitî ye. Di 26em Festîvala Fîlman ya Stenbolê ya Navnetewî de endamê jûrî ya Pêşbirka Netewî bû. Pirtûkên bi nave Gözaltında Kayıp Onu Unutma! (1995) û Türkiye Sizinle Gurur Duyuyor (1998) nivîsandiye. Bi Cihangir Kedileri yê (1993) Xelata Helbesta Cemal Sureya wergirtiye. Nivîskarê lîstika bi navê Gölge Ustası yê ye (1993). Navêن çend senaryoyêن wî ev in: Delibal (2015), Gece, Melek ve Bizim Çocuklar (1993), Düş Gezginleri (1992) û Berdel e (1990). Navêن çend wergerên wî: Sıkı Gözetim (Jean Genet), İnce Sızı (Harold Pinter), İyi Geceler Anne (Marsha Norman) û Yaz ve Duman e (Tennessee Williams). Li Kolêja Robert û Beşa Plansaziya Herêm û Bajariyê ya Zanîngeha Teknîkî ya Rojhilata Navînê (ODTÜ) mezûn bûye. Di sala 1957an de li Enqere yê hatiye dinê.

